

SERPÊHATÎYA
DERHEQA
ZEWACÊ DA

CON Û LÎZA
BÎVÊR

Hevalê giranbiha,

Em gelekî şa ne, wekî ev kitêb destê we da ye. Hûn şabûna ezmîn in. Xwedê dixweze we nas bike û ji alîyê we da bê naskirinê. Bi nêzikaya tevî we, Xwedê we dewatî hevkarîyê dike, ku hûn wê yekê merivên dor û berên xwe ra bidine eyankirinê, çî ku dilê Wî da heye. Çawa ku Pawlosê şandî korintîya ra nivîsî, em bayloz û wekilên Mesîh in, bi destî kîjana Ew vê dinîyayê ra xeber dide.


Zewac, cûrekî herî kivş e, bi kîjanê em tebyeta Xwedê didine eyankirinê. Ew heleqetîyên pîroz, yên di navbera Mesîh û Dergîstîya Wî Civînê da, tîne ber çava. Her yekîtîk /nava kîjanêda usa jî dijwarî, êş, yan jî şaşî hene/ dikare bona kara geleka hizkirinê, şabûnê û aşîtîyê bide.

Xudan dilên me ra xeberda û usa kir, ku em vê berbirîbûnê derbasî li cem we û serwêrên ruhanî yên tevî we, yên li temamiya dinîyayê, bikin. Ev fêrbûn bona hemû meriva ye, yên ku zewicîn e, yan jî nezewicî ne. Em hîvî dikin, ku hûn vê yekê tevî hizkirin û piştgirîya me qebûl bikin û wê derbasî li cem wana bikin, kîjana hûn nas dikin. Em bawer in, wekî ev berbirîbûn wê him alî we û him jî alî endamên komên we bike, ku hûn serpêhatîya xiyalên xwe û ji alîyê Xwedê da duakirî çê bikin.

Nava zewaca me da tengavî û dijwarî hebûne, lê me helalîya Xwedê dîtiye. Ewî zewac nava hemû goveka da daye xebatê ku emirê me berfireh be û Ew dixweze wê yekê bona we jî bike. Em dua dikin, wekî bi xwendina vê kitêbê hûn bèn ser wê fikirê û wî hemû tiştî bistînin, çî ku bona nivîsara serpêhatîya we ya bedew pêwîst e.

Nava Mesîh da:

Con û Lîza Bîvêr




John Lisa



JohnBevere@ymail.com

LisaBevere@ymail.com

Messenger
International
MessengerInternational.org



SERPÊHATÎYA
DERHEQA
ZEWACÊ DA

CON Û LÎZA
BÎVÊR

Story of Marriage by John & Lisa Bevere, Kurmanji/Latin

© 2015 Messenger International

www.MessengerInternational.org

Originally published in English as Story of Marriage

Additional resources in Kurmanji/Latin by John & Lisa Bevere are available for free download at: www.CloudLibrary.org

To contact the authors: JohnBevere@ymail.com, LisaBevere@ymail.com

“Serpêhatîya derheqa zewacê da”, Con û Lîza Bîvêr, Kurmanciya latînî

© 2015 Messenger International

www.MessengerInternational.org

Pêşda bi zimanê inglîzî hatîye çapkirinê, bi sernavê “Story of Marriage”

Hûn dikarin belaş van matêriyala û yên mayîn bi kurmancîya latînî ji van malpera dest bînin: www.CloudLibrary.org

Bona îzbatkirina tevgirêdanên tevî xudanên kitêbê:

JohnBevere@ymail.com, LisaBevere@ymail.com

Xeberên razîbûnê

Ji gelek aliyava bi saya we serhatîya zewaca me bona zarokên me, jinên wan û nebîyên me hatîye nivîsarê. Em şane, wextê ku em divînin, ku ji we her yek nava emir da pêş ketiye û hizkirina we hindava yê mayîn heye.

Êdîsonê bê tirs, tenê wedê heta-hetayê wê bi rastî emekê te bona vî karî biryar bide. Gotina derheqa wê yekê da, wekî meyê nikaribûya ev kitêb bêyî te hazir bikira, dide kîvîşê, ku em temamiya rastîyê nebêjin. Spas bo wê yekê, ku te gotina me xweyî kir, ku te xeberên me xweyî kirine û gotina me tevî fikirdariya gotinên nivîsarên pîroz kirine yek, kîjanê nêzîkî jîyanên meriva be.

Cêylîya bedew û aqil, bi saya nêzîkbûna te û xebathizîya te, te bi cûrê bedew ev kitêb rêz kir. Bira ew hemû tişt, çi ku te nava vê deştê da çandiyê, nava emirê te da mîaser bibe.

Wînsêtîn û Êlîson, spas bo vî hemû tiştî, çi ku we kir, ku alî me bikin, ku em matêriyalên xewendina vê kitêbê yên herroje çap bikin. Xebata we ev kitêb da dewlemendkirinê û berfirehkirinê.

Em spasîyê elamî xebatkarên “Mêsîncêr Întêrnêyşînil”-ê û hevkarê dikin, ku tevî mene. Meyê çetin hevalên wî cûreyî yên helal ji Xwedê hîvî bikirana, yên ku tevî me bûna, ku Mizgînîya Îsa Mesîhe bi rûmet bighînine miletên cîhanêye cuda-cuda.

Ji gişka zeftir spas bo Te, Bav Xwedê, bona hizkirina Te ya bê sinor û bo Te, Îsa- Padişê me, bona dayîna emirê Xwe ê giranbiha, û bo Te, Ruhê Pîroz- bo qewata Te, hînkirin û tevgirêdanên nêzîk. Spas bo wê yekê, ku Tu tu cara me nahêlî û ji me dûr nakevî.

S E R E C E M

Derheqa vê kitêba întêraktîv da	7
Pêşgotin	9
1. Bernama destpêkê	11
2. Dawîyê ji destpêkê lê binihêrin	51
3. Erdê li ser gemîyê paqij bikin.....	93
4.R'abine li ser p'îya û çê bikin	143
5. Nêzîkayî	185
6. Em careke mayîn destpê bikin.....	229
Xebera zêdekirî: Çawa xilazbûnê bistînin?.....	271

Derheqa vê kitêba întêraktîv da

Hûn dikarin vê kitêbê ji destpêkê heya dawîyê bixwînin, mînanî her kitêbeke başqe. Çi jî hebe, em berbirî we dibin ku beşên întêraktîv zêde bidine xebatê, ku kitêbê diha gelekî bi kûrayî fem bikin.

Her beşeke vê kitêbê pareveyî ser pênc beşên xwendina pênc roja hatîye kirinê, lê nava her beşekêda jî dawîyê matêriyalên dersa yên anegor hene. Hûn dikarin tevî matêriyalên dersa par-par nava rojekê da bixwînin, yan jî parên raberkirî anegorî xwestina xwe lêkolîn bikin. Em pêşniyar dikin, ku tevbiyên koma hînkirinê nava hevtêkê da beşên nava serîkî kitêbê da û matêriyalên dersa xilaz bikin.

Eger hûn vê kitêbê nava doranên dersa “Serpêhatîya derheqa zewacê da”, ya cêrga “Berevoka Mêsîncêr”-ê, dixwînin, em pêşniyarî we dikin, ku hûn matêriyala hînbûnê ya her hevtêkê guhdar bikin û nava komê da caba pirsên guvtugokirinê bidin. Paşê serê kitêbê yê anegor bixwînin, pêra jî matêriyalên dersa. Nava her serîkî vê kitêbê da matêriyalên hînbûnê hene. Pirsên guvtugokirinê, yên bona her serîkî peyî matêriyalên dersa yên herroje hatine raberkirinê.

Ev hemû tişt bo we ye.

Pêşgotin

Diqewime hûn bipirsin: “Gelo hêja bû, ku kitêbekê jî derheqa zewacê da binivîsyana”. Eva pirsra ewlin bû, ya ku we da me.

Bona nivîsandina vê kitêbê sê menî hene. Ya ewlin ew e, ku me rêberîya Xwedê texmîn kir. Xêncî wê yekê zarok û xebatkarên me hîvî ji me kirin, ku em derheqa vê yekê da binivîsin. Bi kutasî, ji we geleka jî hîvî kiribû, ku kitêbeke vî cûreyî binivîsin.

Me zanibû, wekî gelek kitêbên baş derheqa zewacê da hene û ji wana geleka usa jî alî me kirine. Feqet lêkolîna bi hûr-gilî nişan da, ku “têberdan” (kêmasî) hene. Me dît, wekî piraniya van kitêba ji aliyê jina, yan jî mêra da hatine nivîsarê. Zewaca baş feydayê hevkarîya baş e. Bo wê yekê jî em bawerin, ku derheqa çida em bi vê tîmayê bi hevra xeber didin, qîmetlûye.

Em jî zanin, wekî serhatî cûre-cûre ne. Gerekê bêjin, wekî em her du jî merivên *bi ruhê xwe va qewat in*. Ez û Lîza ji sî salî zêdetir e ku em zewicîne û nava wî wedeyî da em hindik cara rastî çetinaya hatine. Me fem kirîye, wekî cêribandina me cuda ye û fikira me jî wê cuda be.

Me dixwest nişanî mêra û jina bikira, wekî zewac qalib nîne, kîjan wana dide sînorkirinê. Em bawerin, wekî her îzindayîneke efrandarî dikare zewacê çê bike û wê yekê anegorî xwestinên xwe, xwestina Xwedê bike. Em gumanin, wekî ev kitêb wê alî we bike, ku hûn serhatîya xwe ya cuda bivînin û binivîsin.

Ev kitêb bona kê hatîye nivîsarê?

Ev kitêb bona wan meriva ye, yê ku hazir dibin bizewicin, yê ku îdî zewicîne, yan jî dixwezî derheqa zewacê da bizanibin.

Çawa ku em zanin, nava rojên me da ji hev cihêbûna mêr û jina gelek. Gelek meriv jî ditirsin serhatîya xwe destpê bikin. Çi ku hûn divînin, gerekê pêşeroja we qirar neke.

Hene meriv, yên ku tê bêjî nikarin ji ewê para serhatîya xwe derbazzir bibin, ya ku wana xweş nayê. Em naxwezin ku hûn kitêba xweye zewacê bigrin. Em dixwezin alî we bikin, ku hûn rûpelê kitêbê wergerînin.

Gelek jin û mêr jî hene, yên ku hevalên baş bûne, ên bawer dikirin ku serhatîya wane evîndarîyê wê tu cara ser hevda neyê. Feqet wana dît, wekî rûpelên serhatîya wane baş nişkêva rûyê ji hev cihêbûnê da qetiyane. Serhatîya we ser hevda nehatîye.

Ev kitêb, kitêba dersê ya tam nîne, ya ku bi hûngilî zewacê guvtugo dike. Derheqa vê têmeayê da meriv dikare gelek cilda binivîse û xêncî wê yekê jî hemû cab li cem me tunene. Çi jî hebe me qirar kir ku em serhatîya xwe binivîsin û wedê emirê xwe, yê herî şikestî, bidine kivşê, çimkî em zanin, ku em rîya çawa derbaz bûne û em bawerin, wekî rîya me ya derbazbûyî wê alî merivên mayîn bike.

Bi kutasî, Îsa hela hê difikire, wekî zewac ew serhatî ye, ya ku hêja ye bê gilîkirinê. Bi rîya zewacê Ew dide kivşê, ku Ew çawa me hiz dike. Em dur dikin, ku rûpelên vê kitêbê bawerîyê, gumanê û hizkirinê him dilên nezewicîya, him dilên zewicîya, him dilên genca û him jî dilên merivên temenê mezin da hişyar bikin. Em bangî we dikin ku hûn careke mayîn bikevine nava xiyala.



— YEK —

Bernama destpêkê

“Xudan Xwedê ji erdê her dar şin kirin, bo ditinê hewaskar û bo xwerinê xweş, nava baxçe da jî dara jîyînê, usa jî dara qencî û xirabî naskirinê.”

— Destpêbûn 2:9, NLT

Roj I

Hebû- tunebû baxçek hebû, yê ku dora du dara hatibû nikandinê. Diqewime hûn îdî zanin, wekî ew baxçe cuda bû, mînanî baxçên mayîn nîbû. Ew ji çetinaya û ji hev parçebûnê dûr bû. Nava baxê Yêdêmê ra çem dikişiyar, kîjana ava zelal didane wana, yên ku li wir diman.

Em t'enê dikarin bedewetîya wan dara bînine ber çavên xwe, kîjan nava qewilên wî cûreyî da şin dibûn. Her darek sembola emirê bêkêmasî bû, yên ku nava wî erdî da nikandî bûn, bi avên zelal û bi ronahiya royê va şin dibûn. Nava baxçe da gelek dar hebûn, lê Gotina Xwedê tenê derheqa duda da bîr tîne- dara Jîyanê û ya Qencî

û xirabî naskirinê. Ev her du dar jî nava qewilên mînanî hevdu bûn, lê ji van dara yek emir dida kivşê, lê ya duda mirin.

Diqewime berê we derheqa vê serhatîyêda guhdar kirîye, çimkî her serhatîke zewacê ji van her du darên Yêdêmê pêşda hatîye. Zewacên me meriv dikare ji gelek aliyava himberî darên emir bike. Zewac bi rêyên cûr bi cûr pêşda tên û ew yek gelekî kardar e, wextê ku ew li ser koka gihîştî tê hîmdanînê. Zewac nava sala da dibin yan yên ku rez didin, yan jî rez nadin, yan jî hêdî- hêdî şîn dibin, yan jî baş şîn dibin. Her zewacek dikeve bin hukumên hewa cûre- cûre, lê nenihêrî wê yekê, zewac cih dide bayên guhastina jîyanê.

Şikilê li ser rûyê vê kitêbê dara emir raber dike. Ew xelegên kivşkirî, kijana hûn divînin, ew serhatîya dara emir in.

Mektebê da ji me gelek meriv derheqa bîologîayê da hîn bûne û dikarin salên darê qîrar bikin, wextê ku xelegên li ser darê hesab bikin. Em her du jî dikarin xelegên li ser darê hesab bikin, lê em ji bîologîayê gelekî dûr in, nenihêrî wê yekê ku em darên bedew gelekî hiz dikin. Tevî salên darê, bîolog dikarin bi hûrgilî derheqa emirê wê da bêjin, wextê ku cihê darêyî birî binhêrin.

Bona çavê hînbûyî her xelegê serhatîk e. Bi wan xelega meriv dikare bêje, ku dar zivistana nerm, yan ya gelekî hişk dîtiye, yan jî havînê bêyî av maye, yan jî baranên gur dîtine. Lêkolîna bi hûrgilî dikare êrîşên nexweş, yan jî birînên cûre-cûre bide zelalkirinê. Her xelegê saleke bi cûrê xwe ye.

Her saleke zewacê meriv dikare himberî xelegeke darê bike, bi cûrê xweva. Salveger hema dawîya sala derbazbûyî û destpêka sala nû dide kivşê. Sal bi jimara her salekê tê kivşkirinê. Feqet meh, hevtê û roj, kijan salê tam dikin û yekîtîya şabûnê, êşê, xebatê û tiştên mayîn in.

Serpêhatîya we

Bi destpêkirina vê yekê, bîr bînin, wekî serpêhatîya we (yan jî serpêhatîya pêşeroja we) tenê *ya we ye*. Her emirek û her zewacek yekîtiya şabûna, serkevtina û diwariya ye. Eva wedekî dirêj e, ku piraniya Civînê hesab dikir, ku şewira bona wan pirsgirêka pêşniyar bikin, yên ku zewacên me didane sistkirinê. Me dibihîst: “Jinno, gurê da bin. Mêrno, hiz bikin”. Neniherî vê yekê, wekî ev gotin rast in û qîmetlû ne, li vir dersa bona çekirina zewacê tune, ya ku anegorî hemûya ye, çimkî her zewacek xweya “dewsa pêçya ye” cuda ye.

Werin em vê pirsê bi vî cûreyî binihêrin. Nava sixêmayên hemû mala da hîm tomerî ye, stûnên dîwara û ban dîsa tomerî ne, lê azaya arxîtektore efrandariyê heye, ku proêkta wê malê bide guhartinê- anegorî xwestinên bineciyên wê malê. Hema ev jî derheqa zewacên me da ne. Me destûr standîye, ku em proêkta zewaca xwe usa çê bikin, ku ew anegorî me be. Her malbetek gerekê cuda be û aza cûrê emirê xwe biguhêre. Nava zewaca me da, mesele, em derbasî wî wedeyî dibin, wextê ku bûyîna dê û bav nava malbetê da rola meye sereke nîne. Ev yek dide kivşê, wekî zûtirekê wê hewce nîbe, ku li malê awqas cihên razanê hebin, çiqwas berê bûn. Guhartina vî cûreyî ya nava zewacê da usa sade ye, çawa guhartina hewa salêye cuda-cuda.

Rastî û qîmetiyên erşê ezmîn û yên heta- hetayê hene, kîjan wê zewaca we bidine bilindkirinê, alî we bikin, wî hemû tiştî mîaser bikin, bona çi Xwedê gazî we kirîye. Xwedê dixweze, wekî her zewacek bi hizkirinê, qedirgirtinê, şabûnê, gurêdabûnê, bi helalîyê, nêzîkbûnê bê çekirinê. Eva çend tiştin, lê hela hê tiştên hê zêde hene. Çawa jî hebe ev materyalên çekirinê wê nava emirên we da bêne kivşê. Xwedê prînsîpên tomerî dide kivşê, lê pêra jî mecalê dide, ku hûn nava pirsên şexsî da xwe bidine kivşê.

Xwedê pircûretîyê hiz dike. Em dixwezin destpêkê da zelal bêjin, ku em bawer nakin, wekî hemû zewac gerekê anegorî qalibê zewacêye tomerî bin. Nava rojên me da gelek cara diqewime, wekî mêr û jin ji malê der, yan jî ji welêt der kar dikin û jin dikare diha gelekî pera bixebite, ne ku mêr. Ew yek, wekî jin dikare diha gelekî pera bixebite, nade kivrê, wekî ew gura mêrê xwe da nîne, yan jî mêr serê wê nîne. Awqasî ew dide kivrê, wekî emekê herdu jî nava byûcêa malbetê da heye. Ev yek dide kivrê, wekî zewaca wana wê ji ya kalik – pîrikên wana cudatir be.

Zewaca me ya usa ye. Em her du jî dixebitin û em her du jî ji zewacê der rêber in. Carana em tevayî dixebitin, yan jî carana cuda dixebitin, lê meremê zewaca me û qîmetîyên bin wê yekê da ji cih naleqin. Rolên mêr û jinê cih da nahejin, nenihêrî wê yekê, ku ew çiqwas pere distînin.

Nava baxçê ewlin da Xwedê gote Adem û Hêwayê, ku gelek zarokên wan hebin û zêde bin. Ewî negot, wekî Hêwa gerekê li malê bimîne û tenê bi “zêdaya” Adem va mijûl bibe. Nava Gotinên Silêman 31-ê da jina emir da mezin serkarî dikir û xebatkareke kivrê bû. Eger ev cûrê zewacê anegorî zewaca we ye, hûn jî usa bikin. Diqewime ji we yek her dem dixweze li malê bimîne, nenihêrî wê yekê, ku zarokên we hene, yan na. Ji van nêzîkbûna tu yek şaş nîne.

Pêşda tê texmînkirinê, wekî wê yekê çawa bi açixî bona merivên başqe k’ar kirîye, ewê usa jî bona we kar bike. Feqet em nava wedekî cuda da dijîn, wextê ku li her ciha çetinayî hene. Em dixwezin ku zewaca we qewîn bibe û ew yek dide kivrê, ku hûn gerekê bona çêkirina zewaca xwe nava xiyalên xwe da azad bin, lê ne ku nava zewacên merivên başqe da.

Em dibêjine we, ku hûn vê yekê bidine xebatê û hîvî ji Ruhê Xwedê bikin, Yê ku Ruhê r’astîyê ye, ku elamî we bike,

ku rastîyên Wî yên heta-hetayê dikarin zewaca we biguhêrin, werguhêzî yekîtiya mexsûs bikin, ya ku Ewî hema xût pêşîya efrandina dinîyayê bona we program kirîye.

Roj 2

Wextê ku serhatîya we rastî çetîna ya tê

Eger bi salên dirêj tevayî ne, hûn hela hê serhatîya xwe nizanin. Zewaca 50-î sale dikare yan bi 50-î salên cetin be, yan 50-î salên baş be, nenihêrî wê yekê, wekî zewac diha gelekî bi rojên cûre- cûre derbas dibe.

Wextê ku hûn dîna xwe didine şikilê dare yê li ser rûyê kitêbê, ber cava ye, wekî her xeleşek qalîna ya darê mezin dike. Nenihêrî wê yekê, wekî ew rûyê bi xeleşa, yan dijawariyê, yan jî zêdayê dide kîvşê, ew tomerî hildayî fikira berfireh dide wê şuxulkariyê. Gelo kitêba Con Bûnyane “Rêwîtiya hecê”, ya ku îdî sê sedsalin ku tê çapkirinê, wê bibûya xebateke çawa kîvş eger Mesîhîyî bihata bajarê E’zmîn, bêyî derbasbûna nava dijawarya û gumanbiriyê ra. Bêyî şabûnê û çetîna ya, serhatîya wî wê bi qewimandinava tijî nîbûya û wê mêriv aciz bikirana. Serhatîya Mesîhî hêja ye hema bona wan çetîna ya bixwînin, rastî kîjana ew tê û wana alt dike. Nava zewaca me da çetîna yî dikarin fikirê bidine serpehatîya me.

Demên gumanbirîyê bêhurmet nekin. Wana bidine xebatê, ku hûn nêzîkî kerema Xwedê bibin û qewata Xwedê eyan bikin, kîjan wê texmînkirinên we û sînorkirinên ruhanî hesab hilnede. Bi zewaca ji 30-î salî zêdetir me da eyankirinê, wekî ew demên ku gelekî tarî me va dihatine texmînkirinê, paşê dibûne wek ronahiyê, kîjana rîya me ronahî dikir. Wana em mecbûr dikirin, ku em bilind

bibin û tabîya qewîn da cîhê xwe bigrin. Şerkarîya we ya niha dikare nava serhatîya we da bibe wedê herî kivş.

Ruhê zewacê

Berî ku em derbazî serpêhatîya zewacê bibin, werin em derheqa meremê zewacê da xeber bidin. Bêfitîya, bêyî şikberî, zewac tişteki baş e, lê carana jî ew yek şuxulkarîya bi êş e. Em hemû jî dikarin ewê êşê bi sebir xwe ra bibin, eger em meremê wê fem bikin. Mesele, hûn dikarin çend seheta li ser kursîya doxtirê dirana teyax bikin, eger hûn zanin, ku qenckirina we wê bigihîje meremê xwe û êşa diranê we wê bê hildanê. Bi texmîn, nava zewaca we da hebûne roj, kîjan mînanî rûniştandina li ser kursîya dirançêkirinê bûne, lê ne ku mînanî gera li ber kenarê behrê. Wî çaxî gelekî girîng e ku hûn meremê wê yekê bizanibin.

Roja îroyîn meremê zewacê bin pirsê da ne. Çawa ku em zanin, gelek meriv meremê yekbûnê, zewacê fem nakin, ew lez jî gemîyê xwe diavêjin, wextê ku texmîn dikin, ku av nerihet e û gemîyê dive û tîne. Yên mayîn dibêjin, wekî îzbatbûna bi zewacê qewîn nîne û gerekê ew careke mayîn bê fikirdayînê, yan jî ew gerekê ji hev cihê bibin. Hinek meriv jî pêşnyar dikin, wekî peymanên zewacê gerekê bi wedê kivşkirî bêne sînorkirinê, wextê ku tê kivşê, wekî nikarin ji me hîvya xwepêşkêşkirinê bin.

Koma sazbandîyê ya bi navê “Aût Kast”-ê nava stirana xwe ya e’yan da, ya bi navê “Mîsîs Cêkson”-ê da fikireke belabûyî elam kir:

Di navbera min û keça te da
Tişteki mexsûs diqewime.
Tu dibêji, wekî eva hizkirina zaroka ye,
Em dibêjin, wekî ew ya gihîştî ye.

Ez gumanim, wekî emê her dem xwe vî cûreyî texmîn bikin.
 Tu dikarî kêyfeke baş program bikî,
 Lê ez nikarim pêşda bivînim, ku wê çawa bibe.

Nava stirana “Mîsîs Cêkson”-ê da xortekî cahil baxşandinê ji dayîka keçeke genc dixweze. Ew keç ji wî hemle bûye, lê xort îdî hizkirina hindava wê da texmîn nake. Telebextra, ev sitran fikireke belabûyî dide kivşê, ya derheqa hizkirinê û zewacê da: “Ez gerekê xwe nava evîntiyê û zewacê da ba t’exmîn bikim, baş bim”. Ev fikir li ser wê yekê hatîye hîmdanînê, wekî h’izkirin me ra dibêje, ku çi rast e, çi jî şaş e û em nikarin wê yekê kontrol bikin. Ez texmîn nakim, wekî ez bextewar im, usa ye ez gerekê tiştêkî biguhêrim. Bi kutasî ez nikarim texmînkirinên xwe control bikim, çawa ku ez nikarim sêzonên salê kontrol bikim. Bi gotina stiranê hûn dikarin keyfeke baş teşkîl bikin, lê hûn nikarin pêşda bizanibin, ku wê çawa bibe.

Hene meriv, yên ku dixwezin zewacê bikine anegorî wedê niha. Ew dipirsin: “Bo çi em nikarin diha aktîv bin. Eger ev serwêrtî dixweze bijî, ew gerekê berfireh be, yektîyên mêra û jîna bighîne hev”. Hinek merivên eyan qet naxwezin bizewicin, çimkî zewac hela hê bi fikirdarîyê negihîştî ye û ew gerekê her dem pêşda here, bê guhartinê, lê qanûna zewacê û tevbiyên wê nikarin bêne guhartinê.

Dêmek, em gura kê bikin? Îzina kê heye, zewacê vî cûreyî qîmet bike? Kî gerekê bêje me, ku zewacê nava emirên me da hukumê çawa bihêle?

Em bawerin, wekî tenê Xwedê ye, îzina Kîjanî heye. Gotina Wî elam dike:

“Xwedê zewac çê kirîye, lê ne ku we çê kirîye. Ruhê Wî nava hemû parçên zewacê ye biçûk da jî dijî.... Dêmek ruhê zewacê xweyî bikin, yê ku nava we da ye” (Maxakîya 2:15, MSG).

Ev gotin tu şîkekê nahêle: “Xwedê zewac çê kirîye, lê ne ku we”. Ewî ne tenê zewac çê kirîye, lê Ew bi Xwe jî nava yekbûna her du şexsa da ne. Her zewacek ji gelek parça hatîye çêkirinê. Hinek zewac zelal in, hinek gelekî cetin in, lê Xwedê bi Ruhê Xwe va emir dide her parçekî zewacê yê biçûk.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî nava Maxakîya 2:15-da nivîsar e: “Ruhê Xwedê nava her parçekî zewacêyî biçûk da diji”. Bi gilîkî mayîn gotî, Xwedê îzinê dide, ku em nava zewacê da efrandar bin, lê Ew hemû mafên Afrandar xweyî dike, wekî zewac çi ye û kî nava wê yekîtiyê da ne. Zewacê nikarin careke mayîn bêyî qayilî û tevûna Wî çê bikin, lê Ew jî nava pirsên hîmdar da li ser tabîya zelal e: “Ez im Xudan û Ez nayême guhartinê” (Maxakîya 3:6, NLT).

Vegera berbi Yêdênê

Em paşda vegerine baxçe. Gelo ew her du dar tên bîra we? Ji wana yek dara zanebûna qencîyê û xirabîyê bû, ya tek- tenê bû, rezê kîjanê bona Adem û Hêwayê qedexekirî bû. Xwedê eşaretî da, ku eger ew rezê wê darê bixun, ewê bimirin. Feqet tiştêkî ew def dan, ku ew eşaretîya Xwedê hesab hilnedin û bicêribînin rezên qedexekirî bixun.

“Û jinê dîna xwe dayê, wekî berê darê bona xwerinê baş bû, berbiçav bû û dilhaviji bû bona stendina zanebûnê...”
(Destpêbûn 3:6, NIV).

Bi rastî nava wî baxçeyî da gelek dar hebûn, kîjan bona xwerinê baş û berbiçav bûn. Feqet dara, berê kîjana dikaribû meriv bilind bikira, bigîhanda statûsa Xwedê, lap başqe bû. Hêwa fikirî, wekî tiştêkî hê zêde heye, lê ne ku çi ku bona wê hatibû dayînê. Bona me tiştê ecêbmayînê ye, wekî evê jinê berbi tiştêkî usa cedand, çi ku

gerekê nebûya (wekehevtîya tevî Xwedê), bi undakirina wê yekê, çi ku dikaribû li cem wê hebûya (serwaxtî). Adem û Hêwa xwestin bibine mînanî Xwedê, lê ji hukum û serwêrtîya Wî cuda. Wana berbi tabîke usa cedand, ya ku ya wana nîbû. Ev yek miqabilî wê bijartinê bû, kîjan ji alîyê peyîhatîkî wana hate kirinê:

“Ew ku binyata xwe da Xwedê bû, peyî wê yekê neket ku bima weke Xwedê...” (Fîlîpî 2:6, NIV).

Adem û Hêwa bi şikilê Xwedê hatibûne çêkirinê, lê ne weke Wî. Şikil bi cûrê tam tu tiştêkî raber nake, lê awqasî ew nîşandayîn in. Bi stendina sozdayîna feş ya derheqa wekehevtîya tevî Xwedê, mêr û jin fikirîn, wekî wana tiştêk dest anî, lê bi rastî ew her du jî ziyane ketin. Dewsa serwaxtîyê wana ew qebûl kir.

Ev mêr û jina xapiyayî ji baxçe hatine derxistinê. Wana îdî nikaribû ji dara Jîyanê berê wê bixwerana. Bêyî berên wê darê Adem û Hêwa bi mirinê hatibûne gunekarkirinê. Ew mirin û baxçê wana îdî ji zûva tune. Feqet anegorî fikirekê emirê wana berdewam dibe, çimkî em lawên wana ne. Li vê diniyayê mêr û jin îdî heta- hetayê sax namînin, lê zewaca wana emir xweyî dike, çimkî ew peyî xwe yên mayîn dihêlin.

Mizgînîya me heye: niha xaçê Mesîh dara emirê me ye. Xaç wî hemû tiştî dide dasekinandinê, çi ku li wî baxçeyî hate undakirinê. Zewaca baş bona Xwedê dikare bibe dara jîyana heta-hetayê. Ew atmosferê anegor saz dike him bona li peyî xwe hiştina zaroka, him jî bona heyîna nêzikayê. A hema ev yek bona Xwedê gelekî girîng e, ku em qedirê zewacê bigrin, ruhê zewacê xweyî bikin û hev hiz bikin.

Eseyî nîne, ku meriv pêşekzanê heleqetiya be, ku meriv fem bike, wekî nava rojên me da tiştêkî girîng unda bûye, kîjan nava baxçe da hebû. Gelek zewac himberî dara jîyanê ya heta-hetayê

dernakevin. Jihevcihêbûn, ji hev femnekirin, xayîntîya nava zewacê da, qezîya û bêhurmetkirin zewaca û malbeta hildiweşînin. Rûyê tiştên wî cûreyîda gelek meriv meremê zewacê fem nakin û ew difikirin, ku bo çi ew gerekê bixwezin bizewicin. Lê ewên ku zewicîne, dicêribînin nava qewilên agirê bi cûrê xaç da bi zorê bijîn. Zewac bona wan meriva ne îskeleke çareserkerî ye, lê zona şer e.

Roj 3

Kanîya jîyanê

“Rûyê we cihûyada navê Xwedê nava necihûyada tê bêhurmetkirinê” (Romayî 2:24, NLT).

Wextê ku em Bedena Mesîh texmîn nakin û hiz nakin çawa ku lazim e, meriv navê Xwedê bêhurmet dikin. Ev yek gerekê me zendegirtî nehêle, çimkî çawa mesîhî em diibêjin ku em baylozên (sefîrên) Mesîh in. Pawlosê şandî nivîsî:

“Awa gotî, Xwedê bi Mesîh diniya tevî xwe li hev anî, neheqîyên wan wan ra neheqî hesab nekirin û gotina li hev anîne sparte me. Awa em ji aliyê Mesîh da qasidîyê dikin, çawa ku Xwedê bi me hîvî ji we dike: em aliyê Mesîh da reca ji me dikin, tevî Xwedê li hev werin” (B Korintî 5:19, 20, NLT).

Qasid yan wekîl e, yan jî ew e, yê ku mizgîniyê tîne. Çawa mesîhî em ji navê Mesîh xeber didin. Me pêşnyar stendîye û serbara serda emirkirin jî stendîye, ku em qulixa li hev anîna Xwedê mîyaser bikin. Eva meremê jîyana me ye. Em hevkarên Xwedê ne, yên ku padişatîya Wî li ser vê diniayyê bela dikin.

Bi vî cûreyî Mesîh çi ji me, qasidên Wî, hîvî kirîye? Îsa got: “Ez temîke nû didime we: hevdu hiz bikin. Çawa ku min hûn hiz kirin, hûn jî usa hevdu hiz bikin” (Yûhenna 13:34).

Em mecbûr nînin, ku vê mîsîyê bi qewata ruhê xwe mîyaser bikin. Kitêba Pîroz zelal dibêje, wekî bona mîaserkirina meremê xwe em gerekê berê ewlin nava Mesîh da bin, dêmek bibine peyhatîyên kerema Wî, bi rîya karê Wî yê xilazkirinêyî li ser xaç mîyaserkirî. Tenê wî çaxî em dikarin bi qewata Ruhê Wî pêşda bèn û tenê wî çaxî emê bikaribin hevdu hiz bikin çawa ku Ew me hiz dike.

Bin navê keremeta nû da, Xwedê tişteki usa nabêje me, bona kîjanê Ewî qewat nedaye me. Çawa ku em nava Mesîh da nin, Ruhê Wî wê karebûnê bide, ku em bi rîya zewacên xwe û emirên şexsî, hazîrîya Wî û hizkirina Wî li vê dinîyayê bidine eyankirinê. Çawa jî hebe em nikarin hizkirina Wî bidine eyankirinê, eger me bi xwe ew yek texmîn nekiribe. Efesî 3:16-19-a da Mesîh kilîta qebûlkirina qewata hizkirinê elamî me dike:

“De bira Ew weke dewlemendîya rûmeta Xwe qewatê bi saya Ruhê Xwe bide we, ku hûn kûraya dilê xwe da bişidin, bi bawerîyê Mesîh dilê we da bijî û hûn hizkirinê da ra û rikinê xwe biavêjin, ku tevî temamiya cimeta Xwedê bikaribin fem bikin, ku berayî, dirêjayî, bilindayî û kûraya hizkirina Mesîh çi ye. Belê, bira hûn *wî çaxî* hizkirina Mesîh nas bikin, ya ku ji her hiş- aqilî zêdetir e, wekî hûn temamiya Xwedê va tijîbin” (NLT, xeberên bi herfên cudakirî zêdekirî ne).

Bona stendina eyantîya hizkirina Mesîh, em gerekê pêşda îzinê bidin, wekî Xwedê bi qewata hundurîn me bide qewatkirinê- bi saya Ruhê Xwe. Feqet ev yek nikare usa bibe, eger we emirê xwe nedaye Wî. Hema ku emirê we bibe yê Xwedê, bona we mecalê hebe, ku hûn nava hizkirina Wî da mezin bibin û nava feydaên wê yekê da hûnê bibine xweyê jîyaneke tam.

Peyî du gotina ra, Pawlos meremê qewata wê yekê şirove dike, kîjanê em bi naskirina hizkirina Mesîh distînin:

“Awa ezî girtîyê bona navê Xudan, hîvî jî we dikim, *ku hûn usa bijîn, çawa layîqî ewî navê we ye*, çimkî, hûn jî aliyê Xwedê da hatine gazîkirinê. Hûn bi temamiya milûktîyê û şikestî, bi sebirê hizkirinê da li ber hev daxun. Bicedînin, ku yekîtiya Ruh pê hevgirêdana edilyê xweykin. Çawa beden yek e û ruh yek e, hûn jî gumaneke ra hatine gazîkirinê” (Efesî 4:1-3, NLT, xeberên bi herfên cudakirî zêdekirîne).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Pawlos dinivîse: “Hûn usa bijîn, çawa layîqî ewî navê we ye”. Careke mayîn Ew derheqa meremê me da xeber dide, kîjan hizkirina Xwedê, rastî û cûrê jîyanê ye (padişatiya Wî) li vê dinîyê ye. Ji van tiştê meriv nikare tu yekî jî bêyî naskirina hizkirina Xwedê mîyaser bike. Zanebûna teorêtîkî alî nake. Emê bikaribin emir û zewaca çê bikin, kîjan wê layîqî gazîkirina me bin, tenê wî çaxî, wextê ku em hizkirina Xwedê nava xwe da texmîn bikin.

Nava vê beşê da Pawlos çend modêl şirove kirin, kîjan anegorî zewacê ne: “Ber hev daxun, gurê da bin, bi cûrê milahîm yek nêzikî şaşîya yê mayîn be û hemû cedandina bidine xebatê, ku bi edilyê bi hev ra bijîn.

Badîhewa nîne, wekî nava serê gotinên Efesîya da gotinên Kitêba Pîroz yên here eyan tên ber çava, yên derheqa zewacê da (bîr bînin, wekî parevekirina serîya û gotina sedsala 13-a da jî aliyê civînê da hatîye zêdekirinê û nava nivîsara Pawlos da parevekirina wî cûreyî tune bû). Diqewime, ku Efesî serên 1-4-da Pawlos dilên xwendevanên xwe hazir dikir, ku ew tevî wan derheqa rastîyên derheqa zewacê da bida zelalkirinê, bona femkirina kîjana pêwîst bû hizkirina Xwedê nas bikin.

Bi vî cûreyî em vê yekê divînin: hetanî ku hûn nikaribin bi cûrê rast hiz bikin, hûn gerekê pêşda kûrayên wê hizkirinê bidine eyankirinê, bi kîjana Xwedê we hiz dike. Zanebûna we ya derheqa hizkirina Xwedê da nikare li ser înformasiya ne girîng bê hîmdanînê. Hûn gerekê bi xwe wê yekê texmîn bikin. Wextê ku hûn hizkirina Mesîh li ser xwe texmîn bikin, “hûnê bi tijbûna qewatê û jîyanê bibine yek, ya ku ji Xwedê tê”. Tenê wî çaxî hûn dikarin usa bijîn, kîjanê layîqî gazîkirina we be. Wextê ku hûn ji nêzik va hizkirina Xwedê ya bêsînore hindava xwe nas bikin, hûnê qewatê bistînin, ku hûn bi cûrê rast bijîn û hiz bikin.

Meremê zewacê

Eger meremê jîyana we ya şexsî ew e, ku hûn li vê dinîyayê bibine wekilê Mesîh, wî çaxî meremê zewaca we kîjane?

Em ji vê yekê destpê bikin: Xwedê hizkirin e. Hizkirin karê Xwedê yan jî hebûna wî nîne. Xwedê bi Xwe hizkirin e. Zewac îzbatîya hizkirinê ye, ya ku Xwedê da hîmdanînê. Xêncî îzbatîya ewlin, ku ji aliyê Xwedê da hate hîmdanînê, zewac usa jî şikilê sembola poetic e, ya ku Ew dide xebatê, ku hizkirina Xwe û xwepêşkêşkirina me ya hindava Civîna Wî û Bûkê da bide kivşê. Bûk û zeva şikilên Civînê û Mesîh yên sîmvolîk in.

Rûyê van şikilên sîmvolîk da êrîşên dijî zewacê diha gelekî kûr in, diha gelekî tarî ne, ne ku çawa gelek wê yekê fem dikin. Êrîşên dijî zewacê tenê bi meremên xwe yê sîyasî, yan jî pêşketina civakê va ser hevda nayên. Kitêba Pîroz zelal dibêje, ku em miqabilî bedenê, yan jî xwînê şer nakin, wekî dijminê me ne hukumatek e, yan jî teşkîletek e (binihêre Efesî 6:12). Dijminekî kevinar heye, yê ku dijminê şexsa ye. Ew bi cûrê xewile kar dike û dîcedîne evê yekîtiya xwedêtîyê nava hev bixe. Ewê êrîşên xwe yên li ser zewacê nede sekinandinê, hetanî ku ew fikirên me yên derheqa wê yekê

da nav hev nexe, ku çawa Xwedê cimeta Xwe hiz dike û tevî wê dikeve nava tevgirêdana. Ji hemû kesî zêdetir cin divedîne, ku em hizkirina Xwedê, ya ku dide guhartinê, nebînin û qebûl nekin. Feqet bi saya keremeta Xwedê em dikarin hindava dijmin serbikevin, wî hemû tiştî qebûl bikin, çî ku Xwedê dixweze bona zewaca me bike.

Îsa çî difikire?

Xwedê ne tenê zewac çê kirîye, lê progirama Wî heye û meremê bona zewacê heye, yê ku nehatiye guhartinê. Neniherî wê yekê, wekî bi hezara sala pirsên şexsî yên derheqa zewacê da hatine guvtugokirinê, Ew piştgirîya progirama xwe ya pêşin dike. Binihêrin, ku Îsa wextê qiseke Xwe ya here eyan derheqa zewacê da çî gote fêrisîya.

“Rojekê fêrisîya rih’etî nedidane Wî: “Gelo li gora qanûnê rast e, ku bona her menikê mêr jîna xwe berde?”.

Ewî got: “We Încîla xwe da nexwendîye, serê-sêrîda Efirandar mêr û jin bona hevdu çê kirin, nêr û mê xuliqandin? Bona vê yekê mêr dê û bavê xwe dihêle, xwe li jinê digire û her du dibine bedenek. Wî çaxî îdî ne ku du beden in, lê bedenek e. Bona vê yekê ewên ku Xwedê kirine yek, tu kes gerekê karê Wî neherimîne, wana jî hevdu dîrxê” (Metta 19:3-6, MSG).

Fêrisîya tenê dixwestin bizanibûna, ku qanûnê çawa digot, lê Îsa dixwest ku ew qewata hizkirinê fem bikin.

Em nikarin vê yekê bîr bikin, wekî pêşda Xwedê jin û mêr bona hevdu çê kirin. Bi zewacê ew dê û bava dihêlin, ku yekîtiya sax çê bikin. Çawa ku jin û mêr dighîjine hev, tu kes gerekê yekîtiya wan neteribîne.

Bona çi jihevcihêbûn Xwedê xemgîn dike?

Nava tercima “Mêsîc”-êda (The Message) ji hev cihêbûna mêr û jinê himberî heramkirina karê Xwedê tê kirinê. Ji hev cihêbûn rûyê wê yekê da pirsgirêka mezin e, wekî zewac karê Xwedê ye.

Xebera *h'eramkirin* dide kivşê, ku *merivek tiştêkî pîroz bêhurmet dike*. Sînonîmên xebra heramkirin evin- *bidine xebera, bêhurmet bikin, zîyanê bidinê, pêpes bikin û bidine xeyîdandinê*. Fikirên van xebra hemû yên zordariyê ne. Me ev gotin ji tercima “Mêsîc”-ê hildane, lê hemû tercime jî didine kivşê, wekî tiştên ku Xwedê gîhandine hev, ji hev cihêkirina wê yekê xirabkarîke giran e. Bi lêkolînkirina hemtêksta vê gotinê, em dikarin bên ser wê fikirê, wekî Îsa derheqa hemû zewaca da xeber dida.

Hûn dikarin bînine ber çavê xwe ku gelo dinîyayê cabeke çawa bida, eger yekî xebata Lêonardo Da Vînçî ya “Mona Lîza” heram bikira? Hemû mecalên prêsayê wê derheqa wê yekê da xeberdana. Kî ky ev xirabkarî kiribûya, wê ji alîyê civakê da bihata gynekarkirinê û ewê emirê xwe hebsê da derbas bikira. Gelo çawa ew meriv wê karên merivatîyê yên mezin heram bikira? Wî çaxî Lêonardo wê mexberê xwe da wengerîya.

Xwedê sirîya xwe da zewacê çawa karekî Xwe, yê mezin, hesab dike, yê ku gerekê bi efrandariya Wî ya hizkirî bê kivşê. Fikira Wî ya derheqa zewacê da hema wî çaxî tê kivşê, wextê ku Îsa caba fêrisîya da. Gotinên Îsa bona fêrisîya gelekî bilind bûn û wana qîrar nekir caba wî bidin. Wana nikaribû meremê Xwedê yê pêşin yê derheqa zewacê da fem bikirana û bo wê yekê jî wana xwe piş qanûna Mûsa veşartin. Vê nêzîkbûnê îzin dida wana, ku ew dûrkevin, lê ne ku qewat dida wana.

Bi nerast hesabkirina gotina Îsa, wana caba vî cûreyî da: “Eger usa ye, bona çî Mûsa derheqa dokûmêntên jî hev cihêbûnê da emir kir?”

Îsa got: “Mûsa jî dest serhişkîya we îzin da, ku hûn jinên xwe berdin, lê ew yek beşa progirama Xwedê ya pêşin nîbû. Min we dibire berbi progirama pêşin û ez we nava zinêkariyê da gunekar h’esab dikim, eger hûn jî jina xwe ya helal cihê bin û paşê yeke mayîn bistînin. Ez wê yekê cuda dikim tenê wî çaxî, wextê ku merivê li rex zinêkarî kirîye” (Metta 19:7-9, MSG).

Bin navê Qanûna Mûsa da rûyê serhişkîya mêriv da berdaxustin dihatine kirinê. Ewana tiştên peymanî bûn, lê ne ku meremê Xwedê yên pêşin bûn. Hûn gerekê şikber nîbin, wekî Xwedê feydayên jî hev cihêbûnê hiz nake. Wextê ku mêr û jin jî hev cihê dibin, efrandarîke Xwedê (çawa ku derheqa wê yekê da nava Efesî 5:31-32-a da hatîye nivîsarê) tê pêpeskirinê û parçekirinê.

Roj 4

Dilê nû

“...Min we dibire berbi progirama pêşin û ez we nava zinêkariyê da gunekar hesab dikim, eger hûn jî jina xwe ya helal cihê bin û paşê yeke mayîn bistînin...” (Metta 19:9, MSG).

Careke mayîn em bêjin, wekî Îsa wê tu cara tişteki usa hîvî neke, bona çî ewî karebûn nedaye. Ew me berbi progirama Xwedê ya pêşin, ya derheqa zewacê da dibe, çimkî Ew dixweze ku hemû tiştên lazim bide me, ku ew yek mîyaser bibe. Qanûna Mûsa bona serhişkîya mêriv ber daxust, lê bi qurbanîya Îsa em dilên nû, yên jî Ruh tezebûyî, lê ne ku dilên kevir distînin.

“... Ez ê dilê nû bidime we û Ez ê ruhê nû daynime nava we. Ez ê dilê we yê kevir hildim û dilekî nû bidime we” (Yêzêk. 36:26, NLT).

Em divînin, ku çawa ev fikir peymanî Nû da diwekile. Pawlosê şandî bi van xebera ber dilê meda tê:

“... Em zanin, ku Xwedê çiqwasi bi dil me hiz dike, çimkî Ewî em dane Ruhê Pîroz, ku dilên me bi hizkirina Wî va tijî bibin” (Romayî 5:5).

Em nikarin bi qewata xwe dilê nû peyda bikin. Ev yek qewata Xwedê û karebûna Wî va girêdayî ye. Feqet em gerekê gurê da bin, ku vê qewatê qebûl bikin. Bira bîra we da bibe, wekî Xwedê tu cara wê hizkirina Xwe bi destê zorê nede we, Ew cêntilmên e, Yê ku mecbûr nake.

Dêmek, dilên me yên nû hene, kîjan dikarin hizkirina Mesîh qebûl bikin. Em jî dikarin gotinên Îsa yên derheqa progirama pêşin da qebûl bikin, kîjan derheqa zewacê û jî hev cihêbûnê da nin, nenihêrî wê yekê, wekî ew gotin dikarin merivên başçe bidine xemgînkirinê.

Încîla “Mêsîc”-ê xebera *borcdar* dide xebatê (ya ku borcdariya li ber qanûnê, bi hiqûqî, dide kivşê) bona nîşandayîna wî halê mêriv, yê ku jî merivê li rex xwe cihê dibe. Em zanin, wekî ev yek dikare bibe dewakarîke mezin, lê eger Xwedê evê normê dide me, usa ye Ewê keremê jî bide, ku em wê yekê anegorî wê normê bikin. Feqet çawa ku ev hemû tict bi hêsanî nabe, gelek meriv qîrar dikin wî çaxî dûrkevin, wextê ku ew gerekê cedandina bidine xebatê.

Anegorî pîrdayînekê, jî sê cotên zewacê yên nebextewar, dudu wê nava pênc salên pêşin da bextewar bin, eger ew qîrar bikin ku jî hev cihê nebin. Dêmek, gerekê hûn t’eslîm nebin. Em niha derheqa halê zewaca we da nizanin, lê eger hûn xwe nava halê tenêbûnê da

texmîn dikin, dîsa guman heye. Îsa hat, ku zewacên baş werguhêzî yên diha baş bike, lê zewacên teribî jî bike yên tam*.

Cudakirin

“Ez tenê wî çaxî cuda dikim, çaxê zinêkarî hatîye kirinê” (Metta 19:9, MSG).

Îsa zelal got, wekî ev yek ji progirama pêşin cuda dibe. Ewî serbara serda got, ku eger zinêkarî hebûye, wî çaxî jî hev cihêbûn tenê li ser xwestinê dimîne. Eger merivê li rex we helal nîbûye, hûn boreddar nînin tevî wî bimînin, lê boreddar jî nînin jî wî dûrkevin. Hûn kîjan rê bibijêrin, hûn boreddar in wî afû bikin.

Firqîya mezin di navbera afûkirinê û li hev hatinê da heye. Hûn gerekê wî merivî afû bikin, yê ku jî we dizî ye, lê ew yek nade kivşê, wekî hûn gerekê wî dizî dewatî li malê bikin.

Li hev hatin tiştê bûyînê ye tenê wî çaxî, eger jin û mêr bikaribin hemû tiştî bidine dasekinandinê û careke mayîn bibine yek.

Ji encamên zinêkarîyê em tu cara zîyanê neketine, lê em her dem li rex hevalên xwe bûne, yên ku ew zêrandin dîtine. Ji wan meriva geleka rîya lihevhatinê bijartin. Wana zewacên xwe dane dasekinandinê. Wî çaxî her alîkî nava zewacê da dilê şikestî û tobekirin texmîn kir. Xwedê jî, rehmbûna Kîjanî bêsînor e, dewê dike, ku em pêşîya li hev hatina tevî Wî tobe bikin, fikira xwe û dilê xwe biguhêrin.

Em jî merivên usa nas dikin, yên ku nikaribûn li hev bihatana. Hewce nîbû, ku ew li ser xwe gunekarî texmîn bikirana. Îsa

* Hûn gerekê tu cara nava halên usada nemînin, yê ku bona we û bona zaroka qezîya ye. Eger nava zewaca we da zordarî heye, em hîvî dikin, ku hûn carekê ra gavê biavêjin bona çareserkirina bêqezîyabûna xwe. Bona stendina alîkarîyê civîna xwe va, yan jî serkarîya cih va, werine girêdanê.

giranîya xayîntîyê fem dikir û bona wê yekê berdaxust. Me didît, ku Xwedê çawa bona hevalên me dua dikir, wextê ku ew peyî ji hev cihêbûnê ra li hev dihatin.

Eger nava emirê we da ji hev cihêbûn qewimîye, em ber dilê we da tîn, ku hûn îzinê nedin, wekî ew yek jîyana we ya pêşerojê qirar bike. Ji hev cihêbûn beşeke paşeroja we ye, lê ew yek gerekê pêşeroja we qirar neke.

Paşeroj ne ya we ye. Ew ya Xwedê ye. Dijminê şexsê we wê bicêribîne paşeroja we bide xebatê, ku progiramên Xwedê yên bona pêşeroja we bide teribandînê. Bîr nekin, wekî Xwedê ev roj daye we û ew qirarên ku hûn îro mîyaser dikin, wê roja tê çê bibin, lê ne roja derbasbûyî. Eger we qirarên rast mîyaser kirine, wî çaxî serwaxtî û qewata Xwedê qebûl bikin. Bi rîya tobekirinê gurê da bin û başiyên kerema Wî li ser xwe texmîn bikin, kîjan dikarin hemû tiştên dijwar bidine guhartinê.

Gelo ez ketime telê?

Şirovekirina Îsa ya derheqa wê yekê da, ku Xwedê çawa zewac çê kirîye, gerekê ji normên wan çaxa bi firqîke mezin cuda bûya. Gotinên wî dewsa bilindkirina moralên şagirtên Wî, moralên wana êxistin.

Şagirtên Îsa gotin: *“Eger qewilên zewacê wî cûreyî ne, usa ye em ketime telê. Wî çaxî çi hewce ye bizewicin?”* (Metta 19:10, MSG; xeberên bi herfên cudakirî zêdekirî ne).

Gelo eva fikireke çiqwas xirab e, ya derheqa jîyana zewacê da, wextê ku dibêjin ketime telê? Çawa jî hebe, mînanî şagirta ji me gelek meriv hesab dikin, wekî zewac me dide sînorkirinê û dike hebsê. Gelek mêr û jin rûyê zewaca tevî merivê xirab ji tirsê ketina li wê telê dizêrin.

Me tişteq fem kirîye: nava zewacê da pirsra sereke ya dîtina merivê rast nîne, çiqwas *bûyîna* merivê rast e. Me şaş fem nekin. Wextê gera wî merivî lazim e, ku ji merivên xwedêparêz şewirê bistînin û berbi edilaya Ruh bicedînin. Gelek cara em bawer dikin, wekî bi zewacê emê hemû kêmasîyên emir bidine tijîkirinê. Tu merivek nikare vê yekê bike. Tenê Xwedê dikare wê yekê bike. Xêncî wê yekê hûn nikarin merivekî “bidine rastkirinê” û wî werguhêzî şexsekî usa bikin, hewcê kîjanî ne hûn. Ew yek nava qewata we da ye, ku hûn paqijkirina Xwedê qebûl bikin û bibine jin yan mêrekî usa, yê ku emirê xwe pêşkêşî merivê li rex xwe dike. Hûnê bikevine nava halekî usa baş, wextê ku hûn emirê xwe pêşkêş bikin, lê ne ku berbi parastina berjewardîyên xwe bicedînin.

Metta 6:22 da nivîsar e, wekî îşiqa bedenê çav e. Dêmek, hemû tişt wê yekê va girêdayî ne, ku hûn jîyanê çawa fem dikin. Eger hûn bifikirin, ku “hûn ketine telê”, fikirdariya we wê ewê yekê bide sînorkirinê, çi ku Xwedê dikare nava zewaca we da bike. Eger hûn texmîn dikin, wekî zewaca we tela bêguman e, wî çaxî wê usa be. Bi kuutasî, ronahîya we ya ruhanî wê qewilên we yên tebyetî qirar bike û zewac jî ji vê normê başqe nîne.

Diqewime hûn bifikirin: “*Con û Lîza, hûn ji çapê zêdetir hîvî dikin. Hûn dixwezin, ku ez emir pêşkêşî yê li rex xwe bikim? Ew yek tiştê pêkenîne ye! Çimkî gelek xwestin, guman û xiyalên min hene. Îsa dixweze, wekî ez bextewar bim, Ew çi ku hûn dibêjin fikireke baş e, tiştêkî usa ye, berbi kîjanê meriv dikare bicedîne*”. Em dikarin bidine bawerkirinê, wekî Xwedê bi rastî dixweze ku hûn bextewar bin, lê bextewariya bi rastî feydayê cedandinên bilind e. Bextewarî wî çaxî tê, wextê ku em berbi meremê diha mezin dicedînin, lê her meremekî mezin wê dewê bike, ku hûn

emirê xwe pêşkêş bikin. Em bextewariya rast divînin, wextê ku em emirê xwe pêşkêş dikin. Zewac atmosferêke usa ye, ku em dijî fikira bilind ya derheqa xwe da şerkarîyê dikin.

Tîmotî û Kêtî Kêllêr dinivîsin: “Eger her du meriv, mêr û jin jî bêjin: “Ezê hesab bikim, wekî pîrsgirêka here mezin ya nava zewaca me da wê bibe fikira bilind ya derheqa min da”, wî çaxî ew zewac dikare bibe zewaceke gelekî baş”. Fikira bilind ya derheqa mêriv da îzinê nade ku zewaca baş hebe. Ev yek dide kîvşê, wekî xwepêşkêşkirin kilîta zewaca tam e. Eger heleqetîyên we yên tevî mêr, yan jî jina li rex we sertbûyî ne, menî hema ew e ku hûn derheqa xwe da li ser fikireke bilind in.

Roj 5

Mezinaya zewacê

Feqet Îsa got: “Her kes nîne, wekî bona zewacê gihîştî ye. Zewac dewa hinek karebûna û merîfetê dike. Zewac bona her yekî nîne. Carna tê texmînkirinê, wekî hinek meriv piştî hatina li diniyayê derheqa zewacê da nafikirin. Yên mayîn tu cara pêşniyarê jî nakin, yan jî pêşniyarên wana nayêne qebûlîkirinê. Lê yên mayîn qîrar dikin bi menîyên girêdayî padişatîya Xwedê va nezewicin. Feqet *eger hûn dikarin bighîjine mezinaya zewacê, wî çaxî wê yekê bikin*” (Metta 19:11, 12, MSG; xeberên bi herfên cudakirî zêdekirî ne).

Wextê ku şagirt li ser fikira derheqa ketina li telê difikirin, Îsa tiştêkî usa digot, kîjanê dikaribû sînorên jîyana wana bida berfirehkirinê. Îsa zewacê çawa tele hesab nake, lê çawa qewimandîneke usa hesab dike, ya ku dikare emirê we bide *dewlemendkirinê*.

Dikare bê texmînkirinê, wekî zewac jimar û qîmetê tevbûyên xwe dide kêmkirinê. Bi kutasî du meriv dibine yek. Çawa jî hebe, zewac ne ku kêmkirî dibe, yan jî hev cihê dibe, lê zêde dibe. Du meriv dibine yek û nava hemû govekên emir da zêdebûn pêşda tê. Xwedê nikaribû temî bida Adem, ku hetanî çêbûna Hêwayê ew bighîje û zêde bibe, yan jî çendbare bibe. Û ev temî bi hebûna zaroka va nedihate sînorkirinê. Qewata çendbarebûnê, ya ku nava zewacê da ye, nikare rûyê mezinaya wê ya bêsinor da bê hesabkirinê.

Em dikarin we bidine bawerkirinê, wekî weyê ev kitêb nexwenda, eger hûn zewicî nîbûna. Jîyana me wê teng bûya. Îro, ez (Con) ew im, yê ku heye, çimkî nava emirê min da keremeta Xwedê û pêşkêşa Wî- Lîza Bîvêr heye. Gelo zewaca me her dem hêsa bûye? Na xêr. Feqet Xwedê zewaca me daye xebatê, ku hemû govekên emirê me bide berfirehkirinê.

Ez jî (Lîza) li ser wê fikirê me, ez awqas jî Xwedê razîme, wekî Ewî, bi saya malxwê min, emirê min da berfirehkirinê. Wextê ku em jî nû va zewicî bûn, ez jî meriva ditirsyam. Tê bêjî ez li ser xwe guman nîbûm, hîmlî bi wê meniyê, wekî pêncsalîyê da nexweşîya penceşêrê li cem min hebûye, rûyê çî da min çavekî xwe unda kirîye. Con zanibû, ku tîrsa min wê pêşkêşê dide sînorkirinê, ya ku Xwedê dabû min. Ew ber dilê min da hat û bi wê yekê alî min kir, ku ez bikevime nava bernama Xwedê û nava jîyana diha berfireh, çî jî bi piranî wê qulixê va girêdayî bû, ya ku bona meriva dihate kirinê.

Çawa ku me da kîvê, wextê ku Xwedê temî da me, ku em zêde bin, wî çaxî Ewî derheqa zaroka da nedigot. Xwedê zanibû, wekî yekîtiya mêr û jinê wê mecala çendbarebûnê çê bikira. Ev prînsîp nava her govekeke emir da-nava xebata we, malbetê, emirê ruhanî û govekên mayîn da kar dibe. Nava zewacê da Xwedê ew tişt da me, kîjan dikare sînorkirinê me jî me bide dûrxistinê. Eger

nava emirê we da duakirin û çendbarebûn tune, wî çaxî îdî wede ye, ku hûn cedandina bidine sekinandinê û destpê bikin merivê li rex xwe hiz bikin û qedirê wî bigrin.

Ev yek hêsa nîne

Pêşekzanê leşkerîyî baş wê we ra bêje, wekî her parçekî girîng, yê progirama leşkerî ya kardar ew e, ku hûn dijmin û bernamên wî baş bizanibin (Bi fikira we, bo çi komên fûtbolê bi wedê dirêj listikên aliyên mayîn temaşe dikin?). Wextê ku dijmin êrîşê tîne li ser zewaca, xwezima zewacên mesîhîya, meremê wî ew e, ku wana bide parçekirinê û serkarîyê lê bike. Zanistî derheqa vê yekêda gerekê rê nîşan bide, ku em diji wê yekê bisekinin.

Bi şerkarîya bona zewacên me, em bona fikira xwedêtîyê şerkarîyê dikin. Bîr binin, wekî Xwedê zewac çê kirîye, lê ne ku we. Cin zewacê hiz nake, çimkî ew tişt ji tevgirêdana bi bedenî (fizîkî) zêdetir e, ew yek yekîtiya ruhanî ye. Çimkî zewaca we bi wê derecê girîng e, wekî ewê diji wê yekê derkeve. Feqet hûn gerekê pêşda herin ku bighîjine rewa xwe (binihêre Filîpî 3:14). Îsa tu cara negot, wekî zewac wê hêsabe. Bi texmîn, ewî bi vî cûreyî, bi vê gotinê da femkirinê:

“Her yek nîne, wekî bona zewacê awqas gihîştî ye. Zewac dewa hinek karebûna û merîfetê dike” (Metta 19:11, MSG).

Beşeke gihîştinêye girîng hazirîya pêşketinê û hînbûnê ye. Gêrî Tomas nava kitêba xwe ya “Zewaca pîroz”-da dinivîse: “Eger hûn dixwezîn diha gelekî mînanî Îsa bin, wî çaxî ez nikarim mecaleke ji zewacê baştir bivînim. Bi saya zewacê hûn rastî kêmasîyên xeysete usa tîn, kîjana, eger hûn nezewicîne, hûnê nebînin”. Îsa zelal got, wekî emirê zewacê wê hemû aliyên xeyset ê negihîştî derxe

ser rûyê avê, lê eger hûn dixwezîn bi saya keremeta Wî bighîjinê (bona çi gurêdabûn, xwepêşkêşkirin û sebir lazim e), hûnê wî cûreyî mezinaya zewacê li ser xwe texmîn bikin.

Peyman, yan hec?

Carana meriv heca zewacê (sozê zewacê) çawa peymanê qebûl dikin. Eva pirsgirêk e. Peyman qayîlî ye, ya ku bona qirarkirina sînorkirina ye. Peyman dibêje: “Ev in sînor. Tu gerekê vê qayîliyê neteribinî. Eger tu peymanê me biteribinî, ezê îdî îzina teribandina peymanê bistînim”. Bi gilîkî mayîn gotî- *ez nava telêda nînim*.

Fikirdariya bi peymanê, zewacê biçûk dike. Ferhenga Mêriyam-Wêbstêr vî cûreyî dide kivşê, ku dikarin xeberê bidine *biçûkkirinê*: “bi saya guvaştinê kurt bikin”. Eva mînanî mezinaya zewacê nîne, derheqa kîjanê da Îsa digot. Zewac gerekê jîyana me bide berfirehkirinê, ne ku bide sînorkirinê.

Xwedê zewacê çawa peyman qebûl nake. Bona Wî zewac heca ruhanî ye. Ew qayîlî ye, ya ku dibêje: “Ez bi temamî xwe pêşkêşî te dikim. Ez û hebûna min yên te ne û hebûna te jî ya min e. Bi saya vî sozî hemû beşên me wê çendbare bibin, berfireh bibin û zêde bibin”. Hec bi heyteholî elam dike: “Ez ketime telê û bo wê yekê jî ez şa me”. Hec berfireh dike.

Pawlos Efesîa ra nivîsî:

“Mêrno, jinên xwe hiz bikin, *çawa ku Mesîh Civîn hiz kir...*”
(Efesî 5:25, NLT; xeberên ku bi herfên cudakirî ne hatine zêdekirinê).

Pawlos ber dilê mêrada hat, ku jinên xwe usa hiz bikin, çawa ku Mesîh Civînê hiz dike. Ev hizkirin hizkirina sozdayî ye, ya ku jî peymanê zêdetir e. Mêrno, gelo hûn şa nînin, wekî Îsa we wî çaxî jî

hiz dike, wextê ku hûn awqasî jî ne yê “hizkirinê ne”? Gelo hûn şa nînin, wekî Îsa tu cara heleqetîyên Xwe çawa peyman qebûl nake, bi kîjana Ew “ketîye telê”. Em gerekê bicedînin, ku mînanî Îsa hiz bikin, wextê ku em dergîstîyên xwe hiz dikin (Pawlos li vir nasekine. Ew dibêje, wekî em gerekê şexsê xwe bona jînên xwe bidin).

Bîr bînin, wekî serê sisîya da, yê efesîya da, pêşîya nivîsara van gotina Pawlos kûraya hizkirina Xwedê ya hindava cimeta Xwe da kivşê. Piştî du serîya, ewî temî kir, wekî hizkirina wî cûreyî nava zewacên me da jî hebe, dêmek em gerekê “usa hiz bikin, çawa ku Mesîh Civîn hiz kir”.

Meremê zewacên me ew e, ku em mînanî hizkirina Îsa ya hindava dergîstîya Wî hiz bikin. Bona çi merivên ku Îsa nas nakin, gerekê bixwezin rastî Wî bîn, tev wî xeber bidin, eger heleqetîyên cimeta Wî ji hizkirinê, qewatê û pêşkêşkirinê dûr in? Hûn fem dikin, ku zewaca we bona çi awqas girîng e? Ew yek bona we nîne. Xwedê dixweze zewaca we bide xebatê, ku bighîje hizkirina Xwe ya hindava dinîyaê.

Çawa ku me îdî got, hizkirina rast gerekê hindava merivê li rex we ji wê hizkirinê pêşda bê, kîjanê ji Xwedê qebûl dikin. Hizkirina vî cûreyî ya kûr nikarin bidine feşkirinê. Ew gerekê ji Wî bê qebûlkirinê, hizkirina Kîjanî ji femdarîya merivatîyê zêdetir e.

Emê bêjine we, wekî nêzîkbûna Xwedê ya hindava zewacê hêsa nîne. Nava zewaca me da gelek cara usa qewimîye, ku me hesab kirîye, ku gerekê em tevgîrêdana xwe bidine teribandînê. Dihate texmînkirinê, ku îdî guman tune. Feqet piştî zewaca 30-î salî em diha bextewarin û em bi guman hîvîya 30-î salên mayîn in.

Dara jîyanê, yan ya mirinê?

Ez (Lîza) hiz dikim bi baxçebêcerkirinê va mijûl bibim, lê Con wê yekê hiz nake. Rezên baxçe li min xweş tên, lê ne ku xebata, ku bona wê yekê tê kirinê. Baxçe xebata mezin e û gelek wede dixweze. Ji mala me hetanî dikana bi navê “Xurekê saxlem” rîya çend deqa ye û ew yek bona Con tiştêkî hêsa ye, ku ew here û bê, lê ne ku destên xwe qirêj bike.

Baxçe û zewac bona bêcerkirinê gelek wede û qewatê dixwezîn. Eger em dixwezîn ku zewaca me saxlem be, wî çaxî helkirina lez nabe, ya ku wê îzinê bide, ku em dora xebata lazim ra derbaz bibin. Xebat bona me kardar e, çimkî em wê yekê qîmet dikin, bona çi em dixebitin, lê em jî gerekê zewacê qîmet bikin.

Behsa baş (lê carana jî ya xirab) ew e, ku hûnê nava govekên jîyana xwe da wî hemû tiştî berev bikin, çi ku hûn nava zewaca xwe da biçînin. Nava evî serê kitêbê da me pêşda derheqa zewaca da çawa darên jîyanê da dîyarkirinê. Wekî mayîn jî rastî ye. Zewamca we usa jî dikare bibe dara mirinê.

Ev her du dar jî nava qewilên bêkêmasî da mezin dibûn.

Çi jî hebe, darek ya jîyanê bû, lê ya mayîn ya mirinê.

Dara zewacê, ya ku Xwedê daye hîmdanînê, mînanî axa dewlemend e, lê zewaca niha yan jî ya pêşerojê mînanî dare ye. Bernama zewacê ya yekem axa qenc e, nava kîjanê da yekîtiya we dikare bighîje, lê bijartin ya we ye. Gelo zewaca we wê bibe dara ku jîyanê dide? Gelo merivên li rex we, malbet, heval û xebatkar wê şabûnê, hizkirinê ji wê darê bistînin, yan dara we wê bibe ya gumanbirîyê, xwehizîyê û telayê, rezên kîjanê wê bèn xwerinê?

Ji me gelek meriv fikirîne, wekî hema îdara zewacê menîya pirsgirêkên me ye. Hinekên mayîn cedandine ku merivên li rex xwe

gunekar bikin. Her du nêzîkbûn jî didine kivşê, wekî em naxwezin nepaqîjîya dilên xwe da qebûl bikin û gava biavêjin, ku wê yekê biguhêrin. Em gumanin, wekî ev gotin derheqa we da nînin.

Hetanî berdewamkirina evê sefera xwe, hûn gerekê qirar bikin. Hûn gerekê qirar bikin, ku bawer bikin, wekî zewaca we dikare bibe û wê bibe ya usa, çawa ku Xwedê têra dîtîye.

Diqewime hûn difikirin: “*Ezê wî çaxî bawer bikim, wextê ku bivînim*”. Feqet bawerî hindava guhartinê her dem peyî guhartinê ra tê, çimkî hemû sozên Xwedê bi bawerîyê tèn qebûlkinê. Behsa qenc ew e, wekî Xwedê nava zewaca we da diha gelekî hewaskar e, ne ku hûn. Hûn gerekê “ji Ezmîn peya bibin” û îzinê bidine Xwedê, wekî Xwedê nava emirê we da hebe. Bi kutasî, zewaca we hema karê efrandarîya Wî ye. Eger hûn îzinê bidin, Ewê wê yekê biguhêre û werguhêzî karekî giranbiha bike.

Ders: Roj 1

SÊZONÊN SALÊ YÊN NAVA ZEWACÊ DA

“Wedê hemû tiştî heye û usa jî wedê temamiya idara bin ezmîn da heye.”

— Zanebûn 3:1

Bahar, havîn, payîz û zivistan her çar sêzonên sale ne. Her sêzonek bi aliyên xwe yên bi şabûn û cetin va kiviş e. Zewaca we mînanî van sêzona ye û hûnê wextê zewacê sêzonên cûre-cûre bivînin, lê hûnê nava çend heba ra çend cara derbas bibin. Nava her sêzonekê da tiştên hînbûnê û mecalên destanîna gihîştinê hene. Xudan û serwêr **Çarlz Sûîdon** derheqa sêzona da fikirên xwe raber dike:

“Ez şa me, wekî Xwedê sêzona diguhêre. Gelo hûn bona vê yekê şa nînin? Xudan ne xeber dide, ne jî difikire, wextê ku wede û sêzona diguhêre. Gelo tişteki çiqwasî şaş e, wextê ku nava hemû sêzona ra bi cûrekî derbas dibin, surên nû nayêne eşkerekirinê û tiştên nû nayêne hînkirinê. Meremê wan sêzona ew e, ku em diha bi kûrayî texmîn bikin û em bi zanebûna Xwedê xwe şîret bikin. Em gerekê alî bikin, ku em qewat bin... çawa ku ew dara ku nêzîkî çema nikandî ye”.

Bi fikira we sêzona here baş kîjan bû, ya ku we tevî jin yan jî mêrê xwe derbas kirîye? Bi kurtayî derheqa wê yekê da bêjin û şirove bikin, ku bona çi ew yek bona we mexsûs bûye.

Derheqa bagereke here giran da şirove bikin, ya ku rastî we hatîye. Hûn çawa nava wê yekê ra derbas bûn û Xudan çawa we hîn kir?

Çawa şîret bixwînin gotinên- Zanebûn 3:11, Romayî 8:28 û B Korintî 2:14

Bifikirin ku niha nava zewaca we da kîjan sêzon e? Hûn çi dikarin bikin, ku vê sêzonê diha baş bidine derbaskirinê?

Bisekinin û dua bikin: “Xudan, em çi dikarin bikin, bona ku vê sêzonê diha baş derbas bikin, nava kîjanê da nin em. Çawa bide me, wekî em wî cûreyî bivînin, çawa ku Tu divînî. Alî me bike, ku em bona wan hemû tiştên baş razî bibin, kîjana emê pêşerojê da bi saya vê sêzonê berev bikin. Bi navê Îsa, amîn”.

Wextê ku sal derbas dibin “dewsa pêçîya”-ye nava zewaca we da wê diha zelal be. Hinek wede deng nekin, bicêribînin vê yekê fem bikin. Kîjan tişt zewaca we dike ya mexsûs? Derheqa pêşkêş, merîfet, xwestin, merem û cêribandinên merivê li rex xwe da bifikirin.

Dua bikin û hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku Ew elamî we bike, ku cudatîya heleqetiyên we kîjan e û Ew çi dixweze bi saya merivê li rex we bide mîaserkirinê. Çi ku Ew nîşanî we dide, binivîsin, lê paşê wede cuda bikin, ku derheqa wê yekê da tevî merivên li rex xwe xeber bidin.

Ders: Roj 2

XWEDÊ ZEWAC ÇÊ KRIÎYE

“Xwedê zewac çê kirîye, lê ne ku we. Ruhê Wî nava parçên zewaca we ya here biçûk da jî dîjî”

— Maxakîya 2:15, MSG

Berî her tiştî, pêşîya hîmdanîna îdareke mayîn, zewac hate çêkirinê. Serwêr û xudanê merîfet **Maks Lûkado** dinivîse:

“Xwedê zewac çê kirîye. Ew yek ji alîyê tu komîtêke hukumatê da nehatîye têradîtinê. Ew ji alîyê tu teşkîleteke civakî da nehatîye hazirkirinê. Zewac nava fikira Xwedê da xuliqî ye”.

Zewac ji alîyê Xwedê da hatîye çêkirinê û ew yek bona Wî girîng e, bi awqasîva girînge wekî ew dixweze nava hemû heleqetîyên we yên nava hemû goveka da bibe. Gotina Wî dibêje: “Ew Ruhê ku Ewî nava me da danîye, me hiz dike û Ew jî hiz dike, ku Ruh bi hizkirin bê qebûlîkirinê” (Aqûb 4:4, AMP).

Bisekinin û bifikirin: gelo we Ruhê Xwedê teglîfî li hemû govekên zewaca xwe kirîye, yan na? Gelo şêwira Wî nava bernamên we yên herroje da cihê girîng digire, yan na? Eger we tenê carana tevbûna Wî tewaqe kirîye, wî çaxî jîyana we çawa ye, wextê ku hûn bîr dîkin Wî teglîf bikin?

Mecala we wê hebe, ku hûn wî çaxî tevî Xwedê her dem, li hemû cîha û derheqa hemû tiştî da, xeber bidin. Gelo nava

jîyana we da tirs, diwariyên finansî, yan jî diwariyên başqe wextê heleqetîya hene, yan na? Gelo bona çî merivê nikaribe bi rîya duakirinê derheqa hemû xemgînîyên xwe da raber bike? Bi guhdarî wan beşa bixwînin û binivîsin, ku Ruhê Pîroz çî dibêje we.

Filîpî 4:6, 7 • Metta 6:25-34 • A Petrûs 5:7 • Aqûb 5:13-16

Metta 7:7-11 • Yûhenna 14:13, 14 • A Yûhenna 5:14, 15

“Û emê li ser xwe guman bin, wekî Ewê me guhdar bike, wextê ku em her tiştî ji Wî hîvî bikin, anegorî xwestina Wî. Û eger em bi rastî zanin, ku Ew me guhdar dike, wextê ku em tevî Wî xeber didin û hîvîkirinên xwe raberî Wî dikin, em dikarin guman bin, wekî Ewê bersiva me bide”.

— A Yûhenna 5:14, 15, TLB

Xwedê naxweze, wekî zewaca we bibe zona şêr. Ew dixweze, ku ew bibe mînanî Yêdêm. Xebera “Yêdêm” “xweşîyê” dide kîvê. Hûn ji her tiştî zêdetir çî dixwezin, wekî Xwedê nava zewaca we da bide guhartinê? Wextê ku hûn bersivê bidin, ji Wî bipirsin: “Rola min ya nava helkirina vê pîrsê da kîjane? Ez gerekê nava xwe da çî biguhêrim?”

MESÎH RABER BIKIN

“Em qasidên Mesih ne. Xwedê me dide xebatê, ku me bîne li ser wê yekê, ku mêr û jin cudatîya daynin alikî û bikevine nava karê Xwedê, bi saya çî gerekê hemû şaşîyên di navbera alîya da bèn rastkirinê. Nihê em ji navê Mesîh xeber didin...”

— B Korintî 5:20, MSG

Xwedê, Efrandarê hemû karî, mecala hevkarîya tevî Xwe daye me. Em gerekê xeysetê Wî eyan bikin û xwestinên wî, rêyên li ser vê diniyayê bidine kîvê. Ev yek him derheqa emirê meyî şexsî da ye, him jî derheqa zewaca me da ye. Rîk Rênnêrê serwêr, yê ku xudanê kitêba ye û mîsyonêr e, şirove dike:

*“Anegorî gotinên Pawlos, li ser kaxeza korintiyayê 5:20-ê hatiye dîyarkirinê, wekî em “qasidên” li ser diniyayê ne: yên ku çawa wekîlên Ezmîn hatine şandinê. Çawa qasidên Mesîh em *dengê Ezmîn in*. Çawa wekîlên Wî, îzina me heye, ku ji navê Xudan xeber bidin û kar bikin. Çawa qasidên Ezmîn, piştgirîya me ya *tam*, dayîn, *parastin* û *alîkarîya* ji aliyê serwêrtîya Ezmîn da û bi mecalên Ezmîn heye”.*

Hûn û merivên li rex we qasidên Xwedê yên li vê diniyayê ne. Ew bi saya we ber dilê bêbawera da tê, hîvî dike, reca dike, ku vegerine li cem Wî. Feqet hûn bi çiqasîva bona vê teslimkirinê “başin”? Eger we Xwedê nas bikira û we cote meriv bidîta, wekî zewaca wana mînanî zewaca we ye, wî çaxî çî wê we nêzikî Xwedê bikira û çî jî wê we ji Wî dûr bixista?

Wextê ku bedena Mesîh najî û baş nayê hizkirinê, meriv navê Xwedê bêhurmet dikin (binihêre Romayî 2:24).

Gelo Ruhê Pîroz tiştêkî usa nîşanî we dide, çi ku gerekê bê guhartinê, diqewime nêzîkbûn, xeyset, yan jî govekeke zewaca we, ya ku bi cûrê rast Wî raber nake? Eger usa ye, wî çaxî Ew çi nîşan dide?

Hewce nîne, ku hûn gunekarîyê û gumanbirîyê texmîn bikin. Ruhê Pîroz dixweze wî hemû tiştî biguhêre, çi ku nîşanî we dide. Hûn gerekê wê yekê teslîmî Wî bikin û alîkarîya Wî hîvî bikin.

Nava jîyana me da govek hene, nava kîjana da em dikarin pêş bikevin û gerekê em hîn bibin, ku Xudan diha baş raber bikin. Vê yekê çawa bikin: bi qewata Ruhê Wî? Eger hûn bi xwe hizkirina Wî qebûl bikin, hûnê bikaribin jina xwe, yan jî mêrê xwe, merivên dora xwe hiz bikin. Bi guhdarî wan beşa bixwînin û binivîsin, ku Ruhê Pîroz derheqa qebûl kirina hizkirina Xwe û gihîştina nava hizkirina Wî da çi elamî we dike.

Romayî 5:5 • Efesî 3:16-19 • A Yûhenna 4:7-17

“...Xwedê hizkirin e û her yek yê ku nava hizkirinê da dijî, tevî Xwedê dijî û Xwedê jî nava wî da dijî. Bi jîyîna tevî Mesîh hizkirina me diha gewîn dibe û dibe ya tam...”

— A Yûhenna 4:16, 17, TLB

Ders: Roj 4

DILÊ NÛ

“Ezê dilê nû bidime we û ruhê nû daynime nava we. Ezê dilê kevir ji bedena we hildim û dewsa wî dilê usa daynim, yê ku nava xwestina Xwedê da ye, lê ne ku bi serî xwe ye. Ezê Ruhê Xwe daynime nava we û usa bikim, ku hûn bikaribin wê yekê bikin, çi ku Ez dibêjime we û hûn jî bi gotinên Min bijîn.”

— Yêzêkiêl 36:26, 27, MSG

Diqewime hûn bi tirs nêzîkî zewacê dibin. Diqewime cêribandina we ya şexsî û normên kûltûra me we anîne li ser wê fikirê, ku hûn zewacê çawa barekî giran dinihêrin. Diqewime we rûyê tirsê teribandîna da dilê xwe berk kirîye. Diqewime li cem we jî ev pirs pêşda hatîye: “Gelo ez ketime telê?”. Xwedê dixweze li hemû cihê pêşda here û dilekî nû, yê nazik û milahîm bide we, ku hûn bi gulvedan bijîn û bernama Wî ya pêşin mîyaser bikin.

Bona Îsa tiştêkî diha girîng tune ye, çawa ku dilê we ye. Bi guhdarî gotinên Wî nava Lûqa 8:5-15-da bixwînin. Nava vê beşêda Ruhê Pîroz çi nîşanî we dide? Ew derheqa dilê we da çi eyan dike?

Mesela toximreş jî nava Metta 13:3-23 û Marqos 4:3-20-da hatîye nivîsarê.

Hûn bi xwe nikarin pê bihesin, ku dilê we da çi heye. Feqet Xudan dikare û dikare *eyan bike* ku dilê we da çi heye û wê yekê *derman bike*.

Dora van rastîya bifikirin.

“...çimkî Xudan hemû dila dipirse û hemû menîyên nava fikira da fem dike. Eger tu Wî bigerî, Ewê bona te bê dîtîne.

— A 1 Dîrok 28:9, NIV

“Dil...têderxistinoke, yê ku tu cara ji aliyê tu yekî da nehatîye têderxistinê. Feqet Ez- Xwedê, dil dipirsim û fikirê kontrol dikim. Ez dikevime dilê mêriv, ez dikevime koka hemû tiştî. Ez wî cûreyî nêzikî wan dibim, çawa ku ew bi rastî usa nin, ne ku çawa ku ew xwe didine kivşê”

— Yêrêmîya 17:9, 10, MSG

“Xudan, dilê min bipirse û nas bike: min bicêribîne û fikirên min yên nerehet nas bike. Her tiştî nava min da nîşan bide, çi ku Te dide xeyîdandinê û bi xeta jîyana heta-hetayê rêberîyê li min bike”.

— Zebûr 139:23, 24, NLT

Bisekinin û dua bikin: “Xudan, nîşanî min bide çi dilê min da hindava zewaca min da heye. Bide eyanêkirinê, ku tu bikaribî wê yekê bi navê Îsa qenc bikî”. Bêyî deng guhdar bikin, ku Ew çi elam dike. Wê yekê binivîsin û teslîmî Wî bikin.

Gelo hûn hewcê dilekî bûne, yê ku dixweze hizkirin û keremeta Xwedê qebûl bike? Bavê we yê ezmîn wê nasîya we neda bernama Xwedê ya zewacê, eger hazir nîbûya, ku bona mîaserkirina wê bernamê alî we bikira. Bona çi gerekê hûn niha alîkarîya Wî hîvî nekin? Hûn dikarin dua bikin...

*“Bavo, bona pêşkêşa zewacê ez razîme. Ji wî hemû tiştî min aza bike, rûyê çi da ez dikarim şaş nêzikî zewacê bibim û duakirinên wê têberdim. **Dilekî nû** bide min, yê ku hindava Te nerm e û nazik e. **Çavên nû** bide min, ku ez zewaca xwe usa bivînim, çawa ku Tu wê yekê divînî. Alî min bike, ku ez bi bawerîya xwe tiştê herî baş bînim, lê ne ku hîvîyê bim, ku tiştê herî xirab biqewimin. Alî me bike, ku nava hemû kara da em Te cîyê ewlin da bigrin. Spas, Bavo, bi navê Îsa, amîn”.*

Ders: Roj 5

MEZINAYA ZEWACÊ

“Her kes nîne, ku bona zewacê îdî gihîştî ye. Zewac dewa hinek karebûn û usa jî merîfetê dike... Feqet eger hûn dikarin bighîjine mezinaya zewacê, wê yekê bikin”.

— Metta 19:11, 12, MSG

Mezin bikin: ev xeber dide kivşê- zêdekirin, belakirin, berfirehkirin. Çêkirê zewacê, Xwedê, dixweze yekîtiya we bona berfirehkirina emir bide xebatê. Eger hûn progirama Wî ya here baş qebûl bikin, Ewê bi saya merivê li rex we kar bike, ku we diha gelekî bike mînanî Îsa û karebûnê bide we, wekî hûn nava hemû karên xwe da bighîjine açixiyê.

“Çawa ku hesin hesin tûj dike, usa jî merivek, yê mayîn tûj dike”.

— Gotinên Silêman 27:17, NIV

Dibêjin, wekî nava zewacê da firqîya mêr û jinê guhdariyê teglîfî li ser xwe dike. Nava wan firqîya da qewat heye û hema bi saya wê yekê ye, wekî em dikarin bibine yek. Feqet ew tiştên ku berê guhdariya me dikişandine li ser xwe, hinek wede şûnda dikarin ji xwe bidine dûrxistinê.

Kîjanin sê tiştên sereke yên nava xeysetê merivê li rex we, yên ku pêşda bala we dikişandin? Kîjanin ew hersê tiştên ku niha we didine dûrxistinê? Gelo di navbera van tiştên da tevgirêdan heye?

Hersê tiştên sereke,

kîjan bala min dikişandin

Hersê tiştên sereke,

kîjan min didine dûrxistinê

Bîra xweda xweyî bikin, wekî ew firqî gerekê we bikin yek, lê ne ku we ji hev cihê bikin.

Ruhê Xwedê bi serwaxtîya Xwe tevî we û usa jî merivên li rex we nivî dibe û şêwira Wî her dem nîne, ku wî çaxî tê dayînê, wextê ku hûn dua dikin. Gelek cara Ewê başqe tevî ji we yekî xeber bide, tişteki usa bêje, kîjanê gerekê hûn fem bikin. Eger hûn dixwezin ji aliyê Xwedê da bèn rêberkirinê û qirarên ji aliyê Wî da dukirî qebûl bikin, bona we ew serwaxtî lazime, ya ku Ewî danîye nava we. Bi bêqelpî caba van pirsra bidin:

Gelo nava jîyana xwe da bona merivê li rex xwe (serwaxtî, rêberî, rexnekirina çêkirinê) ez vekirîme, yan girtîme?

Nava kîjan goveka da ez bona wê yekê vekirîme, lê nava kîjanada girtîme? Bo çi?

Ew merivê li rex, yê ku ji aliyê Xwedê da hatiye dayînê, emekê herî mezin kirîye nava çêkirina şexsê we. Navê wê firqîyê bidin, ya ku nava we da wextê tevgirêdanên tevî merivê li rex we çê bûye. Niha Xwedê çawa wan firqîya bona berfirehkirina emirê we dide xebatê?

Gelo we qet razalixî elamî merivê li rex xwe kirîye, bona wê yekê, wekî ewî alî we kirîye ku hûn emirê xwe bidine zelalkirinê û berfirehkirinê. Eger usa nîbûye, hema niha wede başqe bikin, ku hûn bi bêqelpî razîbûna xwe elam bikin.

PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

Eger hûn vê kitêbê nava sinorên dersên tomerî, yê “Berevoka Mêsincêrê” ya “Serhatîya derheqa zewacê da” lêkolîn dikin, matêriyala vidêoêye 1-ê temaşe bikin.

1| Zewac hema pêşda fikira Xwedê bû. Ewî zewac çê kirîye û meremê Wî bona zewacê heye. Bi guhdarî bixwînin gotinên Destpêbûn 1:27, 28, 31 û Maxakîya 2:15. Pênc merema başqe bikin, yê ku Xwedê bona zewacê qîrar kiribûn. Li rex van xala pênc feşkirinên navhevxiştî binivîsin, yê ku mîrêcin dicêriband dewsa wana pêşniyar bike.

MEREMÊN XWEDÊ FEŞKIRINÊN

KU MÎRÊCIN NAV HEV XISTINE

_____	_____
_____	_____
_____	_____
_____	_____
_____	_____

2| Zewacên, ku Xwedê xweş tên, hukumî li ser wan meriva dikin, yê ku nêzîkî hev dibin. Hûn dikarin jin û mêrekî usa bîr bînin, zewaca kîjana baş e? Ew qedirê zewacê çi cûreyî bilind xweyî dikin? Gelo tiştêkî usa heye, ku hûn dikarin ji wana hîn bibin û tiştê ku wê alî we bike ku ruhê zewaca xwe xweyî bikin.

3| Metta 19:6-da Îsa got: “Çawa ku Xwedê yekîtîya jin û mêr ya tebyetî çê kir, tu kes gerekê ev karê Wî heram neke, wana ji hev bide qetandinê” (MSG). Wextê ku hûn xebera “tebyet”-ê dibihên, fikira we ra çi derbaz dibe? Fikirên wî cûreyî çi cûreyî alî we dikin, ku hûn zewacê bin ronahiya nû û baş da bivînin?

4| Metta 19:11, 12-da Îsa got: “Her kes nîne, wekî awqas bona zewacê gihîştî ye. Zewac dewa hinek karebûna û merîfetê dike. Zewac bona her kesî nîne... Feqet eger hûn dikarin bigihîjin û bigihîjine mezinaya zewacê, wê yekê bikin” (MSG). Mezinaya zewacê çî ye? Em çawa dikarin wê yekê bivînin?

5| Zewac pîroz e: ew bona temamiya jîyana jin û mêrekî hec e. Gelo nava vê dersê da tişteki usa heye, ku we berbi şerkarîya bona zewaca we dibe? We ji vê dersê fikir û texmînkirinên nû yên çawa stendin?

6| Îsa got, wekî çira bedenê çav e (binihêre Metta 6:22). Dêmek lênihêrandina we ye derheqa jîyanê da geleki girîng e, çimkî ew werguhêzî rastîya we dibe. Ev yek bi taybetî nava zewacê da rastî ye. Wê çî bibe, eger hûn zewacê çawa tele lê binihêrin?

Kitêba Pîroz dibêje, wekî em nava şerê ruhanî da nin (binihêre Efesî 6:12, 13 û B Korintî 10:3, 4). Gelo ev fikir alî we dike, ku hûn hevraqayîlnebûnên zewaca xwe û dijawariya bin ronahîke başqe da binihêrin?

7| Kitêba “Serhatîya derheqa zewacê da” wê him bona merivên zewicî, him bona merivên dergîstî û usa jî bona yên nezewicî kardar be. Neniherî wê yekê, ku hûn dighîjine kîjan komê, hevîyên we yên ji vê dersê kîjan in?

Eger hûn zewicîne (yan jî zewicî bûne), weyê bixwesta çî bizanibûya, hetanî ku we ev xeber bigotana “Ez qayîlim”? Şewira çawa hûnê bidine endamên komê yên nezewicî?

TOMERÎKIRINA SERÊ K ITÊBÊ

- Xwedê yekîfîya zewacê pêşîya sazkirina îdarekê çê kir. Ewî zewac sînorkir û ew sînorkirin tu cara nehatîye guhartinê.
- Zewacên ku li Xwedê xweş tèn, gerekê mînanî dara Jîyanê bin. Em gerekê mînanî hizkirina Xwedê bikin û bibine qasid, bi saya çi Ew pêşniyar dike, wê yekê bidine dasekinandinê, çi ku wextê da li Yêdêmê hate undakirinê.
- Ruhê zewaca xwe kontrol bikin, bi teglîfkirina Xwedê, nava hemû govekên zewaca xwe. Ewê dilê nû bide we, bona ku hûn hizkirina Wî qebûl bikin û bidin, û çavên nû, bona ku hûn zewaca xwe ji tabîya Wî binihêrin.
- Xwehizî çetinaya dijawabê, ya ku îzinê nade pêşkêşa zewacê bivînin û li ser xwe texmîn bikin usa, çawa ku Xwedê dixweze.
- Êrîşa li ser zewacê, êrîşa li ser wê dîtinê ye, ku çawa Xwedê nêzîkî cimeta Xwe dibe.
- Xwedê zewac bona berfirehkirina hemû govekên emirê me jîyana me çê kir.



— DÛ —

Dawîyê ji destpêkê lê binihêrin

Roj I

Gelo we guhdarî daye ser wê yekê, wekî film û kitêbên here romantîk derheqa destpêka serhatîya evîndarîyê da didine kivşê? Wan roman û filma, yên we yên hizkirî bînin bîra xwe (bêfitîya, bona we çend meriva ev yek diha hêsa ye, ne ku bona yên mayîn). Syûjêya wê çawa bû? We sertbûna huba xwe wextê reqasa ewlin texmîn dikir? Diqewime we xwe kursîva diguvaşt, hetanî ku filmê syûjêa xwe diguhart û du teyredên evîndar nikaribûn ramûsana ewlin li ser xwe texmîn bikirana. Bêfitîya, wedê usa jî dibe, wextê ku çetinaî pêşda tên, lê em zanin, bi kutasî ew çetinaî wê ser hevda bèn. Neniherî van çetinaî her du evîndar dikaribûn wan çetinaî alt bikin. Serhatî bi van xeberava ser hevda tê: “Û ew layîqî emirê wededirêj û bextewar dibin”.

Em zanin, wekî *emirê* wan yê *wededirêj û bextewar* bû. Feqet ew çi cûreyî bû? Çêkirina destpêka baş hêsa ye, lê lazime xebata giran bê kirinê, ku beşa vê serhatîyê ya hîmlî û dawîya wê çê bikin.

Tiştêkî eyan e, wekî çanda (kûltûra) me bi destpêka serhatîya evîndarîyê va berbiç'e've. Du merivên evîndar dikarin bi seheta progirama şaya xwe hazir bikin, lê dikarin hindik wede derbas bikin, ku salên pêşîya xwe bidine progiramkirinê, yên ku wê piştî şahîyê bèn. Bûk dikare bi seheta kincên bûktîyê bigere, lê bona şêwirdarîya pêşîya zewacê tenê çend seheta başqe bike. Nava feydaên wê yekê da piranîya bûk û zava bona wî wedeyî hazir nînin. Wextê ku çîrok ditemire, ew divînin, wekî ew gerekê bi pirsgirêkên rastva heleqetîyên rast saz bikin.

Rojên heyteholâ şahîyê, gerekê bi gumanê, bedewîyê û fikirên derheqa cejinê da tijî bin. Paşê zewacê bi gumanê va û bedewîyê va wî çaxî tijî be, wextê ku ew her du meriv dîsa wan hemû tišta bidine xebatê, bi kîjana destpêka xwe hazir dikin, bona progiramkirina dawîyê. Emirê wededirêj û bextewar hema usa nayê stendinê. Ew yek merem e, berbi kîjanî gerekê bicedînin û wê yekê çê bikin.

Dor û berê xwe binihêrin û guhdarîyê bidine ser tiştêkî baş û bedew çêkirî, mesele, li ser malekê, yan avtomaşînekê, yan jî ser wê kursîyê, li ser kîjanê hûn r'ûniştîne. Diqewime qet fikira we ra jî derbaz nebûye, wekî ew tişt du cara hatîye çêkirinê. Cara ewlin, wextê ku proêkta çêkirinê fikira yekî da bûye, lê cara dua wextê ku ew proêkt hatîye mîaserkirinê. Fikira derheqa proêktê da her dem pêşîya çêkirinê ye. Berê ewlin gerekê derheqa feydayê dawî da bifikirin, lê bona gava duyem matêrîyal û xebat tên xwestinê. Ew hemû tiştê, ku fikira we ra derbaz dibin, jî çêkirina sêndvîçekê destpêkirî hetanî proêktên çetin, pêşda gerekê derheqa wê yekê da bifikirin, hetanî ku ew bibe tiştê matêrîyalî.

Qet wê fikira we ra jî derbaz nebe, ku hûn maleke usa çê bikin, ya ku bêyî proje bibe, çimkî karê we wê bi temamî navhevkeve. Çêkirina her maleke bedew jî proêkta (proje) baş hazirkirî destpê dibe. Çêkirina malê bi saya xebata kel û ced û

matêriyalên anegor destpê dibe, lê tenê wî çaxî, wextê ku proêkta (pojeya) wê îdî ser hevda hatîye.

Bona qirarkirina qîmetê çêkirinê dîsa proêkt lazim e. Gelo hûnê rehet çêkirina malê destpê bikin, bêyî zanebûna wê yekê, ku ewê çi biha be? Îsa ev pirs da, wextê ku em hîn dikirin, ku em gerekê jîyana xwe çawa çê bikin.

“Ji we kîjan ku bixweze bilindcîhekî nobedara çê bike, pêşiyê rûnenî, nede ber hesêb, gelo qewata wî wê bigihîje ku bîne sêrî, yan na? Nebe ku hîmê wê dayne û nikaribe bîne sêrî, yên ku bibînin lê bikenin û bêjin: “Evî merivî destpê kir çê bike û nikaribû banîya sêrî” (Lûqa 14: 28-30).

Prînsîpa çêkirina avayî usa jî nava çêkirina zewacê da rast e. Hûn zewaca çi cûreyî çê dikin? Gelo we bahê wê hesab kirîye û wê yekê ra daye qayîlkinê, ku ji we wê çi bê xwestinê, bona çêkirina zewaca we?

Xwedê naxweze, wekî zewacên me bi êşê, yan jî şermê ser hevda bîn. Ew naxweze em wana bihêlin û negihînine dawîyê. Nenihêrî wê yekê, ku zewaca we ji nû va destpê dibe, yan jî bi salên çetin derbas bûye, tu cara dereng nîne ku progirama Xwedê qebûl bikin. Nava Xwedê da em dîtîn, mecal û qewata lazim dibînin, bona ku em zewaca ku Ew dixweze çê bikin. Rastîke ecêb heye: Xwedê dixweze, ku axirîya we bextewar be. Ew diha gelekî dixweze, lê ne ku hûn dixwezîn ku çêkirina karê Wî bigihîje dawîyê.

Nava vî serê kitêbê da rastîyên usa hene, yên ku wê nîşanî we bidin ku çawa bidine progiramkirinê û çi cûreyî bi açixî hûn zewaca xwe çê bikin. Emê gilî bikin, ku me destpêka zewaca xwe da çi kir, ku em li ser hîmekî (bingehêkî) qewîn zewaca xwe çê bikin, ku li ber bagerên jîyanê ber xwe bidin. Xêncî wê emê we hîn bikin, ku progirama usa çê bikin, kîjanê berbi *emirê wededirêj û bextewar* rêberîyê li we bike. Ev serê kitêbê t'enê bona merivên

tezewewicî, yan jî hela hê yên nezewicî nîne. Eger hûn jî zûva zewicîne, hûn dikarin jî vî serê kitêbê karê bistînin û jî nûva heleqetiyên xwe binihêrin. Me jî usa kir.

Xwedê bi dîtina dawîyê ji sêrî da destpê dike

Ew yek tiştêkî xêfiktî ye, ku bi sazkirina yekîtîya xwe pêşda nepirsin: “Hûn vê yekê bona çi dikin û hûn kuda diçin?”. Her yekîtîk gerekê bêyî fikira anegor nîbe. Mesele, meremê Xwedê yê mexsûs hebû, wextê ku Ewî qirar kir tevî Birahîm yekîtîyê mor bike.

Bi fikira we bo çi Xwedê Birahîm bijart, ku ew bibe bavê cimeta Wî ya bijartî. Caba (bersiva) vê pirsê ya here belabûyî ew e: “Çimkî bawerîya wî ya mezin hebû”. Nenihêrî wê yekê, wekî bona mîaserkirina progirama Xwedê bawerîya pêwîst lazime, lê menîya bijartina Birahîm ew nîbû. Xwedê Birahîm bijart, çimkî zanibû, wekî Birahîmê nisiletên xwe hîn bike, ku peyî Xudan herin.

“Çimkî Min ew bona wê yekê bijart, wekî ew *temîyê bide kurên xwe û peyî xwe ra jî mala xwe*, ku ew rîya Xudan da here, rastîyê û heqîyê bikin, wekî Xudan çi ku Birahîm ra soz daye, bîne sêrî” (Destpêbûn 18:19, ESV; xeberên bi herfên cudakirî zêdekirî ne).

Bi bijartina Birahîm, Xwedê dîna xwe da pêşeroja ev merivê koçer û bêzuret û nisiletên wî dîtin. Bona Xwedê ew yek girîng bû, wekî Birahîm “temî bida kurên xwe, ku rîya Xudan da here”, çimkî Ewî dixwest, serhatîya xilazbûna Xwe bi saya nisiletên Birahîm mîaser bikira. Ewî zanibû, wekî Birahîm û Serayê wê şaşî bikirana, feqet usa jî zanibû, wekî ew “matêriyalên” r’ast bûn. Wextê ku tevî me yekîtî tê morkirinê, Xwedê her dem nisiletên me hesab hiltîne, çimkî Ew îdî pêşerojê da bûye, zane wê îro çi bibe, ku Ew bikaribe me bighîne li wir.

Yekîtiya Xwedê ya tevî Biraîm awqas berfireh bû, wekî bi kutasî gihîste me. Bi saya baweriyê Biraîm, yê ku bêzuret bû, weke steyrka û xweyê nisileta mezin bû. Ew merivê ku bêyî milet bû bona hemû mileta bû bavê baweriyê.

“... Biraîmê ese bibe miletekî mezin û zor. Û bi wî dua wê li temamiya miletên li ser dinîyê bibe...” (Destpêbûn 18:18, ESV).

Jiyana me ji ya Biraîm cuda dibe, lê prînsîp yek e. Xwedê merivên usa digere, yên ku bi zanebûn îzinê didin, ku yekîtiya Wî bi destî wan belabe. Serhatiya we tenê derheqa we û merivê li rex we da nîne: gelek tişt dikevî nava wê.

Tenê Ezmanê hukumê yekîtiya Xwedê bi temamî bide eyankirinê, yê ku bi saya we û heleqetiyên Wî hatîye kîvşê. Ew dixweze bighîje hemû kesî, yê ku bi saya we tê vê dinîyê û usa jî her merivekî, ku dikeve nava dorana hukumê we. Ev yek dide kîvşê, wkî hûn gerekê wê fikirê qebûl bikin, ya ku bi we ser hevda nayê û bi fikira we va nayê sînorkirinê. Progîrama (bernama) Xwedê bona serhatiya zewaca we wê her dem nisiletên pêşerojê jî hesab hilde.

Roj 2

Lawên Xwedê

“Xwedê zewac çê kirîye, lê ne ku we. Ruhê Wî nava hemû parçên zewacêye biçûk da jî dijî û *Ew çi ji zewacê dixweze? Lawên Xwedê- awa çi...*” (Maxakîya 2:15, MSG).

Lawên Xwedê: Xwedê ji zewacê wê yekê dixweze. Ev yek çi dide kîvşê? Gelo Ew dixweze, wekî gelek zarok bên dinîyayê û dinîya bi wan va zêde be? Him erê û him jî na.

Maxakîya 2:15 da nivîsar nîne, wekî Xwedê dixweze, ku ji zewacê *zarok* pêşda bîn. Ew dixweze, ku *zarokên Xwedê* pêşda bîn. Xwedê dixweze, ku lawên Wî, yên cûre- cûre, yên emirê biçûk, yan jî emirê mezin hebin, yên ku wê Wî rûmet bikin û rîya Wî da herin. Bîr bînin, wekî em qasidên Wî ne. Meremê Xwedê ewe, ku Ew bi saya me û usa jî merivên mayîn Xwe eyan bike.

Wêstmînstêr dinivîse: “Meremê mêrivî sereke ew e, ku Xwedê rûmet bike û heta-hetayê Wî texmîn bike”. Ev fikir gelekî li me xweş tê. Xebera “rûmetkirin” gelek cara nava Încîlê da tê xebitandinê, feqet ev xeber nava xeberdana herroje da nayê xebitandinê, tê bêjî ew xeber ya ruhanî ye û nayê femkirinê. Xebera *rûmetkirin* awqasî dide kivşê, wekî em Xwedê eyan dikin. Xwedê dixweze bi saya jîyana me, zewac û nisileta me eyan be. Bona wê yekê jî rîya here baş, ya bona gihîştinê û bûyîna lawên Xwedê zewac e.

Eger hûn zarokê jî mezin nekin, Xwedê dixweze zewaca we bona bûyîna çawa lawê Xwedê bide xebatê. Ew dixweze we werguhêzî wekîlê rûmeta Xwe bike û we bike mînanî Bavê We. Bi parevekirina emirê we, tevî merivekî mayîn gelek mecal çê dibin, ku hûn bibine mînanî Xwedê. Me dîtîye, wekî gelek cara xeysetê xwedêtîyê nava xiyala da nayê destanînê, ew nava agirê zewacê da şerkarîyê dike.

Ez (Con) zewacê himberî agir dikim. Lê me jî himberî hesinê giranbiha dikim. Agirê ku tevî hesin dişuxule, çi dike? Ew nepaqijîya wî dide kivşê. Gistîla min ya zewacê mînanî zêrê paqij e, lê bi 50-î selefî va bi matêrîyalê mayîn e. Eger min gistîla xwe bikira nava agir, ew nepaqijî wê bihatana kivşê. Hema wî cûreyî jî, ew çetinayî rastî kîjana tên em-ji hevraqayîlnebûnên biçûk destpêkirî hetanî wedê çetin nepaqijîyên emirê me eşkere dikin (bona eşkerekirina hinek nepaqijîya dereca germayê ya diha bilind

tê xwestinê, ne ku bona yên mayîn). Wextê ku zewac kêmasîyên me dide kivşê, hêsa ye ku em merivên li rex xwe gunekar bikin. Pêşîya zewacê em rastî tiştên usa nedihatin. Wextê ku em hindava merivên li rex xwe acizîyê texmîn dikin, wekî ew “sistayên” me diha zelal dikin, em gerekê ji Xwedê razî bin, wekî zewac me diha zêde dike mînanî Îsa. Gelo meremê me yê sereke ev nîne?

Heyîna merem wextê dijawariya

Em zanin, wekî himberîhevkirina me ya tevî tiştên kevinar meriva şa nake, lê rîya berbi dawîya bextewar qet mînanî çîrokê jî nîne. Carana serpêhatîya we ya zewacê ne ku mînanî gera baş e, lê diha gelekî mînanî wê yekê ye ku hûn çiyayê Êvêrêstê derbas dibin.

Ew merivên ku rê didine pêşîya xwe, ku berbi serên çiyayên Hîmalayê, li kîderê berf e, herin ku bi rîya dijar ra derbas bibin, herin serê çiyayê Êvêrêstê, gerekê du tiştê bîra xwe da xweyî bikin. Ya ewlin ew e, wekî ew gerekê bizanibin, wekî ev pêşniyar wê sînorên karebûnên wan yên fîzîkî û ruhanî bicêribîne. Merivên vî cûreyî derheqa qezîya da, yên ku pêşîya wan in, nizanin, lê zanin, wekî ewê rastî çetinaya bîn. Ya duda, ew gerekê meremê xwe bîr bînin, ku ew gerekê hilkişîne serê çiyayê diniyaeyî herî bilind. Serkevtin bona wana ev e: bighîjine bilindaya li ser 8.848 mêtira. Bêyî zanebûna derheqa wî meremî da, wextê ku endamên êkspêdîsyayê rastî çetinaya mezin bîn, wê paşda vegerin.

Zewac jî hema wî cûreyî ye, eger em fem dikin, wekî çetinayî beşeke dîroka zewaca men e. Emê neşkên, wextê ku karebûnên me yên fîzîkî û ruhanî bîn cêribandinê. Eger em destbi çêkirinê bikin û dawîyê destpêkê da bivînin, emê teslîm nebin eger em rastî çetinya bîn.

Bi hînkirina derheqa gihîştina ruhanî da Îsa got, wekî ewên, ku bawerîya xwe Gotina Xwedê tînin, wê rastî *tengasîya*

û zêrandina bèn. Nava zimanê yûnanî da ev xeber vî cûreyî ne “tlîpsîs” û “dîogmos”. Xebera “tlîp’sîs” dide kivşê “qezîya, ku derda, hukum, zehmet û zêrandinê pêşda tîne”. Tu tişt nava vê yekê da ber çavê me baş nayê kivşê, lê ev qewat gihîştina me ya nava Xwedê da hêsa dike. Pawlos xeberên Îsa diwekilîne:

“Em jî dikarin şa bin, wextê ku em rastî çetinaya û zehmetîya (tlîpsîs) tên, çimkî em zanin, wekî ew alî me dikin, ku em sebira xwe bidine pêşxistinê. Û sebir xeysetê qewîn dide pêşxistinê, lê xeyset jî gumana me ya nava xilazbûnê da dide qewatkirinê. Ev guman wê berbi nerazîbûnê nebe, çimkî em zanin ku Xwedê bi cûrê çiqwas nazik me hiz dike, çimkî Ewî em dane Ruhê Pîroz, ku dilên me bi hizkirina Xwe va tijî bike” (Romayî: 5:3-5, NLT).

Pawlos nivîsî, wekî em gerekê wextê çetinaya û tengasîya *şa bin*. Bona çi? Tengasî mecalê saz dikin, ku em xeysetê xwe bidine qewatkirinê. Çetinayî alî me dikin, ku em bibine mînanî Xwedê. Em dikarin guman bin, wextê ku em zanin, ku Xwedê me hiz dike û derheqa me da awqas gelek difikire, wekî Ewî em dane Ruhê Xwe, ku wextê çetinaya jî dilên me bi hizkirinê va tijî bike.

Kitêba Pîroz jî zelal dibêje, wekî Xwedê ne xudanê çetinayên me ye. Li piş tengasîya û zêrandina mîrêcin sekinî ye (binihêre Marqos:4:15 û Aqûb:1:12, 13), lê Xwedê wê van tiştta hema miqabilî (dijî) dijmin bide xebatê. Çi ku çawa merem hatibû danînê, ku me ji Xwedê bide dûrxistinê, destên Xilazkirê Me da werguhêzî hacetekî dibe, bi kîjanî Ew me werguhêzî mînanî Wî dike.

Em bîr bînin, wekî dijmin zewacê û çi ku zewacê va girêdayî ye hiz nake. Ewê hemû tiştî bike, ku yekîtîyên me bide parrçekirinê û wana bi tengasîya bide girankirinê. Eger bawerîya me ya bona yekîtîya me heye, wekî Xwedê wê me ji çetinaya derxe, emê bi gumanê qewatbin û bikaribin miqabilî êrîşên dijmin derbikevin. Xwedê naxweze, wekî em li ber êrîşên miqabilî zewaca xwe teyax

bikin. Ew dixweze ku em bi wê rê diha qewatbin. Em gerekê bîr bînin, ku em bona çî şerkarîyê dikin (bo meremê Xwedê) em dijî kê (mîrêcin) şerkarîyê dikin û kî piştgirîya me dike (Ruhê Pîroz). Bawerî gumana me bi rîya çetinaya qewîn dike, eger em hetanî wî çaxî paşda venakişin, wextê ku Ew nava me da wê karê Xwe ser hevda bîne.

Dawîya Îsa ya bextewar

Îsa ji her kesî zêdetir zêrîya. Ew çawa Xwedê, bû mînanî me ku êşa mirina neheq li ser xwe bivîne. Ewî bona me rê çêkir, ku em Xwedê ra qayîl bibin, lê piranîya merivatîyê hela hê Wî înkâr dike.

Gelo Îsa çawa karibû êşa wî cûreyî û înkarkirinê bivîne? Caba vê pirsê zelal e, lê usa jî kûr e: Ewî tu cara berê xwe ji dawîya Xwe ya bextewar venegerand. Bi mesela Wî em dibînin, ku çawa gerekê serpêhatîyên xwe binivîsin:

“Berê xwe bidine *Îsa*, Yê ku ev yek destpêkir û ser hevda anî, nava kîjanêda em in. Wê yekê lêkolîn bikin, ku Ewî çawa ew yek kir. Çawa ku Ewî tu cara berê Xwe ji wî cihî dûrnexist, kuda ew diçû, him nava Xwedê da, him jî tevî Xwedê, li ser wê rê Ewî li ber hemû tiştî- Xaç, şermê..., teyax kir” (Îbranî: 12:2, MSG).

Îsa teyax kir, çimkî ewî zanibû, ku ew kuda diçe. Ewî diha dûr dinihêrî û soz didît.

Nava tercima “Stêndrd”-êye înglîsî da Îbranî 12:1, 2 bi vî cûreyî nivîsar e:

“...Werin em bi sebir berbi wê yekê birevin, çî ku pêşîya me danî ye û çawa himdarê bawerîya me Îsa binihêrin, *Yê ku bona wê şabûnê, ya ku pêşîya Wî haitibû danînê*, xaç hilda ser xwe...” (herfên cudakirî zêdekirî ne).

We ev yek fem kir?: “Ew şabûn, ya ku pêşîya Wî hatibû danînê”. Gelo xaç Îsa dida ruhdarkirinê? Na xêr. Ew awqas nahevketibû, wekî pêşîya cezakirina Xwe temamiya şevê Ewî ji Bavê rêke başqe tewaqe dikir. Feqet li cem Îsa tiştekî usa hebû, kîjan nava gelek zewaca da tune ye. Ewî dikaribû diha zêde tişt bidîtana. Ewî ew qewat û soz didîtin, yê ku bi saya qirarên Wî wê bihatana. Gelo meremê Îsa çi bû? Bersiva wê pirsê Efesî 5 da hatiye nivîsarê:

“... Ewî e'mirê xwe bona wê yekê da (bo Civîna Xwe), bona ku Ew wê yekê werguhêzî tiştekî pîroz û paqij, bi Gotina Xwedê şûstî, bike. *Ewî ev yek bona wê yekê kir, ku civînê werguhêzî ya paqij û bêyî kêmasîya bike.* Dewsa wê yekê ewê pîroz û bêsuc be” (Gotinên 25-27, NLT; herfên cudakirî zêdekirî ne).

Em in dawîya Îsa ya bextewar. Em ew şabûn in, ya ku pêşîya Wî hatibû danînê. Îsa xaç hilda ser xwe, ku bikaribe me ra, Dergîsîtiya Xwe ra, li hev bê. Niha civîn dikare bêyî şermkirina ji feqîriya xwe ya berê li rex Wî be, çimkî nava Wî da şexsîtiya me ya nû heye. Feqet lazim e, ku gumana wê yekê hebe, ya ku dikare pêşerojê da bona me be, ku emir nava çetinaya ra derbaz bibe.

Xudanê nama Îbraniya gotina xwe berdewam dike û ber dilê me da tê:

“Wextê ku zelal bibe, ku hûn nava baweriya xwe da merûm dibin, xal bi xal vê serpêhatiyê, cêrga dijminatîyêye dirêj bixwînin, kîjanê ra Ew derbas bû. *Ew yek wê qewata adrênalinê bide şexsên we*” (Îbrani 12:3, MSG).

Wede da em hemû jî nava baweriyê da bêqewat dibin. Bo vê yekê jî xudanê nama Îbraniya dinivîse *wextê ku*, lê ne ku *eger* hûn bidine zelalkirinê, wekî hûn nava baweriyê da bêqewat dibin. Zewac ne kê m ne zêde dewa baweriyê dike, çimkî *helalî* dide

kiwşê, ku *bi bawerîyê va tijîbûyî bin*. Wextê ku nava zewaca we da çetnayî pêşda tèn, zêrandinên Mesîh bîr bînin. Careke mayîn serpêhatîya Wî bixwînin. Pirsgirêkên we bi çiqwasîva jî bi derd û kula va tijîbûyî bin, ew himberî xaç tu tişt nînin. Wextê ku helalîya we ya hindava merivê li rex we ditemire, bîr bînin, wekî Îsa hindava we da helal e. Wî hemû tiştî bîr bînin, wekî Ew bona lihevhatina tevî we nava tiştên çawa ra derbaz bû. Mesela Wî wê qewata adrênalînê bide we.

Roj 3

Bawerîya xwe li tiştê herî baş bînin

“... Ez im Xwedê... Yekî mînanî Min tune, ku ez pêşda dawîyê gilî dikim...” (Îşaya 46:9, 10).

Emê tişteki nû nebêjin, ku binivîsin, wekî yekî mînanî Xwedê tune, lê gelek cara em qewata vê gotinê û rastîya wê bîr dikin. Çawa lawên Xwedê, em hatine gazîkirinê, ku mînanî Wî bin û qedirê tebyeta Wî bigrin. Bi bawerîyê em dikarin bibine çêkirçiyên pêşerojê: em dikarin emirên xwe, bidine sazîkirinê, zaroka û zewaca ji dawîyê berbi destpêkê elam bikin.

Me îdî zelal da kiwşê, wekî *emirê wededirêj û bextewar* bi xwe çê nabe. Em wê yekê bi fikirdarî çê dikin. Bona vê gotinê pirs pêşda tê: “Ez çawa dawîya bextewarîya xwe çê bikim?”. Diqewime we gelek cara ev gotin xwendine, lê careke mayîn wê yekê bikin:

“Bawerî eseyîya wan tiştaya ye, ku em tê da gumanin û îzbatîya wan tiştaya ye, ku me va ne xuya ye... Bi bawerîyê me va eyan e, ku dinîya bi xebera Xwedê efrî ye û ew tiştên ku tèn dîtîne, ji wan tiştên ku nayêne dîtîne, çê bûne” (Îbrani 11:1, 3).

Meremê me ew e, ku em *emirê wededirêj û bextewar* çê bikin, yê ku hela hê tune ye. Bawerî ew material e, kîjanê em didine xebatê, ku wê yekê çê bikin, çî ku hela hê rastî nîne.

Xwedê wî çaxî em bawer kirin, wextê ku me hela hê tu tişt nekiribû ku hêja bûya bawer bikira. Bawerîya Wî ye mezin hindava we da heye, çimkî bawerîya Wî ye mezin hindava Wî heye. Ew zane, wekî qewata Wî dikare nava emirê we da hemû tiştî bike. Tiştê tek- tenê yê ku wê nehêle, hûn qewata Xwedê ya bêsinor bibînin, heramî ye, kîjanê nava kubarîyê da koka xwe danîye.

Kubarî netebitîyê, yan jî gumana mezin ya hindava qewatên xwe dide kivşê. Cûrê kubarîyê yê nedîyar (nekivş) heye, kîjan hiznekirina hindava şexsê mêriv da ye. Nava herdu cûra da jî kubarî naxweze wî hemû tiştî qebûl bike, çî ku Xwedê bona me li ser xaç kir, bi saya karê Mesîhî mîaserkirî. Îsa, bona ku me wergehêzî wî cûreyî bike, wefat bû. “Diqewime em razî bin, - K.S.Lyûis nivîsiye, - çawa “merivên sade” bimînin, lê bernama Wî cûrekî mayîn e. Dûrketina ji wê bernamê xweranedîtin û tirsonekî ye. Qebûlkirina vê bernamê gurêkirin e”.

Em wî emirê ecêb qebûl dikin, yê ku ji aliyê Xwedê da hatîye pêşniyarkirinê, wextê ku em fikirdarîya xwe li ser dereca dayîna Wî bilind dikin.

Hûn bawer in, ku hûn layîqî zewaca baş in? Diqewime fikirên vî cûreyî we didine zêrandinê:

“Barê” min yê mezin ji paşerojê heye.

Ez nava malbeta baş da mezin nebûme.

Dê û bavê min ra li hev nehat malbeta baş çê bikin.

Min gelek şaşî kirine.

Ez gerekê bi jîyana bi cûrekî razîbim.

Eger we texmîn nekirîye, Xwedê berxudanê hiz dike, lê kêmasîya bawerîyê wê qewata Wî ya nava emirên me da bide

sînorkirinê. Eyantîya me ya derheqa mezinaya Wî da hebe û ew yek wê usa bike, ku em nava Wî da guman bin û bi wê yekê va tevayî ewê alî me bike, ku em gurê da bin. Bi saya gurêkirinê em tiştê herî baş distînin, çî ku Xwedê bona me hazir kirîye. Îşaya 55:8, 9 dibêje:

“Fikirên min qet mînanî yên we nînin, - Xudan dibêje.- Û rêyên Min ji wî hemû tiştî dûrin, çî ku hûn dikarin texmîn bikin. Çimkî çawa ku ezman ji dinyayê bilindtirin, usa jî rêyên Min ji rêyên we bilindtirin û fikirên Min ji fikirên we bilindtirin” (NLT).

Hûnê jî qayilbin, wekî serwaxtî û karebûna Xwedê ya mezin heye û ew jî ya we mezintir e. “Nava Xwedê da, - Lyûîs dinivîse, - hûn rastî tişteki usa tên, kîjan bi hemû tiştî va zêdetir e”. Hûn gerekê bawerîya xwe li vê yekê binin, eger hûn dixwezî hemû tiştên lazîm bona zewacê bistînin.

Em çî cûreyî jî potênsyala zewaca xwe hesab bikin, xiyalên Xwedê yên derheqa zewaca me da diha mezinin. Ew ne tenê gelekî derheqa wê yekê da fikirîye, lê serbara serda bername hazir kirine.

“Çimkî Ez wan şewira zanîm, wekî ez derheqa we da difikirim, - Xudan dibêje, - şewirên aşîtiyê, lê ne ku yên xirabîyê, ku pêşerojê û gumanê bidime we” (Yêrêmîya 29:11).

Ev soz me li ber bijartinê dide sekinandinê: yan gerekê bawer bikin, ku gotina Xwedê rast e û gumana Wî ya derheqa zewacên me da qebûl bikin, yan jî gerekê bifikirin, ku Ew derewîn e. Bi nihêrandina pêşeroja we, Xwedê eyantîya Kurê Xwe nava we da divîne. Ev yek wê wî çaxî bibe rastî, eger hûn qewata Wî bi gurêkirinê û bawerîyê qebûl bikin. Neniherî wê yekê, ku em emirê *wededirêj û bextewar* progiram dikin, ew yek bi qewatên me va nayê sînorkirinê. Emirê meyî progiramkirî nîşandayîna hizkirina Xwedê ye, yê ku bi saya Ruhê Pîroz dibe rastî, Yê ku nava me da kar dike.

Diqewime, hûn bifikirin: *“Ez gumanim, wekî Xwedê nava pirsra zewaca min da teslîm bûye. Bona me îdî guman tune. Gumana me ya bona pêşrojê tune ye. Me ew texmînkirina dîyarî unda kirîye”*.

Diqewime hûn wî cûreyî texmîn dikin, çimkî we qewatên xwe dane xebitandinê?: cedandinên xwe pevbiguhêrin û hûnê wê yekê bistînin, çi ku Xwedê bona we cuda kirîye. Wextê ku hûn bawerîya xwe li Wî bînin, Ewê xiyalên we hilde, emir bide wana û wê yekê bike dilên we.

Mêrno, ev yek dide kîvşê, wekî Ewê qewatê bide we, ku hûn jina xwe usa hiz bikin, çawa ku Mesîh civînê hiz dike, bêyî tu nîşaneke xwehizîyê. Jinno, Ewê qewatê bide we, ku hûn qedirê mêrê xwe bigrin. Bi vî cûreyî hûn her du jî wê li ser tabîya rast bin, ku tevayî bighîjin û bighîjine mezinaya zewacê.

Încîl zelal dibêje, wekî bêyî bawerîyê meriv nikare kêfa Xwedê bide xweşkirinê (binhêre Îbranî: 11:6).

Bona çi Xwedê bawerîyê awqas hiz dike? Menî ew e, wekî bi bawerkirina Xwedê, em qewatê distînin, ku bibine mînanî Wî, mînanî Wî bijîn, çimkî emirê xwedêtîyê yê herî baş e. Ew jî razîbûna we razîbûnê distîne û em derheqa bextewarîya kurt da xeber nadin, lê derheqa şabûn û razîbûna wededirêj da dibêjin. Xwedê dixweze, çi tiştên here baş ku li cem Wî hene bide zewaca we, lê tiştê herî baş jî nava yekîtîya usa da îzbat dibe, hîmê kîjanî Ew e.

Proje (proêkt)

Gelek cara meriv şaş dikin, bawerîyê û gumanê çawa tişteki hesab dikin, feqet di navbera wan her du tiştên da firqî heye. Eger bawerî matêrîyala zewaca baş e, guman jî projeya wê ye. Bi gilîkî mayîn guman qalib e, lê bawerî ew e, ya ku wî qalibî tijî dike. Bêyî

gumanê bawerî matêriyalê bêcûre ye û kara wê awqas e, çiqwas kara matêriyalê çêkirinê ye, lê bêyî projeya malê.

Bînin bîra xwe, wekî Xwedê bi xwe Birahîm bijart û tevî wî peyman bi meremê mexsûs çê kir. Birahîm gerekê nava rîya Xudan da şîret bidana nisiletên Wî. Birahîm bêzuret bû, wextê ku Xwedê bona wî sozî gazî wî kir, feqet Xudan ew da bawerkirinê, wekî ewê bibe bavê milletê mezin.

Birahîm xweyê bawerîya nebînayî bû, derheqa kîjanî da Încîl dibêje, wekî “bona sozê Xwedê ew dudilî nebû” (Romayî 4:20). Çi jî hebe, nava Destpêbûn 15-da em divînin, wekî hetanî tijîbûna bi bawerîyê, ewî dijî gumanbirîyê şer dikir:

“... Xebera Xudan dîtinkê da Birahîm ra hat û got: “Netirse, Birahîm, ez ji te ra mertal im, xelata te wê gelekî mezin be”.

Hingê Birahîm got: “Ya Xweyî Xudan! Tê çî bidî min? Ezî va bêzuret mame, serwêrê mala min Yêlyazêrê Şamê ye”. Birahîm dîsa got: “Te ku zuret neda min, va ye xulamê mala min da wê dewsa warê min bigre”.

Û awa xebera Xudan hate wî û got: “Ew dewsa warê te nagire, lê yê ku wê ji bedena te bibe, ewê bibe warê te”.

Hingê Xudan ew derxiste derva û gotê: “Niha dîna xwe bide ezmên û steyrka bijmire, eger dikarî bijmirî. Û gotê: “Zureta te wê jî wê awqas be”.

Birahîm bawerîya xwe Xudan anî û wî ew yek jê ra rastî hesab kir” (Destpêbûn 15:1-6).

Me dikaribû fem bikira, wekî Xudanê dereca bawerîyê ya nû bida Birahîm. Feqet dewsa wê yekê Ewî dîtink da bawerîya Birahîm, bi kîjanê va ewî dikaribû xwe bigirta. Vê dîtinkê bawerîya wî da qewatkirinê, çimkî vê yekê cûre (form) da gumana wî. Xwedê Birahîm gazî derva kir, ku steyrka bijmire. Ezmanê

şev bona bawerîya wî projeya steyrka da kivşê. Nava fikirên wî da steyrkên bêhesab jorê dihatine guhartinê û wana sifetên zaroka distendin. Xwedê negote Biraîm, wekî peyîhatiyên wî mînanî wan steyrka bêhesabin. Ewî mesela hertimî, kivş û matêriyali da dîyarkirinê. Bi nîşandayîna vê yekê dîtinoka Xwedê nava fikirdarîya Biraîm da îzbat bû.

Hema bi vî cûreyî jî Xwedê dixeweze fikirdarîya we bide xebatê, bona ku dîtinoka Xwe ya derheqa zewaca we da derbazî cem we bike, çimkî eger dîtinok heye, usa ye guman jî heye. A hema bona vê yekê jî Pawlos got, wekî lazime fikira wî cûreyî xirab bikin, ya ku dijî ulmê Xwedê kubar dibe (binhêre B Korintî 10:4, 5). Hûn gerekê fikirdarîya xwe biparêzin, çimkî ewê binyat û qîmetê kirinên xwe qîrar bike. Derheqa wê yekê da bifikirin, çawa li ser textê xetekişandinê, li ser kîjanî gumana we wê bê kivşê.

Xwedê soz da me, ku me bi gumanê va tijî bike, lê gelo em wê yekê çawa distînin? Ruhê Wî ruhên me bi gumana qewat va tijî dike, wextê ku em dua dikin.

“Ez dua dikim, wekî Xwedê-kanîya gumanê, we bi temamaî bi şabûnê û aşîtiyê va tijî bike, çimkî hûn li ser Wî guman in. Wî çaxî hûnê bi gumana îzbatbûyî, bi saya qewata Ruhê Pîroz qewat bin (Romayî 15:13, NLT).

Xwedê kanîya gumana me ye. Eger em hîvî bikin, Ewê me bi şabûnê û aşîtiyê va tijî bike, çî ku em nava zewaca xwe da dixwezîn. Wextê ku em bi gurêkirinê bèn cem Wî, emê bi gumanê va tijî bibin, bi saya qewata Ruhê Pîroz. Gelo eva sozekî çawa ye!

Nava gotinên Silêman 29:18-da nivîsar e, wekî bêyî dîtinokê emê unda bibin. Bi rastî zewac bêyî dîtinoka xwedêtiyê bêyî jîyan e. Bo wê yekê jî em bangî we dikin, ku xiyalên we yên mezin hebin. Wextê ku hûn hazir dibin xiyal û meremên xwe binivîsin, dua bikin, ku Xwedê dilê we bona femkirina programa Wî hişyar bike.

Roj 4

Rêstorana çînî

Wextê ku em teze zewicî bûn, cîhekî mexsûs hebû û em diçûne wir, ku derheqa pêşeroja xwe da xeber bidin. Ew rêstoraneke çînî bû, ya ku ji mala me gelekî dûr nîbû. Me ûnîvêrsîtê teze xilaz kiribû û perê me awqas hindik bûn, wekî me bona xwe herdua beşeke mirîşka biçûk hildida. Ew atmosfêra edil û usa jî ya bîyanî usa dikir, ku em bikevine nava xiyalên derheqa welatên dûr da û hêvîyên me hebin.

Wî çaxî me gelek tişt nizanibû, lê nava tiştêkî da em guman bûn. Me dixwest bi dil, bi fikir û qewata xwe qulixî Xwedê bikira. Me dixwest, ku emirê me bi açixî derbaz bibe û malbeta baş hebe. Bi rastî gotî, me nizanibû ku emê ku da biçûna, yan jî emê nava emir da bighîştana kîderê, lê me zanibû ku em rîya çawa ra dixwezî derbaz bibin. Me dixwest, ku em usa bijîn, ku Xwedê mîrata nû bi rîya me îzbat bikira.

Ez (Con) jî malbeta baş bûm. Dê û bavê min îdî 65 sal in ku zewicîne. Bavê min bi helalî em hiz kirine û pirsên malbeta me dane çareserkirinê, lê dayîka min karê malê kirîye. Dê û bavê min bona emirê min û zewaca min nava gelek pîrsa da bûne mînaekeke baş û ezê heta- hetayê bona wê yekê razî bim.

Ez (Lîza) jî malbateke başqe bûm. Dê û bavê Con himberî malbeta min cûrekî mayîn bûne. Li malbeta min hukumê alkoholê, zinêkarîyê, zordarîyê, xayîntîyê, jî hev cihêbûnê hebûye. Wextê ku me emirê xweyî zewacê destpêkir, wî çaxî kivş bû, wekî fikirdarîya min a derheqa malbeta saxlem da tune ye, lê min gelekî dixwest, ku ez bibime endameke malbeta wî cûreyî.

Wextê ku me li wê rêstorana çînî da xeber dida, me zanibû, wekî em derheqa zewaca cûrekî mayîn da xeber didin. Em bi

qedirgirtin nêzikî mînaka dê û bavê Con dibûn, feqet ew yek bona me ne rast bû. Me herdua jî zanibû, wekî nava zewacê da hela hê tiştê zêde hene, xêncî çî ku me dîtibû. Bona me zewac ew tişt nibû, ku em hetanî dawîya emirê xwe tevayî bin. Lê merem ew bû, ku bi saya yekîtiya me em mîrata heta- hetayê jî çê bikin. Bêfitiya, ev yek wê derheqa zarok û nebîyên me da bûya, lê ewê usa jî hukumî li ser merivên bêhesab bikira.

Me destpêkir ku em dîtinoka zewaca xwe bînine ber çava. Me pirs didane hevdu, norm qirar dikirin, derheqa awqas tiştên mezin da diketine nava xiyala, çiqwas me dikaribû. Em qayil bûn, wekî meremê meyî ewlin ew bû, ku tevayî qulixî Xwedê bikin û bi qirarên xwe qedirê Wî bigrin. Ev huemû tiştên mayîn wê nava filtir (parzûn) ra derbazbûna.

Nava zewaca 32 salada wedê usa hebûne, wextê ku em bona wê yekê tevayî bûne, ku me qirar kiribû ku em qedirê Xwedê bigrin. Wedekî usa hebû, wextê ku min (Lîza) *texmîn* nedikir, ku min Con hiz dikir, lê Con jî digot, wekî ew min hiz nake. Ewî xwe pêşkêşî grafîka seferê dikir û ez li malê tevî zarokên biçûk dimam.

Bi rastî gotî, wî çaxî gumana min tunebû ku pêşerojê da hizkirina me wê bihata dasekinandinê. Şexsê min ji birînên stendî îdî qenc bû. Min *texmîn* dikir, wekî wî alî da ez tenê mame. Eger jihevcihêbûn cûrê bûyînê bûya, min ê ew rê bibijarta. Feqet bona zewaca me dîtinoka min tunebû. Min tenê sîya vî hemû tiştî didît. Wedekî usa jî hebû, wextê ku ez difikirîm: “*Xwedê, ezê nava vê zewacê da bimînîm, eger Tu soz bidî min, ku ezê mecbûr nebim, ku li Ezmîn tevî Con bijîm*”. Min xwe awqas tenê *texmîn* dikir, lê bona jinên qulixçiya jî çetin bû ku tevî yekî derheqa derdê xwe da gilî bikirana.

Wî çaxî min jî (Con) dijî gumanbirîyê şer dikir. Dihate *texmîn* kirinê, wekî min hal rast qîmet dikir, çimkî Lîza bi cûrê qedirnegirtinê nêzikî min dibû û bi cûrê hişk min ra xeber

dida. Em bi cûrê lez paşda diçûn û me herdua jî mecaleke bona dasekinandina hizkirinê, qedirgirtinê, nedidît.

Ew derdê, ku me texmîn dikir, gelekî xirab bû. Feqet ew yek cûrekî malbetê bû, lê cûre tên guhartinê. Êvara girî dikare dirêj bikişîne, lê Xwedê soz daye, wekî şebeqê çabûnê bê (binhêre Zebûr 30:5).

Bi bîranîna vî hemû tiştî tê texmînkirinê, wekî ew wede ne yê rast bû û tê bêjî ew hemû tişt tevî merivên başqe qewimîne. Bi qewata Xwedê em hindava meremê xwe helal man, kîjan Xwedê dabû pêşîya me. Wextê ku me bi bêqelî xwe ji xwehizîyê tobe kir, em teslîmî serwaxtîya xwedêtîyê bûn, zewac û hizkirina me qewata nû stendin.

Ji van qewata yek, ya ku alî me kir, ku em çetinaya alt bikin, fikirdarîya me ya derheqa emir da bû. Me ew yek çawa wedê 70 yan jî 80 sala qebûl nedikir, lê me ji alîyê heta-hetayê da jîyanê dinihêrî. Himberî emirê heta- hetayê 70-ê yan jî 80-ê sal tişteki gelekî biçûk e. Kitêba Pîroz hîn dike, wekî tabîya me ya hindava xaç wê qîrar bike ku emê jîyana heta- hetayê, *li kîderê* derbas bikin, feqet jîyana me bawermenda wê qîrar bike ku emê jîyana heta- hetayê çawa derbas bikin. Pawlos dinivîse:

“...û hê dixwezin ji wî qalibî derên li cem Xudan bihêwirin... Çimkî gerekê em hemû jî li dîwana Mesîh bisekinin, wekî her kes wek wan emelên qalibê xwe da kirî bistîne, çî ku kiribe, qencî, yan xirabî” (B Korintî 5:8, 10).

Tiştêki ber cava ye, wekî Pawlos derheqa bêbawera da nanivîse, çimkî wextê ku bêbawer ji qalibê xwe derdikevin, nakevine nava hazirîya Xudan. Ew berbirî wan meriva dibe, yên ku bi saya Îsa Mesîhê Xilazkir nava malbeta Xwedê da nin. Em, bawermend, emê li ber Wî bisekinin û bona jîyana xwe û qîrarên xwe cabê bidin. Nava encamê mehkema Mesîh da wê tiştên cûre-cûre hebin. Ewê bi çapên cuda-cuda bin, ji wê yekê destpêkirî,

wekî nava emirê hineka da karê wan ye kirî wê bişewite, lê hinek jî wê jîyana heta-hetayê bistînin û wê li rex Wî padişatîyê jî bikin. Ulm derheqa wê yekê da zewaca me xweyî kir. Ji me tu kesî nedixwest li ber textê Îsa cabê bide, ku bona çî me karê Wî yê efrandar haram kir, yekîtîya zewacê xirab kir. (Eger hûn dixwezî derheqa Dîwanê da diha zêde bizanîbin, kitêbeke Con ya mayîn bi sernavê “Ewên ku bi hueta- hetayê va dilivin” bixwînin).

Piştî wê yekê meremê meyî duda ew bû, ku em diha gelekî dawîya zewaca xwe evîndar bin, ne ku pêşîyê da. Ewî meremî em mecbûr dikirin, ku em nava wedê cetin ra derbazbin û hev hiz bikin, eger me ew yek texmîn nekira jî.

K. S. Lyûîs nivîsîye:

“Hizkirin... Yektîya kûr e, ya ku bi rezedilî û bi femdarî, bi rîya tradîsîya tê xweyîkirinê û qewînkirinê. Ew qewat dibe, mêr û jin jî Xwedê hîvî dikin û distînin. Ew dikarin hizkirina wî cûreyî wî çaxî jî texmîn bikin, wextê ku ew li hev xweş nayên”.

Bêyî şikberî wedê usa hebûne, wextê ku em li hev xweş nehatine. Feqet Xwedê kerem daye me, ku em nava wan wedên cetin ra derbas bibin û Ewê wê yekê jî bona we bike. Roja îroyîn em li hev xweş tên û diha gelekî jî hev hiz dikin, lê ne ku roja zewacê. Ew yek rastî ye û em hîvîyê ne, wekî nava her dehsalîkê da emê nava hizkirinê da diha gelekî bighîjin.

Xwedê dîyarîya dike

Me derheqa xiyalên xwe da li ser kaxwezên rêstoranê dinivîsîn, bi xeberdana derheqa wê yekê da, ku emê çawa wan zaroka mezin bikin, yên ku hela hê tunebûn. Me guvtugo dikir, ku emê çawa wana terbyet bikin, emê çawa borcdarîyên li malê teslîmî wana bikin, çiqwas pere emê bidine wana bona xerc û emê

çawa odên malê nava wan da pareve bikin. Me derheqa mîrata xwe da xeber dida, usa jî derheqa wî hukumî da me xeber dida, yê ku wê qîrarên me yên qebûlkirî li ser zarok û nebîyên me bihişta. Bona me ew yek girîng bû, ku em mîrata ruhanî û finansiyê derbazî wana bikin (binihêre gotinên Silêman 13:22).

Me mala xwe ya pêşerojê dianî ber çava. Bona me ew yek girîng nîbû, ku mala me wê mezin bûya û bedew bûya. Me dixwest, ku mala me ya mêvandar û germ bûya, li kîderê meriva xwe parastî texmîn bikira. Me dixwest, ku ew bibûya cîhekî eşq, li kîderê zarokên me bikaribûna hevalên xwe teglîf (dewat)bikirana.

Me derheqa wê yekê da xeber dida, ku Xwedê bona çî gazî me kirîye û ew yek wê çawa hukumî li ser emirê meyî zewacê bikira. Me rolên jinê û mêr guvtugo dikir. Me qîrar dikir, ku emê çawa finansên xwe pareve bikin û emê çawa bêyî deyîna bijîn. Me usa jî derheqa hemû tiştî da xeber dida, hetanî ku me destên xwe dinihêrî û me li ber çavên xwe didît, ku kaxwezên li ber me tê bêjî bibûn projeya jîyanê, ya ku me dixwest çê bikira.

Li me xweş dihat, ku em bifikirin, wekî wextê ku me bernamên xwe li ser parçên kaxwez dinivîsîn, Xwedê jî ew yek dinivîsî.

“Wî çaxî ewên ku ji Xudan ditirsyan, xeber dan û Xudan guhê xwe da ser, bihîst û kitêba bîranînê li ber Wî hate nivîsarê, bona ewên ku ji Xudan ditirsin û yên ku navê Wî, çawa yê rûmet hesab dikin” (Malaxî 3:16).

Wan roja me derheqa têmayên cûre- cure da xeber dida û nenihêrî wê yekê, ku me gelek tişt bîr kiribû, lê Xwedê bîr anî û ew yek mîaser kir. Xwedê xeberdanên wan meriva dinivîsî, li cem kîjana xofa Wî hebû. Wextê ku hûn zewaca usa didine progiramkirinê, ya ku rûmetê bona Xudanê emir tîne, Ezman derheqa wê yekê da dinivîse.

Roj 5

Bi nivîsara dîtînoka xwe

“... Dîtînokê binivîse û li ser wan xeta bide zelalkirinê, bona ku ewê ku dixwîne, bikaribe bireve” (Hebaqûq 2:2, ESV).

Tu cara bona nivîsara dîtînoka zewaca we dereng nîne. Hûn dikarin aza binivîsin û biguhêrin, hetanî ku hûn bernama femdarî bistînin. Dîtînoka zelal wê qewatên pêwîst bide we, bona ku hûn rîya revê ra derbas bibin, bighîjine xetê.

Ese wede başqe bikin, ku hûn derheqa dîtînoka zewaca xwe da tevî merivên li rex xwe xeber bidin. Eger hûn nezewicîne, beşa xwe ya dîtînokê binivîsin. Cîhekî usa bivînin, li kîderê hûn dikarin bikevine nava xiyala. Xwestinên we gerekê zelalbin. Prînsîp û qîmetiyên xwe qirar bikin, ji xiyalên mezin netirsin. Ev dîtînok wê bibe steyrka Bakûr: ya bona rojên ku wê bîn.

Zewac mînanî marat’ona revê ye, nava kîjanê da xeta destpêkê bi xetên dehsalîya va tê parevekirinê. Gelek mêr û jin hene, xiyalên kîjana yên wedekurt in. Ew hîvîdarin ku malê bikin û zaroka terbyet bikin. Ew xiyal yên baş in, feqet ewê we gelekî dûr nebin, çimkî yên ji wana zêdetir hene û bo wê yekê jî xiyalên xwe berdewam bikin.

Bîra xwe da xweyî bikin, wekî hûn û merivê li rex we tevayî direvin, lê ne ku bi hev ra ketine lehcê. Hûn nikarin tenê wê yekê ser hevda binin. Û bo wê yekê jî hûn gerekê çawa kom kar bikin. Eger destpêka we çetin bûye, bizanibin, wekî dawî wê diha girîng be, ne ku destpêk. Çêkirina bernama we cûrekî qirarkirina xeta we ye. Hûn gerekê dîtînokê daynine li ber xwe, bona ku ew tişt li ber çavê we bin, berbi çî hûn divedînin.

“Çimkî dîtînok hîvîya wedê kivşkirî ye û ew berbi dawîyê diçe, ewê nexapîne. Eger bê texmînkirinê, ku ew disekine, hîvîya

wê bisekine, ewê bê û wê derengî nekeve... Merivê heq wê bi bawerîya xwe jîyan bike” (Hebaqûq 2:3, 4, ESV).

Ew dîtînok, bi kîjanê Xwedê wê piştgirîyê bide we, wê pêşîya we da here û wê rê bona mîaserkirina wê yekê hazir bike. Eger hûn wê dîtînokê li ber çavê xwe xweyî bikin, ewê we nexapîne. Carana hûnê texmîn bikin, ku çi ku Xwedê gotîye, nikare bibe rastî. Rîya we dikare we bibe cîhên usa, li ku weyê nexwesta biçûna û hûn hîvîya wê yekê nîbûn, ku hûnê herin li wir. Gumana xwe bidine li ser Xwedê. Xwedê zane, ku ji we çi gerekê bê dîrxistinê, bona ku hûn rîya xwe ser hevda bînin. Xwedê piştgirê mîaserkirina dîtînoka we ye û Ewê qewatê bide we, wextê ku hewcetîyên we hebin. Feqet hûn gerekê ewê dîtînokê li ber xwe xweyî bikin.

Bernama we gerekê bibe dokûmênta bi jîyanê va tijî, çi ku dide kivşê, wekî ew gerekê du tişta nava xwe da bide dîyarkirinê:

Prînsîb û qîmetîyên bi cûrê zelal qirarkirî

Fikir û qîrarên zelal wê qalibê pêwîst çê bikin bona dîtînoka we, wek mînaka “zewaca me wê Xwedê rûmet bike” yan jî “emê hewcetîyên hev ji hewcetîyên şexsî bilindtir hesab bikin”. Ev tişt bona guvtugokirinê nînin.

Evana gerekê tu cara neyêne guhartinê, yan jî ber hev bîn daxustinê.

Mecala pêşketinê

Bernama baş bersiva hemû pirsê nade, lê zelalkirinê tîne.

Tenê Xwedê derheqê wî hemû tiştî da zane, çi ku li pêşîya we ye, feqet hûn dikarin bere-bere alîyên bernama Wî ye cuda-cuda, bi rêberîya Ruhê Wî eşkere bikin.

Nava wede da dîtînoka we wê nava dorana diha berfireh da bê û wê diha zelalbe. Ewê bibe çawa ya anegorî cûrên çetin.

Ev guhartin dikarin derheqa zarokên we da bin, girêdayî wê yekêra ku ew çend salîne, yan jî ew piştgirîya we dikin, kîjanê hûnê bona karyêrayên hev bidine kivşê.

Awa pênc gavên praktîk, kîjana em pêşniyarî we dikin, ku hûn bernama xwe ya zewacê çê bikin.

1. Dua bikin

Hîvî ji Xwedê bikin, wekî Ew bi Ruhê Xwe nava xebardan, fikir û cedandinênn we da hazirbe. Hîvî ji Wî bikin, ku ew qalibê gumanê bide we, kîjanî Ew dixweze bi bawerîya we tiş bike.

2. Wî hemû tiştî berev bikin, çi ku dilxweş dike

Gotinên ji Încîlê, miqala, serpêhatîya, şikila, xeberên stirana û her tiştên mayînn binivîsin, kîjan tevî we xeber didin.

3. Herine cîhekî usa, li kîderê hûn dikarin bikevine nava xiyala

Hewce nîne, ku hûn cîhekî usa bigerin, li kîderê ew cîh mexsûs be, yan jî biha be. Ew dikare bibe cîhekî sade, mesele kafêya li ser soqaqa we, yan jî kursîkî li parka mehela we.

4. Meremên xwe qirar bikin

Xiyalên we gerekê mezinbin. Tu cara bi meselên wedê niha, yan jî halê wedê niha va neyêne sînorkirinê, kîjan we usa jî paşerojê da dîtine. Hûn dikarin van têma guvtugo bikin: finans, terbyetdarîya zaroka, halê malbetê, pêçketina şexsî, pêçketina ruhanî, rihetî û dasekinandin, karyêrayên xwe, borecdarîyên sosyâlî, tevbûna xweye tevî şuxulkarîya civînê, emirê xweyî civakî û tiştên mayînn.

5. Wê yekê qirar bikin, ku hûnê çawa bighîjine wana

Piştî qirarkirina dîtinoka xwe, halê niha qîmet bikin. Hûn niha li kîderê ne û bi çiqasîva hûn ji meremên xwe dûr in. Halê

xweyî niha qîmet bikin û wan norma, gava, yan guhartina qirar bikin, kîjanê we li ser rîya we bidinesekinandinê.

Nava emirê we da bernama we wê bi gelek cûra pêşda bikişîne. Bi xweyîkirina van tişta bîra xwe da bersiva van pirsra bidin:

Gelo zewaca me wê çawa be, wextê ku em...?

Hela hê zarokên me tunene.

Zarokên biçûk hene.

Zarokên me îdî gihîştine.

Piştî dûrketina zaroka em her du tevayî mane.

Nebîyên me hene.

Hetanî dawîya emirê xwe tevayî bijîn.

Eger hûn zewicî nînin, rastî hevdu tîn, yan jî dergîstîne hûn çawa dikarin bona wê zewacê hazir bin, kîjanê hûn dixwezin pêşerojê da bibe?

We bona terbyetdarîya zaroka, finansa û govekên mayîn, merem danîne pêşîya xwe. Ew merem gelekî mezinin, feqet evê her roj saz bin, bi saya norm, bijartin û tradîsyayên we.

Dora van pirsra bifikirin:

Hûnê çawa byûcêya xwe ya mehê xerc bikin?

Hûnê rojên hêsbûnê yên çawa hildin û hûnê çawa wê yekê program bikin?

Wextê hêsbûnê hûnê çi va mijûlbin?

Gelo hûnê dîsa tevî merivên li rex xwe wede kiviş bikin û rastî hevdu bîn?

Hûnê çawa hevraqayîlnebûnên tevî merivê li rex xwe bidine rastkirinê?

Hûnê çawa wedê xwe tevî zaroka derbas bikin?

Hûnê çawa zaroka terbyet bikin?

Gelo hûn her du jî dixwezin karyêrayê çê bikin û ji malê der bixebitin?

Eger erê, wî çaxî ewê çi cûreyî bibe?

*Hûnê çawa piştgirîya karyêraên hevdu, yan jî meremên
Mezin ên başqe bikin?*

*Hûnê xwendina çî cûreyî bistînin? Xwendina zarokên we wê
ya çî cûreyî be?*

*Gelo mecalên çî cûreyî wê bona hêsbûna zarokên we hebin?
Hûnê çî cûreyî piştgirîyê bidine hewaskarî û talantên wana?*

*Hûnê bona saxlemîya xwe çî bikin (fîzkûltûra, hêsbûn,
xwerin û tiştên mayîn)?*

Hûnê halê xweyî ruhanî çî cûreyî derbas bikin?

Nava ulmê Xwedê da hûnê zarokên xwe çî cûreyî mezin bikin?

*Zewaca we û usa jî malbeta we wê çî cûreyî karê bidin dinîya dor
û ber (civîna xwe, civakê, cîhê jîyanê, cîhê xebatê û tiştên mayîn)?*

Çawa ku me îdî da kivşê, bernama we ya bi hûr-gilî wê bê guhartinê û bere- bere wê pêşda here, bi destanîna serwaxtîyê û cêribandinê. Eva tiştêkî sade ye, feqet gelekî girîng e, ku hûn qalibê bernama xwe îzbat bikin û xwe pêşkêşî normên hîmlî bikin, kîjanê nava temamîya jîyana we da neyêne guhartinê.

Ser Êvêrêstê ra derbas bibin

Bînine ber çava, wekî mêr û jinek dikevîne teyarê. Ew pir şa ne, ku wê herine rêwîtiyê, lê hela hê ne li ser wê fikirê ne, ku ewê kuda herin. Ew tenê zanin, wekî teyare wê wana bibe berbi qewimandinên mezin. Ew texmîn dikin, wekî ewê herine cîhekî usa, li kîderê klîma germ e û tevî xwe tenê kincên bona xweavêxistinê hildane û çend heb jî kincên sivik yên mayîn, bi texmînkirina wê yekê, wekî diqewime êvarê hewa hinekî zivir be. Piştî çend seh'eta teyare dighîje cih û eşkere dibe, wekî ew hatine Nêpalê. Bi fikira wana ew gerekê tevî rêwîtiya bi klîma germ bûna, lê eşkere dibe, wekî ew gerekê hilkişîne çiyayê Êvêrêstê, li kîderê

qewilên hewa sar in. Femdarîye, wekî ew hazir nînin rêwîtîya wî cureyî ya çetin û bi qezîya bikin, bo wê yekê jî ew paşda vedigerine malê. Bi fikira geleka zewac mînanî sefera (rêwîtîya) berbi behrê ye, lê em bêjin, wekî ew diha gelekî mînanî çûyîna li çiyayê wî cûreyî ye. Zewac şabûnê pêşda tîne, lê bi wê yekê va tevayî usa jî xebateke giran e. Neniherî wê yekê, wekî ev mesele çawa ya bêfikir dikare bê texmînkirinê, feqet mirina zewaca nêzikî 25 cara diha zêde ye, ne ku çûyîna li çiyayê Êvêrêstê.

Gelo bona çî ew merivên ku hildikişine çiyayê Êvêrêstê diha bi açix in, ne ku mêr û jinên zewicî. Dîtinoka wan ya derheqa seferê da heye û ew zanin, ku ew hîvîya çî ne. Ew zendegirtî namînin, wextê ku ew rastî hewa zivir, dereca hewê ya nimiz û bayê tên. Telebextra gelek zewac rûyê tunebûna dîtinokê da diteribin. Hêja ye, wekî hûn niha hinek wede bona çêkirina bernamê başqe bikin.

Hemû tiştî bi cûrê açix bikin

Wextê serpehatîya we, Xwedê wê sînorên dîtinoka we bide berfirehkirinê û wê bi cûrê bedew bixemilîne. Ewê tu cara wî emirî xirab neke, kîjanî hûn her du çê dîkin. Diqewime wextê derbasbûna nava tengasya ra hûn texmîn dîkin, wekî Xwedê dicêribîne dawîya serpehatîya we bîne. Diqewime hûn bi hêrsê û acizbûnê tijî bibin û hûn bixwezî Wî gunekar bikin. Feqet bizanibin, wekî Xwedê xudanê tengasîyên we nîne û Ew hemû tiştî dike hevkarê rehmê (Romayî 8:28). Keremeta Wî û Ruhê Wî tu cara wê jî we dûr nekevin. Ewî soz daye, wekî wê tu cara îzinê nede we, ku hûn nava tengasîyên usa ra derbas bibin, kîjana hûnê nikaribin alt bikin.

“...lê Xwedê amin e, ew nahêle, ku hûn jî qewata xwe der bêne cêribandinê. Ewê cêribandinê da delîlekê jî bike, ku hûn bikaribin teyax bikin (A Korintî 10:13).

Carna hûn dikarin texmîn bikin, wekî tişt xirab dibe, unda dibe, feqet eger hûn nava gumanê da qewîn bimînin, hûnê bikaribin bagerên xwe bidine sistkirinê. Wextê ku hemû tişt îdî gotî be û kirî be, hûnê gotina Xudan guhdar bikin:

“Xulamê baş, rehm û amin...” (Metta 25:23).

Gelo ew yek tiştê hewaskar nîne, wekî Xudan xebera “baş”, lê ne ku ya mayîn dide xebatê. Ji me tu kes nava wî emirî da bi cûrê îdêalî najî, lê em dikarin *baş* bijîn û zewaca me jî baş be. Ev yek dide kivişê, ku emirê zewaca me gerekê bi cûrê aqilmendî û nava gurêkirinê da derbas be, bi hînbûna ji şaşîya û bi cedandina berbi keremeta Xwedê, bona ku em tiştê herî baş bistînin, çi ku li cem Wî heye. Eger hûn evê rê bibijêrin, zewaca we wê ne tenê bijî, lê wê pêra jî gulvede. Xwedê wê alî bike, ku hûn şuxulkariya xwe ya qenc ser hevda bînin.

“... Em dixwezin, wekî ji we her yek... hetanî dawîyê li ser gumana tam be, bona ku hûn xweranedîtî nîbin, lê mînanî wan meriva bin, yên ku bi bawerî û sebira xwe sozdayîna distînin” (Îbranî 6:11,12, ESV).

Xwedê dixweze, ku hûn sozdayînen Wî yên derheqa zewacê da bistînin. Bi wê gumanê bin, kîjanê Ruhê Wî dide. Tevî merivên li rex xwe bin û bawer bin, wekî zewaca we dikare bê guhartinê. Hûnê zendegirtî bimînin, wextê ku bivînin, ku Xwedê nava emirê we da çi dikare bike. Xwedê dicedîne zewacên usa çê bike, parçên serpêhatîya kîjana ya here hewaskar dawî ye, lê ne ku destpêk e.

Ders: Roj 1

KARÊ DERECEBILIND NAVA ÊTAPA HAZIRKIRINÊ DA

*Belê, em çêkirçiyên wî ne, yekîtiya Mesîh Îsa da xuliqî bona kirinên
qenc, kîjan ewî zû va bona me program kirine.*

— Efesî 2:10, NLT

Ew çî ku Xwedê çê dike, bi meremekî ye û zewaca we jî wî cûreyî ye. Ew dixweze zewacê bike karê keremeta xweye bilind-bi saya Ruhê Xwe, Yê ku bi Xwe nava emirê we da ye.

Wî wedeyî bîr bînin, wextê ku hûn nezewicî bûn, yan jî dergîstî bûn. We çî cûreyî zewaca xwe texmîn dikir. Dilê we û fikira we da texmînkirinên îdêaliye çî cûreyî hebûn?

Bi çiqasîva zewaca we jî fikirên we cuda dibe?

Xwedê zewac çawa hec program kirîye. Ew yek bona temaîya jîyanê peymanê—“ku hetanî mirinê jî hev cihê neke”. Her tevbûyekî wê peymanê xwe pêşkêş dike û hemû rêsûrsên xwe dide merivên li rex xwe. Çetinayên her yekî dibine çetinayên yên mayîn. Her du jî sond dixun, ku hev biparêzin û piştgirîyê bidine hevdu.

Xudan û terîfkir Bob û Odrî Mêysnêr fikirên xwe yên derheqa wê yekê da raber dikin:

“Ew hec ya xwedêtîyê ye. Încil derheqha wan duakirina da zelal xeber dide, kîjan tèn wextê ku em wê peymanê xweyî dikin. Dikevine nava wê yekê milahîmî, finansên duakirî, çareserî û aminayî, emirê wededirêj, saxlemî û xeysetê xwedêparastîyê... Nava qewilên heca rast da em aza teribandin û çetinayên, ku diwekilin qebûl dikin, çimkî em zanin, wekî emê neyêne înkarkirinê, eger em helal bin. Merivê li rex me, yê ku wextê wan dijwarîya tevî me ye, dikare aza derheqa rastîyê da bi hizkirin xeber bide, bona ku alî me bike, ku em dijwarîya alt bikin. Eva jîyana nava heca Mesîh da ye, ya bi cûrê herî baş”.

Xwedê derheqa wê hecê da çi dibêje we? Ji xwe pirs bikin: “*Gelo zewaca min, zewaca hecê ye? Gelo ez hazirim, ku zewaca min wî cûreyî bê?*”. Dua bikin û hîvî ji Ruh bikin, ku Ew alî we bike, ku qewatê bide we.

Bona peymana zewaca we meremê Xwedê yê mezin heye, yê ku diha gelekî derheqa we û merivê li rex we da ye. Ew dixweze, ku yekîtîya we mînanî yekîtîya Brahîm û Sarayê be, ku pêşerojê da bona hizkirina Wî û rastîyê rê veke. Bi xwe pirsê bidine xwe û Xudan: “*Zewaca min bi çi cûreyî û hukumî li ser kê dike?*”.

Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, ez çawa dikarim heca Te derbasî zarok, nebî û wan meriva bikim, yên ku nava dorana hukumê min da nin?”

Bi bêdengî nêzîkî Xwedê bibin. Guhdar bikin, ku Ew derheqa wedê niha û pêşerojê da çi xeber dide. Gotinên Wî binivîsin û kerema Wî ya bona gurêkirinê hîvî bikin.

Ders: Roj 2

NAVA AGIR DA PIJYAYÎ

“Hevalno, wextê ku bi rastî emir dijwar dibe, neyêne li ser wê fikirê, wekî Xwedê kar nake. Dewsa wê yekê şa bibin, ku hûn merkeza vî hemû tiştî da nin, ku Mesîh çî dît. Eva şuxulkariya paqijbûna bi ruhanî ye û rûmet nêzikî we ye.”

— A Petrûs 4:12, 13, MSG

Zewac prosêsa paqijbûna ruhanî ye û Xwedê ye, ku we paqij dike. Ew xudanê pirsgirêkên we nîne, feqet Ewê wana bide xebatê, ku we û merivê li rex we bike mînanî Îsa.

Werin em bêqelp bin, tu kes tengasîya hiz nake. Eger me bikaribûya dora wan dijwarîa ra derbazbûna, meyê hema usa jî bikira. Feqet qîmetê rîya dijwar jî heye.

Dora wan rastîya bifikirin, kîjan derheqa kara tengasîya da nin. Me rastkirinên mexsûs kirine, bona ku bikaribin wan xebera nêzikî zewaca we bikin.

“Feqet Xwedê bi hûrgilî haj pê heye, ku çî tevî min û merivê li rex min diqewime û wextê ku ew lê binihêre, Ewê awqas paqij elamî min bike, mînanî zêrê rast”.

— Îbo 23:10, TLB

“Xudan, Te min û merivê li rex min paqij kirîye, çawa zîv nava cihê helandinê da... Em nava agir û avêra derbas bûn. Feqet dawîyê te em anîne nava dewlemendîyê û zêdayê”.

— Zebûr 66:10, 12, TLB

“Bi rastî (jin û mêr) wê yekê çawa pêşkêş hesab bikin, wextê ku çêribandin û çetînayî ji hemû alîya va tîn ser we. Hûn zanin,

wekî bin hokum da emirê bawerîyê eşkere dibe û rengên xwe yên rast dide kivşê. Dêmek necêribînin ji wede zûtir ji tişteki aza bibin. Îzinê bidin, wekî ew karê xwe bike, bona ku hûn bighîjin û pêşketî bin, ku nava tu pirsekê da bin nekevin”.

— Aqûb 1:2-4, MSG

“...Tengasî wê bidine kivşê, wekî bawerîya we rast e. Ew usa tê lênihêrandinê, çawa ku agir zêr kontrol dike paqij dike, nenihêrî wê yekê, wekî bawerîya we ji zêr bihatir e. Dêmek, wextê ku bawerîya we wextê derbasbûna nava tengasîya ra qewîn bimîne, ewê pesindayîna mezin bona we û merivê li rex we, usa jî qedir û rûmetê bo we bîne...”.

— A Petrûs 1:7

Bi kurtayî derheqa halekî konfliktîyê da gilî bikin, rastî kîjanî hûn û merivên li rex we tîn.

Bi rîya van gotina, gelo Ruhê Pîroz derheqa we û merivê li rex we, usa jî wî halîda çi dide kivşê?

Eger hûn bizanibin ku nava merivê li rex we da şaşî kîjan e, ew yek wê alî we neke ku bê guhartinê. Guhartin wî çaxî destpê dibe, wextê ku hûn pê dihesin, ku çi gerekê nava xwe da bidine rastkirinê. Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz li dilê min û fikira min da çi diqewime? Tu dicedînî çi biguhêrî? Gelo fikirên min yên derheqa min da şaşin? Alî min bike, ku ez dengê Te guhdar bikim û gura gotinên Te bikim, bi navê Îsa”.

Ruhê Pîroz vê rastîyê derheqa min da elam dike...

Ruhê Pîroz min ra dibêje, ku ez van gava biavêjim...



Ders: Roj 3

BAWERÎ, GUMAN Û GURÊDABÛN

“Bila Xwedê- kanîya gumanê, bi rîya bawerîya hindava Xwe da we bi şabûnê û aşîtyê va tijî bike. Wî çaxî hûnê bi qewata Ruhê Pîroz guman bin.”

— Romayî 15:13, GW

Bawerî matêriyalê çêkirinê yê bona çêkirina zewaca me dide, lê guman jî projeya wê zewacê ye, kîjanê gerekê mîyaser bikin. Xwedê çawa kanîya gumanê hindava we merivê li rex we bawer e. Li ser Wî guman bin û Ewê bona zewaca we projeya Xwe bide, Ewê qewatê bide We, ku zewaca we ya nava xiyala da mîyaser bibe.

Nava kitêba xwe ya *“Biraîm, yan jî gurêdabûna Bawerîyê”*- da serwêr F. B. Mèyêr şirove dike:

“Bawerî ew toximê biçûk e, yê ku nava xwe da hemû rengên emirê mesihîtyê dide kivşê, yê ku hîvîyê ye, ku qewatê bidinê û duayê Xwedê hebe. Wextê ku meriv *bawer dike*, li wir tenê pîrsa xwendinê û wede dimîne, bona ku ew toxim bighîje... Bawerî usa xwe tevî Kurê Xwedê dike yek, wekî em tevî Wî Yek in, temamîya rûmeta nava xeysetê Wî da... derheqa meda ye”.

Bi vî cûreyî, bawerî çî ye? Ji kîderê ew çê dibe? Meriv gerekê çî bike, wekî ew nava emirê we da diha qewat bibe? Bi guhdarî dora wan cumila bifikirin û binivîsin, ku Ruhê Pîroz çî elamî we dike?

Romayî 1:11, 12, 10:17, 12:3 • Îbranî 11:1, 6 • Efesî 2:8 • Kolosî 2:6-8

Xêncî bawerîyê hewcetîya we heye, ku hûn projeya ji aliyê Xwedê da dayî, ya bona yekîtya we bistînin. Bisekinînin û dua bikin: “Xudan bona zewaca me projeya Xwe ya xwedêtyê dayne

di hundurê dilê min û merivê li rex min. Te çawa mesela steyrkên ezmîn da Biraîm, wî cûreyî jî dilên me çê bike, kîjanê em dikarin fem bikin û heta- hetayê bîr bînin, bi navê Îsa”. Guhdar bin û binivîsin wî hemû tiştî, çî ku Xudan elam dike.

Kilîteke usa heye, kîjan gerekê li cem we hebe, ku hûn bawerîyê û gumanê bistînin. Ew yek *gurêdabûn e*. Gurêdabûn dibêje: “Ez bêyî Te nikarim bikim, Xudan, feqet ez dikarim bi saya Te hemû tiştî bikim”. Wextê ku dilê we wî cûreyî ye, wî çaxî zewacê tiştê herî baş bistîne, çî ku li cem Xwedê heye.

Xödanê sedsala 19-a û serwêr Êndryû Myûr gotîye: “*Îsa hat, ku şikestîbûnê vegevine li vî welatî û me bike tevbûyên wê û bi wê yekê me xilaz bike... gurêdabûna Wî xilazbûna me ye. Xilazbûna Wî gurêdabûna me ye... Em tenê bi saya Mesîh bi rastî şikestî ne, Yê ku nava me da bi şikestîbûna Xwe ya xwedetîyê dijî*”.

Bi guhdarî dora van gotina bifikirin. Xwedê çî elamî we dike.

Metta 11:28-30 • Yûhenna 13:1-17 • Filîpî 2:1-11 • Aqûb 4:6 • A Petrûs 5:5

“.. *Emir bi sebir û gurêdabûnê qebûl bikin, ber hev daxun, çimkî hûn hev hiz dikin. Bila meremê we nava Ruh da yek be û wî çaxî hûnê tevayî nava aşîtyê da bin*”.

— Efesî 4:2, 3 Philips

Ders: Roj 4

TEVAYÎ DERHEQA TIŞTÊN MEZIN DA BIKEVINE NAVA XIYALA

“Her du tevayî dikarin diha gelek tišta mîyaser bikin, ne ku yek, ku du cara kar bike, çimkî feydayên wana wê diha baştir bin... Sisê diha baş e, çimkî têlê sêbare rihet naqete.”

— Zanebûn 4:9, 12, TLV

Bername Xwedê bona her jinekê û mêrekî jîyana nava mezinaya zewacê da ye. Wextê ku Ruhê Wî Yê Pîroz merkeza yekîtiya we da ye, hûn û usa jî merivên li rex xwe dikarin bighîjine tiştên mezin.

Hûn dixwezin ku emirê we li ser dereca bilind be? Bona wê yekê, bona ketina nava xiyala, xiyalên derheqa tiştên mezin da, wede başqe bikin. Dawîya wî serê kitêbêda emê we hîn bikin, ku hûn dîtînoka zewaca xwe binivîsin. Hema niha dikarin bona wê yekê xwe hazir bikin.

Çend ciha nav bikin, li kîderê hûn û merivê li rex we bi hizkirin wedê xwe derbas dikin, kîjan rihetîyê pêşkêşî we dikin û li kîderê hûn dikarin aza bikevine nava xiyala.

Bersivên xwe guvtugo bikin, lê paşê çend cihîya bivînin, li kîderê hûn dikarin rastî hevdu bîn û tevayî bikevine nava xiyala.

Wextê ketina nava xiyala hûn û merivê li rex we dikarin bi bêqelpî dilê xwe vekin û derheqa wan kara da bifikirin, kîjana hûn tevayî dikarin bi qewata Xwedê, bi serwextîyê û milahîmîyê mîyaser bikin. “Çawa jin û mêr hûn tevayî çi dikarin bikin, ku bighîjine feydayên hê mezin”, -xudanên kitêba Bîl û Pêm dipirsin.-

“Bi cûrê giran bifikirin... Bona ku bizanibin, ku gelo hûn berbi xiyala diçin, yan na? Hûn gerekê çend meremên xwe binivîsin, kîjan wê bidine kivşê, ku hûn çawa bighîjine xiyala xwe. Merem gerekê *dîyarkirî... rastî... û bi alîkarîya Xwedê nêzik be*”.

Bona qirarkirina merema hûn gerekê tevayî diha gelekî nava matêrîyalên xwendinê yên rojtira mayîn da xeber bidin. Lê niha xiyalên çawa dilên we da hene? Derheqa wê yekê da bifikirin, ku hûn bona heleqetîyên xwe, terbyetdarîya zaroka, çareserkirina finansî, xwendinê û karîyêrayê, çêkirina malê, yan jî kirîna wî û tiştên mayîn da çi dixwezîn.

Xiyalên min ên here mezin derheqa zewaca me da evin...

Bi xiyalên xwe va bi hev ra fikirên xwe nivî bikin û wana binivîsin û paşê hîvî ji merivê li rex xwe bikin, ku ew jî wî cûreyî bike.

Xiyalên merivê li rex min, yên derheqa zewaca me da evin...

Gelo xiyalên we hinekî anegorî hev dibin, yan na? Gelo tiştên tomerî hene? Derheqa wê yekêda guvtugo bikin.

Xiyalên here mezin yên tomerî yên nava zewaca me da evin...

Bîr bînin: “Hûn zanin, wekî Xwedê hemû tiştî dikare bike, diha zêde, ne ku hûn dikarin bifikirin, yan jî nava xiyalên xwe yên mezin da binivînin” (Efesî 3:20, MSG). Bi duakirinê xiyalên xwe teslîmî Xudan bikin û hîvî bikin, ku Ew van gavên zelal nîşanî we bike, bi kîjana hûn dikarin nêzikî xiyalên xwe bibin.

Ders: Roj 5

DÎTINOKA XWE BINIVÎSIN

“Dîtinokê binivîse û li ser wan texta bide zelalkirinê...”

— Hebaqûq 2:2, KJV

Niha wextê ku hûn tevî merivê li rex xwe ketine nava xiyala gava bi sirê ew e, ku hûn dîtinoka xwe binivîsin. Heyîna dîtinokê dide kivşê, ku derheqa zewaca we da xiyala bi rastî heye, bona kîjanê hûn û merivên li rex we dikarin bi rêberîya Xwedê û kerema Wî tevayî kar bikin.

Xudan, profêsor û şewirmendê malbetî **H. Norman Rayt** derheqa dîtinoka da fikirên qîmetlû pêşniyar dike:

“Dîtinokê meriv dikare çawa têradîtin nav bike, kîjan bi girîng hesabkirina înfomasîyaên derheqa halê niha û mecalên wan da, usa jî bi qîmetkirina dersên paşerojê tê kirinê. Dîtinokê jî meriv dikare qîmet bike çawa tiştê ku nayê dîtinê, yan jî wana bikine yê dîtinê. Ew dide kivêş, ku şikil fikira we da derheqa wê yekê da heye, ku rojên pêşîya we da çi gerekê bibe, biqewime, yan jî çawa gerekê bibe. Dîtinok jî şikil e, li ser kîjanî hela hê qewilên ku tune ne, hatine kişandinê. Ew yek dide kivşê, ku meriv li ser pêşerojê tê merkezkirinê, lê ne ku dikeve nava wedê derbasbûyî û niha û navhev dikeve. Dîtinok prosêsa sazkirina pêşeroja baş e, bi qewat û rêberîya Xwedê”.

Dîtinoka zewacê ya bi açix xweya prînsîp û qîmetiyên mezin e. Lez çend norma binivîsin, kîjan nayêne guvtgokirinê, bi kîjana hûn û merivên li rex we dixwezîn bêyî ber hev daxustin anegorî wê yekê bin.

Wek mînak, ji hevraqayîlnebûna dûr bimînin, ji deyînkirinê dûr bin, her dem bona baxşandinê hazir bin, tu cara hev nuxsan nekin û tiştên mayîn.

Careke mayîn şirovekirina dîtînokê bixwînin, ya ku Rayt nivîsîye. Ew çi dibêje we? **Meremên wedekurt** yên çi cûreyî li cem we hene, yên usa, wekî hûn û merivê li rex we dixweze sala tê bighîjê?

Bona zewaca we meremên wedê navîn yên çi cûreyî hene? Nava ji pêncê hetanî deh salên pêşîyê da meremên we yê çi cûreyî hene? Bîra xwe da xweyî bikin, wekî hûn gerekê zelal û rast bin, li ser wê yekê xwe bidine merkezkirinê, ku hûn çi dixwezin bivînin.

Nava zewaca we da **meremên wededirêj** yên çi cûreyî hene? Gelo meremên zelal hene, wekî hûn dixwezin nava 20-30-î salên bi sire da bighîjinê? Derheqa pênsîyaê, nebîya, qulixê, hêsbûnê, yan jî sefera (r'êwîtîyê) û tiştên mayîn da bifikirin.

“Feqet van tiştta, kîjana Ez program dikim, wê carekê ra mîyaser nebin. Wede hêdî, qewîn û bi îzbatî nêzîk dibe, wekî ew dîtînok mîyaser bibe. Eger tê texmînkirinê, ku ew hêdî- hêdî diçe, gumanbir nebin, çimkî ev hemû tişt wê ese mîyaser bin, tenê gerekê sebira we hebe. Ewê qet rojekê jî derengî nekeve.”

PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

*Eger hûn vê kitêbê nava doranên dersên tomerî da, yê nava dersên
“Serpêhatîya derheqa zewacê da”, ya “Berevoka Mêsincêr”, lêkolîn
dikin, vidêoya dera ya duda temaşe bikin.*

- 1| Gelek mêr û jinên zewicî “bi rêjîma wa gotî tenê jîyanê” dijîn. Feqet Xwedê naxweze, wekî zewac tenê bi formalî derbas bibin. Ew dixweze, wekî zewac gulvedin, pêşbikevin. Çend deqa bona vê yekê başqe bikin û bi hev ra fikirên xwe nivî bikin, ku bona çî ew yek girîng e ku nava zewaca we da dîtinoka wî cûreyî hebe, ya ku diha gelekî mezin e, ne ku hewcetîyên we û yê merivê li rex we.
- 2| Bêyî şikberî hûnê wextê zewacê rastî dijwarîya bèn. Hûn û merivê li rex we du şexs in, yê ku nava prosêsa yekbûnê da nin. Nava Îbranî 12:2, 3-da progirama cêribandî tê raberkirinê, bona ku dijwarîya alt bikin. Bi guhdarî vê beşê bixwînin û stratêjîya Xwedê qirar bikin, kîjan ew e ku we mînanî zêrê paqij ji nava agir derxin.

Berê xwe bidine Îsa, Yê ku ev prosês him destpê kir û him jî ser hevda anî, nava kîjanê da nin em. Lêkolîn bikin, ku Ewî çawa ew yek kir. Çawa ku Ewî tu cara berê xwe ji wê derê venegehand, kuda ew diçû, - ji dawîya bexteware nava Xwedê da û tevî Xwedê, li ser rê Ew karibû li ber her tiştî- Xaç, şermê û bona hemû tiştî teyax bike. Lê niha Ew li cihê rûmetê ye, li rex Xwedê. Wextê ku hûn bidine zelalkirinê, ku nava bawerîya xwe da hûn zeyîf dibin, careke mayîn xal-bi xal vê serpêhatîyê bixwînin- ewê cêrga dijminatîyê ya dirêj, kîjanê ra Ew derbas bû, qewata adrênalînê bide şexsên we.

— Îbranî 12:2, MSG

- 3| Kubarî îzinê nade me, ku em bighîjine tiştê herî baş, çi ku Xwedê bona me dixweze. Gelo we îzin daye, wekî kubarî dîtinoka nava zewaca we da bide sînorkirinê? Hûn çi gerekê biguhêrin, wekî ewê zewacê bikine rastî, ya ku Xwedê bona we hazir kirîye?
- 4| Zewacên bextewar û saxlem, yên ku dighîjine mezintayê, dîtinokên wan hene. Dîtinoka baş bi bernama rast va tê piştgirtinê. Her mêr-jinek bernama xwe anegorî wê yekê dikin û mêr û jin xwe pêşkêşî mîyaserkirina wê yekê dikin. Nava zewacê da hinek goveka nav bikin, kîjana da pêwîst e ku dîtinoka bi hûrgilî hebe. Bona çi nivîsara bernama zelal gelekî kardar e? Bona çi ew yek girîng e, wekî dîtinok nava wede da bê anegorîhevkinê û guhartinê?

Serwêr: teslîmî koma xwe bikin, ku Hebaqûq 2:2, 3 û Gotinên Silêman 29:18 bixwînin.

- 5| Nava Metta 25:23-da xulamê “bi reh’m û helal” layîqî pesindayîne bû. Bona êkonomîya “baş” ew ji aliyê axayê xwe da hate qebûlkinê. Zewaca îdêalî û ya baş yek nînin. Gelo çawa meremê zewaca îdêalî dikare îzinê nede me ku zewaca me baş be? Zewaca baş çîye, ya ji aliyê normên me, qirar, yan jî şaşîyên me da hesabkirî?

TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Serpêhatîya zewaca we tenê derheqa we da nîne. Ew derheqa her merivekî da ne, yên ku nava emirê we da nêzîkî we û merivên li rex we da nin û ew yek jî hukumê xwe li ser nisiletên nû, bi saya mîrata we, dihêle.
- Zewac him bona jîna, him jî bona mêra cîhekî usa îdêalî çê dike, ku mînanî Mesîh bin. Ew bona Xwedê rûmeta mezin tîne, çimkî Xwedê bi rîya zewacê eyan dibe.
- Bawerî bona zewacê matêriyalê çêkirinê yê îdêalî ye, ya ku hela hê mîyaser nebûye. Guman ew proje ye, yan jî dîtînoka ji aliyê Xwedê da dayî ye, ya ku bi rîya bawerîyê çê dibe.
- Gurêdabûn derî bona tiştê herî baş ve dike, çî ku li cem Xwedê heye. Bi saya gurêdabûnê, em qewata Xwedê qebûl dikin, bona ku em mezinaya zewacê usa texmîn bikin, çawa ku Ewî daye programkirinê.
- Neniherî halê zewaca we yê niha ew dikare werguhêzî emirê wededirêj û bextewar bibe.
- Derheqa zewaca xwe da dîtînoka bi jîyanê va tijî binivîsin, kîjanê nava wede da pêşbikeve û nava kîjanê da wê gumanên we, xiyal û normên we wê hebin.



— SÊ —

Erdê li ser gemîyê paqij bikin

Erdê li ser gemîyê paqij bikin: Ev dide kivşê, ku bona tişteki xwe hazir bikin, pêşda hemû tiştî rast bikin, çi ku dikare bona pêşdaçûyîne dijawariya pêşda bîne.

Roj I

Ev têrmîna behrê pêşda çawa emirkirin e, ya ku li ser wê gemîyê tê elamkirinê, gemîya ku bona destpêkirina şêr xwe hazir dike. Çawa ku ev emirkirin tê bihîstinê, merivên li ser gemîyê gerekê hemû tiştên li ser erdê wê, haceta, şirîta, yan jî tiştên mayîn bidine alîkî, kîjan dikarin dijawariya pêşda bînin, bo we yekê paqij bikin ku ew li ser gemîyê aza herin û bîn. Roja îroyîn ev têrmîn derheqa her hazirîkê da ye, ya ku îzinê dide bêyî dijawariya derbasî karê xwe bibin.

Serê kitêbêyî derbazbûyî da me derheqa zewacê da çawa projeya sax û pratîk xeberda. Meremê evî serê kitêbê ew e, ku derheqa wan dijawariya da xeber bidin, kîjan dikarin îzinê nedine we, ku hûn pêşda herin û dijawariya zewacê texmîn bikin. Meremê

paqijkirina erdê li ser gemîyê ew e, ku îzinê nedin, wekî şîrîtên li ser wir navhevkevin. Eger erdê li ser gemîyê hevdayî nîne, li wir şîrît, yan jî tiştên mayîn hene û eger wî çaxî bagêr rabe, hûn dikarin rûyê wan tiştê da erdê bikevin, çimkî ew tişt wê bikevine nava dest-pîyê we.

Em dixwezin alî we bikin, ku hûn bi gemîya xwe berbi pêşerojê herin û wî hemû tiştî hildin, çî ku bona we lazim e. Û bi wê yekê va tevayî wî hemû tiştî jî gemîyê biavêjin, çî ku dikare gemîyê giran bike, nehêle pêşda here, yan jî berbi paşerojê vegerin. Gelek meriv ne tenê li ser gemîyê dişimitin, dikevin û zyanê didine xwe, lê gelek jî carana jî gemîyê dikevin û nava behrêda wunda dibin.

Progîrama Xwedê ya derheqa zewacê da bêyî kêmasiya ye. Feqet usa tê texmînkirinê, wekî zewac kêmasîyên mêr û jina diha zêde dide diyarkirinê. Dewsa wê yekê hîvîyê bisekinin, hetanî ku hûn gemîke jî rê derketî, şikestî, bi barê undakirî, bi şîrîtên qetîyayî biajon, lê em jî dixwezin alî we bikin, ku gemî rast here.

Werin em evê xeberdana derheqa behrê da bidine xebatê. Wextê ku meriv bi zanebûn naxwezî pirsgirêkên hîmlî bidine helkîrinê, kîjan nava heleqetîya da pêşda tîn, tê bêjî ew derdikevine nava behrê û wî cîhê vebûyî didine xitimandinê, yê ku li ser wê gemîyê pêşda hatîye. Ewê hinek wede kar bike, lê eger hukum diha zêde bibe, ew cîhê xitimandî wê dîsa vebe.

Em naxwezî, ku hûn bişimitin, yan jî niqoyî binê behrê bibin. Em dixwezî, ku zewaca we qewîn be û li ber her bagerekê teyax bike, kîjan wê rastî we bê. Bi xebata li ser projeya zewacê ya serê kitêbêyî pêşda, we îdî hinek pirsgirêk dîtine, kîjana gerekê bidine helkîrinê, hetanî ku hûn bikaribin berbi dîtînokê herin. Dêmek, werin em hemû berdaxustina û kêmasîya dûr bixin, kîjan nava xwehizîyê, kubarîyê û xeydê da nin. Werin em jî hemû nifira azad bin, kîjan me didine sînorkîrinê, jî tirsê azad bin, kîjan me dide girêdanê, îzinê bidin, wekî guman bibe wersê me.

Destpêka me

Em zanin, wekî “paqijkirina erdê li ser gemîyê” bi çiqasî va girîng e, çimkî me zewaca xwe wî cûreyî destpê nekir. Em li şêwirdarîya pêşîya zewacê diqesidîn, lê bi rastî me guhdarî nedikir. Wextê ku şêwirmendê me dicêriband me hîn bike çawa gerekê nava hevraqayîlnebûna û avên gur ra derbas bin, em difikirîn: *“Hevraqayîlnebûn? Emê tu cara rastî tiştên usa neyên. Xwedê em kirine yek. Ev şêwir bona wan meriva ye, yên ku mînanî me evîndar nînin. Destê Xwedê li ser me ye”*.

Piştî zewacê çend hevtê derbaz bibûn, wextê ku pirsgirêk pêşda hatin. Gelek wede nelazim bû ku em fem bikin ku em bi çiqasî va şaş bûn. Em zewicîn û em difikirîn, wekî em jin û mêrê îdêalî ne, lê zûtirekê me destpêkir diha gelekî zelal kêmasîyên hev bivînin. Me cedandinên mezin dane xebatê, ku hev biguhêrin. Nava encamên wê yekê da zewaca me werguhêzî şerkarîyê bû, ya di navbera du merivên bi ruhê qewîn. Hesin dicêriband hesin bide tûjkirinê û li dor-berê wê jî pirîsk bela dibûn.

Me hela hê fem nedikir, wekî yekîtiya me hela hê sist û nerm bû. Belê, me bi kûrayî xwe pêşkêşî hev kiribû, lê fikirên me yên derheqa xeysetên me da gelekî bilind bûn, bi taybetî nava pirsên sebirê û xwepêşkêşkirinê da. Kêmasîyên me diha gelek bûn, ne ku em hazir bûn wana qebûl bikin. Lazim bû ku aliyên xwe yên baş jî diha bidana qewînkirinê, bona ku li ber dijwarîyên pêşerojê ew teyax bikirana.

Dewsa wê yekê, ku me usa bikira, ku Xwedê “erdê gemîya me paqij bikira”, me dixwest nava hevda ew yek hel bikira. Ew mêr û jinê ku bawer bûn, wekî Ezman ew çê kirine bona hevdu, ji wî halê xwezilîyê ketibû. Em li civînê hela hê dikenîyan, lê emirê me yê li malbetê îdî mînanî *bernamên “Fêdêrasîyona hemdinîaê ya gulaşê” ya bi têlêvîzyonê dibû*.

Sala zewaca me ya ewlin rojekê di navbera me da halekî sert pêşda hat. Con nedixwest, ku ez (Lîza) ji odê derkevim û gote min, kô ez li ser cîyê me r'ûnêm. Wê þebeqê min dixwest lez derbikevim, çimkî min hela hê tiştêkî usa negotibû, ku rûyê wê yekê da poşman bûma. Min cêriband herime berbi dêrî, wextê ku ewî cêriband min bide rûniştandinê ku tevî min biaxive. Nava encamê wê yekê da ez erdê ketim.

Ez carekê ra rabûm û lempa li ser erdê danî, destê min da bû. Con bi nihêrandineke tirsyayî min nihêrî û bawerîya xwe çavên xwe neanî.

- Eva çî te ra ne?- ewî pirsî.

- Nizanim, - min bi dengê nimiz gotê.

Ew yek awqas bêfikir bû, wekî em her du jî rihet, me derheqa pirsgirêka xwe da xeberda, lê koka wê hela hê helkirî nîbû.

Piştî çend roja min tevî hevaleke xwe nan dixwar. Êpêce wede bû ku ewê mêr kiribû, lê ne ku ez. Ez fikirîm, wekî ez dikarim derheqa dijwarîyên zewacê da tevî wê xeberdim. Feqet dewsa ewê qewimandina girêdayî lempa li ser erdê ra, min qîrar kir xeberdanê bi cûrekî mayîn destpê bikim. Min bi cûrekî nefikirî pirs kir:

- Qet usa qewimîye, ku tu tevî mêrê xwe bikevî nava xeberdanên sert û nişkêva fem bikî, wekî tu bi lempa erdê destê te da rabî ser pîya?

Ewê min nihêrî û da kivşê, wekî pirsra min ya bêfikir bû:

- Na xêr.

- Tevî min jî tiştê usa neqewimî ye, - min lez bersiva wê da.

Bi rastî min derew kir. Hevala min texmîn kir, wekî ew pirsra ku min da qîrîna alîkarîyê bû, lê nerastîya derheqa zewaca me da îzin neda, ku em vê xeberdanê berdewam bikin.

Him Con û him jî ez, me texmîn dikir, ku em ketine nava hesarê. Nava zewaca me da pirsgirêk pêşda dihatin, lê me nizanibû,

ku berbirî kê bibin. Li civînê me derheqa şerkarîya xwe û halê xwe da vedişart. Me zanibû, wekî hevraqayînebûnên me diha sert dibûn, lê me nizanibû, ku em çawa bikin. Bêgumanî û şerm, kîjan rûyê halê me da pêşda hatin, hemû tişt diha xirab kirin. Nava encamên wê yekê da halê sertî li mala me diha xirab bû.

Û ew yek qewimî. Konflîkta me gihîşte dereca here bilind, wextê ku min (Con) Lîzayê xist. Hetanî wê qewimandinê min îdî nava xebendanên sert da qewat dida xebatê (min Lîza def dida), feqet eva cara ewlin bû, wextê ku min wê xist. Carekê ra, bi femkirina kirina xwe, ez tirsîyam û ewê yekê hukumî li ser îsafa min kir. Lîzayê jî derba cabdayînê da min, lê paşê çû odê û derî li ser xwe girt. Em her du jî çûn razên, lê me texmîn dikir, wekî tişteke unda bûye.

Rojtira mayîn, pêşîya çûyîna xebatê, Lîzayê dengê xwe nedikir û diha gelekî dûr ketibû. Dihate texmînkirinê, wekî heleqetîyên me jî pîrozayê û aminayê miqûf mabûn. Em her du jî temamiya rojê dixebitîn û hetanî dawîya hevtîya xebatê dûraya di navbera me da diha zêde bû. Wî çaxî Lîza cabdara firotanê bû û ew bi zanebûn li cîhê xebatê diha zêde dima, dikanên bin cabdarîya xwe da kontrol dikir, nedixwest rastî min bê. Wextê ku ew dihate malê, ewê nedixwest min 'a biaxive, yan jî tevî min şivê buxwe, lê carekêra diçû oda razanê, dikete nava cî, destpê dikir bixwîne. Ez hîvîya dawîya hevtê bûm, ku em bi kutasî bikaribin vî hemû tiştî rast bikin, çî ku qewimî bû.

Sonda min

Wextê ku ez hela hê cahil bûm, genc bûm, min (Lîza) sond xweribû, ku eger mêrê min nişkêva min bixe, ezê bihêlim û herim. Ez malbeteke neqewîn da mezin bibûm û ez bi tirs difikirîm, wekî

ez jî dikarim bibime qurbanîya zordariyê. Wextê ku Con min xist, min derheqa sonda xwe da bîr anî. Min dikaribû qîrar qebûl bikira, ya ku dikaribû emirê min bida guhartinê. Gelo min dikaribû zewaca me xweyî bikira? Gelo min dikaribû merivekî usa hiz bikira, xwe pêşkêşî wî bikira, yê ku min xist?

Li cîhê xebatê hemûya texmîn kiribûn, wekî tişteki gelekî kûr min xemgîn dikir. Serkareke min texmîn dikir ku çi diqewime. Ewê jinê min ra xeberda, ber dilê min da hat û bêyî fikirkirin gote min, ku ez gerekê ji Con dûr bikevim. Ez hîvîya dawîya hevtê bûm, ku Con ji mala me bidime derxistinê. Xêncî xeberdana tevî xebatkarên me, min usa jî kitêba Doktor Cêyms Dobsone *“Hizkirin gerekê berk be”* dixwend, ya ku ez def dam, ku halê xwe diha çetin bikim û bighînimê krîzîsê.

Wê êvarê, wextê ku Con ji xebatê paşda vegeyîya, ew nikaribû biketa malê. Min derî kilît kiribû. Wî çaxî hela hê têlêfonên mobayl tune bûn. Ew li ber derî sekinî û kire gazî: “Lîza, ez hatime, bihêle ez bême hundur”. Paşê min pencere vekir û gotê, ku ez haj pê heme ku ew hatîye, lê ew gerekê here cîhekî mayîn razê. Con bawerîya xwe li gotinên min neanî. Hinek wede derbas bû, ewî fem kir, wekî ezê nehêlim ku ew bê hundur, qîrar kir bi menîya duakirinê û rojîya here mala hevalekî xwe.

Wextê ku ez tenê mabûm, min qîrar kir tevî Xwedê xeber bidim. Ez difikirim, ku duakirina min vî cûreyî destpêbû: “Dêmek, Xwedê, binihêre ez çi pêşniyarî Te dikim. Con hela hê li malê nîne û ew gerekê teze eyantîyê derheqa wê yekê da bistîne, ku bi çiqasî xirab ew nêzîkî min bûye. Diqewime Tu xewineke xirab bidî wî, yan jî bi birûskê wî bitirsînî. Tenê hîvî dikim, wî nekuje, çimkî perên me wê têrê nekin ku wan xerca bikin”.

Feqet min çiqwas bona Con dua dikir, merivê tek- tenê derheqa kîjanîda Xwedê tevî min xeber dida, ez bûm. Xwedê nedixwest derheqa pirsên Con da tevî min guvtugo bike, feqet

dixwest halê dilê min nîşanî min bide. Ewî gote min: “Lîza, hewcetiya te heye, ku qewateke mezin tevî zewaca we bibe. Ez dixwezim tevî wê yekê bibim û tu gerekê bi cûrê qewat kar bikî. Ev yek dide kivşê, wekî tu gerekê bibaxşînî, lê tu jî difikirî, wekî yê pêşberî te layîqî wê yekê nîne”.

Xwedê her dem digote min: “Lîza, tu miqabilî Con hesab xweyî dikî”.

Xweyîkirina hesab

Wextê ku Con û Ez teveyî diketine nava hevraqayîlnebûna, me derheqa pirseke ber çava xeber nedida. Me ew tişt didane xebatê, çî ku nava meha da berev bibûn, bona ku em hev nuxsan bikin. Himê hevraqayîlnebûnên me bêhurmetkirin, gunekarkirin û telayî bûn. Hevraqayîlnebûnên biçûk jî werguhêzî pevçûyînên mezin dibûn.

Ez nava wan xeberdana da, yên ku dirêj dikişandin, neheq bûm û min nedixwest bona wan bêhurmetkirinên ku Con gîhandibûne min, bibaxşanda wî. Rûyê wan birîna da, kîjan nava zewaca me da hebûn, ez ditirsîyam, ku eger ez deynên wî bibaxşînim, minê xwe bikira bin qezîyayê, him bi fîzîkî û him jî bi moralî. Feqet Xwedê gote min, wekî rast e, Con jî merivê îdêalî dût e, lê ew layîqî baxşandinê ye.

Min her dem dicêriband guhdariya Xwedê bida berbi Con, lê ew yek badîhewa bû.

-Bona çî her dem ez gerekê bême guhartinê, - min digot, - ez gumanim, wekî Tê hema wan tiştê bêjî Con, çimkî ewê neyê guhartinê, hetanî ku Tu bi wî ra xeber nedî.

Bi vî cûreyî Xwedê nepaqijîya dilê min dida kivşê. Kubariyê û xwehizîyê zûtirekê serên xwe bilind kirin. Nişkêva ez fikirîm, ku merivê çî bêjine min, eger roja yekşemê şebeqê ez û Con li civînê li rex hev rûniştî nîbin. Min qîrar kir, wekî ezê îzîne bidime wî, ku

ew wede da paşda vegere, bona ku ew kincê xwe xweke û tevî min bê civînê, ku hemû kes bifikirin, wekî li cem me hemû tişt baş e. Ez bona Con û heleqetîyên me xemgîn nibûm, lê ez difikirîm, ku merivê çî bifikirin. Kubarîya min îzin nedida min ku nava vê pirsê da qewata Xwedê texmîn bikim, nava kîjanê da hewcetîya min hebû.

Bi kutasî min terka şerkarîyê da û îzin da Xwedê, ku ew tevî dilê min usa bixebite, çawa ku Ewî dixwest. Piştî şaşîya Con ya mezin jî min qirar kir rola xwe nava wê qewimandinê da fem bikim. Wextê ku ez şikestim, min qewata Xwedê texmîn kir. Şikestîbûn her dem pencerên qewatê vedike.

“... Xwedê miqabilî kubar- babaxa ye, lê keremê dide şikestîya”
(A Petrûs 5:5).

Bona min eyan bû, wekî ez nikarim Con biguhêrim. Tenê Xwedê dikaribû ew yek bikira. Feqet min dikaribû îzin bida, ku Xwedê ez biguhartama.

Rojtira mayîn Con bi cûrekî mayîn guhartî vegeerîya malê. Xwedê tevî wî, wextê salên ewlin yê zewaca me xebitî, û ewî îdî destê xwe li ser min bilind nekir, ku eva îdî serê 30-î salîye ku em tevayîne. Yekîtiya me hate guhastinê û em bi cûrê şikestî nêzikî Xwedê bûn. Ê usa jî em himberî hev wî cûreyî bûn, bi gumana dasekinandina aşîtiyê.

Şîretên vê serpêhatîyê

Xwezî me bikaribûya bigota, wekî birînên wî çaxî stendî nava rojekê da qenc bûn, lê usa nebû. Nava du salêd peyî ra, em hela hê nava halê wî cûreyî da bûn û me dicêriband bi hev ra usa bin, ku rûmetê bona Xwedê bînin. Me şîretên cûre-cûre bihîstibûn, jî wê yekê destpêkirî, wekî em her du gerekê serkarîya wî halî bikin, hetanî ku Lîza jî gerekê hindava min da şikestî bûya.

Rûyê negihîştîbûna me da me gelek cara hev gunekar û rexne dikir. Wextê ku Xwedê xebata başqe tevî me her yekî, cuda-cuda mîyaser dikir. Picştî zewaca me çar sal derbaz bibûn û me xwe şikestî texmîn dikir. Neaçixîyên me hema bi tiştên matêriâlî va girêdayî jî şedetîya wê yekê didan, diketine nava kîjana wek mînak pencera guhartî û tiştên mayîn. Xwedê gumana Xwe ya hindava me da unda nekir. Ewî em ji şaşîya xilaz dikirin û ew hal werguhêzî mecalêng wa gotî “erdê li ser gemîyê paqij bikin” dikir. Xwedê ew hemû tişt dane xebatê, bi kîjana dijmin dixwest zewaca me bida undakirinê.

Nenihêrî wê yekê, me her dem gilî kirîye, wekî pirsgerêkên me hebûne, feqet tu cara awqasî bi hûrgilî me derheqa emirê xwe da xeber nedaye. Niha em naxwezin kirinên xwe bidine afûkirinê, lê em dixwezin piştgirîyê bidin, wekî hemû tişt dikare bê guhartinê. Çawa jî hebe, em zanin, wekî hemû qewimandinên zordarîyê yên li malbeta nînin ku bi açixî ser hevda tîn û em piştgirîya wan meriva nakin, ku nava wî halî da bimînin, nava kîjanî da bona wan û zarokên wana qezîa ye. Eger hûn nava wî halî da nin, cîhekî mayîn bivînin. Derheqa bêqezîyabûna xwe da bifikirin û hûnê alikarîyê bistînin, hewcê kîjanê ne hûn. Hinekî şûnda emê derheqa wê yekê da xeber bidin.

Nava van salên dijwar da, zewaca me bi temamî çawa ya bêguman dihate texmînkirinê. Çi jî hebe piştî 30-î salên derbasbûyî em emirê diha baş derbas dikin, ne ku pêşda. Eva şedetîya kerema Xwedê ye. Ev yek nade kivşê, wekî nava van sala da em neketine nava qûmistana, feqet em zanin, ku eger me qîrar kirîye hev hiz bikin, Xwedê bi helalî em nava qûmistana ra dane derbaskirinê.

Em nizanin, ku heleqetîyên we yên niha çi cûreyî ne, lê em dikarin bidine bawerkirinê, wekî bona we guman heye. Bi guman berbirî Xwedê bibin û îzinê bidine Wî, ku Ew we biguhêre. Hûn nikarin merivê li rex xwe biguhêrin, lê Xwedê dikare. Wê

cabdarîyê teslîmî Wî bikin. Xwedê wê ewê guhar'tina ecêb destpê bike, eger hûn îzinê bidine Wî.

Du gotin derheqa zordarîyê da

Em dixwezin vê yekê bidine zelalkirinê: malxwê hizkirî, destbilindkirina li ser jina xwe tu cara rast nîne. Încîl dibêje, wekî hûn gerekê qedirê wê bigrin (binhêre A Petrûs 3:7). Êrîşên jina we yên bi moralî, yan jî bi fizîkî yên li ser we îzinê nadine we, ku hûn jî wî cûreyî bikin. Eger pêwîst e, ji wir herin. Destê xwe li ser wê bilind nekin, hema wî çaxî jî, eger hûn çawa cabdayîn wê yekê dikin. Eger usa nîbe, hûnê aminaya jina xwe unda bikin. Ewê îdî hembêza we da xwe çareserkirî texmîn neke. Eger we qewata fizîkî daye xebatê, hindava jina xwe, carekê ra li ber Xwedê tobe bikin û hîvî ji kevanîya xwe bikin ku ew we bibaxşîne.

Jina hizkirî, malxwê we dixweze we biparêze. Hema bi vî meremî jî Xwedê qewata mezin daye mêra. Hûn dikarin hesab bikin, wekî êrîşa fizîkî ya li ser mêrê xwe nişana hêrsketinê ye û ew bêqezîya ye eger zîyanê naghîne wî. Feqet ew hindava wan êrîşa gelekî berk dibe. Dixwezî rast be, yan jî şaş, mêr hîmlî bi cûrê fizîkî cabê didin, wextê ku rastî êrîşê tên. Em naxwezin yekî miqabilî yê mayîn defdin, yan jî aliyên xirab bidine hiyarkirinê. Em tenê tiştên baş dixwezin. Eger nêzîkbûna we ya hindava malxwê we ya bêhurmetkirinê ye, tobe bikin û careke mayîn tiştên usa nekin.

Diqewime hûn malbeteke usa da mezin bûne, li kîderê zordarî tiştê qebûlkirî bûye. Diqewime endamên malbeta we bi gotina, yan jî bi fizîkî zordarî dane kivşê. Em dixwezin bêjin, wekî zordarî tu cara mêtoda helkirina konflîkta nîne. Şewirmendîya mesîhîtiyê dikare alî we bike. Hûnê fêrbin, ku bi cûrê aqilmendî halên çetin bidine rastkirinê, him nava emir da, him jî nava malbetê da. Gelek

civîn nava komên biçûk da dersên wî cûreyî pêşniyar dikin. Tu cara ji stendina alikariya profesîonalî û ruhanî şerm nekin.

Eva çawa derheqa mêra û usa jî jina da ne. Eger merivê li rex we xwe nava qezîayê da texmîn dike, ji wî dûrkuevin, careke mayîn bicêribînin aminaya wî qazanc bikin, tu cara necêribînin bi mecbûrî tevî Wî li wir qîse bikin, li kîderê ew qezîayê texmîn dike. Eger hûn usa bikin, halê diha sert bibe û hûnê wî çaxî tiştêkî usa bikin, rûyê çî da hûnê paşê poşmanbin.

Roj 2

Bêhurmetkirin

*Baxşandin dide kivşê, ku girtî aza berdin û
Bidîne zelalkirinê, wekî ew girtî hûn bûn.*

— Lyûîs B. Smîds

Tiştê ewlin, ji çî gerekê hûn erdê zewaca xwe paqij bikin, bêhurmetkirin e. Em zanin, wekî bêhurmetkirin bi jehrê va tijî ye û emê beşa vî serê kitêbêyî mezin bona wê pirsê başqe bikin.

Bi nexwestina baxşandinê, meriv azadiyê unda dike. Merivê ku nabaxşîne, lê xweş tê ku heyfê hilde, lê rêberê wî texmînkirina feqîryê ye. Bi baxşandinê him merivê ku bêhurmet dike û him jî merivê ku hatîye bêhurmetkirinê azad dibin. Gelek meriv bawerin, wekî meriv gerekê hetanî wî çaxî nebaxşîne, hetanî ku heyfê hilnedin. Ji me geleka gotîye: “Ezê wî bibaxşînim, wextê ku ew bê guhartinê”. Feqet nava padişatîya Xwedê da baxşandin tiştê bijartinê nîne. Ew rîya tek-tenê ye. Em çiqwas zêde dibaxşînin, bi awqasî va zêde em dibine mînanî Bavê ezmîn. Eger em dixwezî bibine wekîlên mezinaya Wî, em gerekê qewata baxşandinê qebûl bikin.

Pawlos temî da me:

“Bi baxşandin nêzîkî şaşîyên hevdu bibin û her merivekî bibaxşînin, yê ku we bêhurmet dike. Bîr bînin ku Xudan hûn baxşandin, usa ye hûn jî gerekê wan meriva bibaxşînin” (Kolosî 3:13, NLT).

Gelek cara çetine wê yekê qebûl bikin. Eva pêşniyar nîne, lê temî ye, qewilên kîjanê tune ne. Xwedê dibêje me, ku em her merivekî bibaxşînin, yê ku me bêhurmet dike.

Gelek cara em bi baxşandin nêzîkî teribandînin xwe dibin û wana afû dikin, hêvîdarin ku merivên başqe jî wê hindava me da usa bin. Çawa jî hebe bona me dijwar e, ku em xirabkarîyên merivên başqe bibaxşînin, xwezima jin yan jî mêrên me. Feqet merivê ku nikare bibaxşîne bîr kirîye ku ew çawa hatîye baxşandinê. Ji me geleka fikirdarîke başqe dest anîne, bi bîrkirina wê yekê, ku ji me hemû kes layîqî derbaskirina heta- hetaê ya li cehnemê ne. Xirabkarîya me ya miqabilî Xwedê gelekî giran bû, wekî Ew mecbûr bû Kurê Xweyî tek- tenê bike qurbanî, ku encamên heyî wunda bibin. Mesîh baxşandina Xwe ji ser xaç elam kir, nenihêrî wê yekê, wekî wî çaxî tijîbûna bi telayê diha hêsa bû. Ewî em baxşandin, hetanî ku karên me layîqî baxşandina Wî bûna û em jî gerekê wî cûreyî hindava merivên başqe bin.

Diqewime lazim nîne, ku gelekî dirêj li ber we bê gotinê, ku merivê li rex we yê îdêalî nîne. Tu kes jî îdêalî nîne. Feqet şaşî mecalê çê dikin, ku kerema Xwedê bê kivşê. Hazîrîya baxşandinê şedetîke wî curie ya mezin e, ya ku nava Mesîh da ye.

Bêhurmetkirinê bihêlin

Wextê ku em teze zewicîbûn, ez (Lîza) ji wan meriva bûm, yên ku digotin: “Ezê te bibaxşînim, eger tu bêyî guhartinê”.

Navnîşa bêhurmetkirinên min tenê zêde dibû, çimkî Con hela hê xeysetê xwe nediguhartibû. Ez difikirîm, wekî bi nebaxşandinê ezê wî defdim ku ew bê guhartinê, lê dewsa wê yekê ewî gunekarkirin, bêgumanî û bêqewatî texmîn dikir.

Hemû tişt hate guhartinê, wextê ku Xwedê nîşanî min da, ku ew çawa dibaxşîne. Baxşandina Wî bona xeysetê guhartî kirêdayîn nîne. Ew kivota aminayê ye. Xwedê fikirdariya min ya derheqa baxşandinê da çê kir û xebera min guhart, ew kire anegorî dilê Xwe: “Ez bawer im ku tu dixwezî bêyî guhartinê û ez te dibaxşînim”.

Wî çaxî min fem nedikir, ku bi çiqasî va girîng bû ku min Con bibaxşanda. Paşê min fem kir, wekî telaya min a berbi malxwê min îzin nedida wî, ku ew bê guhartinê, çimkî Îsa dibêje:

“Eger hûn gunekariyên yekî bibaxşînin, ewê baxşandî bin. Eger hûn nebaxşînin, ewê baxşandî nîbin” (Yûhenna 20:23, NLT).

Bi seda sala ser hev ev gotin bi şaşî hatiye xebitandinê û hatiye navhevxistinê, bi xebitandina wê yekê, bona pêşda anîna tirsê û hukumdarîyê. Meremê Îsa ew yek nîbû. Bi lêkolînkirina temamiya qulixa Wî, em dikarin fem bikin, ku meremê vê gotinê kîjan e û bi çiqwasî va ew yek girîng e. Îsa qewata baxşandinê diha zêde fem dike, ne ku yekî mayîn, çimkî bi saya wê yekê Ewî ew tişt li hev anî, çi ku mirov nikaribû li hev banîya.

Bînin bîra xwe, wekî anegorî kaxweza korintîaye duda, ya 5:17-20, em qulixçiyên aşîtiyê ne, bi saya kê Xwedê berbirî diniyayê dibe. Em gerekê wê baxşandinê îzbat bikin û belav bikin, ya ku nava Mesîh da hatiye pêşniyarkirinê. Wextê ku dewsa wê yekê em qirar dikin bêhurmetkirinê xweyî bikin, em gumana Xwedê îdî elam nakin. Em derheqa gunekarkirinê da hindava wan meriva da xeber didin, bo kîjana Xwedê dixweze destpêka nû pêşniyar bike. G. L. Borxêrt vî cûreyî gotinên Îsa şirove kirîye: “Pêwîst e, ewê rola

giring fem bikin, ya ku dikare gotinên baxşandinê mîyaser bike, meriva azad bike, bona ku ew gunekariyên xwe yên pêşda berdin û guhdariya xwe bidine li ser şabûna jîyana tevî Mesîhê ku ji nava mirîya rabûye, bi rêberîya Ruhê Pîroz”.

Baxşandin karê xwedêtîyê ye. Tu tişt xwepêşkêşkirina awqas mezin naxweze, çawa ku baxşandin e. Bi baxşandinê em bi zanebûn qirar dikin bibine nîşangeh dewsa parastina mafên xwe. Feqet bi qurbankirina şexsên xwe, em dikevîne hembêza Xwedê. Bi bijartina baxşandinê em ji piştgirtina moralê xwe paşda disekin. Em dewsa wê yekê teslîmî rastîya Xwedê dibin. Xwedê pêşniyarî merivên li rex me dike, ku ew bi kerema Wî xwe biguhêrin û wan meriva bibaxşînin. Bi wê yekê mecal çê dibe, ku ew fem bikin û vê pêşniyarê qebûl bikin.

Wextê ku em bi tobekirinê tèn ber Xwedê, Ew nabêje me: “Ez Xwedê me û zanim, wekî piştî du hevtîya tê careke mayîn vê yekê bikî”. Ew dibêje: “Ez te dibaxşînim” û Ew qewata Xwe pêşniyar dike bona guhartinê. Xwedê nabêje me, wekî emê pêşerojê da rastî ter’ibandina bèn. Ew guman û sozên Xwe bona her şerkarîkê elam dike. Werin em wî cûreyî bi hevra bin.

Ruhê xwe vekin

Bêhurmetkirin me def dide, ku em ruhên xwe bigrin. Em dora dilên xwe dîwara çê dikin, bona ku em careke mayîn wê êşê nebînin. Em dikarin bifikirin, wekî ew dîwar me diparêzin, lê bi rastî ew îzinê nadine me, ku em hizkirina Mesîh bidin û bistînin. Bêyî hizkirina Wî, jîyana me wê ji merem û qewatê miqûf bimîne. Meremê me wê xweparastin be, lê karên me jî wê bibine merkezên xwehizîyê. Bi tamamî, dilên me wê bibine kevir û emê hindava merivêd başqe wî cûreyî bin. Eva hema rast miqabilî gotina Încîlê ye.

Diqewime hûn derheqa behrên Galîlêayê û ya Mirî da zanin. Ev her du jî li Îsraêlê cîhê avêyî here eyan in. Behra Galîlêayê avê jî Bakûr distîne û derbasî Başûr dike. Ev yek mecalê dide, ku behra Galîlêayê bona jîyanê be û nava wê da gelek heywanên avê dijîn. Feqet behra Mirî tenê avê qebûl dike û nava xwe da xweyî dike. Behra Mirî nava tu cîhekî da nayê kivşkirinê, çimkî ew vala nabe û vala nake. Bo wê yekê jî ew nav pêşda hatîye.

Bi xweyîkirina bêhurmetkirinê em dibine mîna behra Mirî. Rûyê ruhên me yên girtî da nava zewaca me da atmosfîreke usa saz dibe, li kuîderê tu tişt nikare zêde be, yan jî bijî. Bi ruîya baxşandinê em careke mayîn dilên xwe vedikin bona ku qewata Xwedê bikaribe here berbi hundurê me û paşê bi saya me derkeve. Wextê ku em naxwezî bibaxşînin, yan jî baxşandinê bistînin, em bi kuutasî şexsê xwe da jehrê belav dikin. Bona jîyana normal em gerekê tevî wan meriva bidin û bistînin, tevî kîjana em dijîn. Em gerekê belaş bidin û bistînin.

Sînorên baxşandinê

Hûn dikarin bifikirin: *“Tê texmînkirinê, wekî merivê li rex min her dem hewcê baxşandinê ye. Baxşandina min bêyî sînor nîne, gerekê sînor hebe”*. Şagirtên Îsa jî usa difikirîn:

Hingê Petrûs nêzikî Wî bû û gotê: “Xudan, gava birê min neheqîyê li min bike, gerekê çend cara bibaxşînimê wî, heta hevt cara?” Îsa gote wî: “Ez nabêjime te hevt cara, lê heta hevtê cara hevt” (Metta 18:21, 22).

Bi dayîna vê pirsê, Petrûs dicêriband berbîhêr be. Ew bin Qanûnê da mezin bibû, ya ku digot: “Gerekê gunehê xwe li wan meriva neynî, yên ku gunekar in. Tu gerekê bi vê prînsîbê pêşda herî: jîyan dewsa jîyanê, çav dewsa çav, diran dewsa diran, dest

dewsa dêst, ling dewsa ling” (Du Dîrok 19:21, NLT). Bi vî cûreyî, wextê ku Petrûs pêşniar kir, ku hevt cara bibaxşînin, ew hîvîyê bû, wekî Îsa bigota wî: “Belê, Petrûs, te hemû tişt fem kir”. Ji beşên Peymana Nû yên mayîn em zanin, wekî pêşniyara Petrûs, ya derheqa baxşandina hevt cara, ew reqem bû, kîjan çawa ku ew difikirî, wê lazim bûya, ku nava rojê da bibaxşîne yekî (binihêre Lûqa 17: 3, 4). Çawa jî hebe, bersiva Îsa ya derheqa baxşandina “hevtê cara hevt”-da sînorê diha bilind nîbû, anegorî kîjanî lazim bû nava temamiya jîyanê da bêhurmetkirina bibaxşîne. Ewî nîşanî Petrûs dikir, wekî baxşandin gerekê bêyî sînor bê dayîne.

Bi gotina Îsa, bi wê reqemê, bona kirina guneha, meriv gerekê 450-î bêhurmetkirina nava rojekê da bike. Eger hesab bikin usa dertê, wekî merivê li rex we gerekê sê derba carekê we bêhurmet bike û bi wî qewilî, wekî her du jî gerekê ne bixun, ne jî razên. Çetin merivekî usa hebe. Feqet eger merivê li rex we miqabilî we rojê 490 cara we bêhurmet bike, ew nade kivşê, wekî piştî bêhurmetkirina 490-î hûn dikarin îdî wî nebaxşînin.

Nava Kitêba Pîroz da reqema hevt sembola îdêaliyê ye, xwezima ya di navbera ezmîn û dinîyayê da. Îsa reqema 490 da xebatê, ya ku pareveyî li ser hevta dibe, ku bida kivşê, ku em gerekê anegorî norma Bavê bibaxşînin. Baxşandina wî cûreyî ya merdanî, tenê bi menîkê ye: bi saya Mesîh em bona Xwedê hatine dasekinandinê. Bo wê yekê jî em gerekê bibaxşînin, çimkî em ji nû va hatine çêkirinê û dilên me jî nû ne. Dilên me belaş baxşandina Wî qebûl kirine û bona saxlemîya ruhanî em gerekê bi merdanî merivên baþqe jî bibaxşînin.

Em zanin ku Îsa dixweze, wekî baxşandina me bêsinor be, çimkî piştî xebardana tevî Petrûs, Ewî serhatîke derheqa padişê ku dibaxşîne û xulamê ku nabaxşîne gilî kir û xebardana xwe bi vê sîrovekirinê ser hevda anî:

“Wî çaxî padişê hêrketî ew meriv şande zindanê, ku ew bizêre, hetanî ku temamîya deynê xwe bide.

Awa Bavê Min Yê ezmin wê çi bike, eger hûn dilê xwe da nexwezin bibaxşînine bira û xwişkên xwe” (Metta 18:34, 35, NLT).

Emê baxşandinê nestînin, eger ji baxşandinê paşda bisekinin. Ev qanûn cuda nîne. Gelo bo çi bona Xwedê awqas girîng e, ku em bibaxşînin. Menî ew e, wekî bi baxşandinê em tebyeta Wî eşkere dikin û mînanî wê yekê dibin. Em ji feqîrîya merivatîyê bilindtir dibin û dibine mînanî Bavê xwe. Nava baxşandina Xwedê da em doxtirîyê distînin û tê pêşniyarkirinê, ku em doxirîya Wî derbasî wan meriva bikin, kîjana em dibaxşînin. Eger merivê li rex we gelek cara baxşandinê ji we dixweze, usa ye hûn ji aliyê Xwedê da hatine dukirinê, izinê didin bibine wekilê qewata Wî.

Bona ku diha zêde derheqa têma bêhurmetkirinê da hûn bizanibin, kitêba Con ya “Tela şeytan” bixwînin.

Roj 3

Şerkarîya me: serpêhatîya Con

Nava zewaca me da wedekî usa hebû, wextê ku em nêzîkî 18 meha ji hev xeyîdî bûn. Ew hevraqayîlnebûn careke mayîn serê xwe bilind dikirin. Li ber zarokên xwe me şer dikir. Zarokên mezin fem dikirin ku çi diqewime û em didane sekinandinê, digotin: “Hûn dikarin derheqa wê yekê da wextê nanxwerinê xeber nedin?”. Dêrdê me her dem halê sertî li malê çê dikir û zewacê usa jî malbeta me xirab dikir.

Êvarekê rûyê wê yekê da, wextê ku carekê jî me bi hev ra şer kir, ez (Con) hêrketî ji malê derketim û min gazinê xwe carekê ra li ber Xwedê kir. Min derheqa şaşî û dûrnedîtina Lîzayê da gazinê

xwe dikir. Min texmîn dikir, wekî Xwedê bi zanebûn jineke usa dabû min, ya ku piştgirîya min nedikir û ez rexne dikirim. Di hundurê min da pirs pêşda dihatin, ku ezê çawa emirê xwe tevî wê wî cûreyî berdewam bikim.

Ezê tu cara bîr nekim, ku çawa Xwedê caba min da. Ruhê Pîroz derheqa wê yekê da tu xeberek negot, ku çawa Ew bona min xemgîn e, ne jî derheqa wê giraniyê da xeberda, çi ku min li ser xwe texmîn dikir. Dewsa wê yekê Ewî bi dengê nimiz gote min: “Kurê min, ez dixwezim, ku tu derheqa tiştêkî da bifikirî, kîjanê tu nava Lîzayê da qîmet dikî û bona wê yekê jî Min razî bî”. Hinek wede lazim bû, ku caba wê pirsê bidim û min bin pozê xwe da got: “Ew dayîka baş e”. Wextê ku ev xeber jî devê min derketin, min nava xwe da aktîvî texmîn kir. Xwedê ez usa kirim, ku ez berdewam bikim. Min gotê: “Xudan, spas, wekî Lîza bi rastî xwerinên baş çê dîke”. Paşê min got: “Spas, wekî ew bedew e”. Paşê min destpê kir derheqa aliyên Lîzayê yên baş da xeber bidim û bona wê yekê jî razalixîyê elam bikim.

Wî çaxî ez îdî li ser Lîzayê hêrs nibûm û ez tenê li ser xwe hêrs diketim. Paşê ez fikirîm: “*Tu bi rastî xêfîkî. Jina te baş e, lê tu gelekî xirab nêzîkî wê dibî. Gelo çi diqewime?*”. Di hundurê min da tê bêjî min êşek texmîn kir, ez fikirîm, ku ez bi çiqwasî xirab nêzîkî Lîzayê dibim. Ew jina min bû, ya ku min bijartibû û ew dayîka zanokêd min bû. Bi rastî ew duakirina Xwedê bû, lê ez bi cûrê xirab nêzîkî wê dibûm.

Ez jî malê derketim, Lîza îdî jî min westîyayî bû, ez jî ji wê. Lê niha min tenê dixwest, ku ez herime hundur, bêjime wê, ku ez çawa bona wê yekê razîbûm. Ez lez çûme malê û fikirîm: “*Diqewime Lîza gotina min qebûl neke, feqet ez gerekê bêjime wê, ku ez bona wê çiqwas razî me*”.

Çawa ku ez ketime malê, min Lîza dît û kire gazî:

- Lîza, ez gelekî poşman bûme, ez baş nîbûme, ez hîvî dikim, ku tu min bibaxşînî. Tu dayîkeke baş û kevanîke başî, xwestina dilê minî.

Min gilî kir, ku Xwedê çi anî bîra min, paşê min destpê kir pesinê wê bidim bona xeysetê wêyî baş. Xeber ji dilê min mînanî kanîyê derdiketin. Min xeber dida, lê Lîza nerm bû û destpê kir bigirî. Min nizanibû, wekî wextê ku ez ne li malê bûme, ewê dua kirîye: “Xwedê, eger Tu Con paşda vegeerînî û ew bêje, ku ew poşman bûye, ezê careke mayîn dilê xwe vekim”.

Şerkarîya me: serpêhatîya Lîzayê

Nava 18 meha da hemû tişt gihîşte asteke usa, wekî min îdî gistîlka nîşanîyê ji destê xwe derxist. Min digote Con, ku em zewicîne, lê nîşankirî nînin. Min destpê kir bawer bikim, ku ez Con hiz nakim. Min nedixwest bibaxşanda Con, dilê min jî destpê kir sar bibe. Wextê ku min nedixwest bibaxşanda, dilê min jî destpê kir sar bibe û heleqetîyên me li ber qezîyayê sekinîbûn.

Wî çaxî Con gelek cara diçû rêwîtiyê û diha baş bû, ku ew li malê nîbû. *“Emir diha sivik e, wextê ku ew li malê nîne”*, - ez difikirîm. – *Ew tenê hêrsa min radike, wextê ku ew li male ye”*.

Ez awqas gumanbir bibûm, wekî min destpêkir bangî Xwedê bikim: “Xwedê, heleqetîyên me ketine nava halê xirab. Con gelekî xirab nêzîkî min dibe. Ez zanim ku Tu gerekê rûyê kirinên wî da hêrsketî bî”.

Min gazin kirin. Her roj min pirsgirêka xwe li ber Bavê raber dikir. Feqet wextê ku min xwe ker kir, min bihîst ku çawa Ewî got: “Lîza bêje Min, wekî Ez besî te me”.

Pêşîyê ez hinekî tirsîyam. Eger min bigota, wekî Xwedê bes bû, diqewime ew yek bida kivşê, wekî Conê nehata guhartinê. Min ew xeber wekilandin: “Bavo, Tu bona min besî”.

Min careke mayîn pirs dayê: “Lê Con?”.

Min careke mayîn bihîst: “Bêje Min, ku Ez besî te me”.

“Tu besî min î”.

Min ew xeber her dem diwekilandin. Wextê ku ez û Con diketine nava halê wî cûreyî min dua dikir: “Îsa, Tu besî min î”. Nava wede da ew eyantî dilê min da îzbat bû û duakirinên min hatine guhartinê. Ew çi ku min digot, werguhêzî gotina razîbûnê bû, ya ku min nava Xwedê da dît: “Îsa, Tu diha zêde yî ne ku besî min î”.

Zûtirekê Xwedê dilên me herdua da xebata xwe kir. Wextê ku Con ji sefera xwe paşda vegeŕiya, ez bi şabûn çûme firegehê pêşîya wî. Ez şa bûm, ku ezê malxwê xwe bivînim, û bona min jî syûrprîzek hebû. Ewî pêşkêşeke bedew bona min anîbû.

Ji wî çaxî da nava zewaca me da destpêka nû hate kivşê. Hewaskar e, wekî pêşîya wê guhartinê îdî dilê me herdua vekiribû.

Eger nava zewaca me da em dîna xwe bidine mesela Îsa û eger bona şaşîyê bibaxşînin, wî çaxî yekîtîya me wê saxlem be û gulvede. Mesela here mezin, ya ku me bêyî fikirmîşbûn derbasî zarokên xwe kirin, ew bû, wekî me baxşandin xwest û me baxşande hev. Zarokên me fem kirin, wekî em ne merivên îdêalî ne, yên ku li dinîya ne îdêalî dijîn, lê baxşandina Xwedê ya dilên me da dikare guneha veşêre. Ew guneh, meremê kîjana ew bû ku zewaca me xirab û unda bike, bi rastî bona zarokên me bû derseke baş, ya derheqa hizkirin, kerem û baxşandina Xwedê da.

“Hizkirin gulvedide, wextê ku şaşî tèn baxşandinê...” (gotinên Slêman 17:9, NLT).

Wextê ku hûn qîrar dikin xeyîdê xweyî bikin, hemû kes ziyane dikevin, çimkî hizkirin îdî xilaz dibe. Feqet wextê ku hûn qîrar dikin bibaxşînin, hemû endamên malbeta we karê dikevin, çimkî hizkirin destpê dike gulvede.

Tirs

Tiştê mayîn, yê ku gerekê ji heleqetîyên we bê dûrxistinê, tirs e. Nava deh salên ewlin da, yê zewaca me, min (Lîza) miqabilî tirsra tenêmayînê şerkarî dikir. Him bavê min û him jî serwêrê minî ewlin jinên xwe hiştibûn, dûrketibûn, ku tevî jinên diha cahil bizewicin. Rûyê paşeroja min da, min îzin dida, ku tirs fikira min da bêyî qedexekirin bima. Fikirên min nedikirine qîrîn, wana bi dengê hêdî digotin: “*Yeke, hemû mêr jî dûr dikevin. Îzinê nede, ku ew gelekî nêzîkî te bibin û ewê hêrsa te ranekin*”. Rûyê fikirdarîya vî cûreyî da, ez diji (miqabilî) her nazikayîke hizkirinê derdiketim. Wextê ku Con ez hembêz dikirim, hinek wede derbas dibû û min destpê dikir, piştî wî xim, ku ew min berde.

Rojekê wextê ku dîsa usa bû, min piştî wî xist, Con carekê ra pirs da min:

-Em gerekê bibine çend salî, ku fem bikî, wekî ezê te nehêlim û neçim? Gelo tê hîvîyê bisekinî, hetanî ku em bibine 70 salî?

Ez ecêbmayî mam.

-Ezê awqasî hîvîyê bisekinim, çiqwas lazim be, - ewî got, - feqet nava wî wedeyî da emê gelek tiştên baş ji destê xwe berdin.

Min fem kir, wekî min Con mecbûr dikir, ku ew bona wan hemû tiştên xirab deynê xwe bide, çî ku mêrên başqê dabûne min. Ez fikirîm: “*Bona çî Con gerekê bona şaşîyên wana bide. Ew yek nerast e. Bi cêribandîna xweparastinê, ez ziyane didime heleqetîyên me*”. Tirsra derheqa wundakirina Con da ya wedê niha talan dikir. Wî çaxî min qirar kir, wekî diha baş e, ez bi temamî Con hiz bikim, eger ez wî wunda bikim jî, lê ne ku hindikî hiz bikim û paşê jî poşmanbim, wextê ku bifikirim, ku ew yek dikaribû cûrekî mayîn bûya.

Tirs û bêaminayî îzinê nadine me, ku em zewaca xwe bi cûrê tam derbas bikin, çimkî tirs nêzîkî paşerojê ye û nade bawerkirinê, wekî pêşerojê da hemû tişt dikare baş be. Eger em dixwezîn, ku Xwedê

nava zewaca me da tiştên nû bike, em gerekê qirar bikin, ku tirsê bihêlin û wî hemû tiştî qebûl bikin, çî ku hizkirin bona pêşeroja me têra divîne. Tirs hîvîya teribandinê ye, lê hizkirin tu cara nateribe.

Tirs qewata ruhanî ye, ya ku dijî hizkirina Xwedê û parastinê ye û nava emirê me da derdikeve. Ew dijî hizkirinê ye, çimkî him hizkirin û him jî tirs bi cûrê nebînayî kar dikin. Hizkirin bangî me dike, ku bi şikberî nêzîkî wî hemû tiştî bibin, çî ku em divînin û wan tiştê bawer bikin, kîjana em nikarin bivînin. Tirs me ra dibêje, ku bawerîya xwe wî hemû tiştî bînin, çî ku em dibînin û bi şikberî nêzîkî wan tiştê bibin, kîjan nayêne dîtîne. Em dikarin bawerîya xwe yan tirsê teribandinê, yan jî hizkirina bi guman bînin, lê ne ku herduya bi hev ra. Tirs hizkirinê dide dûrxistinê, lê hizkirin jî tirsê dûr dixê.

“... Hizkirina îdêalî tirsê dide dûrxistinê. Ew tirsê, ku em texmîn dikin, tirsê cezakirinê ye û ev yek dide kivşê, ku me hizkirina Wî ya îdêalî texmîn nekirîye. Em jî hev hiz dikin, çimkî pêşda Ewî em hiz kirine” (A Yûhenna 4:18, 19, NLT).

Karebûna guhartina hizkirinê diha zêde ye, ne ku karebûna kirinê tirsê. Ew hizkirina îdêalî, ya ku tirsê dide dûrxistinê wî çaxî pêşda tê, wextê ku tu hizkirina Xwedê nas dikî. Bi qewata hizkirina Wî em dikarin derheqa xwe da ber xwe nekevin, çimkî em zanin, wekî Xwedê wê hewcetîyên me bide razîkirinê. Feqet eger em wede nava hazirîya Xwedê da derbas nakin, em nikarin hizkirina Wî bi cûrê nêzîkî nas bikin, çimkî aminaya Wî hema nava hazirîya Wî da eyan dibe.

Bi nasnekirina tebyeta Xwedê ya rast, emê her dem nava tirsê da bin, wekî Ewê yan jî merivê li rex me wê bihêle, dûrkeve, kîjan tê hesabê çawa cûrê cezakirinêyî navhevxistî. Eger nava hizkirina Wî da em aminayê dest bînin, emê bikaribin jî tirsê azad bin û hizkirina bêyî berjewandî pêşniyarî merivên li rex xwe bikin. Gotina Xwedê dibêje:

“...Ji hev hiz bikin, çimkî hizkirin ji Xwedê ye. Her merivek, yê ku hiz dike, kurê Xwedê ye û Xwedê nas dike. Feqet merivê, ku hiz nake, Xwedê nas nake, çimkî Xwedê hizkirin e” (A Yûhenna 4:7, 8, NLT).

Qewînbûna tirsê me def dide, ku em bêjin, wek mînak: “Eger malxwê min (yan jî kevanîya min) bighîje jineke mayîn, ezê tu cara nebaxşînimê. Sondxwerinên vî cûreyî, meremê kîjana ew e, ku em pêşeroja xwe biparêzin, îzinê nadine me ku qewata hizkirina Xwedê qebûl bikin. Em gerekê fêr bin, guman bin, wekî Xwedê wê derheqa me da bifikire, hema wî çaxî jî, wextê ku merivê li rex me bide xeydandinê, înkâr bike, yan jî rastî jineke mayîn bê. Xwedê hîvî ji me kirîye, ku hemû tirsê teslîmî Wî bikin. Bi nekirina vê yekê, em dibêjine Xwedê, wekî em bawer nakin ku Ew dikare rêberiyê li jîyana me bike. Bêyî teslîmkirina tirsê, em nikarin gura serwêriya Îsa bikin.

Roj 4

Nifirên malbetî

Destpêka zewaca me da, me zanibû, ku Xwedê dixwest tiştê nû nava jîyana me û zaroka da bike. Feqet nava jîyanên dê û bav û kal-bavên me da qewînbûnên ruhanî yên kivş hebûn, yê ku paşeroja malbetî heram kiribû, mesele, serxweşîya ji alkoholê, zinêkarî û tiştên mayîn. Hetanî stendina mîrasa nû, em gerekê dijî wan nifira derketana, kîjana malbetên me bi nisileta ser hev dane zêrandinê. Dijî wan nifira tenê dikarin bi rîya duakirinê şer bikin û tenê bi Gotina Xwedê dikarin wana xirab bikin. Nifirên malbetî bi cudatîyên cûre-cûre pêşda tên. Mesele, nava serê kitêbêyî pêşda, me da dîyarkirinê, wekî malbetên me ne mînanî hev bûn. Ez (Lîza) xemgîn bûm, ku malbeta Con wê çawa nêzikî

malbeta min ya nesaxlem bibe. Hema êvara nîşanîya me, bavê min bi alkoholê serxweş bû û bi bêşermî, bi hazirîya mêrê wê, nêzikî dayîka Con dibû. Usa nîbû, wekî meremekî bi rastî hindava dayîka Con hebû, lê meremê wî ew bû, ku dayîka min bide xeyîdandinê. Paşê dereng dayîka Con xemgînî derheqa wê yekê da elam kiribû, wekî eva cara ewlin e, ku nava dîroka malbeta wan da malbeteke usa, li kîderê jihevcihêbûn heye, wê bighîje malbeta wana. Min bihîst, ku ewê çawa got: “Nava malbeta meda tu cara jihevcihêbûn tunebûne”.

“Gelo fikira wê ya wî cûreyî derheqa min da heye, - ez fikirîm, - wekî ezê mîrasa wana xirab bikim”?

Piştî şîvê, min ew bêhurmetkirin li ser xwe texmîn dikir, ya ku dayîka min stend. Xêncî wê yekê min gelekî şerm dikir. Dihate texmînkirinê, ku eger me tiştên başe pêşîya zewacê daniya li ser mêzînê û bikişandana, wî çaxî tiştên baş wê yên malbeta Con bûna. Nava malbeta min da tenê tiştên xirab bûn: bêaminaya zewacê, jihevcihêbûn.

Nava jîyana xwe da min fem kir, wekî Xwedê bona aliyên malbeta Con yên baş û yên malbeta min ya xirab xemgîn nîbû. Ewî dixwest, ku mîrasa pîroz hebe.

“Min guhdar bike, keça padişatîyê: bi dilê xwe wî hemû tiştî qebûl bike, çî ku Ez dibêjim. Cimeta xwe û malbeta xwe ya dûr bîr bike, çimkî malxwê te yê padişatîyê ji bedewetîya te hijmekar e: qedirê wî bigre, çimkî ew xudanê te ye... Lawên te wê mînanî bavê xwe bibine padişa. Tê wana bona gelek welata bikî axa. Ezê nava her nisiletêkê da rûmetê navê te ra bînim. Bo wê yekê jî, miletê pesinê te ji heta- hetayê bidin” (Zebûr 45:10-12, 16, 17, NLT).

Li vir derheqa Îsa û Dergîstîya Wî da tê gotinê. Feqet Xwedê ew yek da xebatê, ku sozê Xwe bona jîyana min bide kivşê, yê ku bi paşeroja malbeta min va nedihate sînorkirinê. Wextê ku

min xeberên “tu keça padişatîyê” xwendin, tê bêjî di hundurê min da jîyan destpê bû. Xwedê min ra xeber dida çawa keça Xwe ya padişatîyê. Wî çaxî min ji nû va fem kir, ku ez nava Mesîh da kî me. Min qewînbûnên paşeroja xwe yê ruhanî înkâr kirin û min bona pêşeroja malbeta xwe gumana nû stend.

Min fem kir, wekî zarokên min wê mînanî bavê min nîbûna. Ewê bibûna mînanî bavê xwe û ewê mîrasa mînanî Xudan bistendana. Ez li ser wî sozî sekinîm, wekî kurên min wê bibûna kurên Yê Herî Bilind.

Bi dijîderketina miqabilî nifiriên malbetî, me dît, wekî Gotina Xwedê rast bû. Xwedê wextê rojîya û eyantîya, soz dane me û bi saya wan soza malbeta me gulveda.

Duakirina bona xirabkirina nifirên malbetî

Nava Galatî 3:13-da nivîsar e: “Mesîh, em ji wê nifra Qanûnê kirî, ew dewsa me kete bin wê nifirê”. Nifirên çî cûreyî jî nava malbeta we da hebin, yek e nava Mesîh da serwêrtîya wana tune.

Eger hûn derheqa nifirên malbetî da ha ji pê hene, em dixwezîn alî we bikin, ku hûn wana xirab kin, kîjana mîrasa malbeta we dane sînorkirinê. Duakirina ku jêrê hatîye raberkirinê, wê alî we bike, ku bi şûrê Gotina Xwedê hûn dijî qewîntîyên mîrêcin derkevin. Azayî hema usa ji nifirên malbetî pêşda nayên. Hûn gerekê meremên mîrêcin êşkere bikin û miqabilî wana derkevin. Meremê wî ew e, ku îzinê nede we, ku hûn wê şabûnê, aşîtîyê û hizkirinê bibînin, yê ku Xwedê pêşkêşî we kirine. Hûn dikarin bi wê serwêrtîyê dijmin alt bikin, ya ku niha nava Mesîh da heye.

Em hîvî dikin, ku pêşîya wê duakirinê rabin û hinek wede bisekinin. Eger hûn dixwezîn hema niha dua bikin, bawerbin, wekî hûn tenê ne, yan jî tevî merivekî nêzîk in. Eva duakirina şexsî ye,

wextê kîjanê hûn gerekê bi dengê bilind xeber bidin, hîvîkirinên xwe û tabîya xwe bêjin û bidine dîyarkirinê.

Duakirina li jêrê raberkirî miqabilî wan nifira ye, yên ku bona zewac û malbeta me qezîya bûn. Me ev duakirin bi berevkirina parçên ji Încîlê hazir kirîye, çimkî Gotin şûrê Ruh e. Eger nava dîroka malbeta we da pirsgirêk hene, yên ku neketine nava vê duakirinê, em dibêjin, ku hûn parça ji Încîlê bibînin, yên ku miqabilî wan pirsgirêka ne, bi rastîya Xwedê û sozê Wî. Parçên usa berev bikin, yên ku anegorî Gotina Xwedê ne û bi qewata xwîna Îsa wê nifirê xirab bikin. Dawîya duakirinê me ji Încîlê çend beş raber kirine bona lêkolîna paşê.

Bavê Ezmanî ezîz,

Ez bi navê Kurê Te Yê ezîz- Îsa, têm pêşîya Te: ez bi razîbûn bi dergên Te dikevime hundur û bi rûmet têm li cem Te. Nêzîkbûn min dide ghartinê, wextê ku ez derheqa kerema Te, rehm û hizkirina Te da difikirim, berê ewlin ji Te bona ewê xebata mezin, ya bona xilaskirinê razî dibim, ya ku Te nava emirê min da mîyaser kirîye.

Meremê min heye, ku ez peymanê tevî XUDAN, Xwedê Yê Îsraêlê mor bikim. Tu yî XUDANÊ Ezmanî topa dinîyayê, Xwedê Yê Mezin, Yê ku peyman Xwe ya hizkirinê tevî wana xweyî dike, yên ku Wî hiz dikin û gura baylozên Wî dikin. Bila guhdarîya Te berbi wê yekê be û çavên Te vekirî bin, ku Tu duakirina xulamê xwe bibhêyî. Ez gunehên xwe û usa jî gunehên mala bavê xwe tobe dikim, wan hemû tiştên nerast, yê ku dijî Te hatine kirinê. Min bibaxşîne, çimkî ez li ber Te gelekî gunehkar im. Em bi şermê va hatine pêçanê, çimkî me dijî Te gunehkarî kirîye. Feqet Tu, Xwedê Yê meyî Xudan, dibaxşînî, nenihêrî wê yekê, ku em dijî Te rabûne, gura Xwedê Yê me- XUDANÊ me da nîbûne, ne jî qanûnên Wî xweyî kirine, kîjan Ewî bi destî pêxembera dane xulamên Xwe. Em hîvî ji Te dikin, ku Tu dilên me sunet bikî û gunehên paşeroja me, şermê dûr bixî.

Ez derheqa gunehên xwe û bavên xwe xwe mikur têm, yên ku nava cûre- cûre tişta da bûne. Ez ji wana paşda disekinim, çî ku wana kirîye, qebûl nakim û nifira wan ji jîyana xwe, zarokên wana û zarokên zarokên wana xirab dikim.

Ez gunehên xwe yan jî yên bavên xwe yên derheqa xebitandina narkotîka û alkoholê da tobe dikim û ji wana dûr dikevim. Bavo, hemû dergên dijî guneha, dîlbûnê, bigire. Ez ji wana paşda disekinim (navên wan narkotîka bidin, kîjan we va girêdayî ne), û ez qewata wê nifirê ji emirê xwe, zarokên xwe, zarokên wana û zarokêd zarokên wana xirab dikim. Bi navê Îsa, amîn.

Nava serîkî kitêbê yê bi sire da emê derheqa wê prînsîbê da xeberdin, ya derheqa nifira û tevgirêdana da, yêu ku rûyê zinêkarîyê da pêşda tên. Em zanin, wekî Îsa li ser Xaç gihîştîye serkevtinê û hûn ji wan nifira aza bûne. Hewce nîne, ku hûn ji wan nifira bitirsîn, yan jî rûyê wê yekê da xemgîn bin, wekî ew guneh wê peyî we û zarokên we jî bên. Îro we bona malbeta xwe mîraseke nû îzbat kir.

Bona lêkolîna paşê bixwînin: Zebûr 100:4, 2 Dîrok 29:10, 11, Nemîya 1:5-7, Daniêl 9:8-10, Metta 10:34, Îbranî 4:12, 2 Dîrok 29:5, 6.

Roj 5

Meriv çawa nêzîkî qewimên xwe yên nû bibe?

Tevî kontrola qewimên nû pirsgirêk diha gelekî li cem merivên ku teze zewicîne, pêşda tên. Feqet ew dikarin usa jî peyî zewacê ra pêşda bên. Westê ku di navbera merivên li rex me û qewimên me konflikt pêşda tên, em bi rastî dixwezîn dê û bavên xwe biparêzin (yan jî qewimên mayîn), kîjana em nava temamiya emirê xwe da

nas dikin. Em hemû jî gerekê hizkirinê û qedirgirtinê hindava dê û bava da bidine kivşê. Feqet nenihêrî wê yekê, ku hûn şewira dê û bava qebûl dikin, piştî zewacê hûn gerekê berê ewlin fikira merivê li rex xwe hesab hildin.

Hetanî zewaca kurê meyî mezin, min (Con) digote wî, Êdîson, ezê emirî li ser te nekim, ku tu nava pirsekê da çi bikî, te hela hê jî min pirsra şewirê nekirîye. Ezê îdî necêribînim rêberîyê li jîyana te bikim. Tê malbeta xwe çê bikî, û ez dixwezim mecala fêrbûnê û gihîştinê bidime te”. Êdîson bona wê tabîyê razalixî elamî min kir. Ew her dem, wextê ku dixweze ez şewirê bidime wî, berbirî min dibe. Ez Êdîson kontrol nakim, ku wî bikime kopîya xwe, çawa ku Xudan ew çê kirîye. Û naxwezim nava zewaca wî da tevî pirsên wî bibim, ezê îzinê nedime xwe, ku rola serkarê malbeta wî hildime destê xwe (bi rastî gotî, ew yek min ecêbmayî dihêle, ku ew çawa serkarîyê li malbeta xwe dike. Ew wê yekê diha baş dike, ne ku ez, wextê ku ez emir da hevalê wî bûm).

Încîlê da diha zelal nivîsar e:

“...Mêr bavê xwe û dayîka xwe *dihêle* û dighîje jina xwe û ev her du digihîjine hev, dibine yek” (Destpêbûn 2:24, NLT; xebera cudakirî zêdekirî ne).

Bi vî cûreyî hiştina dê û bava dide kivşê, wekî ew serwêrtîya malbeta dê û bavê xwe dihêlin. Ev yek jî dide kivşê, ku ji wî hukumê ne saxlem dûr dikevin, yê ku nava emirê dê û bavê we da hebûye. Qedirgirtina dê û bava girîng e, lê hûn dikarin qedirê wan bêyî gurêdabûna wan da jî bigrin. We malbeteke nû saz kirîye, bi serwêrtîya nû. Nava jîyana we da îdî serwêrtîya dê û bavê we tune û usa dertê, wekî ew gerekê serkarîyê jîyana we û zewaca we nekin.

Diqewime hûn mecûr bin tevî wan qewimên xwe bikevine nava kar, yên ku dicêribînin tevî karê zewaca we bibin. Pêşda qewimekî me dicêriband me kontrol bike û cihêbûnê bike nava

yekîtîya me. Tevbûna wî çiqwas diçû, awqas zêde ziyan dida, lê cêribandinên me yên bona bi cûrê nerm helkirina wê pirsê badîhewa bûn. Paşê em rastî wî şexsî hatin (em her du jî qedirê wî digrin û wî hiz dikin) û me tabîya xwe zelal da diyarkirinê.

Min (Con) gotê: “Tê vir hada tevî serkarîkirina malbeta min nebî. Eva malbeta nû ye. Em qedirê te digrin, lê tê wan qirara kontrol nekî, kîjan nava malbeta me da tèn qebûlkinê. Emê îzinê nedine te, ku tu çawa bixwezî usa bikî”. Min gerekê xeberên berk bidana xebatê, bona wê yekê, wekî nêzîkbûnên pêşda tu feyda nedabûn. Feqet ewî fem kir, ku çi diqewime û niha jî ew bi aqilmendî nava heleqetîyên me da li ser tabîke cuda ye.

Em, mêr û jin, gerekê her dem yekîtîya xwe ji êrîşên cûre- cûre biparêzin, nava wan da usa jî êrîşên endamên malbeta me. Gelek cara ev êrîş çawa yên bi zanebûn û bi meremê xirab nayêne kirinê. Gelek cara ew cûrê qerfkinê dibin, lê hema tiştên wî cûreyî yên biçûk jî hukumê xwe yê xirab dihêlin. Wextê ku ez heyteholên zewacê derbas dikim, ez dîna xwe didime hemû endamên malbetê û hevala, yên ku hazirin û ez dibêjime wana: “Ev yekîtî ji aliyê Xwedê da îzbat bûye û hûn gerekê dijî vê yekîtîyê xeber nedin. Tu cara necêribînin vê yekîtîyê bidine parçekirinê. Derheqa yekîtîya jîyanê da emê xeberdin, ya ku Xwedê îro îzbat kir”.

Wextê ku Êdîson zewicî me qirar kir, wekî emê wî mecbûr nekin, ku ew bijartinê di navbera jina xwe Cûlîyê û me da bike. Bi rastî, ewî îdî bijartina xwe wê rojê kir, wextê ku ewî Cûlî stend û em bona wê qirarê gelekî şa ne. Nava doranên heleqetîyên malbetî da hizkirin tu cara meriva mecbûr nake, ku bijartinê bikin. Hizkirin piştgirîyê dide û pirayên di navbera heleqetîyên kevin û nû da çê dike. Em Cûlîyê hiz dikin û diha gelekî wê çawa keça xwe hesab dikin, lê ne ku çawa bûka xwe. Ev nêzîkayî tenê bi menîkê dikare hebe:em bi qedirgirtin nêzîkî malbeta wê ya nû dibin û me îzin daye, ku ew û Êdîson serpêhatîya xwe binivîsin.

Hêvîyên ne bi rastî

Li Welatên Amêrikaêye Yekgirtî hêvîyên ne bi rastî menîyên ji hevcihêbûna mêr û jîna ya sereke ne. Ji me gelek meriv dizewicin û wî çaxî ew hîvîya wê yekê ne, ku paşê ewê nava heleqetîyên îdêalî da bin, her dem nava heleqetîyên fîzîkî da bin. Em hîvîyê nînin, wekî zewacê bi cûrê h'elalî xwehizîya me û usa jî wan goveka bide eşkerekirinê, nava kîjanada em xwe parastî texmîn nakin, ne jî têra divînin, wekî emê kêmasî û şaşîyên merivên li rex xwe bivînin. Hêvîyên me yên şaş dikarin bibine menîya telayê û nerazîbûnê, kîjanê îzinê nede me, ku em yekîtîya usa çê bikin, ya ku gerekê Xwedê xweş bê.

Tiştên vî cûreyî gelek carana rûyê himberîhevkirinên ne aqil da pêşda tên. Em nava kûltûra usa da dijîn, ya ku li ser keyf û şabûnê hatiye merkezkirinê. Bona me her dem mecal tên dayînê, ku em yekîtîya xwe himberî yekîtîyên usa bikin, yên ku bi tîlêvîzîyonê tên nîşandayînê. Film û progiramên bi tîlêvîzîyonê hizkirina bêyî xebat, bedewetîya bêyî qurbanî û aminaya bêyî riskê pêşniyarî me dikin. Ew tenê guhdariya mezin datînine li ser beşa heleqetîyaye romantîk. Lê alîyên emire mayîn nadine kîvşê.

Eger hûn îdî nava wedekî kîvş da zewicîne, we îdî fem kirîye, wekî zewac tenê bi rasthatinên romantîkî va sazûyî nîne. Zewac xebateke giran e, ya ku her dem nîne, ku meriv bi hizkirina mezin mîyaser dike.

Eger nava zewaca we da çetînayî hene, ew yek nade kîvşê, wekî gerekê hûn nezewicîyana. Çetînayên zewacê kardar in, çimkî ew alî we dikin, ku nava karê xwe da berfireh bin. Ew xeysetê me dide filtirkirinê (paqijkirinê) û karebûnên we zêde dikin. Tê bîra we, wekî heleqetîyên zewacê alî we dikin, ku hûn bighîjine *mezinayê?* Fikira derheqa pêşketinê û gihîştinê da hemûya xweş tê, hetanî ku ew rastî halekî usa tê, yê ku dewa gihîştinê dike.

Hêvîyên ne bi rastî tenê ji progiramên têlêvîzîonê pêşda nayên. Em bi xwe şaşîya mezin dikin, wextê ku em zewaca xwe himberî zewacên hevala, yan jî cînara dikin. Tenê fikira derheqa wê yekê da jî îdî tirsê pêşda tîne. Em nikarin bizanibin, ku nava wan malbeta da çi diqewime. Derva hemû tişt baş tê kivşê, lê diqewime piş dergê girtî ew hev wunda dikin.

Li cem me dikare tişteki usa pêşda bê, ku em wedên zewaca xwe yên cuda-cuda himberî hev bikin. Em dikarin niha, wek mînak, wedê niha, wextê ku zarok hene û wedê aza tune, himberî wî çaxî bikin, wextê ku hela hê zarok tunebûn. Bi lojîkî eva bêfikir e. Ew yek tiştê bûyîne nîne, wekî emirê we piştî hebûna zaroka neyê guhartinê. Wextê ku hûn dibine dê û bav, azaya we diha hindik dibe û diha gelekî cabdarî dikeve ser we. Hebûna zaroka emirê we diguhêre û bi wî cûreyî heleqetîyên we jî tîn guhartinê. Em zanin, wekî femkirina vê yekê çetin nîne, feqet em çiqwas gelekî himberîhevkirina dikin, kîjan ewê şabûnê ji me distînin, ya ku niha dikare hebe, em sertbûnê dikine nava heleqetîyên xwe.

Têodor Rûzvêlt gotîye: “Himberîhevkirin şabûnê didize”. Eger hûn dixwezin nava zewaca we da şabûn hebe, hûn gerekê heleqetîyên xwe himberî wan heleqetîya nekin, kîjan li ber çavê we çawa yên diha baş tîn texmînkirinê, nenihêrî wê yekê, wekî gilî derheqa meriva da ne, ne derheqa progiramên têlêvîzîyonê da nin. Şabûn tişteki bêyî nişan nîne. Hûn nikarin şabûnê dest bînin, eger hûn usa bi hûngilî derbasî himberîhevkirina bin. Şabûn ji her tiştî jortir e û ew bi texmînkirina va nayê sînorkirinê û ew qewatê distîne, wextê ku şikilên tomerî divîne, progirama Xwedê ya tomerî, ya bona jîyana we.

Şabûn rezê Ruh e (binihêre Galatî 5:22, 23), yê ku dide kivşê, wekî ew ji Xwedê tê, lê ne ku ji kirinên ber çava. Xwestina mêriv nikare wê yekê pêşda bîne. Bextewarî ew tişt e, yu ku dikare rûyê

çetinayên wedelî da bê teribandinê, lê şabûn ji çetinaya jortir e. Kanîya şabûnê ew guman e, ya ku nava Mesîh da ye. Eger şabûna me ya nava Xwedê da tune, nava emirê me da ew qewat wê tune be, ya ku bona çêkirina zewaca bi açix pêwîst e, çimkî şabûna Wî qewata me ye (binihêre Nêmîya 8:10). Bi berbirîbûna berbi civîna Fîlîpîya, Pawlos ev fikira careke mayîn wekiland:

“Timê pê Xudan şa bin, dîsa dibêjim, timê şa bin!. Bila berbihêriya we hemû meriva va eyan be. Xudan nêzik e. Bona tu tiştî xema nekin, lê xwestina we bira bi dua- dirozga, razîbûnê va tevayî, Xwedê va eyan be. Û edilaya Xwedê, ku ji her hiş-aqilî derbaztir e, wê dil û fikirên we yekîtiya Mesîh Îsa da xweyî bike” (Fîlîpî 4:4-7).

Wextê ku nava heleqetiyên we da nerihetî hene, hêvîkirinên xwe binine ber Xwedê, bi şabûnê û bi razîbûnê. Ewî soz daye, ku dijawariyên we tevî aşîtiya Xwe biguhêre. Ev pevguhartina dest dide.

Hêvîyên ne bi rastî wê şabûna we bidizin, nava encamê wê yekê da wê wan qewata ji we bistînin, bona kîjana hûn nava zewaca xwe da hewce ne. Nekevîne nava vê telê. Van hêvîya êşkere bikin, kîjan nava heleqetiyên we da dijawarî pêşda anî ne û tobe bikin, wekî we îzin daye wana, ku di hundurê we da ew cihê girîng bigrin, lê ne ku rastîya Gotina Xwedê û bernama Wî ya tektenê ya bona emirê we.

Sirîya we

Hinek wede başqe bikin, ku hûn tevî kevanîya xwe, yan jî malxwê xwe derheqa evî serê kitêbê da xebardin. Hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku ew rêberîyê li we bike û wê yekê binivîsin, çi ku gerekê nava zewaca we da bê paqijkirinê û dûrxistinê. Tiştên usa hene,

kîjana pêwîst e bidine guhartinê, wek mînak, xeysetê we û Xwedê we alî bike, ku bi qewata kerema Wî hûn wê yekê bikin. Dijî wan tiştê, mesele, nifirên malbetî, gerekê bi duakirina pêşda bîn.

Aciz nebin, eger navnîşa we ji çend rûpela be. Meremê vê dersê ew nîne, ku hûn bidine zelalkirinê, ku bi çiqasîva zewaca we “şaşê”, ne jî ku hûn bivînin, wekî xêncî we dîsa pirsgirêkên kê diha zêde ne. Bi kirina vê yekê, hûnê berbi tiştên baş herin, yê ku dikarin nava pêşeroja we da hebin. Eger hûn pirsgirêkên xwe niha bidine helkirinê, hûnê mecalê bidine malbeta xwe, ku serpehatîya baş binivîsin, ya ku wê bibe mîrasa Ezmîn, ya ku hatîye li ser dinîayê. Em dixwezin, wekî hûn erdê li ser gemîya xwe paqij bikin, bona ku hûn bikaribin pêşda bilivin û jî wan tiştê azad bin, çî ku wê çetinaya bona we pêşda bîne, wextê stendina progirama Xwedê ya bo we. Me duakirin hazir kirîye, ya ku wê alî we bike, ku vê prosêsê destpê bikin.

Bila eva bona we bibe wedekî dîyarî.

Bavo, em razî ne, wekî Tu destpêk û mîrasa nû pêşniyarî me dikî.

Hetanî nivîsara vî hemû tiştî jî heleqetîyên me çî gerekê bê dûrxistinê, em dua dikin, wekî atmosferê ezmîn dora me bigre.

Em hîvî jî Te dikin, Ruhê Pîroz, rêberîyê li me bike û me fêr bike.

Em dua dikin, wekî milyaketên Xudan dora me esker saz kin û hazir bin, ku heyfildana hindava dijmin da mîyaser bikin, yê ku bi nisileta ser hev malbeta me dane zêrandinê.

Em bona kerema mezin dua dikin, ya ku wê qewatê bide me bona baxşandinê û guhartinê.

Em dua dikin, wekî fikirên me anegorî Gotina Te bîn daçêkirinê.

Em bona eyantîya hizkirina Te hîvî dikin, ya ku wê hemû tîrsa bide dûrxistinê.

Em bona dasekinandina aminayê û paqijkirina heleqetîyên xwe hîvî dikin.

Em dua dikin, ku Tu yekîtîyê bînî li wir, li kîderê jihevcihêbûn heyê.

Em hîvî dikin, ku Tu piştgirîyê bidî me, bona ku em ne ku anegorî hêvîyên, ku Xwedê xweş nayên, lê anegorî sozên Te bikevne nava xiyala.

Em nava malbeta xwe, zewaca xwe û jîyanên xwe da bi navê Îsa Mesîh azayê elam dikin. Em elam dikin, wekî padişatîya Xwedê nava me da ye. Xwestina Xwedê wê nava zewac û malbeta me da mîaser bibe, çawa ku li Ezmîn e, usa jî li ser dinîyayê. Bi navê Îsa, amîn.

KONTROLA MALBETÎ

“Hûn dilê xwe bicêribînin û dîna xwe bidinê, ka hûn nava bawerîyê da nin? Usa nejn, çawa ku hûn mînanî herroje nêzikî hemû tiştî dibin. Carana cêribandina bona xwe derbas bikin. Şedetîya we gerekê hebe, wekî Mesîh nava weda ye, lê ne ku li ser wî tiştî hûn bisekinin, çî ku we bihîstîye. Wê yekê binihêrin. Eger hûn wê kontrolê derbas nebin, tişteki bikin”.

— B Korintî 13:5, MSG

Carana bona pêşdaçûyîne, gerekê paşda binihêrin û fem bikin, ku hûn çawa gihîştine li vir, li kîderê ne hûn niha. Kontrola malbetî ya vî cûreyî wê alî we bike, ku hûn ewê tehevbinê bibînin, ya ku gerekê ji ser erdê gemîya zewaca we bê paqîjîkirinê û bi wê yekê va mijûl bin. Çend deqa bisekinin û bifikirin, paşê bi bêqelpî bersivê bidin.

Zarotîya xwe bîr bînin. Bi tomerî hildayî hûnê atmosferê mala xwe çî cûreyî binin ber çava?

Mînak (mesele)- edîlayî, tevhevbin, bi hizkirinê va tijî, vekirî, girtî, merdanî, timatî, bi tirsêva tijî, şa, germ û mêvanhizî, yan jî sar û dijminatî.

Bi cûrê kurt heleqetîyên dê û bavên xwe bînine ber çava, bi tomerî hildayî (heleqetî, hevaltî û tiştên mayîn)

Dê û bavê we hevraçayîlnebûna, pirsgirêka çawa didane rastkirinê? Ew çî cûreyî nêzikî hev dibûn?

Wextê ku we tiştek şaş dikir, yan jî wextê ku we nêzîkbûneke xirab dida kivşê, wana çi cûreyî hûn şîret dikirin? Gelo peyî şîretkirinê ra ew şaşî hela hê dijî we dihate xweyîkirinê, yan hûn bi temamî dihatine dasekinandinê û careke mayîn dihatine hizkirinê?

VAN CUMULA BÎ XWE SER HEVDA BÎNÎN

Li mala me tiştên usa hebûn, **kîjan min xweş dihatin**, û ez dixwezim wan tiştê li malbeta xwe biwekilînim...

Li mala me tiştên usa hebûn, **kîjan min xweş nedihatin**, û ez naxwezim wan tiştê li malbeta xwe biwekilînim...

Cabên xwe careke mayîn lê binhêrin û wana himberî jîyana zewacê û malbetî bikin. **Mînanîhevbûnên** çawa hûn nava atmosferê malbeta xwe, heleqetîyên xwe û merivê li rex xwe da divînin, nava wê yekê da ku hûn çawa pîrsgirêka didine rastkirinê û zarokên xwe çawa terbyet dikin? Tevgirêdaneke tomerî tê kivşê?

Anegorî bersivên we hûn û merivê li rex we gerekê erdê gemîya zewaca xwe jî çi bidine paqîjkirinê?

Derheqa bersivên xwe da merivê li rex xwe ra gîlî bikin. Dua bikin û wî hemû tiştî teslîmî Ruhê Pîroz bikin, çi ku gerekê ji emirê we bê dûrxistinê, paqîjkirinê.

BI BAXŞANDIN NÊZÎK BIN

“Bi baxşandin nêzikî şaşiyên hev bibin. Û her merivekî bibaxşînin, yê ku we dide xeydandinê. Bir bînin, wekî Xudan baxşande we. Usa ye hûn jî gerekê bibaxşînine meriva”.

— Kolosî 3:13, NLT

Gelo hûn bi *baxşandin* nêzikî merivê li rex xwe dibin? Gelo hûn îzinê didin, ku merivê li rex we şaşîya bike û mecalê didin, ku ew bi kerema Xwedê mezin be, ku bibe mînanî Wî? Bi rastî em hemû jî hewcê baxşandinê ne, çimkî em hemû jî şaşîya dikin. Bi baxşandinê em dibine mînanî Bavê xweyî ezmîn: em dibine ortecîyê kerema Wî bona merivê li rex xwe, ku bona guhartina wî merivî alî bikin. Xudanê kitêba K. S. Lyûûs dinivîse:

“Eger merivek mesîhî ye, ew yek dide kivşê, wekî gerekê tiştê usa bibaxşîne, kîjan yên baxşandinê nînin, çimkî Xwedê tiştên nebaxşandinê baxşandiye, yê ku nava te da bû. Diqewime awqas jî çetin nîne bêhurmetkirinekê bibaxşînin, lê baxşandina roja îroyîn... her dem xwesîya serwêr bibaxşînin, malxwê şerûd, jina ku her dem gazina dike, keça xwehiz, kurê derewîn her dem bibaxşînin: emê çawa bikaribin vê yekê bikin? Bi fikira min gerekê tenê bîr bînin, ku em li ser tabîke çî cûreyîne û bi rastî bawerîya wan xebera bînin, kîjana em her êvar dua dikin: “Gunehên me bibaxşîne, çawa ku em dibaxşînine wana, yên ku *dîjî me gunekar bûne*”. Peymaneke başqe tune ye, bi kîjanê em dikarin baxşandinê bistînin. Înkarkirina vê yekê dide kivşê, ku hindava rehma Xwedê înkâr bikin. Nava vê gotinê da tiştêkî cuda tune ye. Xwedê hema rast wê yekê dixweze, çî ku dibêje”.

Nava kîjan goveka da hûn dixwezin merivê li rex we bibaxşîne we? Nava kîjan goveka da hûn hewce ne, ku xeysetê xwedêtîyê dest bînin. Navê sê goveka bidin, derheqa kîjana da hûn zanin û li ser kîjana hûn dixebitin.

Sê goveka nav bikin, nava kîjana da merivê li rex we hewcê baxşandinê ye. Gelo hûn dibaxşînin? Eger na, bo çi?

Anegorî Gotina Xwedê çi wê biqewime, eger hûn qirar bikin, ku xeyîda dijî merivê li rex we dilê xwe da xweyî bikin? Bi guhdarî xeberên Metta 6:14, 15, 18:21-35, Marqos 11:25 bixwînin û binivîsin ku Ruhê Pîroz çi elam dike.

Baxşandina Xwedê bêsinor e. Eger bona we dijwar e, ku merivê li rex xwe bibaxşînin, hinek wede başqe bikin û li ser jîyîna derbasbûyî binihêrin. Gelo we fikira xwe da Xudan bêhurmet kirîye, bi gotin û karên xwe va? Wextê ku hûn kûraya gunehên xwe bîr bînin û dora wan zêrandina bifkîrin, yên ku Îsa li ser xwe dîtin, ku bona bahê wê yekê bida, Ruhê Pîroz wê dilê we nerm bike, wê keremê bide we, ku hûn bibaxşîninê.

**DUAKIRINA BONA TOBEKIRINÊ Û BONA
TESLÎMKIRINA MERVÊ LI REX XWE LI CEM XWEDÊ**

“Xudan, bona xweyîkirina xeyîda dijî merivê li rex min, min bibaxşîne. Tu hemû gunehên min dibaxşînî û tu cara wana bîr naynî. Qewat û xwestinê bide min, ku ez jî wî hemû tiştî bikim. Ez merivê li rex we teslîmî destên Te dikim. Hizkirin û kerema Xwe bike dilên me. Alî bike, ku bi dil wî merivî hiz bikim û bibaxşînim, hindava şaşiyên wî milahîm bim û alî wî bikim, ku nava Te da ew mezin be. Ez bi saxlemîyê, serwaxtîyê, edîlayê, şabûnê, hizkirinê, aminayê, bi eyantîya Gotina Te û heleqetiyên nêzîke tevî Te bona wî dua dikim. Spas, Bavo, wekî Tu zewaca me qenc dikî. Bi navê Îsa, amîn.”

Îzinê bidine Ruhê Pîroz, ku Ew xeysetê Xwe yî hizkirinê û xeysetê Xwe yî ku dibaxşîne nava we da çê bike, wextê ku hûn nava hazîrîya Wî da wede derbas dikin û bi guhdarî dora parçên Încîlê difikirin, mesele, van gotina: A Korintî 13, Romayî 5:5, Efesî 3:16-19, A Petrûs 3:8, 9.

HEMÛ TIŞT FIKIRA WE VA GIRÊDAYÎ YE

“..Fikirên xwe bidine berbi wî hemû tiştî, çi ku rast e, qenc e û heq e. Derheqa wî hemû tiştî da bifikirin, kîjan paqij û bedew in û derheqa wan merivên baş û rehî da nin. Derheqa wî hemû tiştî da bifikirin, bona çi hûn dikarin rûmetê bidine Xwedê û şa bin.”

— Filîpî 4:8, TLB

Hûn li ser çi fikirên xwe merkez dikin, wextê ku hûn derheqa merivê li rex xwe da difikirin? Eger hûn fikirên xwe li ser şaşiyên wî û teribandînen wî bidine merkezkirinê, pirsgirêkên we yên zewacê diha bên texmînkirinê. Feqet eger hûn fikirên xwe li ser wan tiştên bidine merkezkirinê, bona kîjana hûn dikarin razî bin, hûnê heleqetiyên xwe bi temamî bin ronahîke mezin da bivînin. Zewaca we û temamiya jiyana we fikira we va girêdayî ne.

Hûn çi cûreyî merivê li rex xwe qebûl dikin? Ew yek wê hukumî li ser heleqetiyên we bike, eger hûn fikirên xwe li ser şaşî û teribandînen wî bidine merkezkirinê. Hûn çi cûreyî nêzikî wê yekê dibin? Derheqa xeberên xwe, kirin û nêzîkbûna xwe da bifikirin, kîjana ew ji we distîne.

Dua bikin û hîvî ji Xudan bikin, bona ku derheqa rastîya nêzîkbûna we da bide eyankirinê. Ew çi nîşanî we dike? Çi hîvî dike, ku hûn bi alîkarîya Wî biguhêrin.

Hûn dixwezînin, ku qîmetê merivê li rex xwe bi cûrê nû bivînin? Bi guhdarî dora gotinên Filîpî 4:8 bifikirin. Peyî wê yekê ra navnişê çê bikin û nava wê navnişê da deh cudatîyên xeysetê jinê, yan jî mêrê xwe da binivîsin, bona kîjana hûn dikarin ji Xwedê razî bin.

Dîsa bifikirin derheqa wê yekê da û xalên nû nava 30-î rojên peyî ra ve navnişê da zêde bikin. Ese bi bêqelpî bona van cudatîya razalixiyê elamî merivê li rex xwe bikin.

Tirs wî hemû tiştî navhev dixe, çi ku em dibînin. Tirs guhdarîya me dibe berbi wan tişta, yên nava merivê li rex me, nava me û nava halên me da, kîjan şaş tên texmînkirinê. Gelek cara tirs **qelpî ye, ya ku rast tê texmînkirinê**. Hîvî ji Xudan bikin, ku wana eyan bike.

Van tîrsa bi gotinên Fîlipî 4:8 bidine derbaskirinê. Gelo ew rast, rehm û heq in? Gelo ew paqij û bedew in. Hûn dikarin bona wana pesinê Xwedê bidin? Hemû tiştê ku nava vê kontrolê da teyax dikin gerekê bîn avîtinê û dewsa wê rastî bê cîwarkirinê.

Gelek cara tîrsên me ji xeyîdên berê pêşda tên. Bi tîrsa wê yekê, wekî wê careke mayîn me biêşînin, em bêyî fikirdarî dicêribînin ku merivên li rex me bona şaşiyên dê û bava, hevalên berê, yan jî jin û mêrê berê bînine ber cabdarîyê.

Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, gelo ev pîrs çawa pêşda hatin? Kîjane hîmê wana? Ez çawa dikarim diha zêde aminaya xwe Te bînim û wana ji emirê xwe bidime derxistinê?”. Bê deng bimînin û guhdar bikin. Ew çi elamî we dike?

Ders: Roj 4

AZABÛNA JI NIFIRËN MALBETÎ

*“Mesîh bona azabûna me ya ji nîfirê bahê wê da...
û dewsa me nîfirikirî ma...”*

Galatî 3:13, GW

Xwedê dixweze nava malbeta we da tişteki nû bike. Ew dibêje: “Awa Ez tişteki nû dikim, yê ku wê eyan bibe: gelo hûnê nizanîbin? Ezê usa jî li qûmistanê rêkê çê bikim, lê li cihê vala jî çema çê bikim” (Îşaya 43:19). Çawa ku Coys Mayêr dinivîse:

*“Îsa hat, ku dergên hebsê bide vekirinê û dîla azad bike...
Dîqewime zaroktîya we bêbext bûye. Dîqewime halên we diha
xirab û hukumdar bûye. Dîqewime hûn nava haleki usa xirab
da bûne, weki hûn texmîn dikin, ku bona gumanê menîke rast
tune ye. Feqet ez dibêjime we: *pêşeroja we bi paşeroj yan jî
pêşerojê va qîrar nabe*” (binihêre Lûqa 18:27).*

Mesîh bahê wê da bona ku we merivê li rex we û zarokên we jî hemû nîfira xilaz bike. Hûn gerekê tenê serketina Wî *bidine xebatê*. Li ber Xudan bêdeng bimînin û dua bikin: Ruhê Pîroz gelo nava mîletzanîya min da nîfir hene, kîjan nerazîbûna Xwedê pêşda tînin. Gelo nava mîletzanîya merivê li rex min da jî ew yek heye? Ez hîvî dikim, ku Tu wan nîfira nîşanî me bidî, bona ku em bikarîbin miqabilî wê yekê derkevin û azaya rast bistînin”.

Wextê ku Ruhê Pîroz van nîfira eyan bike, hûn wana teslîmî Wî bikin. Wê duakirinê bidine xebatê, ya ku nava evî serê kitêbê da nivîsare û guman bin, weki Xwedê nava jîyana we da wê guhartineke nû bike.

Carana em bêyî fikirdarî îzinê nadin, ku pirsgirêkên nava jîyana me da, yên ku zîyanê didine malbeta me, ji jîyana me dûrkevin. Menî ew sond in, kîjan me bi xwe xwerine. Ev sond dora dilê me dîwar didine bilindkirinê. Neniherî wê yekê, wekî meremê wan xweparastin e, feqet dewsa wê yekê ew me dikine dîl û êşeke diha mezin li cem me pêşda tînin.

“Tu bi xwe, bi gotinên devê xwe, kefî telê, hema bi sozê xwe hatî girtinê”.

— Gotinên Slêman 6:2, GW

Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, gelo min bi xwe sond xwerîye? Eger erê, kîjanin ew?”. Bê deng bimînin û guhdar bikin. Bona wan sonda tobe bikin, kîjana Ew nîşanî we dike, hîvî ji wî bikin, ku Ew we ji hemû tîrsa bide azakirinê, bi navê Îsa.

Em bi xwe rûyê tîrsê da sonda dixun. Bi tîrsa wê yekê, wekî em careke mayîn derdekî mezin bivînin, em gelek cara vî cûreyî dibêjin: “Ezê tu cara îzinê nedime mêrekî yan jî jinekê...”, “Eger mêrê min, yan jî jîna min xayîntîyê li min bike (destê xwe li ser min bilind bike, yan jî tiştên mayîn) ezê...”. Eger hûn tiştên usa fikirîne, yan jî we bi dengê bilind gotîye, tobe bikin. Hîvî ji Xudan bikin, ku Ew alî we bike, ku hûn hindava parastina Wî da amin bimînin.

“Tu silihek, ya ku miqabilî te hatiye çêkirinê, wê negihîje açixîyê û her zîmanek, yê ku miqabilî dîwana te rabe, tê şaş bidî kivşê. Eva (edilayî, heqîfî, çareserî, serkevtina dijî miqabilderketinê ye), *Mîrasa* xulamên Xudan e (nava kîjanada fêmdariya Xulamê Xudan çê bûye)...”.

— Îşaya 54:17, AMP; xebera cudakirî zêdekirî ne

Hûn ji hemû nîfira azad in, û we hemû duakirinên ruhanî bi cûrê mîrasê stendine, çîmkî hûn tevî Îsa ketine nava heleqetîya

(binihêre Efesî 1:3). Bi guhdarî wan beşên Încîlê bixwînin û wan duakirina bivînin, kijan bona we û malbeta we nava Mesîh da femdarî ne: Metta 11:28, 16:19, Lûqa 10:19, 11:13, Yûhenna 4:14, 7:38, 39, 14:27, 15:11, A Korintî 1:30, B Korintî 5:21, B Petrûs 15:3, 4. Xêncî wê yekê, nava van gotina da Ruhê Pîroz çî dibêje we?

HÊVÎYÊN WE YÊN ÇI CÛREYÎ HENE?

“... (Xwedê) bi Xwe gotîye- Ezê tu cûrekî jî te neteribînim, ne jî Ezê te tenê bihêlim, ne jî bêyî piştgirî bihêlim. (Ezê ne), (Ezê ne), (Ezê ne) te bêyî alîkarî nehêlim, yan jî ezê te tenê nehêlim, ne jî gumanbir bikim (destê Xwe li ser te sist nekim). (Bêşik, na)”

— Îbranî 13:5, AMP

Hêvî “Gumana qewîn e, wekî pêşerojê da tiştêkê bibe, yan biqewime”. Wextê ku hêvîyên me ji merivekî hene, nava me da gumana usa pêşda tê, wekî ewê gelekî bi açix, yan jî gelekî rehm be. Em hîmlî derheqa wê yekê da difikirin, wekî ew wê çî cûreyî derbasî li ser me bibe. Çawa qanûn, hêvîyên here mezin yên nava emirê me da, ew merivin, yên ku diha gelekî nêzikî me ne û berê ewlin yên li rex me ne. Xudan û terîfkir **Patrîk M. Morlí** şirove dike:

“Ev hemû jî nava zewacê da hêvîya tînin. Ew hêvî cûre-cûre ne û gelek cara ew ne yên rast in. Hîmê wana ev e: (1) fikira me ya derheqa zewacê da û (2) hewcetîyên me yên mîasernebûyî. Nava me da her merivek fikira xwe da derheqa wê yekê da dibêje, ku zewaca îdêalî çî cûreyî ye. Diqewime ew fikir me ji dê û bavên me, ji gotinên wana yan jî karên wana, ji serpêhatîyên malbetê yên pêşda, ji dê û bavê hevalemî me, têlêvîzîyonê, kitêba, yan ji jî jîyana artistekî, yan jî mêrxasekî stendîye”.

Hêvîyên ku nerast in dikarin nava her govekeke zewaca we da pêşda bîn: pere, heleqetî, borcdariyên malê, terbyetdariya zaroka, heleqetîyên tevî hevala, heleqetîyên jin û mêra û tiştên mayîn. Bisekinin û dua bikin: “Xudan, gelo hêvîyên min yên nerast nava zewaca min da hene? Eger erê, kîjanin ew hêvî?”.

Ruhê Pîroz çî dide kivşê? Wê yekê binivîsin, usa jî wan gava bidine dîyarkirinê, kîjana Ew nîşanî we dide, ku hûn bikin.

Hûn çawa dikarin hêvîyên xwe yên nerast werguhêzî yên rast bikin? **Patrîk Morlî** şirovekirina xwe berdewam dike:

“Em gerekê fêrbin, bidin û dewsa wê yekê hîvîya tu tiştî nîbin. Em gerekê fêrbin, ku *derheqa hêvîyên xwe da* li ber merivên li rex xwe *gîlî bikin*, paşê wana guhdar bikin, ku bidine zelalkirinê, ku gelo ew rast in, yan na?”.

Ji merivên li rex xwe bipirse: “Tu dikarî bêjî, wekî hêvîyên min yên nerast jî te hene? Eger erê, ew hêvî kîjan in?”. Bi qedir nêzikî wî bibin û bêyî navbirîdayîna xeberdana wî guhdar bikin. Wî hemû tiştî binivîsin, çî ku ew we ra dibêje.

Eger hêvîyên nerast jî aliyê merivên li rex we da hebûne, wede başqe bikin, bona ku baxşandina bêqelp bê xwestinê, ku ew bikeve bin hukum. Dua bikin û hîvî jî Xudan bikin, ku ew qencbûnê bîne nava zewaca we û bona we herdua jî hêvîyên rast bide pêxistinê.

Dêmek, hêvîyên me gerekê ji Xwedê bin û jî wan sozdayîna bin, kîjan nava Gotina Wî da nin. Ew helal e û wê me nehêle û dîrkeve. Dua bikin: “Xudan, gelo ez bi cûrekî hîvîya wê yekê me, ku merivê li rex min wê wan hewcetîya tîjî bike, kîjana Tu t’ênê dikarî bikî? Eger usa ye, hîvî dikim, wê yekê nîşanî min bide. Keremê bide min, ku ez amin bim, wekî Tê wan hewcetîya tîjî bikî, bêdeng bin û guhdar bin. Ruhê Pîroz çî dide kivşê?”

PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

Eger hûn vê kitêbê nava sinorên dera tomerî, ya nava “Berevoka Mêsincêrê” ya “Serpêhatîya derheqa zewacê da” lêkolîn dikin, vidêoya hinkirinêye 3-a temaşe bikin.

- 1| Hevraqayînebûnên nava zewacê da her dem jî hene, feqet ew yek gelekî girîng e, ku wana çawa bidine rastkirinê. Gereke hesab hildin, wekî mêr û jin du merivên başqe ne, yêu ku nava prosêsa yekbûnê da nin. Bo wê yekê jî fikirdarî, femdarî ye û texmînkirinên wana cûre-cûre ne. Jin û mêr cûrekî başqe halên dora xwe, mecala û tiştên mayîn lê dinihêrin. Gelo hûn derheqa wê yekê da fikirîne? Gelo hûn cudatîya merivên li rex xwe fem dikin, kîjan alî we dike, ku hûn wî qîmet bikin û wî bin ronahîya nû da bivînin?
- 2| Bi destî Mesîh Xwedê bibaxşîne wana, yên ku baxşandinê hîvî dikin. Feqet wê çi bûya, eger we hîvî ji Xwedê bikira, ku Ew we bona tiştêkî bibaxşanda, lê Ewî jî bigota: “Ez guman nînim, wekî dixwezim bibaxşîme te. Diqewime tu careke mayîn wê yekê bikî. Berê ewlin Ez dixwezim nava te da guhastinê bivînim”. Eger we cabeke wî cûreyî bistenda, weyê çi texmîn bikira? Gelo hûn vî cûreyî fikirîne, yan jî we usa gotîye, wextê ku merivê li rex we ji we baxşandin xwestîye? Ewê li ser xwe çi texmîn bikira?
- 3| Baxşandina Xwedê dewsa nêzîkbûna guhartî nîne. Ew kivota aminaya Wî ye. Bisekinin û bifikirin. Hizkirina Xwedê ya bêyî tu tişt û qewata baxşandina Wî we dibine berbi guhartinê? Bin ronahiya vê rastîyê da hûn gerekê çi cûreyî nêzîkî merivê

li rex xwe bibin, wextê ku tê dewkirinê ku bibaxşînin. Rûyê nêzîkbûna we da ewê çawa bibe?

“Baxşandin mecala tek-tenê ye, bi kîjanê dorana gunekarkirinê û êşê ya nava heleqetîya da dikare bê xirabkirinê... Ew hemû pîrsa nade helkirinê, girêdayî gunekarîyê û heqîfîyêva... Feqet ew îzinê dide, wekî heleqetî ji nûva destpê bibin”.

— Filîp Yansî

- 4| Tirs qewata ruhanî ye, ya ku nava jîyana me da miqabilî hizkirina Xwedê û parastina Wî derdikeve. Eger em tirsê nedine eşkerekirinê û miqabilî wê dernekevin, ewê îzinê nede, ku em bighîjine mezinaya zewaca xwe. Mêrno, gelo wextê heleqetîya tirsên mêra yên çi cûreyî hene? Jinno, gelo tirsên jina yên çi cûreyî hene, wextê ku tevî mêrê xwe nava heleqetîya da nin? We mecalên çi cûreyî dîtine, ku wan tîrsa alt bikin?

TIRSÊN MÊRA

TIRSÊN JINA

- 5| Hêvîyên nerast yên nava zewacê da bona bêhurmetkirinê û xeyîdê cî çê dikin. Dijmin bi fêlbazî mecalên prêsayê dide xebatê, bona ku derheqa merivên li rex me da fikirên nerast pêşda bên û usa jî toximên nerazîbûnê bireşîne. Bisekinin û bifikirin. Fîlm, mûzîka, progiramên têlêvîzîyonê, rojname, întêrnêt fikirên derheqa merivên li rex me û zewaca me da çi cûreyî çê dikin? Gavên praktîk yên çi cûreyî hûn dikarin

biavêjin bona ku dilên me û fikirên me ji hêvîyên nerast bèn parastinê.

Serwêr: Gotina Filipî 4:8, çawa norma bêşaşîye nava pirsra bijartina mecalên prêsayê da, raber bikin.

*“Çimkî, çawa ku ew dilê xwe da difikire,
ew usa jî heye...”*

— Gotinên Silêman 23:7, NKJV

- 6| Gelo hûn rastî qewimandinên dijwar hatine, girêdayî kontrola qewima ra? Bêyî dayîna navên wana, derheqa yekî da gilî bikin. Eger we ra li hev hatiye nava wî halî da serbikevin, bêjin, ku Xwedê çawa alî we kir. Eger hûn hela hê nava halê wî cûreyî da nin, hîvî ji koma xwe bikin, ku dua bikin, wekî kerema Xwedê qewatê bide we, ku hûn nava wî halî da rast pêşda herin.

TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Bi paqijkirina erdê gemîya zewaca xwe, hûn mecalê distînin bikevine nava wê mezinayê, ya ku Xwedê bona we têra dîtiye.
- Baxşandin gaveke azabûnê ye him bona merivê ku bêhrmet dike û him jî bona merivê tê bêhurmetkirinê. Bi saya kerema Xwedê em dikarin wan meriva bibaxşînin û baxşandina Xwedê qebûl bikin, bi azayî, bêyî sînora.
- Em nikarin merivên li rex xwe biguhêrin: tenê Xwedê dikare wê yekê bike. Feqet em dikarin tevî Wî hevkar bin, îzinê bidin, ku Ew me biguhêre.
- Razîbûna merivên li rex we wê dilê we veke, îzinê bidin, hiz bikin, bibaxşînin û kerema Xwedê nişanî wî bikin, bona ku him ew û him jî hûn bikaribin mezin bin, bên guhartinê.
- Wextê ku hûn qîrar dikin bibaxşînin, hemû kesên nava malbeta we da karê bikevin, çimkî hizkirin me dide gulvedanê.
- Hizkirina Xwedê tirsê dide eşkerekirinê û jî jîyana me dide dûrxistinê. Wextê ku em îzinê didin, ku hizkirina Wî nava me da kar bike, ew yek tirsên merivê li rex me dide dûrxistinê û hemû şaşî û teribandînen me dide veşartinê.
- Hetanî çêkirina mîrasa nû, hûn gerekê miqabilî wan nifra derkevin, yên ku malbeta we dane zêrandinê. Bi saya xebata Mesîh ya ser hevda anî, hemû nifir hatine xirabkirinê.
- Zewaca we nava halê çî cûreyî da be jî, Xwedê dikare wê yekê biguhêre, çimkî Ew nava wê zewacê da ye. Tevî Wî tiştê usa tune, ku neyê kirinê.



— ÇAR —

R'abine li ser p'îya û çê bikin

“..Hûn zanin, kô serwêrêd mileta serwêrfyê li wan dikin û giregirêd wan hökômî li ser wan dikin. Lê nava weda gerekê ösa nibe. Kî kô nava weda dixweze bibe yê mezin, gerekê bibe berdestiyê we. Û kî kô nava weda dixweze bibe pêp, gerekê bibe xölamê we, çawa kô Körê Însan nehatîye, kô jêr'a berdestiyê bikin, lê wekî ew xwexwe berdestiyê bike û emirê xwe bide, kô geleka bik'irê.”

— Metta 20:25-28

Roj I

Tênê mecaleke kardar bona çêkirina zewaca saxlem heye. Neniherî wê yekê, wekî tê bêjî ew kivş e, lê tê texmînkirinê, wekî ew yek bona me geleka veşartî ye. Em gerekê eşaretiyê bidine we, wekî ew mecal wê we firnax neke û ne jî bi hêsanî wê bê dayînê. Feqet ew rîya tek-tenê ya, bi kîjanê meriv dikare wê razîbûnê bistîne, kîjanê em dixwezin ku nava zewaca me da hebe. Hûn hazir in, ku derheqa vê sure da pê bihesin. Ew yek *qulixkirin* e. Bona çêkirina zewaca anegor xiyalên

we, mecala tek- tenê ew e, ku hûn emirê xwe pêşkêşî qulixkirina li rex merivê xwe bikin.

Em hîvî dikin, ku hûn xwendina kitêbê berdewam bikin. Em zanin, wekî fikira derheqa qulixê da gelek cara çabûna mezin pêşda nayne. Gelek cara ew nerazîbûnê û tirsê pêşda tine. Em cûrekî mayîn difikirin, wextê ku zanin emê bona berjewandîyên yekî mayîn qulix bikin. Feqet, Îsa- kurê Xwedê û Padişê padişar qirar kir bibe xulam, çimkî Ewî tiştê herî baş bona we dixwest. Berjewandîyên me bûne pirsar xemgînîya Wî ye here girîng. Ewî ew tabîya mîrtîyê înkâr kir, ya ku dighîşte Wî, ku bona gelîyê di navbera Xwedê û mîriv da rê çê bikira. Lê niha, peyî wê yekê ra, wextê ku Ewî rê hazir kir û me tevî Xwedê li hev anî, Ew razî ye, wextê ku xiyal û xwestinên me mîyaser dike û şabûnê û karebûnê dide me, ku em bibine mînanî Wî. Bi dayîna emirê Xwe, Îsa pêşniyar kir, ku jîyana me bi zêdayê va tijî bike. Qulixa vî cûreyî ya bêsinor ew norm e, bi kîjanê em gerekê hemû heleqetîyên xwe, xwezima zewaca xwe çê bikin.

Niha, wextê ku erdê gemîyê paqijkirî ye, hûn dikarin wê zewacê çê bikin, derheqa kîjanê da hûn ketine nava xiyala. Çi jî hebe, tenê mecalek heye, bi kîjanê hûnê xiyala xwe ya zewacê mîaser bikin. Ew şabûn, hizkirin û razîbûn e, kîjanê hûn dixwezin ku hindava zewaca we da hebe, dikarin bibine rastî, tenê wî çaxî, wextê ku hûn berjewandîyêdên xwe dayînine alîkî, berbi berjewandîyên merivê li rex xwe bicedînin.

We texmîn kirîye, wekî mesîhîyên here bêbext ew in, yê ku t'enê bona berjewandîyên xwe dicedînin. Bawermendên here sînokirî ew in, yên ku tu cara bona yên mayîn tu tiştî nakin. Menî ew e, wekî wextê ku em nava Mesîh da nin, bedena Îsa ya ruhanî, nava kîjanê da qulixkirin hatîye danînê, dibe beşeke tebyeta me. Îsa xulamê herî mezin e. Wextê ku em naxwezin, ku heyîna xwe ya nava Wî da qebûl bikin, em xwe ji qewata Wî cuda dikin. Ev

qewat bona çêkirina malbetê û jîyana ku Xwedê xweş tê, gelekî girîng e. Em dikarin wê yekê bistînin, tenê wî çaxî, wextê ku em divedînin wî cûreyî bijîn, çawa ku Ewî dikir. Eger em qulix nakin, em nikarin zewaca usa çê bikin, kîjanê em dixwezîn.

Bibe yê herî biçûk

Wextê şîva dawî, Îsa gote şagirtên Xwe, hevalên Xweye here nêzik, wekî mirina Wî nêzik e û zûtirekê hindava Wî wê xayîntîyê bikin. Caba Wî çi cûreyî bû? Pêşda wana ew yek înkâr kir, wekî wana dikaribû xayîntîyê bikin, lê nişkêva wana destpêkir nava hev da xeberdin, ku ji wana kî yê herî mezin e.

Îsa derheqa mirina Xwe ya nêzik da gilî dikir û tiştê tek- tenê, wekî hevalên Wî yên here nêzik dikaribûn bikirana, çawa caba wê yekê xeberdana derheqa mezinayê da bû. Awa çi cûreyî Îsa bersiva xêfiktîya wan da.

“...Yê nav wedayî herî mezin bila bibe mîna yê herî biçûk.
 Û bira yê serwêrtîyê dike jî bibe mîna yê ku xulamtîyê dike.
 Niha kîye mezin? Yê li nêzikî sivirê rûniştî, yan berdestî? Ne yê
 li nêzikî sivirê rûniştî? Û Ez nava we da mîna berdestîkî me”
 (Lûqa 22:26, 27).

Gotinên Îsa diqewime usa şagirta xistin, mînanî wê yekê, çawa ku topa fûtbolê sifetê kesekî keve. Wana zelal got, wekî berbi mezinayê divedandin. Feqet, Ewî caba Xwe da, gote wan, wekî bona mezinayê ew gerekê nava xulamtîyê da bighîştana pêşketina mezin.

Feqet Îsa bi van xeberên dijwar va gotina Xwe ser hevda neanî. Ewî xeberdana Xwe berdewam kir, rûyê çî da şagirt ketine nava halekî diha necayîz û diha gelekî navhevketî. Încilê da nivîsar e:

“Îsa zanibû, wekî Bavê serwêrtîya hemû tişt dabû Wî, û wekî Ew jî Xwedê hatibû û wê paşda vegeerîya li cem Xwedê. Hingê

Ew ji ser şivê rabû, potê xwe danî alîkî û pêjgîrek hilda li piştê xwe girêda. Paşê av kire teştê û destpêkir lingên şagirtên xwe şuştin û bi pêjgîra girêdayî ziha kirin” (Yûhenna 13:3-5, NLT).

Ev beşa ji Încîlê meriva ecêbmayî dihêle, çimkî dide kivşê, ku *bona çi* lingên şagirtên Xwe şuştin. Caba vê pirsê meriv dikare bivîne, wextê guhdariyê dayne li ser gotina “*hingê*”. Serwêrî bona Îsa hatibû dayînê, *çi jî hebe*, Ewî Xwe da takirinê û ew yek kir *çi* ku borcdariya xulam bû. Tabûna Îsa ya qelp nîbû. Ewî tabîya Xwe ya serwêrtiyê fem fikir, ya ku Ewî da xebatê bona avîtina gava qulixkirinê.

Sedsala yekê da rê çêkirî nîbûn û dikanên usa tune bûn, li kîderê rêwî bikaribûna solên sportê bikiryana. Meriva çarix pê dikirin û herîya li ser rê û gemara başqe lingên wan va diqelibîn. Ez li ser xwe guman im, wekî nava qewilên wî cûreyî da bêhna pîs ya nigên meriva dighîşte asteke usa, wekî dinîya îroyîn da ew yek eyan nîne.

Nigên meriva her dem qirêj dibûn û xulama gerekê nigên axayên xwe û usa jî yên mêvana paqij bikirana. Li malên merivên dewletî da gelek borcdarî hebûn, gerekê gom paqij bikirana, xwerin hazir bikirana û odên malê jî paqij bikirana. Feqet borcdariya şuştina niga li ser xulamê herî nimiz bû. Li hinek ciha meriva ev borcdarî tenê teslîmî xulamên jin dikirin, çimkî jin dihatine hesabê çawa xulamên here nimiz.

Îsa qirar kir, ku qulixa here nimiz bike. Bona *çi*? Ewî dixwest nîşanî şagirtên Xwe bikira, ku qulixkirin bi çiqasî va girîng bû. Ewî potê xwe jî êxist, yê ku nîşana tabîya Wî ya serwêrtiyê bû û pêjgîr mînanî xulama li piştê xwe girêda. Bîr bînin, wekî Îsa ev hemû tişt kir, lingên wan meriva şuştin, yên ku piştî hinek wede gerekê hindava Wî da xayîntî bikirana, yan jî ji Wî dûrketana.

“Gava lingên wan şuştin, potê xwe avîte ser xwe, dîsa li ber sivirê rûnişt. Ji wan pirsî: “Gelo hûn zanin, ku Min bona we *çi* kir? Hûn Min Dersdar û Xudan hesab dikin, hûn rast dikin, Ez hema usa

ji heme. Awa eger Min bi vê Xudan û Dersadrîya Xwe va lingên we şuştin, gerekê hûn ji lingêd hevdu bişon. Min nexşek nîşanî we kir, wekî çawa Min bona we kir, hûn ji usa bikin. Ez rast, bê xêlif wera dibêjim, xulam ji axayê xwe ne mezintir e, ne ji yê ku hatiye şandinê, ji yê ku ew şandiyê, mestir e. Eger hûn vê yekê zanin, hûnê xweziliyê bin gava biqedinin” (Yûhenna 13:12-17).

Piştî şuştina lingên şagirta, Îsa careke mayîn potê Xwe xwekir, paşda vegeşîya li ser rola Dersdar û ew ders ser hevda anî, ya ku wê tu cara ji bîra şagirtên Wî neçûya. Şîretên vê dersê meriv dikare bi çar xala va bide tomerîkirinê:

1. Çawa Xudan û Dersdar, Ez mînaka we ya sereke me.
2. Çawa ku Min ev kirina nimiz bi rezedilîya Xwe kir, nefikirin, wekî ev yek yan ji karekî qulixêyî mayîn ji qedirê we nimiztir e.
3. Ez Xudanê we me, Yê ku diha mezine, ne ku hûn, feqet çî ji hebe, Ez dixwezim mînanî xulamê herî nimiz qulix bikim.
4. Ez bona wan meriva dua dikim, yên ku li peyî mînaka rêberîya Min, ya ku qulix dike, diçe.

Bona qulixkirinê hatiye gazîkirinê

Îsa got, wekî emê bêne dukirinê, eger li peyî mesela Wî herin. Ev yek dide kivşê, wekî dukirina Wî wê li ser zewaca me bitemire, wextê ku em bibine mînanî Wî, qulixî merivên li rex xwe bikin.

Em nabêjine we, ku hûn ji mînanî Îsa êvarê lingşuştinê teşkil bikin. Fikira vê yekê ew e, wekî nava jîyana xwe da em dîna xwe bidine mesela qulixa Wî. Nava zewacê da em dîna xwe didine mesela Mesîh, wextê ku em tabîya xwe nava malbetê da bona qulixkirinê didine xebatê. Pawlos dinivîse:

“Xwehiz nîbin... yên mayîn ji xwe baştir hesab bikin, ne ku xwe, şikestî bin. Nêzîkbûna we *gerekê* wî cûreyî be, çawa ku ya Îsa Mesîh” (Filipî 2:3, 5, NLT; xebera cudakirî zêdekirî ne).

Nêzîkbûna Mesîh kîjan bû? Ewî qirar kir, mînanî xulam be û berjewandîyên merivên başqe ji yê Xwe bilindtir kirin. Ew hetanî dawîyê çû, bona wan mir, kîjan Ewî hiz dikirin. Ji me îdî gelek meriv bona wê yekê nehatine gazîkirinê, ku bona merivên li rex xwe wê yekê bikin, lê em hatine gazîkirinê, ku em xwehizîya xwe bo wana berdîn.

Dêmek eger qulixkirin awqas bi rûmet e, eger ew duakirina Xwedê tîne, bona çi gelek meriv wê yekê nakin? Pirs nava tebyeta merivatîyê da ye ketîye, ya ku her dem miqabilî rêyên Ruhê Xwedê şer dike û me ra dibêje, ku em berbi berjewandîyên xwe bicedînin. Bedena me dewê dike, ku xwestinên wê hesab hildin û cedandinên wê mîyaser bikin. Feqet bi çiqwasî va jî em tebyeta merivatîya xwe bidine xwerinê, ewê hê zêde bixweze.

Tebyeta gunekar her dem xwehizîyê û nerazîbûnê pêşda tîne, lê Ruhê Xwedê me bona xwepêşkêşkirinê qewat dike û razîbûna wededirêj dide. Gelo em her deqe wê yekê dibijêrin, ku bi Ruhê Xwedê va bîn rêberkirinê, yan bi xwestinên bedena xwe?

“Tebyeta gunekar dixweze xirabkarîyê bike. Ew yek jî miqabilî xwestinên Ruh e. Û Ruh xwestina dide me, kîjan miqabilî wî hemû tiştî ne, çi ku tebyeta gunekar dixweze. Ew her du qewat her dem miqabilî hev şerkarîyê dikin, usa ye hûn azad nînin ku meremên xwe yê qenc mîyaser bikin” (Galatî 5:17, NLT).

Îsa em ji tebyeta gunekar dane azadkirinê, bona ku em bikaribin azad jîyanên xwe bikine qurbanî. Xilazkirinê em azad nekirin ku zêde bistînin, lê bona wê yekê, ku em zêde bidin. “Çimkî hûn bona azadiyê hatine gazîkirinê, - Pawlos dinivîse... Lê tenê azadiya xwe bona razîkirina tebyeta gunekar nedine xebatê. Dewsa wê yekê azadiya xwe bona wê yekê bidine xebatê, ku bi hizkirin qulixî hevdu bikin” (Galatî 5:13).

Me azadî stendîye, ku bikaribin jîyanên xwe bikine qurbanî. Eger em tenê bona xwe bijîn, emê azadiya xwe ya nava Mesîh

da wunda bikin û emê xwe bidine xwehizîyê û gunekarîyê, feqet Mesîh mir, ku me ji wê yekê xilas bike. Lê eger em fêr bin, bijîn û qulixî meriva bikin, xwezima merivên li rex me, emê wê jîyanê bistînin, ya ku Ewî bona me çê kirîye.

Roj 2

Bi Ruh va tijîbûyî

Wextê ku meriv bîr tînin, wa gotî “beşa zewacê” ya nava Efesî 5-da, ew her dem ji gotina 22-a destpê dikin, bi kîjanê tê gotinê, wekî jin gerekê şikestî bin, gurêda bin. Feqet bi rastî gotina Pawlos hela hê zû destpê dibe. Bona ku bi temamî fem bikin, wekî zewacên me gerekê çawa heleqetîyên Mesîh û Civînê bidine kivşê, em gerekê ji gotina 18-a bixwînin:

“... Her dem bi Ruh va (Ruhê Pîroz) tijîbûyî bin” (Efesî 5:18, AMP).

Ew xebera, ku nava vê gotinê da bi xebera “tijîbûyî”-va hatiye tercimekirinê, nava zimanê yûnanîda dide kivşê, wekî her dem bi Ruh va têrbûyî bin. Carek tenê bes nîne. Eger em her dem bi ruhê Xwedê va tijî nabin û bi Wî va nayêne piştgirtinê, emê hîvîyê bin ku merivên li rex me wan hewcetîya tijî bikin, kîjana tenê Xwedê dikare tijî bike. Eger jina we, yan jî merê we merivekî baş e, yan jî meriveke baş e, ewê tu cara nikaribe cihê Xwedê bigire. Eger hûn hîvîyêne, wekî mêr, yan jî jina we wê merem û fikirê bide jîyana we û wê duakirinên usa bide, kîjana tenê Xwedê dikare bide, hûnê nerazî bin, gumanbir bin û hûnê nikaribin hizkirina Xwedê nişan bidin.

Zewacên me wê awqasî Mesîh bidine kivşê, çiqwasî em îzinê didin, ku Ruhê Wî nava jîyanên me da kar bike. Mesîh kevirê enîşka xilazbûna me ye, lê Ruhê Pîroz Ew e, bi saya Kîjanî em

tên guhartinê. Eger em îzinê bidin, ku jîyana me her dem bi Ruhê Pîroz va tijîbûyî be, fikirdariya me wê çê bibe, lê xeysetê me jî wê bê guhartinê. Xwedê dibêje:

“Tebyeta xwe ya berê ji xwe dûrxin... Û her dem bi ruhê fikira xwe werine daçêkirinê (bi heyîna fikirdariya saxlem û tabîya ruhanî) û tebyeta nû xwe bikin, ya ku bi şikilê Xwedê, bi heqîtiya rast û pîrozayê hatiye çêkirinê” (Efesî 4:22-24, AMP).

Gelo wê çî bibe, eger hûn bixwezin bi lûlê avdin, ya ku avê va kirî nîne. Ew yek wê hema wî cûreyî be, eger hûn bicêribînin bêyî Ruhê Wî qulixî Îsa bikin û Wî hiz bikin. Lûle nikare avê bide, ew tenê avê nava xwe ra dide derbaskirinê. Hema wî cûreyî jî em dikarin qulixî merivên li rex xwe bikin û wana hiz bikin, çawa ku Xwedê dixweze, tenê wextê ku hûn qewata Ruhê Pîroz qebûl bikin.

Xebitandinaa qewata xwestina xwe û xebata li ser xeysetê xwe cîhê xwe digrin, lê yeke, ew yek nikare fikirdariya me bide daçêkirinê, yan jî xwestinên bedenê alt bike. Ruhê Pîroz nava me da kar dike û bi saya wî emirê me tê guhartinê. Em dikarin hukumê Wî tenê wî çaxî texmîn bikin, wextê ku em nêzîkî Şexsê Wî bibin û qewata Wî qebûl bikin. Hukumdariya Wî bi nêzîkbûna mesîhîtiyê û kirên hindava merivên li rex me da tê kivşê. Eger hûn bicêribînin xeysetê xwe bêyî tevbûna Ruhê Pîroz biguhêrin, hûnê nerazî bimînin, yan jî bikevine nava şaşiyê.

Me gelek nume ji mêra û jina stendine, zewacên kîjana rûyê xeysetên dîktatorî da xirab bûne. Gelek cara ew meriv baş derheqa Încîlê da zanibûne, lê hizkirina Ruh û kerema Wî li cem wan tune bûne. Çawa feydayê wê yekê ew xeber, kîjan gerekê ew azad bikirana û qewat bidana wana, bona sînokirinê, sistkirinê û şermdayîne hatibûne xebitandinê. Ev tiştên xirab li her cîha hene, li kîderê xwehizî heye. Ew nava me da zêde dibe, wextê ku em bona xebata Ruhê Pîroz vekirî nînin û qebûl nakin, wekî qulix nava zewaca me da rola me ya sereke ye.

Hetanî dawîya evî serê kitêbê emê derheqa wê yekê da xeberdin, ku nava zewacê da çawa qulix bikin. Meremê me ew e, ku anegorî Încîlê bidine kivşê, ku em çawa dikarin bi rîya qulixkirinê zewacên xwe çê bikin û derbas bikin. Em usa jî we ra dibêjin, ku evî serê kitêbê çawa îzindayîn nedine xebatê, bona gunekarkirina xeysetê merivê li rex xwe. Dewsa wê yekê ewê çawa rênîş bidine xebatê bona pêşdaçûyîne.

Em fem dikin, wekî em derheqa wê yekê da xeber didin û hesab dikin, ku herdu jî (mêr û jin) bi qedir nêzikî rolên zewacê dibin, kîjan Xwedê bona wan qirar kirine. Çawa jî hebe, em zanin, wekî ne hemû mêr û jin in, ku wî cûreyî ne. Nava halê çî cûreyîda bin jî, bîr bînin, wekî hûn bi xwe nikarin merivê li rex xwe biguhêrin. Eger bicêribînin wê yekê bikin, hûnê tenê karê Xwedê navhev bixin. Dilê xwe vekin, ku Ruhê Xwedê tevî we bixebite û îzinê bidine Wî, ku Ew nava merivê li rex we da wê xebatê bike, kîjanê tenê Ew dikare bike.

Şexsîtî û rol

Bona ku em wan rolên qulixê fem bikin, kîjana em nava zewacê da hildidine ser xwe, em gerekê careke mayîn vegerine baxçê Yêdêmê:

“Xwedê meriv bi şikilê Xwe çê kirin. Bi şikilê Xwedê Ewî ew çê kirin- ew kirine nêr û mê” (Destpêbûn 1:27, NLT).

Him mêr û him jî jin bi şikilê Xwedê ne û tebyeta Wî didine kivşê. Mêr û jin cuda ne, lê ew her du jî wekehev girîng in, ku li vê dinîyayê tebyeta Xwedê bidine kivşê.

Mêr û jin rol in, ev rol cuda ne, ku Încîl bi cûrê mexsûs derheqa wê yekê da xeber dide, ku ew çî têra divînin, lê ev rol şexsîtîya me nînin. Heyîna me girêdayî ye wê yekê ra, ku em çî cûreyî hatine çêkirinê. Li ser vê dinîyayê em çawa yên mînanî Xwedê hatine çêkirinê. Ketina mêriv ev merem da navhevixistinê,

lê bi kanîya Mesîh ew yek da dasekinandinê. Xilazbûna me ya nava Mesîh da berê ewlin guhartina heyînê ye.

Tu rolek- mêr yan jî jina pêşekzan, qulixçî, yan jî heval, nikare heyîna we bide bêfikirkirinê. Guhastina rolê (mesele, wextê ku dizewicî) weke guhartina şexsîtiyê nîne, çimkî him mêr û him jî jin piştî zewacê çavê Xwedê da awqasî giranbiha ne, çiqwasî ew pêşîya zewacê ne.

Telebext ra, gelek meriv (xwezima jin) difikirin, wekî qîmetê wana piştî zewacê tê guhartinê. Jin ditirsin, wekî mêrên wana bona qedirgirtinê wê mecbûr bin girîngîya dereca duda bidine wana. Wî çaxî dewsa bilindbûna nava hizkîrinê û qulixê da, jin dikeve, dibe xulam, hetanî ku şexsîtiya wê dibe sifir (ziro).

Berê ewlin dikare bê texmînkirinê, wekî mêr ji van qewila karê dikeve, lê usa nîne. Bi rastî, her du jî bin dikevin, wextê ku ji wana yek xwehizîê va dijî. Ew mêrê, ku jina xwe nava zewacê da çawa endama weke xwe hesab nake, ne tenê ji hevaltîya nêzik miqûf dimîne, lê pêra jî mecala xwe ya pêşdaçûyîna unda dike. Mêr diha gelekî nêzikî mesihîtiyê dibin, wextê ku ew usa qulixî jinên xwe dikin, çawa ku Îsa qulixî Civînê dike. Bîr bînin, wekî Îsa da kivşê, ku serwêrtî bona Wî qulixkîrin e, bona wan meriva, kîjana Ew hiz dike serwêrtîyê li wan dike.

Hizkîrin û qedirgirtin him bona jinê û him jî bona mêr hîm in. Her du jî li ser tabîya girîng in û her du jî qulix dikin. Eger em zewacên wî cûreyî lê binihêrin, wî çaxî nava jîyana me da pêşkêşa wê qewatê û wê serwêrtîyê wê bê dasekinandinê, ya ku Xwedê dabû him mêra û him jî jina, ji wî çaxî da, wextê ku merivatî hatîye çêkîrinê.

Xweyîtlêkirin dijî hukumdarîyê

“Xwedê du li wan kir û wan ra got: “Şin bin û li hev zêdebin, erdê tijî bikin û xweyîtiyê lê bikin, hukumî li ser mesîyên behrê, teyredên ezmên û hemû heywanên li ser erdê, yên ku dilivin,

bikin...". Xwedê dîna xwe da hemû kirinên xwe û awa ew yên gelekî qenc bûn..." (Destpêbûn 1:28, 31).

Pêşda mêr û jin dijmin nîbûn. Ew merivên nêzîkî hev bûn, du şexsên cuda, yên ku yek bûn, û dilên kîjana yek bûn. Teslîmî wan hate kirinê, ku dinîyayê tijî bikin û hukumî li ser wê bikin. Xwedê ew xebat da wana (şîn bin û zêde bin) û îzin da, ku ew tiştên mayîn qirar bikin. Wana jî destpê kir, hukum bikin.

Hukumkirin dide kivşê: serkarîkirin, serwêrtîkirin û kontrollîkirin. Ev xebera nava dorana hukumdarîya serwêrtîyê êda dide kivşê. Çawa ku ji serpêhatîya şîva Dawî em hîn bûn, temamiya serwêrtîyê, ya ku bona mêrekî yan jinekê hatîye dayînê, ew bi meremê qulixkirina bona merivên başqe, bona kara wana, pêşdaçûyîna wana hatîye dayînê.

Şerê di navbera mêr û jina da piştî ketina mêriv destpê bû. Rûyê gelîyê bêsinor da, yê ku di navbera Xwedê û mêriv da pêşda hatîye, hukum werguhêzî dîktatorîyê bû. Ev şaşî her dem miqabilî yektîyê şer dikin, ya ku Xwedê çê kirîye. Zewac bû hacetê jihevcihêbûnê, lê ne ku hacetê zêdebûnê.

Nava zewacê da gerekê bona serwêrtîyê şerkarî nebe. Ew çawa yekîtiya serwêrtîyê saz bûye. Zewac du meriva dike yek, fikirên kîjana cuda ne û cudatîyên nava xeyseta da jî dide xebatê, mecala zêdebûnê çê dike. Eva beşeke progirama Xwedê ye, bi kîjanê Ewê wê yekê li hev bîne, çi ku tê texmînkirinê, ku nikare bê li hevanîne. Îsa got:

“Çimkî Kurê Însan hat, ku yê wundabûyî bigere û xilaz bike”
(Lûqa 19:10).

Em gelek cara vê gotinê bi fikira terîfkirinê fem dikin, lê fikira wê diha zêde ye. Îsa tenê bona xilazkirina merivên *wundabûyî* nehat. Ew hat, ku *wî hemû tiştî* xilas bike, *çi ku wundabûyî ye*.

Rûyê ketina merivatîyê da me tevgirêdana xwe ya tevî Xwedê wunda kir. Feqet me usa jî yekîtiya nava heleqetîyên tevî xwişk û bira, dê û bava û zaroka, usa jî jin û mêra da wunda kir. Xêncî wê yekê me usa jî heleqetîyên xwe yên tevî efrandarîyê wunda kirin.

Bi mîaserkirina karê Xwe yê xilazkirinê, Îsa tiştê hê zêde da me. Roja îroyîn li cem me zêdayî û dasekinandin heye. Bi saya xaç her heleqetîk, yê ku zîyanê ketîye, dikare bê dasekinandinê. Ev yek dide kivpê, wekî roja îroyîn zewaca me dikare bê qenckirinê. Jin û mêr dikarin careke mayîn bibin yek.

Wextê ku em bi dil û bi meremê xwe yek in, nava emirê me da zêdayî destpê dibe, çimkî Xwedê duakirina Xwe li wan dera dike, li kîderê yekîti heye (binihêre Zebûr 133). Dijminê me naxweze, ku em duakirina Xwedê bistînin û ne jî dixweze, ku em zêde bibin. Ew hemû tiştî dike, ku yekîtiya me bê wundakirinê. Wextê ku em miqabilî xapandina hukumdarîyê derdikevin û binyatê rastîya hukumkirinê qebûl dikin, wî çaxî em tevî Xwedê dibine hevkar û xwestina Wî ya li ser vê dinîyayê mîyaser dikin.

Niha emê diha bi hûrgilî rolêd mêra û jina yên nava zewacê da guvtugo bikin. Bi femnekirina fikira Xwedê ya derheqa heyîtiya mêriv, qîmet û serwêrtîyê da, meriv dikare bi hêsanî şaş be, bifikire, wekî ev rol yên ku ji aliyê Xwedê da hatine pêşdakisandinê, mêr û jina usa dikin, ku yek ji yê mayîn bilindtir e. Em bawer in, wekî peyî wê yekê ra, wextê ku hûn teslîmkirina Xwedê ya ewlin, ya derheqa zewacê da lêkolîn bikin û wextê ku hûn firqîya di navbera şexsîtiyê û rola da fem bikin, hûnê wî çaxî fem bikin, ku rolên mêra û jina bi çiqwasî va bi qedir in.

Roj 3

Mêr: qedirê jina xwe bigire

“Usa jî mêrno, bi femdarîyê emirê xwe tevî jinên xwe derbas bikin. Diqewime ew ji we sisttir e, lê ew nava emirê weyî nû da hevalkara weke we ye, ya ku pêşkêşa Xwedê ye. Bi wî cûreyî nêzik bin, çawa ku lazim e, ku duakirinên we neyêne teribandinê” (A Petrûs 3:7, NLT).

Qedirgirtin dualî ye. Încîl zelal dide hînkirinê, wekî ji mêr û jina her du jî gerekê qedirê hev bigrin. Hinekî dereng emê derheqa rola jinê da xeber bidin, lê niha emê derheqa rola mêr da bidine kivşê.

Mêr: jina we ji we nimiztir nîne. Ew nava Mesîh da weke we ye û hûn gerekê qedirê wê wî cûreyî bigrin. Bi gotina derheqa wê yekê da, wekî ew ji we sisttir e, Petrûs derheqa qewata fizîkî da dibêje, lê ne ku derheqa karebûnên fikirdarî, cudatî, yan jî qewata ruhanî da. “Sistaya” jina we ya fizîkî ji we kêmtir nake. Ew yek awqasî dide kivşê, wekî nikare tiştekî giran hilbirîne, kîjanê hûn dikarin bikin. Şirovekirina Petrûs qîmetkirin nîne. Ew yek girîng e, ku em fem bikin, çimkî emê qulixî wan meriva nekin, yên ku, bi fikira me, nelayîqî qedir in. Hetanî pêşkêşkirina emirê xwe bona jinên me, em gerekê qîmetê wana fem bikin.

Em eşkere derheqa wê yekê da dibêjin, ne ku bona wê yekê, wekî hûn dixwezin jina xwe nimiz hesab bikin, lê bona wê yekê dibêjin, çimkî em îzinê nadine xwe, ku em zelal şirove nekin. Him mêr û him jî jin bi şikilên Xwedê va hatine çêkirinê, usa ye mînanîbûna Bavê ya li vê dinîayê tê bêhurmetkirinê, wextê ku mêr qedirê jina nagirin, wana qîmet nakin û naporêzin.

Pêşda Xwedê got, wekî baş nîne, ku meriv tenê bimîne (binihêre Destpêbûn 2:18). Jîyana mêrê tenê pirsaw ewlin bû û Xwedê ew pirs hel kir, Hêwa çê kir. Jin bersiva Xwedê ne, lê ne ku efrandinê dereca duda ne. Xwedê çawa merivê ku qulixî Wî dike, jina we teslîmî we kirîye û mecala hizkirinê, piştgirîyê, qulixkirinê daye. Bi kirina vê yekê, em wê yekê dibêjin, çi ku dilê Xwedê da heye.

Petrûs jî nivîsî, wekî mêr gerekê bi femdarîyê nêzîkî jinên xwe bibin. Em gerekê bicedînin wana fem bikin, yê ku ji me cuda dibin. Mêr jî hev cuda dibin û jin jî bi wî cûreyî jî hev cuda dibin, feqet mêr û jin jî hev cuda dibin. Ez (Con) Lîzayê bêhurmet nakim, çimkî ew ji min cuda dibe. Dewsa wê yekê ez wê firqîyê dibînim û dicedînim fem bikim.

Jîyana min wê gelekî min aciz bikira, eger Lîza û ez mînanî hev bûna. Rast e, ew firqî gelek cara çetînayî pêşda anîne, feqet ew

çetinayî alî me kirine, ku em alîyên xwe yên sist eşkere bikin, bona ku li ser wana bixebitin û bidine qewatkirinê. Ez hewce me, wekî Lîza bi xeysetê xwe va firqîyê bide. Ez qedirê wê digrim û bona xwe û malbeta xwe karê tînim, wextê ku dicedînim diha baş fem bikim, ku çi piştgirîyê didime wê.

Guhdarîyê bidine li ser vê yekê: nava kaxweza Petrûs ya ewline 3:7-da nivîsar e, wekî bêhurmetkirina jinên me wê duakirinên me bide teribandinê. Bona Xwedê gulvedana jina awqas girîng e, wekî femkirin û qedirgirtina jinên me bûye peyman a hîmdarîyê ya bo jîyana duakirina me.

Serê yekîtîyê

“Çimkî mêr serê jina xwe ye, çawa Mesîh serê Civînê bû...”
(Efesî 5:23, NLT).

Ev gotin ne derheqa bilindkirinê û nimizkirinê da ne. Li vir mesela Mesîh û Dergîstîya Wî ber cava ye, çimkî hema eve sînorê zewacê. Nava vê gotinê da mêr û jin himberî Mesîh tên kirinê, çi jî dide kivşê, wekî ew rêberên yekîtîya malbetê ne. Li ser milên wana cabdarîke mezin hatiye danînê, köuw bi qulixkirinê rêberîyê bikin, çawa wê yekê Mesîh dike, bona ku dinîya bêbawer bikaribe tebyeta Îsa bibîne (û wextê ku hûn derheqa wê yekê da bifikirin, ku bi çiqasî va kûr Îsa Civînê hiz dike, hûnê qet deqîqekê jî bawer nîbin, wekî Ewî xwestibû qîmetê jinê bide nimizkirinê, bi himberîhevkirina rola wana tevî rola Dergîstîya Xwe).

Mêr, çawa serê yekîtîyê, serwêrtî nestendîye, ku jina xwe her car bide kerkirinê, wextê ku ew tiştêkî dibêje. Mêrê aqil wê gotina jina xwe hesab hilde, fem bike, wekî ew qirarên rast qebûl dike.

Nava salên zewaca me yên ewlin da, min (Con) her roj sehet û nîvekê dua dikir. Ez çiqasî zanim, wekî Lîza, ya ku wî çaxî dixebitî, hindik dua dikir, ew jî tenê wî çaxî, wextê ku av xwe dikir, yan jî avtoşaşîne diajot. Wextê ku em nava pîrsekê da bi hevra

qayîl nedibûn, ez şaş dibûm, wextê ez difikirîm, ku eger ez diha gelekî dua dikim ne ku ew, wî çaxî min dikaribû serwêrtîya xwe bida xebatê û çawa serê yekîtiya me bi fikira xwe pêşda biçûma. Çawa jî hebe, gelek cara, wextê ku min hevraqayîlnebûnên me wî cûreyî didane helkirinê, paşê zelal dibû, wekî Lîza rast bû.

Bi rastî gotî, ez xemgîn dibûm “*Bona çi Lîza awqas rast bû, - ez difikirîm, - ew jî wî çaxî, wextê ku ez awqas wede nava duakirinê da derbas dikim*”. Rojekê min dua kir: “Xwedê, ez her şebeq sehet- nîvekê dua dikim. Lîza diqewime deh deqa, wextê avxwekirinê dua dike. Feqet ew nava 50-î selefên hevraqayîlnebûnên me da rast derdiket”.

Xudan bersiv da:


“Doraneke bi qelemê bikişîne”

Min kaxwezek dît û li ser kaxwezê doraneke kişand.

“Nava dorane da X-a dayne”, - Xwedê got.

Wextê ku 'emamiya dorane bi X-va tijî bû, Ewî got:

“Lê niha di navbera wê dorane da xetekê bikişîne”.



“Divînî?, - Xwedê pirsî, - nivê wan X-a wî berî xetê ne, lê nivê mayîn jî wî berî ne. Con wextê ku tu zewicî bûyî, tu nava Min da yek bûyî, tu tam bûyî. Feqet wextê ku te Lîza stend, tu û ew bûne bedenek. Niha ev dorane we herdu raber dike. Tu alîkî wê dorane yî, lê nivê mayîn jî Lîza ye”.

“Tu zanî, ku ew X çi didine kivişê, - Xwedê got. – Ew sembolên wê yekê ne, kîjanê gerekê tu ji Min bistîni, ku bikaribî qirarên aqilmendî qebûl bikî. Pirsgirêk ew e, wekî tu hemû qirara bi xwe qebûl dikî, bi hesabildana nivê temamiya înfomasîyayê.

Çawa serê malbetê, tu gerekê hîn bibî, ku ji jina xwe wê yekê bistiîni, çî ku Ez elamî wê dikim. Wî çaxî tê qirara li ser hîmê informasiya Min ya tam qebûl bikî”.

Evê yekê fikira min ya derheqa wê yekê da bi temami da guhartinê, ez pê hesiyam, wekî serê zewacê çî dide kivşê. Ez îdî naxwezim rola xwe wî cûreyî bidime xebatê, ku dora şewira Lîzaê ra derbas bim. Ez bi hizkirin wî hemû tiştî didime xebatê, çî ku Xwedê bi destî wê dibêje û bi hizkirin tevî wê qirara qebûl dike.

Xulamê rêber

Em careke mayîn bêjin, wekî mêr gerekê hindava jinê da diktatoriyê neke. Diktatorî ji rêberiyê cuda dibe. Rêberî qedir e, çimkî ew mecala bijartinê dide, lê diktatorî dewa pêşniyarkirina bêyî bijartin dike. Bona ku mêr nava malbetên me da bibine rêberê xwedêparêz, ew gerekê fem bikin, ku tabîya serwêrtiyê çî ye. Gotinên Îsa bîr bînin: “Rêber gerekê minanî xlam be” (Lûqa 22:26, NLT). Çawa serê yekîtiya malbetê, mêr gerekê bibe xulamê ku rêberiyê dike.

Usa nîne, wekî mêr serkar e, lê jin jî bindestiya wî ye. Mêr rêber e, yê ku tevî jina xwe kar dike. Bi rastî, eger mêr aqil e, ewê her dem bêje jina xwe, ku *bêyî wê* nikare tu tiştî bike. Min (Lîza) xweş tê, wextê ku mêrê min dibêje, ku ew hewcê min e. Wextê ku ez wê yekê dibihêm, ez texmîn dikim, wekî karebûna min ya cuda bona tijîkirina wan hewcetîya li cem min heye. Eger nizanibim jî, ku bona bûyîna jina wî cûreyî çî lazim e, ezê hemû tiştî bikim, ku wê yekê bidime zelalkirinê. Ez gulvedidim, wextê ku ew dibêje min, ku ya minanî min tune.

Mêr, qulixkirina bo jina xwe nade kivşê, ku tu gerekê wî hemû tiştî bidî wê, çî ku ew dixweze. Lê gerekê emirê xwe pêşkêşî wê bikî û qirara qebûl bikî, bi hesabhildana berjewandiyên wê. Em rêberiyê li jinên xwe usa dikin, çawa ku Îsa rêberiyê li me dike.

Gelek tişt hene, kîjana Îsa bona berjewandîyên me dike, yên ku li me xwen nayên. Hûnê rastî halên usa jî bîn, nava kîjana da cûrê herî baş bona jina we wê ne anegorî xwestinên wê be. Bi hesabhildana mesela Îsa, em zanin, wekî nava halên wî cûreyî da gerekê ewê rê bibijêrin, ya ku rast e, lê ne ku ya anegorî xwestinê ye. Feqet hûnê bikaribin berjewandîyên jina xwe bi cûrê rast qirar bikin, tenê wî çaxî, wextê ku hûn wê hiz bikin û qedirê wê bigrin, çawa ku Mesîh Civînê hiz dike û qedirê wê digre.

Piştî şuştina nigên şagirtên Xwe, Îsa zelal got, wekî Ew hela hê Xudanê wa ne. Ewî tu cara tabîya Xwe ya serwêrtîyê berneda. Ewî da kivişê, wekî me serwêrtî stendîye, ku em qulixî hevdu bikin. Mêrno, em gerekê nava zewacê da serwêrtîya bidine xebatê, bona ku qewilên usa sazkin, kîjan bi cûrê baş bona jinên me qulix dikin. Bi hesabhildana wê yekê, wekî em serê yektîyê ne, em bona kirina karê xulamê herî xirab cabdar in. Bi kirina vê yekê em gura jinên xwe da nin.

“...Gura hevdu da bin, bi hesabhildana xofa hindava Mesîh”
(Efesî 5:21, NLT).

Tê bîra we, ku nava gotina Efesî 5:18-da temîya Pawlos nivîsar e, ya derheqa “Hertim bi Ruh va tijîbûyî û piştgirtî”-da (AMP)? Ew dide kivişê, ku merivên bi Ruhva tijîbûyî çi dike. Mesele, gotina stiranên ruhanî yan jî razîbûn. Nava gotina 21-ê da ew îdî dinivîse: “Gura hevdu da bin”.Ev gotin tê hesabê destpêka beşa nivîsara Pawlos ya “beşa zewacê”. Çi jî hebe, nava kitêba xwe da, ya bi sernavê “*Fikira zewacê*”, Tîmotî û Kêti Kêllêra dane diyarkirinê:

Nava zimanê inglîzî da ew (gotina 21-ê) himlî çawa cumuleke cuda tê lênihêrandinê, lê vê carê xwendevan tişteki girîng nabînin, kîjanê Pawlos dike. Nava têksta yûnanî da bi gotina 21-ê va cumla pêşîya wê ser hevda tê, kîjanêda Pawlos çend nişanên derheqa mêriv da nav dike- “Bi Ruhva tijîbûyî”.

Kêllêr gotina xwe berdewam dikin:

Nava vê gotinê da derheqa nîşana dawî da, ya tijîbûna bi Ruh va, nivîsar e. Eva wundabûna kubarîyê dide kivşê, bi saya çi merivê şikestî bona yên mayîn qulix dike.

Nava zewacê da ev yek dide kivşê: merivê ku bi qewata Ruh dijî (derheqa girîngîya kîjanêda me îdî xeberda) wê çawa meriv eyan be, yê ku gura merivê li rex xwe da ye.

Gelek meriv gurêdabûnê tenê rola jinê da dibînin, lê Pawlos zelal dibêje mêr û jina, ku herdu jî gura hevdu da bin. Xebera “*Gurêdabûn*”, ya ku nava vê gotinê da tê xebitandinê, hema ew xebera yûnanî ye, kîjanê Pawlos hinekî şûnda dide xebatê, temîyê dide wana, ku ew gura mêrên xwe da bin. Eger nava malbetê da gilî derheqa sîstêma serwêrtîyê da ne, belê, jin gerekê gura mêrên xwe da bin, çawa serwêrê malbetê. Feqet mêr gerekê bi cûrekî mayîn gura jinên xwe bikin.

Pawlos dinivîse, wekî em gerekê gurê da bin, bi hesabhildana xofa hindava Mesîh. Nava vê gotinê da “xof” xebera yûnanî ya “fobos”-e û ew tirsê dide kivşê (em dikarin bivînin xebera “fobos” mînanî xebera “fobîya” ye). Xebera “xof” bi rastî fikira orîcînalê nayne ber çava û wê diha baş bûya, ku ev gotin vî cûreyî tercime bikirana: “Gura hevdu da bin, bi hesabhildana tirsê hindava Îsa da”.

Rojekê, wextê ku ez (Con) gelekî hişşk nêzikî Lîzayê bibûm, Xwedê min ra got: “Berê ewlin Lîza keça Min e, lê paşê jina te ye”. Wextê ku min ew yek guhdar kir, tirsê Xwedê hate ser min.

Mêr: Xwedê her dem hazir e. Ew zane, ku hûn çawa xeber didin û çawa nêzikî keça Wî dibin. Ew gotinên we dibihê û menîyên dilê we da divîne. Gelo hûn qedirê Wî digrin, bi nîşandayîna nêzîkbûna layîq ya hindava dergîstîya xwe da? Bi bêhurmetkirina dergîstîya xwe, hûn Bavê wê bêhurmet dikin. Bi tirsê û xofê miqatî wê bin.

Pawlos dîsa şirovekirinê berdewam dike, wekî mêr gura jinê da ye, bi dayîna emirê xwe. Bi gilîkî mayîn gotî, ew gura jina xwe dike, bi qulixkirina bona berjewandîyên wê.

“Bona mêra ev yek dide kivişê, ku jinên xwe hiz bikin, çawa ku Mesîh Civîn hiz kir. Ewî emirê Xwe bona wê da...” (Efesî 5:25, NLT).

Mesîh tu cara tabîya Xwe ya serwêrtîyê bona berjewandîyên Xwe nedane xebatê. Ewî tabîya Xwe da xebatê, ku qewatê bide me. Hema wî cûreyî jî, em- jin û mêr, hatine gazîkirinê, ku tabîya xwe ya serwêrtîyê bidine xebatê, ku berjewandîyên jinên xwe biparêzin û qewatê bidine wana. Mesîh emirê Xwe bona rûmetkirina Dergîstîya Xwe kire qurbanî. Şabûna Wî û “dawîya bextewar” rûmetkirina dergîstîya Wî ye. Nava emirê we da bona xwehizîyê wê cih nemîne, wextê ku hûn bi rîya Îsa pêşda herin. Çawa mêr rola we eve: “Bi qulixkirina bona jina xwe bijîn. Meremê we yê sereke gerekê ew be, ku Mesîh raberî jina xwe û merivên dor-berê xwe bikin. Wextê ku hûn bi vî cûreyî rêberîyê li jina xwe bikin, bona wê, wê diha hêsa bibe ku ew bi şabûn gura tabîya ewê serwêrtîyê da be, ya ku Xwedê daye we.

Roj 4

Jin: piştgirîyê bide mêrê xwe

“Jinno, mêrêd xwe fem bikin, piştgirîyê bidine wana, çawa hûn piştgirîyê didine Mesîh. Mêr usa rêberîyê li jina xwe dike, çawa ku Mesîh rêberîyê li Civîna Xwe dike, lê ne ku bi zordarî, lê bi hizkirin. Çi jî hebe, çawa ku civîn gura Mesîh da ye, wextê ku Ew rêberîyê lê dike, wî cûreyî jî gerekê jin gura mêrên xwe da bin” (Efesî 5:22-24, MSG).

Tê bîra we, wekî Pawlos temîyên Xwe dane mêra û jina û got, ku ew “gura hevdu da bin, bi hesabhildana tirsra hindava Mesîh” (binihêre Efesî 5:21). Nava xebera mayîn da ew fikira xwe berdewam dike: “Bona jina ev yek dide kivşê, ku ew usa gura mêrên xwe da bin, çawa gura Xudan da” (gotin 22). Bi fikira geleka jin rûyê vê gotinê da zyanê dikeve, lê ew yek usa nîne.

Çawa ku nava zewacê da gerekê diktatorî tunebe, jin tevî mêrê xwe çawa hevkar bi mafê weke hev e. Ev yek miqabilî wê gotinê nîne, ku mêr serê malbetê ye, çimkî nava zewacê da him mêr û him jî jin xweyên serwêrtî û hukumê govekên cuda-cudane. Nava zewacê da serwêrtî dide kivşê: “Ezê serwêrtîya xwe û hukumê xwe bona kara te bidime xebatê û tu jî gerekê serwêrtîyê û hukum bona kara min bidî xebatê”.

Jin qulixî mêrê xwe dike û piştgirîyê dide wî. Jina dilê mêrê we teslîmî we kirine. Dilê wî biparêzin, bi xeberdana bi hizkirin û qedirgirtinê. Eva dikare bibe qulixa here mezin, kîjanê hûnê bidine wî. Hîn bin, ku çawa qulixî mêrê xwe bikin, bi alîkirina wî. Dewsa fikirên cuda, tevî wî qise bikin û alî bikin, ku ew dîtinok û meremê xwe çê bike.

Nava goveka qewata fizîkî da jin sist in, lê nava goveka dil da mêr sistin. Jin parêzera dilê mêr e, hema wî cûreyî ye, çawa ku mêr gerekê bi fizîkî jinê biparêze. Gelo xebata usa yu bi rûmet heye, çawa ku ya parastina dil e?

Wextê ku mêr qulixî jinê dike û emirê xwe bona wê dide, jin wî çawa serê yekîtiya xwe qebûl dike. Eva rola wê ye, ya nava karê eyankirina Mesîh ya li vê dinîyayê. Qedir, hizkirin û rûmeta hindava mêrê wê da didine kivşê, ku rêberkirina ji aliyê Îsa da çîi ye. Xwedê jî jina hîvî nekirîye, ku ew gurêda bin, çimkî ew dereca duda da nin. Ew pêniyarî wan dike, ku bidine kivşê, ku civîn gerekê çî cûreyî be. Nava zewacê da mecal heye bidine kivşê, ku emir dikare çawa be, eger em ji aliyê Xudan û Xilazkirê rehm,

helal û merd da bèn rêberkirinê. Gelo wê çiqwas tragic be, ku em îzinê bidine dijmin, ku evê rolê navhev bixe û ewê werguhêzî layîqî nerazîbûnê û yazixîyê bike. Bi dayîna wê rolê, Xwedê hîvî ji keçên Xwe kirîye, ku ew bidine kivşê, ku Ew helal e.

Xwedê zane, wekî Ewî jin çawa meriva qewat û bi merîfet çê kirîye. Nava dîrokê da Ewî jin bona rêberkirinê, mehkemekirinê, pêxemberbûnê û anîna Kurê Xweyî tek- tenê li vê dinîyayê, mezinkirina Wî, bijartîye. Bi bangkirina bo jina, ku ew qedirê serwêrtîya mêrên xwe bigrin, Ew naxweze bêje, ku ew sist in, yan jî nelayîq in. Dewsa wê yekê, Ew dibêje: “Ez zanim, wekî tu qewat û bi merîfet î, çimkî tu keça Min î. Feqet nava zewacê da, nava mesela wê ya heta-hetayê da yek bona Min lazim e, bi destî kîjanê Ezê wê xwezilîyê bidime kivşê, kîjanê meriv dikare bi gurêkirinê bistîne. Gelo tê bi rezedilîya xwe vê rolê hildî ser xwe: Gelo tê piştgirîyê bidî mêrê xwe û gura wî da bî, ku nîşanî meriva bikî, ku Ez layîqî xwepêşkêşkirina ji alîyê wan da me”.

Barê rêberîyê

Himberî Xwedê, mêr îdêalî nînin. Her dem nîne, wekî ew qirarên rast qebûl dikin û her dem nîne, wekî ew qulixî jinên xwe dikin, çawa ku gerekê qulix bikin. Ev yek dikare bibe menîya nerazîbûnê, bona wan jina, yên ku dixwezin qedirê mêrê xwe bigrin û piştgirîyê bidine wana. Diqewime nava wede da ew bixwezin bi xwe serkarîyê li hemû tiştî bikin. Eger miqabilderketina dijî tabîya mêr ya serwêrtîyê mecala azayê bide, bi rastî ew dikare bibe êşeke mezin û bêbextîyê jinê ra bîne.

Wextê ku zaroka me ya ewlin hela hê teze ji dayîk bibû, ez (Lîza) dixebitîm û girafîka min gelekî berk bû, ez rojên rihetîyê jî nava kar da bûm. Li cîyê xebatê ez rastî dijwarîyên him pêşekzanîyê

û şexsî dihatim. Û bi wê yekê va tevayî min dicedand, ku ez bibime dayîk û jina îdêalî. Nava wî wedeyî da Con nava êtapa derbazbûnê da bû. Rûyê xebatê da ez her dem nava halê sert da bûm û min bîra kurê xwe dikir. Lê Con bi grafika tam nedixebitî. Ewî dua dikir, rojî digirtin, rastî hevalên xwe dihat û golf dilîst. Bona wan dijarîyên xwe, min Con gunekar dikir, çimkî min li ser xwe hukum texmîn dikir. Min texmîn dikir, wekî hemû tişt li malê li ser milê min bû û wekî min îdî nikaribû teyax bikira.

Min dixwest ku Con tevî min xemgîn bûya, lê ewî ew yek nedixwest. Carekê, wextê ku min cêriband derheqa tirs û xemgînîyên xwe da wî ra gilî bikim, ewî gote min:

-Lîza bona wê yekê ber xwe nekeve û wê yekê teslîmî Xwedê bike.

“Tu cara, - ez fikirîm.- Eger ez derheqa vê yekê da nefîkirim, li mala me wê tu tişt neyê kirinê”.

Halê sert ez difetisandim û hukumê, ku li ser min bû, diha giran dibû.

Êvarekê, wextê ku min av xwe dikir, min derheqa barê xweyî giran da li ber Xwedê gazinê xwe kir. Min gotê, wekî min nikaribû parçekî barê xwe bida Con. Eger min neanîya bîra wî, ewê gemar jî nebira nerêta. Dêmek, minê çawa bikaribûya pirsên girîng raber bikirana. Ez nava şerk’arîyê da bûm û min dicedand wî hemû tiştî afû bikim, ku bona çi ez nikarim hemû tiştî kontrol bikim.

“Lîza, bi fikira te, Con rêberekî baş e?”, - Xudan bi dengê nerm ji min pirsî.

“Na xêr, ez nafîkirim, -min gotê.- Ez aminaya xwe li wî naynim”.

“Lîza, tu gerekê aminaya xwe li Con neynî, - Ewî got, -Tu tenê gerekê aminaya xwe li Min bînî. Tu difikirî, wekî Con borcedarîyên serwêrê malbetê baş naqedîne û tu dikarî wana hê baştir biqedînî. Ew sertbûn û nerihetî, kîjanê tu texmîn dikî, hukum û giraniya bûyîna serwêrê malbetê ye. Ew yek bona te bar e, lê bona Con rûmet e. Wê yekê berjêr bike, Lîza”.

Min carekê ra fem kir, ku ez bona çî ketibûme bin wî barî. Tabîya serwêrê mala me, berbi kîjanê min divedand, ku min dixwest wî cihî bigrim, hukumî li ser min dikir, çimkî ew tabî ne ya min bû. Bona mêrê min ew yek wê çawa hukum nîbûya, çimkî Xwedê qirar kiribû, wekî ew serwêrê malbeta me ye.

Min fem kir, wekî min serwêrtîya malbeta me hildabû û min bona wê yekê şerkarî dikir. Min ew rola mêrê xwe hildabû, lê dewsa wê yekê min gerekê ew bilind bikira û bawerîya xwe li qewatên wî bianîya. Ew jî sirîya xwe da tabîya serwêrtîyê dabû min û hemû tişt navhevketi bû.

Ez carekê ra xwe mikur hatim, min av dada û lez pêjgîr hilda. Con li oda razanê bû. Min baxşandin ji wî xwest û girîyam:

- Ez hîvî dikim, ku tu min bibaxşînî. Bona her tiştêkî biçûk me bi hev ra şer dikir û ez ditirsîyam, aminaya xwe li te bînim. Sibê ezê ji xebatê derkevim, eger tu dixwezî. Feqet ez dixwezim, wekî em careke mayîn yekbûyî bin.

- Ez naxwezim ku tu xebata xwe bihêlî, - Con bersiv da. -Ez nafikirim, wekî pirsgirêk ew e. Feqet ez gumanim, wekî tu gerekê terka wê yekê bidî, ku bifikirî, wekî kanîya jîyîna malbeta me, ya aliyê finansîyê da, tu yî.

Ew rast bû. Ew kanî ez nîbûm, lê Xwedê bû. Bi bîrkirina derheqa wê yekê da, ez ketibûme bin hukum û min terka piştgirîya merivên nêzikî xwe dabû. Me qîsa xwe berdewam kir û min soz da Con:

- Ezê piştgirîyê bidime te. Ez te bawer dikim.

Wî çaxî min texmîn nedikir, ku ezê piştgirîya çî bidime wî, yan jî bawerîya xwe li çî bînim. Min tenê zanibû, wekî Con diha gelekî hewcê wê piştgirîyê bû, lê ne ku ez hewce bûm bona helkirina pirsên biçûk. Min fem kir, wekî malbeta me nava halekî xirab da bû. Min dixwest, ku Xwedê qeyde û qanûnên nava malbetê da îzbat bikira. Con jî bona wê yekê, ku rêberîyê li malbeta me nake, û tenêhiştina min, baxşandin xwest. Me peymanî hizkirinê, piştgirîyê û alîkarîya dualî tevayî mor kir.

Nava çend sala da eva şeva ewlin bû, ku vî cûreyî derbas bû. Ez razam, bi rastî rihet bûm. Barê li ser min dûr ketibû.

Wextê ku em wê yekê hildidine ser xwe, çi ku Xwedê bona me têra nedîtîye, em dikevîne bin barê giran. Feqet ew hemû tişt, çi ku Xwedê daye me, bi cûrê rûmet tabî û serwêrtîya me dide kivşê û parastina me diparêze.

Min rola serwêrtîya malbeta me hilda ser xwe, ez ketime bin barekî giran, lê Con jî jî tabîya xwedûrxistinê. Eva tevhevbûneke mezin bû. Wextê ku ez teslîmî wî qeyde-qanûnî bûm, yê ku Xwedê bona malbeta me îzbat kiribû, barê min şikest û Con kincê rêberîyê xwe kirin, yên ku Xwedê dabûne wî. Ez jî ketime bin wî kincî, çimkî ew kinc berfireh bû, ez parastim, ez û yên mayîn, yên ku bin bandora Con da bûn, parastin.

Roj 5

Rolên xwe anegorî hev bikin

Încîl derheqa rolên mêra û jina yên nava zewacê da gelek tiştî dibêje, feqet gelek tişt hene, derheqa kîjana da xeberdan naçe. Xwedê gote Adem û Hêwayê, ku zêde bin û dinîyayê tijî bikin, bêyî raberkirina gotina Wî bi cûrê bi hûrgilî. Bi wî cûreyî jî Ew nava zewaca me da sînora qîrar dike, bêyî sînorkirina me. Ewî em hîn kirin ku qulixî hevdu bikin û mesela Xwe me ra hişt, feqet Ew tiştên biçûk kontrol nake.

Bînine ber çava, wekî erdekî mezin dane we, kîjanî hûn gerekê çê bikin, dor- berê wê rast bikin û tê da usa bijîn, çawa ku hûn dixwezin. Hinekê bixwezin, ku li wê derê hewzê avê jî bê çêkirinê, hinekên mayîn wê deşta baskêtblê bixwezin, hinek jî wê bixwezin her du tişt jî li wir hebin, yan jî ew her du tişt tune

bin. Zewaca we “mal û deşta” we ye, kîjanê gerekê hûn çê bikin û bijîn. Eger jin dikare projeya baş bide, îzinê bidine wê, ku ew bi wê yekê va mijûl bibe. Eger mêr hiz dike bi bêcerkirina baxçe va mijûl be, îzinê bidin, ku ew wê yekê bike. Qulixa her yekî wê bona yê mayîn kardar be. Îzina tu kesî tune bêje, wekî mêr tenê gerekê projeyê çê bike, lê jin jî gerekê tenê bi bêcerkirina baxçe va mijûl bin. Wê yekê bikin, çî ku bona we kar dike, bi bîranîna derheqa qulixa bona merivê li rex we. Pirsên malbeta we tenê derheqa we, merivê li rex we û rêberîya Ruhê Pîroz da nin.

Ji her tiştî zêdetir nava qulixê da hevraqayîlnebûn wî çaxî pêşda tên, wextê ku em hîvîyê ne, wekî merivê li rex me usa qulixî me bike, çawa ku em qulixî wî dikin. Ev yek her dem nîne, ku usa dibe. Li malbeta me em dikenîyan, wextê ku Con digote me, wekî ew xulam e. Piştî nanxwerinê ew ji aspêjxanê wunda dibû, lê derdanên qirêj hîvîya min (Lîzayê) û zarokên me diman. Me texmîn nedikir, ku ewî qulixî me dikir.

Me fem nedikir, wekî Con bi cûrekî mayîn qulix dikir. Me sivire berev dikir, lê ewî finans dianîn, posta me lê dinihêrî û hesabên me didan. Ewî qîrar dikir ku em ji wî karî paşda bisekinin, yê ku me dikaribû bêyî wî bikira, bona ku derheqa karên mayîn yên pêwîst bifikirîya, kîjan ewî hê baştir dikaribû bikira, ne ku endamên malbeta meye mayîn.

Ji vê meselê em dikarin bêne ser vê fikirê: “Mêr û jin dikarin borcedarîyên malbetê nava hevda pareve bikin. Gaveke here kardar ew e, wekî nava zewaca xwe da hûn bikaribin kûltûra qulixê saz bikin, borcedarîyên xwe qîrar bikin. Borcedarîyên bi hevra qayîlkirî bi du xala va kardar in. Ya ewlin ew e, ku hûn bi cûrê baş qulixî merivê li xwe dikin, wextê ku bi îsafî borcedarîyên xwe yên mêr û jîntîyê diqedînin. Bi vî cûreyî hûnê him wedê aza û him jî fikira edil pêşkêşî merivê li rex xwe bikin. Ya duda ew e, wextê ku hûn

zanin, ku merivê li rex we bona çî cabdar e. Wî çaxî wê bona we zelal bibe, ku hûn çî cûreyî dikarin alî wî bikin.

Diqewime we texmîn kirîye, wekî jî gotinên Efesî 5-a tu yek derheqa hewaskarîyên jin û mêrên bi xeysetê hişk mecbûr nake. Hewce nîne, ku parevekirina borcedarîya, yên li malbetê, bèn sînorkirinê. Hene mêr û jin, ku hiz dikin bi wê yekê va mijûl bin. Hene jin, kîjan hiz dikin avtomaşînê çê bikin. Ji we yek jî wê bi hizkirin alî zaroka bike, ku ew dersên xwe hîn bin, lê yê mayîn jî wê li deşta fûtbolê tevî wana bilîze.

Ewê ku serederîyê fînansa dike, dikare mecalên malbetê yên fînansî kontrol bike. Ew dikare bi parevekirina fînansa va qulix bike, usa bike, ku malbet nekeve nava deyna.

Hûn jî dikarin qulixî merivê li rex xwe bikin, guhdarîyê bidine ser bedena xwe. Xêncî wê yekê bi gotina hevalên xwe pêşda neçin, eger ew yek miqabilî berjewandîyên merivê li rex we ye. Hûn dikarin usa jî bi zêberdanê û bi jêsta qulix bikin. Zewac azaya mezin dide, ku hûn kar bikin û mecalên mezin dide, ku hûn qulix bikin.

Texmînkirina duakirinê li ser xwe

“Eger hûn vê yekê zanin, hûn xwezilî ne, eger vê yekê bikin”
(Yûhenna 13:17, NLT).

Nenihêrî wê yekê, ku ew merivê ku qulixî wî dike duakirinê distîne, lê duakirina here mezin ew distîne, yê ku qulix dike. We êdî erdê li ser gemîya zewaca xwe paqij kirîye û we dîtînoka zelal qîrar kirîye. Niha êdî ew yek hazir e, ku bibe mesela hizkirina Xwedê ya li ser vê dinîyayê. Bona çêkirina zewaca bi açix, nêzîkbûna here baş ew e, ku hûn her mecalekê bidine xebatê, ku qulixî hevdu bikin. Hev bilindkin û duakirinên Xwedê yên bi merdanî li ser xwe texmîn bikin.

Wextê ku me destpê kir hev bilind bikin, Xwedê destpê kir me bilind bike. Ewî doranên hukumê me da berfirehkirinê û îzin da, ku bi hizkirina Wî û bi kerema Wî fikirên xwe va tevî merivên dor- bera nîvî bin. Wextê ku hûn hev bilind bikin, bi rîya qulixê, Xwedê wê mecalê bide, ku qulixî wan meriva bikin, yên ku bin hukumê we da nin. Ewî bernameke baş bona zewaca we hazir kirîye. Ew dixweze zewaca we bike karekî usa yê baş, wekî bêbawerên here hişk nikarinbin bi wê yekê va hijmekar bin.

Qulix ji kirinê û nêzîkbûnê ye. Her car wextê ku hûn mecala bona qulixa bo merivê li rex xwe distînin, hûn dikarin ji sê cûra yekê bibijêrin:

- ji wê yekê paşda bisekinin û xwehizîyê bibijêrin,
- bi nerazîbûn bin pozê xwe da xeberdin, wî karî bikin, çimkî hûn xwe borcedar hesab dikin,
- bi şabûn emirê xwe pêşkêş bikin, çimkî alîkarîya bona merivê li rex we razîbûnê bo we tîne.

“Mesih Îsa ser çî nêt- fikirê bû, ji we her kes ji usa difikre. Ew ku binyata xwe da Xwedê bû... Lê xwexwe xwe şikênand, kete binyata xulamekî, bû mîna meriva, kete dilqê Însên...” (Fîlîpî 2:5-7).

Wextê ku hûn dizewicin, hûn peymanê mor dikin, wekî nava temamîya emirê xweda hûnê qulixî merivê li rex xwe bikin. Bi gotina “belê” hûn dixwezin vê yekê bêjin: “Ez emirê xwe pêşkêşî berjewandîyên te dikim. Ez qirar dikim bi şabûn emirê xwe bona te bidim. Xiyal, xwestin û meremên te niha bona yên here girîng in. Ez dixwezim hîn bim, ku bikaribim hizkirina Xwedê tevî te eyan bikim”.

Eger hûn ji tabîya gurêdabûnê nêzîkî zewacê bibin, dêmek çawa xulam, hûnê bighîjine yekîtiya xwedêtîyê. Ew yek her dem nîne ku wê hêsa bibe, lê eger hûn dixwezin ji Xwedê tiştê herî baş bistînin û qirarê qebûl dikin, ku wî cûreyî bijîn, malbeta we wê bi hizkirinê, şabûnê, edilyê, bextewarîyê û razîbûnê va tijî be û hûnê hizkirina Xwedê li vê dinîyayê bidine eyankirinê.

Ders: Roj 1

SURA AÇIXÎÊ

“...Ez nava we da çawa xulam im”

— Lûqa 22:27

“...Azaya xwe bona razîkirina tebyeta xwe ya gunekar nedine xebatê. Dewsa wê yekê azadya xwe bona bi hizkirin qulixkirina bona hev bidine xebatê”

— Galatî 5:13, NLT

“Hizkirin hîmê zewacê ye-hizkirina hindava Xwedê da û hizkirina hindava merivekî baqe da”, - **Doktor Hênri Klaûd û Doktor Con Taûnsênd şirove dikin.**—“Ew yek bi wê yekê va tê kivşê, wextê ku meriv divedine tiştê herî baş bona yê li rex xwe dixweze, nenihêrî wê yekê, ku ew layîqî wê yekê ye, yan na? Ew merivê li rex xwe ji hewcetiyên xwehiziyê û xwestinên xwe bilindtir hesab dike. Ew wî cûreyî xwestinên xwe dike qurbanî, dide û zîyanê dikeve. Ew bona xweykirina peymanê li ber bagera bêhurmetkirina teyax dike”.

Cedandina berbi berjewandiyên merivê li rex xwe, bilind hesabkirina hewcetiyên wî ji yê xwe zêdetir, meriv dikare bi xeberekê bide kivşê- *qulixkirin*. Awa eve sura zewaca açix.

Bisekinin û bifikirin. Li cem jina we, yan jî mêrê we *hewaskariyên* çi cûreyî hene? Gelo çi wî yan jî wê razî dike? Rihetîya çi cûreyî ew hiz dike?

Hûn çi dikin, ku piştgiriyê bidine hewaskariyên wê, yan jî wî?

Bi xwe pirsê bidine xwe û Ruhê Pîroz: “Çi îzinê dide min, ku ez qulixî merivê li rex xwe bikim? Gelo nava min da tişteki usa heye, ku xwehizîyê pêşda tîne, yan jî gurê dike? Gelo ez ji tişteki ditirsim, çi ku dikare biqewime, eger ez qulix bikim?”. Hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku nîşanî we bide, ku dilê we da çi heye.

Îsa Xulamê herî mezin e û çawa Kurê Xwedê we bedena Wî stendîye. Cudatîyên Wî yên ruhanî li cem we hene, ji kîjana yek jî qulixkirin e. Dora wan xebera bifikirin.

“Ewê ku ji Xwedê (bi qayîliyê, bi fikirdarî û anegorî edet) hatiye dinîyayê, guneha nake, çimkî tebyeta Xwedê nava wî da dijî (prînsîba emirê wî-toximê xwedêtîyê, her dem nava wî da dimîne). Û ew nikare guneha bike, çimkî ew ji Xwedê hatiye dinîyayê”.

— A Yûhenna 3:9, AMP

“Emirê we yê nû mînanî emirê kevin nîne. Bûyîna we ya kevin ji toximê ku dimire pêşda hat. Bûyîna we ya nû ji Gotina Xwedê ya sax pêşda hat. Bifikirin: emir, yê ku ji alîyê Xwedê da hatiye çêkirinê”.

— A Petrûs 1:23, MSG

“Werin e cem Min... Barê Min hildine ser xwe. Îzinê bidine Min, ku Ez we hîn bikim, çimkî Ez bi dil şikestî û nerm im û hûnê rihetîyê bona şexsên xwe bivînin. Çimkî hêsa nîne barê Min li ser xwe bivin û ew bar, kîjanî Ez didime we, sivik e”.

— Meta 11:28-30, NLT

Ruhê Pîroz çi elamî we dike? Gelo ev gotin piştgirîyê didine we û we berbi duakirinê dibin?

Ders: Roj 2

SERWÊRÎYÊ BIXEBITÎNIN

“Çiye meriv, wekî Tu wî bîr tînî...

Te ew kire mîr, karên destê Xwe: Te hemû tişt danî bin nigên wî...”

— Zebûr 8:4, 6

Xwepêşkêşkirin û dilê qulixçî beşeke wê mîrasê ne, ya ku me nava Mesîh da çawa bawermend stendîye. Cudatîyên xeysetê Bavê Ezmîn nava jîyana me da pêş dikevin û tèn kivşê, wextê ku em wede tevî Wî derbas dikin. Dêmek, jîyan û zewaca me xeysetê Îsa yê ku qulix dike, bi awqasîva didine kivşê, wekî em îzinê didine Ruhê Wî yê pîroz, ku me tijî bike.

Piştî naskirina Xudan jîyana xwe bîr bînin. Hûn dikarin mînakên (meselên) derheqa wê yekê da bînin, ku çawa Ruhê Pîroz hûn guhartine? Ewî çi cûreyî zewaca we guhartiye?

Xwedê dixweze, ku hûn bibine xweyê wî hemû tiştî, çi ku Ewî bi Ruhê Xwe teslîmî we kirîye. Anegorî ferhenga Vêbstêr ya sala 1828-a xebera “*xweyîtî* (xweyê)” dide kivşê: “qewata bona serwêrîkirinê, yan jî kontrolkirinê: qewata bona rêberkirinê, serkarîkirinê û xebitandinê: serwêrtîya here bilind”.

Careke mayîn bi guhdarî şirovekirina vê xeberê bixwînin. Lê niha bisekinin û bifikirin. Him çawa şexsekî cuda, him jî çawa mêr û jin çi bin kontrola we da heye: hûn rêberîyê kê, yan çi dikin, serkarîya çawa dikin? Hûn borcdarîyên xwe yên nava van goveka da çi cûreyî dikin?

Gelo ji van goveka yekê da, li kîderê hûn serwêrtîyê dikin, halekî usa yê wek niha ew serwêrtîyê li we dike? Eger usa ye, derheqa wê yekê da gilî bikin.

Dua bikin û vê govekê bikine gura Ruhê Pîroz. Hivî ji Wî bikin, ku Ew we bibaxşîne û kerema Xwe bide we, usa jî wê programê, bona ku hûn nava wê govekê da careke mayîn serwêrtîya xwe izbat bikin.

Hûn bi cûrên praktîk yên çî cûreyî dikarin tevî merivê li rex xwe kar bikin, çawa *fikirdarê tevayî*, lê ne ku çawa dijmin? Hûn çawa dikarin nava jîyana zarokên xwe da, hebûna xwe da, govekên xeberê û qulixê da, usa jî cîyên mayîn da, serwêrtîya here baş bikin?

Wextê ku hûn û merivê li rex we bi dilên xwe yek bin û berbi wan merema bicedînin, hûnê zêdayê bivînin. Xwedê duakirina Xwe li wan dera dide, li kîderê yekîti heye (binihêre Zebûr:133). Nava kîjan goveka da dijmin paşda venakişe, ku bêtifaqîyê di navbera we û merivê li rex we çê bike? Van pirsra û usa jî xwe teslîmî Xwedê bikin. Alîkarîya Ruhê Wî qebûl bikin, hivî bikin, ku hûn tevî merivê li rex xwe bibin yek û hivîya duayê Xudan bin.

Ders: Roj 3

QEDIRÊ HEVDU WEKE HEV BIGRIN

“...Her jinek gerekê qedirê mêrê xwe bigre”

— A Petrûs 3:7, MSG

Mêr û jin nava zewacê da weke hev in. Himberî mêrê xwe, jin ne li ser dereca duda ye. Her du jî weke hev in û nava kerema Xwedê da beşên wan yên weke hev hene. Em çawa dikarin bi cûrê herî ban qedirê hevdu weke hev bigrin? Bi hînbûna jîyana wan rola, yên ku Xwedê dane me.

Serwêr Cîmî Êvans dinivîse:

“Nava zewacê da hewcetîya mêr ya here mezin stendina qedir e. Gelo ew yek tişteki hewaskar nîne, wekî Xwedê temiyê dide jinê, ku gura mêrê xwe da be, “çawa hindava Xudan”? Wextê ku jin *qedirê* mêr *digre* û bi şabûn *gura wî da ye*, ew hewcetîya mêr û jintiyê ya here kûr dide tijikirinê.

Hema bi wî cûreyî jî, wextê ku mêr bi *xwepêşkêşkirinê* derheqa jina xwe da difikire û wê hiz dike, ew hewcetîya zewacê ya here kûr, hewcetîya çareseriyê, dide tijikirinê. Bona jinê, rêber lazim e, ku wê *biparêze* û *miqatîyê lê bike*. Wextê ku mêr vê yekê bi şabûn dike, dengê jinêyî hundur caba xwe distîne”.

Mêr: jina we berê ewlin keça Xwedê ye, lê paşê jina we ye.

Jinno, mêrê we berê ewlin kurê Xwedê ye û paşê mêrê we ye. Em qedirê Bavê xweyî Ezmîn digrin, wextê ku em qedirê hevdu digrin, çawa şikilê Xwedê yê li ser şexsa yê weke hev. Nava vê beşê da bi guhdarî derheqa şîretên Xwedê da, yên derheqa mêra û jina da, bixwînin:

Jinno, mêrên xwe fem bikin û piştgiriyê bidine wana, çawa ku hûn piştgiriyê didine Mesîh. Mêr rêberiyê jina xwe dike

usa, çawa ku Mesîh rêberîyê li civîna Xwe dike, lê ne ku bi zordarîyê, lê bi hizkirinê. Usa ye çawa ku civîn gura Mesîh da ye, usa jî jin gerekê gura mêrên xwe da bin.

Mêrno, bona jinên xwe wî hemû tiştî bikin, çi ku hûn dikarin bona hizkirina hindava wa da bikin û cudatîya wê yekê ew e, ku hûn bidin, lê ne ku hildin, rast usa, çawa ku Mesîh bona civînê kir. Hizkirina Mesîh civînê tomerî dike. Gotinên Wî bedewetîya wê hişyar dikin. Ew hemû tiştê, ku Ew dike, û dibêje, meremê wana yek e, ku tiştê herî baş bînine der, yê ku nava wî da ye, hevirmîşê sipî lê bikin, yê ku bi pîrozayê dibiriqe. Mêr gerekê jinên xwe usa hiz bikin. Bi kirina wê yekê, ew bi rastî keremê didine xwe, çimkî ew nava zewacê da îdî bûne “yek”.

“Tu kes zyanê nade bedena xwe, ne usaye? Na xêr, ew xwerinê didê û wê hiz dike. Awa vî cûreyî Mesîh nêzîkî civînê dibe, çimkî em parçekî bedena Wî ne. Awa ev e menî, ku mêr jî dê û bavê xwe dûr dikeve û jina xwe hiz dike. Bi vî cûreyî ew her du dibine bedenek”.

— Efesî 5: 22-31, MSG

Ruhê Pîroz derheqa rola mêr û jinê da çi dide kivişê?

Gelo hûn qedirê jina xwe digrin, bi jîyîna wê rolê, ya ku ji aliyê Xwedê da hatîye dayîne? Cihê we yê mezinbûnê nava kîjan govekada heye?

Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, gelo çi îzinê nade min, ku ez qedirê merivê li rex xwe bigrim? Rûyê nêzîkbûna bêqedir da, ezê ji çi miqûf bimînim? Potênsîyala merivê li rex min, ya çi cûreyî ye, ya ku hela hê min nedaye eşkerekirinê? Hîvî dikim, ku tu alî min bikî, ku wê qîmetîya cem wî bivînim”. Bê deng bimînin û guhdar bikin. Ruhê Pîroz çi elamî we dike?

Ders: Roj 4

MÎNAKA ÎSA

“Çawa ku kitêba Pîroz dibêje: “Mêr dê û bavê xwe dihêle û dighîje jina xwe û her du digihîjine hev, dibin yek”. Eva şewira mezin e, lê ev yek mînaka yekbûna Mesîh û civînê ye.”

— Efesî 5:31, 32, NLT

Xwedê rolên mêra û jina qirar kir. Ev rol bilindbûnê û nimizbûnê va girêdayî nînin. Ew mînaka heleqetîyên Mesîh û Civînê ye.

Niha, wextê ku we derheqa rolên mêr û jinê da xwend, çi ku hûn ji vî serê kitêbê pê hesîyan, himberî wê yekê bikin, çi ku we pêşda bihîstibû, yan jî zanibû. Gelo nava evî serê kitêbê da tiştek heye, ku ji wan tişta cuda dibû, çi ku we bihîstibû, yan jî bawerîya xwe lê diani? Pirsgirêkên çawa bona we hene? Çi piştgirîyê dide we? Hûn çi dixwezin diha kûr lêkolîn bikin?

Derheqa rola mêr da bifikirin: ew gerekê rêberîyê jina xwe bike, qulixî wê bike, çawa Îsa qulix dikir. Nava zewacê da ew yek mînaka rêberî, qulix û hizkirina Îsa ye. Mêrno, *gelo nava vê role da çi li we xweş tê? Gelo tiştekî usa heye, ku evê role va girêdayî ye, rûê çi da hûn li ser xwe guman nînin?*

Xwedê program nekirîye (têra nedîtîye, ku vê rolê hûn bi qewata xwe mîyaser bikin. Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Piroz, Tu Ruhê Mesîh Îsa yî û nava min da dijî yî. Min hîn bike, ku ez mînanî Îsa hiz bikim û qulix bikim. Kerema Xwe bide min, ku ez bi cûrê rast rêberîyê li jina xwe bikim, qirara qebûl bikim û qedirê wê bigrim, çawa endama yekîfîya me ya bi mafên weke hev”.

Jinno, nava rola mêrê we da çi we dide ruhdarkirinê? Hûn çawa dikarin qedirê rola mêrê xwe bigrin, bona ku nava malbeta we da yekîfî diha qewîn bibe?

Paşê derheqa rola jinê da bifikirin: ew gerekê bi rezedilîya xwe gura we da be û rola piştgirîyê hilde ser xwe, çawa sîmvola wê yekê ku Civîn bi rezedilîya xwe gura Mesîh da ye û piştgirîyê dide Wî. Jinno, nava rola we da çi we dide şakirinê? Gelo ew yek texmînkirina usa pêşda tîne, ku hûn bi mafê xwe kêmtirin? Bo çi?

Dengê we, pêşkêş û emekê we qîmetlû ne. Bisekinin û dua bikin: “Xwedê, ez spasîyê elam dikim, ku Tu hîvî dikî, ku ez wî şexsî bidime kîvşê, yê ku nava gurêdabûna Te da ye. Ezê îzinê nedime tu tiştî, ku derheqa şexsîfîya min da li cem min texmînkirinê çê bike, xêncî Gotina Te. Kerema Xwe bide min, bona ku ez qulixî mêrê xwe bikim, çawa ku ez dîcedînim qulixî Te bikim”.

Mêrno, nava rola jinê da çi we dide ruhdarkirinê? Hûn çi cûreyî dikarin qedirê rola jina xwe bigrin, bona ku hûn yekîfîya malbeta xwe diha qewîn bikin?

Tevî jina xwe, yan jî mêrê xwe derheqa wê yekê da xeber bidin, ku we çawa cabên wan pirsî dan. Tevî wê yan jî wî guvtugo bikin, ku bi fikira we çî cûreyî dikarin nava zewaca xwe da yekîtiyê îzbat bikin, derheqa her xemgînîkê da, yan jî guhartina da xeberdin. Eger jî we yek tirsê, yan jî bêitbarîyê texmîn dike, berbirî gotina Xwedê bin. Ew çî dibêje?

Tevayî dua bikin: “Bavo, em razîne, wekî Te qedirê me her yekî girtîye, rola bedew, giran û bi qedir nava zewacê da daye me. Alî me bike, ku em qulixî hevdu bikin û bona rûmeta Te em bibine mînaka yekîtiyê û hizkirinêye baş. Bi navê Îsa, amîn”.

BIBINE KOM

“Tevî hev nava aşîtiyê da bijîn: kubar- babax nîbin, lê bikevine dereca hev (merivên başqe, nava halê cuda da) û karên şikestîya hildine ser xwe. Tu cara xwe bêqîmet nekin, ne jî xwe dewsa zana daynin”.

— Romayî 12:16, AMP

Diqewime we gotina “Nava komê da xebera *ez tune*” bihîstîye. Ew yek ne tenê nava sportê da, lê usa jî nava zewacê da rast e. Hûn û merivê “endamê komê” xweyên rolên girîng in û yek jî yê mayîn nimiztir nîne. “Nava zewacê da jî gerekê firqî pirsgirêka pêşda neyne”, - **Doktor Hênri Klaud û Doktor Con Taûnsênd** dibêjin. – “Eger hûn û merivê li rex we li ser fikirên cuda-cuda ne, mesele, nava terbyetdarîya zaroka da, yan jî pirsra male da, ewê jîyana we diha gelekî dewlemend bike. “Dinîya” we wê diha berfireh be”.

Bi vî cûreyî, jî borcedarîyên malbetê kîjan li cem we diha baş in, lê kîjan li cem merivê li rex we baş tîndandinê? Hûn her dem gerekê borcedarîyên malbetê pareve bikin. Bi rastî, nava wede da ew dikarin bêne guhartinê. Feqet bi tomerî hildayî, kîjan borcedarîya hêja ye, ku teslîmî we bikin, lê kîjana teslîmî merivê li rex we bikin?

Bona malbeta xwe **navnîşa borcedarîyên komê teşkîl bikin**. Hemû tiştî binivîsin, yê ku gerekê bêne mîyaserkirinê û xebatên anegor teslîmî wana bikin, li cem kîjana ew diha baş mîyaser dibin. Hinek xebata dikarin bi temamî teslîmî we yan jî yê mayîn bikin. Xebatên mayîn wê diha baş bînin mîyaserkirinê, eger hûn wana teslîmî bikin û cabdarîyê bidine ser, mesele, d r’oja yan jî du hevîya carekê.

Awa hinek mînak:	Avtomaşînê bişon û guhdarîyê bidine ser
Wedê hêsbûnê program bikin	Byûcêya malbetê kontrol bikin
Deynê malbetê bidin	Kincşûştin
Karên malbetê kontrol bikin	Zaroka bibine mektebê, yan cihên mayîn
Xwerinê çê bikin	Derdana piştî xwerinxwerinê bişon
Malê paqij bikin	Tozê hildin
Guhdarîya baxçe, hewşê bikin	Xurek û tiştên mayîn bikir'in

Diqewime hûn zewicî ne û derheqa wê yekê da fikirîne, ku ji we her yek gerekê borcdarîyên çi cûreyî hilde ser xwe. Eger usa ye, ew borcdarî kîjan in? Bersivên xwe qîmet bikin û himberî borcdarîyên xwe yên nava navnîşê da bikin. Hûn govekên usa divînin, nava kîjana da gerekê guhantina bikin?

Îzinê nedine merivên başqe, ku ew pirsên usa nava emirê we da qirar bikin.

Careke mayîn dîna xwe bidine navnîşa borcdarîyên xwe û wê navnîşê himberî navnîşa jina xwe, yan jî mêrê xwe bikin. Bersivên xwe tevayî guvtugo bikin û paşê navnîşa borcdarîya ya bi hevra qayilkerî çê bikin.

“Emê bivînin, ku hûnê bi çiqasîva aqilmend bin, wextê ku piştgiriyê bidine hizkirina hindava hev da û alîkirina hevdu...”

Hûn nêzîkbûn, gotin û kirên xwe çî cûreyî dikarin bidine xebatê, bona ku hûn alî merivê li rex xwe bikin, ku ew borcdarîyên xwe biqedîne?



PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

Eger hûn vê kitêbê nava sinorên dersên tomerî, yê “Berevoka Mêsincêrê”-ye “Serpêhatîya derheqa zewacê da” lêkolîn dikin, matêrîyala dersa ya vidêoê ya 4 a temaşe bikin.

- 1| Îsa bona me mînaka mezin bû, wextê ku tabîya qulixê ya here xirab hilda ser xwe, nigên şagirta şuştin (binihêre Yûhenna 13:1-17). Neniherî wê yekê, wekî nava civaka wedê niha da hewcetîya şuştina niga tune, lê qulixa bona merivê mayîn pêwîst e. Bi mecalên praktîk yê çî cûreyî hûn dikarin bibine mîna Îsa û bi cûrê sîmvolîk “nigên jîna xwe, yan jî mêrê xwe bişon)?

- 2| *Mêrno*, bona çî ew yek girîng e, ku hûn çawa mêr, jîna xwe çawa hevkarê weke xwe hesab bikin (binihêre A Petrûs 3:7)? Eger hûn usa nekin, wê çî biqewime? *Jinno*, ew yek bona çî girîng e, ku hûn çawa jin qedirê mêrê xwe bigrin? Wê çî biqewime, eger hûn usa nekin?

Gelo bersivên wan pirsê we bi xofa Xudan tijî dikin û alî we dikin, ku hûn wan rola bi kerema Xwedê biqedînin, yê ku ewî dane we?

- 3| Heleqetîyên zewacê yê di navbera mêr û jîna da gerekê heleqetîyên Îsa û me, Dergîstîya Wî, bidine kîvşê. Derheqa wê yekê da bifikirin, ku nava zewacê da mêr û jin sembola kî ne? Rolên mêr û jinê çî cûreyî hizkirina Îsa ya hindava Civîna Wî û merivêd bêbawer da didine kîvşê? Me qewata çawa bona mîyaserkirina vê xebatê stendîye?

Serwêr: bona dayîna bersiva beşa pirsê ya duemîn bixwînin gotinên Efesî 5:18, usa jî Karên şandîya 1:8, Zakarîya 4:6, Aqûb 4:6 û Filîpî 4:13.

- 4| Xwedê dixweze, wekî firqiyên nava me da bibine yek, lê ne ku me ji hevdu cihê bikin. Bifikirin, ku jîyan wê çi cûreyî bûya, eger hûn û merivê li rex we mînanî hev bûna û aliyên we yên qewat û sist jî mînanî hev bûna. Bêjin, ku hemû tiştê çi cûreyî bûya, lê paşê çend pêşniyara bikin, bona kû hûn karê ji firqiyên xwe bistînin.
- 5| Gelekî kardar û girîng e, ku hûn borcdariyên xwe yên malbetîye bi hev ra qayîlkirî bizanibin. Gelo we îdî ew borcdariyên nava zewaca xwe da qîrar kirine? Gelo ew yek, wekî hûn borcdariyên xwe zanin, alî we dike, ku nava zewacê da atmosferâ qulixê saz bibe û hûn piştgirîyê bidine merivê li rex xwe.

TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Mecala here kardar, ya bona çêkirina zewaca saxlem qulixkirina bo jina xwe yan jî mêrê xwe, bi hînbûna wê yekê, ku bona berjewandîyên wî, yan jî wê, berjewandîyên xwe bikine qurbanî.
- Zewacên me wê Mesîh awqasî bidine kivşê, bi kîjana em îzinê didine Ruhê Wî, ku Ew nava jîyanên me da kar bike. Eger em îzinê bidin, ku Ruhê Pîroz her dem me tijî bike, fikirdariya me wê bê daçêkirinê, lê xeysetê me jî wê bê guhartinê.
- Mêr û jin şikilê Xwedê li ser xwe dibin û tebyeta Wî li ser vê dinîyayê didine kivşê. Her du jî weke hev qîmetlû ne û serwêriya her dua jî heye, ku bona hev d qulix bikin.
- Mêrno, Xwedê aminaya xwe li we anîye, ku hûn jina xwe xweyî bikin, biparêzin û piştgiriyê bidine wê. Hûn gerekê wê hiz bikin û qedirê wê bigrin, bi qurbanîkirina emirê xwe bona wê û berjewandîyên wê cîhê pêşin da xweyî bikin.
- Jinno, Xwedê aminaya xwe li we anîye, ku hûn qulixî mêrê xwe bikin, bibine xweykir û parêzera dilê Wî. Hûn gerekê qedirê wî bigrin, gura rêberîya Wî da bin, çawa ku gura Mesîh da bin.
- Tevayî qirarkirina borcdariyên malbeta xwe hevraqayîlnebûna dide kêmkirinê, alî wê yekê dike, ku aşîtî hebe û fikirdariya koma tevayî çê dike.



— PÊNC —

Nêzîkayî

Heleqetîyên bi bedenî bona wan heleqetîya têra hatine dîtinê, nava kîjana da xwepêşkêşkirina tam heye, çimkî heleqetîyên bi bedenî anegorî wê şabûnê ne, ya ku bi saya Mesîh ji yekîtiya tevî Xwedê ya tam tê. Hizkirina here bi hijmekarî, ya di navbera mêr û jinê da, ya ku li ser vê dinîyayê tiştê bûyîne ye, tenê nîşaneke derheqa wê yektîyê da ye.

— Tîmotî û Kêtî Kêllêr, “Fikira zewacê”

“.. O! hizkirî û hizkirîya, bixun û vexun. Belê, ji hizkirina xwe hetanî dawîyê vexun.”

— Stiranên Slêman yên evîntîyê 5:1, NLT

Roj I

Ew cûrê, ku Kitêba Pîroz dide xebatê, ku derheqa jîyana heleqetîyên bedenî da dide kîvşê, tu cara meriv nikare çawa yên bi xof nav bike. Ew diha gelekî eşkere ye û serbara serda êrotîk e. Eger hûn li me bawer nakin, çend deqa kitêba stiranên Slêman yên evîntîyê tevî jina xwe, yan jî mêrê xwe bixwînin û hûnê bibînin ku wê çi bibe.

Xwedê ne mînanî ji me geleka ye û ji heleqetîyên bedenî şerm nake. Ew razîbûnê ji wê bedewetîyê distîne û meremê wê bilind qîmet dike. Xwedê dixweze, bi nêzikayî nava heleqetîyên me yên nêzik da be. Heleqetîyên bi bedenî nava zewacê da ne tenê baş in û yên îzindayînê ne, lê serbara serda gelekî bilind in.

“Ji hizkirina xwe vexun hetanî dawîyê”, - nava kitêba gotinên Slêman yên evîntîyê da hatiye nivîsarê. Bi gilîkî mayîn gotî, heleqetîyên bi bedenî gelekî kûr in û hewce nîne, tenê ji der va wê yekê texmîn bikin. Razîbûna ji wê nêzikayê bicêribînin û li ser xwe texmîn bikin.

Nêzikaya bi bedenî mînanî prosêsa kompyûtêrê ye “nûbûnê ye”, ya nava heleqetîya da ye. Tiştê ecêbmayînê nîne, wekî gelek cara Kitêba Pîroz avê çawa razîbûna bi bedenî dide xebatê. Av bona berdeyamkirina jîyanê cîhê xwe nade tu tiştî. Ew nûbûne û qewatên bîolocîk dide. Neniherî wê yekê, wekî jîyana bi bedenî ya saxlem temamiya binyata zewacê nîne, feqet qîmetê wê meriv nikare bide zêdekirinê. Meremê Xwedê ew e, wekî heleqetîyên hizkirinê yên bi bedenî mînanî cejinê bin û bibine ew bîranîna kûr ya derheqa peymanê da, ya ku jîyanên mêr û jinê dike yek.

Bi wê yekêva tevayî, we zanibû, wekî heleqetîyên bi bedenî usa jî bona saxlemîya we kardar in? Xêncî wê yekê, wekî heleqetîyên bi bedenî nêzikaya di navbera we da diha zêde dikin, ew usa jî piştgirîyê didine sistêma îmunîteta we, alî we dikin, ku giraniya we ya bi fizîkî saxlem be, xwîna we peya dikin, êşên we didine sistkirinê û qezîya înfarkta dil didine kêmkirinê. Bêfitîya, ev tiştên ku me gotin, tenê beşeke kara heleqetîyên bi bedenî ne.

Hinek komên civînê xwestina heleqetîyên bi bedenî nav hev xistine, wê yekê çawa tiştê nebaş hesab kirine. Rûyê wê yekê da jî emirê zewacêyî bi bedenî çawa xirabkarî hatiye hesabkirinê. Hinek dixwezin me bidine bawerkirinê, wekî ew borcdarî ye, ku jin gerekê hindava mêrê xwe da mîyaser bikin. Feqet rastî ew e, wekî

heleqetîyên bi bedenî bona wê yekê hatine têradîtînê, ku mêr û jin lezetê bivînin. Hinek meriv heleqetîyên bi bedenî çawa xirabkarî hesab dikin. Ev fikira şaş ji mîrêcin hatîye, bi kîjanê gelek meriv vê yekê çawa tişteki xirab hesab dikin.

Meremekî heleqetîyên bi bedenî zêdayî ye, feqet Xwedê hema ji destpêkê da usa ji bona xwezîliyê têra dîtibû. “Bira kanîya te duakirî be”, - Kitêba Pîroz dibêje, - û tu tevî jina xwe ya cahiltîyê şa be: ewê bona te çawa kara xezalê ya hizkirî be, memkên wê her dem te têr bikin, tuyê her dem bi hizkirina wê va hijmekar bî” (gotinên Slêman 5:18, 19). Nava tercimên başqe da nivîsar e-“*dîl bî*” (NLT), “*serxweş bî*” (ESV).

Eyan e, wekî raberkirina Xwedê nerm nîne. Ewî organên bedenê çê kirin û ji xebitandina wana şerm nake. Ewî sêks çê kir û texmînkirinên wê dane sertkirinê. Ew şa dibe, wextê ku em razîbûnê texmîn dikin. Ew dixweze ne ku xwestinên me yên bi bedenî bide kêmkirinê, lê bide pîrozkirinê.

Heleqetîyên bedenî yên pîrozkirî

Pîrozkirin prosê e, ya ku berbi pîrozayê dibe. Wê yekê jî meriv dikare hesab bike çawa rîya berbi tiştê herî baş, çi ku Xwedê bona me çê kirîye. Bînine ber çavê xwe, wekî tebyeta merivatîyê qetîya ye û ya xwedetîyê hatîye. Heyîna emirê bi bedenî ya ne bînayî (ya ku bona me beşeke progirama Xwedê ye) ji wê destpê dibe, wekî em banga pîrozaya Xwedê li oda xwe ya razanê qebûl dikin. Eger em bi vî cûreyî bikin, emê razîbûneke bi bedenîye usa êşkere bikin, ya ku wê ji sînoren xiyalên merivatîyê zêdetir be.

Feqet tenê Xwedê dikare pîroz bike, wê yekê pîroz bike, çi ku em didine Wî. Telebext ra, ji me gelek meriv naxwezin emirê xweyî bi bedenî raberî Xwedê bikin, çimkî em ji şaşîyên berê şerm

dikin, yan jî dibine dîlên zordarîyên pêşda qewimî. Rûyê vê yekê da me tebyeta xwe ya bi bedenî çawa ya nepîroz hesab dikir û me dicêriband evê goveka tarî ji Xwedê Yê Pîroz veşêrin. Tişteki ecêbmayîne ye, ku çiqwas meriv zû bîr dikin, wekî Efrandarê emirê bi bedenî dikare xilas bike û pîroz bike.

Şerm dixweze guhdarîya me li ser şexsê me bide merkezkirinê û wê yekê ji Xwedê bide dîrxistinê. Ew me diavêje nava telê û dicêribîne me bîne ser wê qirarê, ku em kerema Xwedê înkâr bikin. Ew texmînkirin, ya ku pêşda mînanî şermê ye, bi kutasî dikare werguhêzî firnaxbûnê be û me def bide berbi tişteki mayîn. Em êşa xwe xweyî dikin, dewsa kîjanê em dikarin wê yekê bînine nava ronahiya hizkirinê. Ew merivên ku texmîn dikin, ku Xwedê pêşda emirê wanî bi bedenî neparastîye, gelek cara ditirsîn, ku Xwedê teglîfî nava wedê xweyî niha bikin. Rastî ew e, wekî Xwedê ji wana dûr neketibû. Ew çî ku qewimibû, feydayên ketina tebyeta merivatîyê bû. Îzinê nedin, wekî şerma guneh yan jî zordarîyê nehêle ku hûn bi temamî nêzikaya zewacê û xwezîliya nêzikaya bi bedenî li ser xwe texmîn nekin. Xwedê dixweze her tişteki şikestîyî nava we da bide qenckirinê û saxlemkirinê.

Wextê ku em teze zewicî bûn, em jî mînanî gelek jin û mîrên mesîhî difikirîn, wekî sondên meye zewacê wê rêça cêribandina bi bedenî ya pêşda bi rîya buhuştê va biçûna. Me bawer dikir, ku eger em hev hiz dikin û xwe pêşkêşî hev dikin, tu qewimandineke tarî, ya ji paşeroja me nikaribû biketa nava pêşerojê. Em difikirîn, wekî niha, wextê ku mecala heleqetîyên bi bedenî ya normal heye, xwehizî û şerm gerekê ji me dûrketana. Telebext ra em şaş bûn. Nava evî serê kitêbê da emê derheqa serpêhatîyên xwe da gilî bikin, ku tevî we derheqa qirarên xwe û eyantîyên xwe da, yên ku azadî bona me anîn, nivî bin.

Tu tişt nikare bona lawên Xwedê hîmdanîna mîrasa heleqetîyên bi bedenî yên nû bide qedexekirinê: ne mîrasa tebyetî, ne jî

teribandin. Çi jî hebe, tenê Xwedê dikare emirê meyî bi bedenî bide pîrozkirinê û me ji şaşiyên paşerojê, niha û pêşerojê azad bike. Nivîne zewacê tenê bi saya Wî dibine cîhê razîbûnê û hizkirinê.

Paşeroja me ya çî cûreyî jî hebe, yek e Xwedê dixweze emirê we yê bi bedenî bi temami bide nûkirinê, dasekinandinê. Kerema Wî diha mezin e, ne ku her tiştekî din, yê ku we pêşda kirîye. Hûn nikarin kerema Wî bistînin, eger we hela hê Ew nekirîye Xudanê emirê xweyî bi bedenî. Hûn gerekê fem bikin, ku hûn şikestî ne û halê xweyî şikestî teslîmî Xwedê bikin. Ewê tarîstana emirê we yê bi bedenî werguhêzî xiyala bedew bike.

Qedirê nivîna zewacê bigrin

“Hal zewac hemûya ra nav-namûsî be û cî-nivîn helal be, çimkî Xwedê wê dîwana çavder û zinêkara bike” (Îbrani 13:4, ESV).

Eger nava zewaca we da pîrsgirêk heye, ewê berê ewlin nava cî-nivînen we da bê kivşê. Cî-nivîna da tunebûna hizkirina gur nîşana pîrsgirêkên başqe ye û sarbûna tu yekî va girêdayî nîne. Pîrsgirêkên veşartî li ewê derê tîn kivşê, li kîderê cîhê mêrivî sist e, lê em diha gelekî hema wextê nêzikaya bi bedenî wê yekê didine kivşê.

Prînsîba nêzikaya bi bedenî ya here girîng namûs e. Gelek meriv bi şaşî bawer in, wekî cî-nivînen zewacê nikarin bêqedir bikin, yan jî haram bikin, û hemû tişt îzin heye. Feqet ew yek şaşîke mezine.

Em qedirê zewacê digrin, wextê ku em nezewicîne, yan jî dergîstîne û em xwe bona merivê li rex xwe xweyî dikin. Em piştî roja şahya xwe qedirê cî-nivînen zewacê digrin, îzinê nadin, wekî merivên başqe bikevine li wir û îzinê nadin, ku kesek me ji bedewetîya nêzikaya bi bedenî dûr bixe (mînak-pornografiya, zinêkari). Cî-nivînen zewacê xwestinên bi bedenî yên nepîroz nade

pîrozkirinê. Xeysetê nepîroz cî-nivînên zewacê heram dike û îzinê nade me, ku em nêzikaya bi rastî li ser xwe texmîn bikin. Çawa ku me serê kitêbêyî pêşda da dîyarkirinê, em jî qedirê cî-nivînên xwe digrin, wê yekê hesab dikin çawa cîhekî usa, li kîderê em qulixî berjewandîyên jina xwe, yan jî mêrê xwe dikin. Qulixa bi bedenî dide kivşê, ku nava sînorên pîrozayê da qedirê hewcetîyên wana bigrin, yên ku Xwedê qirar kirine.

Carana em bi vî cûreyî qulixî merivên li rex xwe dikin, nenihêrî wê yekê, wekî em bi bedenî xwe baş texmîn nakin. Nava sala da texmînkirina heleqetîyên bi bedenîye baş girîngîya xwe unda dike. Hûn îdî sêksê çawa şedetî lê nanihêrin, wekî hûn bi fizîkî layîqî begemîya merivên li rex xwe dibin. Ew îdî werguhêzî begemîya veşartî dibe. Xwedê heleqetîyên bi bedenî çawa mecala heleqetîyaye di navbera mêr û jinada çê kir. Îzinê nedin, wekî texmînkirina bêçarîyê pêşîya we bigre, bona ku hûn vê heleqetîyê bi cûrê baş li ser xwe texmîn bikin.

Çawa ku me got, wekî me cî-nivînên zewacê kirîye cîhê bi qedir, emirê meyî nihayî bi bedenî, wextê ku em ji 50-î derbazzir in, diha baş e, ne ku wî çaxî, wextê ku em ji 20-î derbazzir bûn, nenihêrî wê yekê, wekî bi fizîkî wî çaxî em diha bedew bûn ne ku niha. Emirê bi bedenîyî baş cûrê we yê fizîkî yan jî cêrbandinê va girêdayî nîne. Ew yek tenê tiştekî va girêdayî ye, ku hûn tevayî kî ne.

Wextê ku em bi hizkirinê va mijûl dibin, em emirê xwe yê zewacêyî ji 30-î sala jortir pîroz dikin. Wedê meyî bi şabûnê va tijî û usa jî dijwar, şerkarî û serkevtin, qîmetê didine nêzikaya me. Nêzikaya me ya ruhanî, evîndarî û fizîkî tevayî dighîjine xala here jorin, bi dayîna texmînkirina xwedêtîyê û razîbûnê. Kûltûra heleqetîyên bi bedenî, ya ku me nava zewaca xwe da îzbat kirîye, şedetîya qewata Xwedê ya xilazkir e, çimkî em niha ji wî cîhî gelekî dûr in, ji kîderê me destpê kiribû.

Roj 2

Serpêhatîya Lîzayê

Tevî Con, me gunehên bi bedenî yên cûre-cûre û şikestîbûn anîn nava zewaca xwe. Bêfitîya Con nava şerkarîya xwe ya şexsî da bû, lê ez jî mecbûr bûm nava goveka bedenî da şerkarîyê bikim. Fikira min ra qet derbas nedibû jî, wekî qîrarên bedenî yên ku li ber çavê meriva çawa yên nerast dihatine kivşê, yên ku min qebûl dikirin, wextê ku ez xwendikara 19 salî bûm, wê bicêribandana azaya min ji destê min bigrin, wextê ku ez 22 salîyêda bûme dergîstî.

Dê û bavê min digotîne min, wekî emirê bedenî bona zewacê têra hatîye dîtîne, lê şirove nedikirin, ku bo çi usa ye. Çiqwas tê bîra min, wana hîmlî derheqa nexweşîyên ji wê yekê pêşdahtî, yan jî şerma derheqa hemlebûnê da xeber didan.

Zewaca dê û bavê min gelekî neqewîn bû û min di navbera gotînen wana û emirê wana da tiştên anegorî hev nedidîtin. Çawa mesele, ez dikarim bêjim, wekî pîrika min û bavê min ji zewacê der gelek cara ketine nava tevgirêdanên bi bedenî. Nava emirê wan da fikira derheqa paqijayê da tune bû. Ez hatime ser wê fikirê, wekî gerekê bi fêlbazbî çi dixwezî wê yekê bike, hetanî ku tu nehatî girtîne û li ber tu kesî cabdar nînî.

Li ûnîvêrsîtête min guhdarîya xwe da ser wê fikirdarîyê û keysetê xwe kire anegorî nisileta xwe, hevalên xwe. Ez tevî wan meriva diketime nava heleqetîyên bedenî, yên ku min begem dikirin û min cabdarîya bi bedenî hildida ser xwe. Nava vê yekê da alîkî nava wan heleqetîya da gerekê kontrola hemlebûnê hilda ser xwe. Carana min hevalên xwe dibirine li cem doxtirê xwe, ku bona wana dermanên dijî hemlebûnê bèn dayîne.

Ez 21-salî bûm, wextê ku ez rastî Con hatim, û wextê rasthatina me ya ewlin, ewî rêberîya berbi Xudan li min kir. Ewê

êvarê ez tê bêjî careke mayîn hatime dinîyayê, bi Ruhva tijî bûm û hatime qenckirinê. Wextê ku me qise dikir, min tişteki bêfikir got: “Ez awqas şa me, wekî tabîya min ya moralî bû”.

Ez zendegirtî dimînim, ku bona çî min şirovekirina wî cûreyî ya xêfik kir. Hetanî roja îroyîn jî ez derheqa wê yekê da nizamim, lê caba wê pirsê diqewime ew bû, wekî min firqîya di navbera *moralê û pîrozayê da* fem nedikir. Rast e, tê bêjî ez ji nû va hatime dinîyayê, lê çetin nava çend sehetada meriv dikaribû fikira min çawa ya çêkirî hesab bikira.

Paşê, wextê ky me destpê kir her dem rastî hevdy bên, gymana min hebû, wekî Con derheqa wê yekê da bîr kirîye. Ez gelekî tirsîyam, wextê ky carekê ewî min ra got: “Ez awqas şa me, wekî me herdua jî xwe paqij xweyî kirîye”.

Min dixwest bikira qîrîn: “Min teze tobe kiribû û min nizanibû, ku min çî digot”. Wî çaxî min da eşkerekirinê, wekî qîrarên min yên sexsî dikaribûn çiqwas êş bigîhandana merivên başqe.

Wede nêzik dibû û min zanibû, wekî Conê pêşnîyar bikira, ku emirê xwe tevî wî nîvî bikim. Min zanibû, wekî gerekê derheqa rastîyê da bêjim.

Min va dihate texmînkirinê, ku ez layîqî Con nîbûm. Min dikaribû emirê xwe tevî merivekî usa çê bikira, yê ku Xwedê hiz dikir û derheqa min da difikirî. Lê ez li ser wê fikirê bûm, ku ez berbi berdaxustinê çûme û min ew mecalâ giranbiha unda kirîye. Ez derketime gerê û min destpê kir gazî Xwedê bikim. Min zanibû, wekî ez hatibûme afûkirinê, lê bona encamên qîrarên min yên bedenî ez poşman dibûm.

Ez çûme mala Con, ku tevî wî qise bikim. Feqet hetanî xwemikurhatina derheqa ewê sura bi şermî, ewî got.

-Tê miqabilî wê yekê nîbî, ku ez jî Încîlê gotinekê bixwînim. Min texmîn kir, ku em gerekê bi vê gotinê, bi hev ra qise bikin.

Min bi hejandina serê xwe da kivşê, ku ez qayîl im û Con destbi xwendinê kir.

-“Awa, eger yek yekîtîya Mesîh da ye, ew efirînekî nû ye, tiştên kevin derbas bûn, çûn û wa yên nû hatin” (B Korintî 5:17).

-Ez zanim, wekî eva tê bêjî usa nayê guhdarkirinê, - ewî got û ser da zêde kir, - lê min texmîn kir, wekî Xwedê got, ku te ra bêjim, ku tiştên kevin derbas bûne, tu niha nû yî û tu tê bêjî... qîzbî.

Min texmîn kir, wekî hindik maye, wekî ez bixerîqim.

-Ez qîz *nînim*, - min gotê.- Min hema derheqa wê yekê da dixwest bigota te.

Con ez hembêz kirim, çavên min nihêrîn û got:

-Eger Xwedê dibêje, ku tu usa yî, wî çaxî em kîn e ku miqabilî wê yekê derkevin?

Wî çaxî şerma min bi temamî paqij bû.

Emirê bedînî yê şikestî bidine dasekinandinê

Çi jî hebe, min xwestina xwe ya bedenî dabû hişyarkirinê, lê ne xwestina nava goveka hizkîrinê da. Piştî zewaca me, min dixwest hiz bikira, lê min nizanibû çî cûreyî. Nava femdarîya min da sêks tişteki xirab bû, nerast bû. Ew qedexekirî bû. Niha, wextê ku em zewicîn, sêks nişkêva bû tişteki baş, bi qedir û tişteki ku li Xwedê xweş tê. Min nizanibû, ku ez vê yekê ra çawa derbas bim.

Carana ez û Con tenê diman û min nişkêva jî filmeke pornografîk şikilek dianî ber çavê xwe û tirs dikete nava min, ya ku pênc sal pêşda li ûnîversîtête temaşe kiribû. Carên mayîn, ez bona xwestina bedenî diketime cîhekî girtî, çimkî rûyê heleqetîyên bedenî yên tevî hevalên xwe min şerm dikir.

Niha jî min gerekê îdî aza xwe bi temamî bida mêrê xwe, lê min texmîn dikir, wekî ji paşeroja xwe min şerm dikir. Hêja bû,

ku Con min bi temamî bistenda, lê min nikaribû nava emirê bedenî da xwe aza xweyî bikira, rûyê şaşîyên berê da. Min tevî fikirên netemiz her dem şer dikir. Ez miqabilî wana derdiketim, lê dihate texmînkirinê, ku cedandinên min badîhewa bûn. Nava evê êtapa emirê xwe da ez derheqa tevgirêdana û qewata xirabkirina nifrên, ku ji nisileta derbasî nisileta dibin, hîn bûm.

Ji serê kitêbêyî mayîn yê yekî da me derheqa nifirada xeberda. Çawa ku min da dîyarkirinê, nava serpêhatîya malbeta min da gelek titên nepaqij qewimîne, ji kîjana ez gerekê paşda bisekiniyama. Feqet min jî gerekê ew tevgirêdanên xwe yên berê bidana xirabkirinê, bona ku xwestina min a bedenîye parçebûyî bihata dasekinandinê. Niha em ewê beşa ji Încîlê bixwînin, ya ku derheqa vê yekê da dibêje:

“Gelo hûn nizanin, wekî bedenên we endamên Mesîh in? Wî çaxî, gelo ez gerekê endamên Mesîh hildim û tevî qaba bikim? Tu cara! Yan hûn nizanin, yê ku tevî qaba dibe, tevî wê dibe bedenek? Çimkî nivîsar e: “Her du wê bibine bedenek” (A Korintî 6:15, 16, NIV).

Ez hevalên xwe yên berê çawa qab nikarim nav bikim, lê prînsîb ew e, wextekê ez tevî wana bûm, lê paşê min peyman tevî merivekî başqe mor kir. Şexsê min parrçe- parçeyî bibû û paşê ez hatibûme şikestinê. Wextê ku hûn nava goveka bedenî da şikestîne, hûn nikarin xwe bi temamî teslîmî merivê li rex xwe bikin, çimkî hûn îdî yek nînin.

Bona jîyana nava paqijayê da û texmînkirina pêşkêşa nêzikaya bi bedenî, em gerekê bibine yek û tenê Xwedê dikare wê yekê bide dasekinandinê, bi tomerîkirina wê yekê, çi ku şikestî ye. Tenê Xwedê dikare qedirê emirê meyî bedenî bide dasekinandinê, eger ew hatiye heramkirinê. Tenê Xwedê dikare wê yekê hilde, çi ku nepaqij e û heramkirî ye û careke mayîn wê yekê paqij bike û bide pîrozkirinê.

Eger emirê weyî bi bedenî rûyê kirinên we yên pêşda şikestî ye, em dixwezin pêşniyar bikin, ku careke mayîn bona duakirina bo dasekinandina wê yekê wede başqe bikin. Careke mayîn em hîvî dikin, ku bi ruhanî hetanî duakirinê hazir bin û tenê tevî jina xwe, heval yan hevala xweye nêzik, yan jî hevalê xwe duakirinê dua bikin, yan jî tenê nava hazirîya Ruhê Xwedê da dua bikin. Bi dengê bilind bêjin:

Bavê Ezmîn,

Spas te ra, ku te bona cezakirina gunehê min Kurê Xwe şand. Çawa ku ez nava Mesîh da me, hemû tiştên kevin îdî ji emirê min derbas bûne. Niha hemû tişt nû ye. Anegorî B Korintî 5:21-ê, Îsa gunehê min hilda ser Xwe, bona ku ez bibime heqîtiya Te. Awa roja îroyîn ez kî me.

Niha ez xwe mikur têm û ji hemû gunehên xwe û gunehên bavên xwe, çi ku girêdayî ye gunehên heleqetiyên bi bedenî va, paşda disekinim (hemû guneha nav bikin, ji kîjana hûn paşda disekinim). Bi dengê bilind wana li ber Xwedê nav bikin, ji Xwedê tu tişt veşartî nîne. Ew îdî derheqa hemû tiştî da zane û dixweze wê giranîya wî gunehê şermê ji we dûr bixe. Wextê ku we xilas kir, berdewam bikin).

Bavo, ez şûrê Ruhê Te hildidim û her tevgirêdaneke wî cûreyî didime teribandinê... (Guhdarîya Ruhê Pîroz bikin û bi dengê bilind her navekî bêjin, kîjanî hûn dibihên. Diqewime hûn navên merivên usa bidin, tevî kîjana hûn neketine nava heleqetiyên bi bedenî, lê tevî kê hûn ketine nava heleqetiyên bi bedenî yên usa, yan jî texmînkirinên başqe, kîjan gerekê tevî merivê li rex we bûna, yan jî tevgirêdanên şexsî yên usa, yêu ku gerekê tevî Xilazkirê xwe hebûna).

Piştî gotina her navekî cuda, vî cûreyî dua bikin:

Bavo, milyaketên Xwe bişîne ku purçên şexsê min ji van meriva paşda vegeşînin. Wana bi Ruhê Xwe bide dasekinandinê, bona ku ez bibime merivekî tam, pîroz û cuda, yê anegorî xwestina Te.

Bavo, ez ji hemû şikilên zinêkarîyê û heramîyê paşda disekinim. Tu bibaxşîne min, wekî min şikilên heram danîne li ber çavê xwe. Anegorî Zebûr 101:3 ez peymanê mor dikim û ezê bi saya çavên xwe dilê xwe kontrol bikim. Ez ji her ruheki nepaqij paşda disekinim û emirî li ser wana dikim, ku ew ji jîyana min dûrkevin.

Bavo, min bi xwîna Îsa, ya ku paqij dike, bişo, çimkî tenê qewata wê xwînêye xilazkirinê û tobekirinê heye. Niha ez xwe çawa paristgeha Te pêşkêş dikim: bi qewata Ruhê Xwe her heramîke ruhanî, şexsî û bedenî ji evî cihê pîroz dûr bixe. Tu min bi Ruhê Pîroz tijî bike, Yê ku nava min da dijî. Çavên min veke, ku ez bivînim, guhên min veke, ku ez bibihêm û dilê min veke, ku ez wî hemû tiştî qebûl bikim, çi ku Te bona min hazir kirîye. Ez yê Te me. Bila xwestina Te nava emirê min da mîyaser bibe.

Bi hizkirin: lawê Te.

Roj 3

Serpêhatîya Con

Min xwe bona jina xwe xweyî kiribû, lê ez pornografiacê va hatibûme girêdanê. Wextê ku em zewicîn, min hela hê ew yek li ser xwe texmîn dikir. Ez difikirîm, wekî emirê bedenîyî tevî jina min wê ji wê nepaqijîyê bida qenckirinê, lê ew yek usa neqewimî. Piştî zewaca me, min bi sala ser hev tevî ewê xwestina bedenî şerkarî dikir. Girêdana wê yekê va gelek pîrsgirêk nava emirê meyî bedenî da pêşda dianîn. Min şerm dikir û ez navhevetî bûm. Min nedixwest, ku ez tenê bi wê daxwezê va girêdayî bim, lê min çiqwas dicêriband, nikaribûm ji wê yekê azabûma. Tişteke gerekê ez bidama guhartinê.

Sala 1984-a borcedarîke min ew bû, ku rêberîyê li wan terîfkira bikim, yên ku dihatine civîna me û rojekê min derheqa wê yekê

da yekî ra gilî kir. Ew meriv qulixçî bû, qedirê kîjanî min gelekî digirt. Ew bi qulixa xwe ya azakirinê va gelekî eyan bû. Ez difikirîm, wekî ew yê tek- tenê bû, ku dikaribû alî min bikira. Min jî derheqa şerkarîyên xwe da wî ra gilî kir.

Ewî caba min neda, çawa ku ez hîvîyê bûm:

-Wê yekê neke, - ewî got.- Bi gilîkî wê yekê neke.

-Baş, - min gotê. -Feqet hûn dikarin bona min dua bikin.

Ewî dua kir, lê tu tişt neqewimî. Ez difikirîm: *“Diqewime gerekê ez merivekî usa bivînim, pêşkêşa kîjanî ya azakirinê diha qewat e”*. Feqet min merivekî usa nas nedikir, qulixa kîjanî diha hukumdar bûya. Min jî wî çaxî texmîn kir, wekî ez gunehê xwe va hatime girtinê.

Neh meh derbaz bibûn, wextê ku rojekê hevalemî min îzin da min, ku mala wî da çar roja bimînim. Ez li wir başqe bûm bi meremekî, ku ez miqabilî ewî hukumî şerkarîyê bikim. “Xwedê, bese, - min got.- Gerekê terka vê yekê bidim”. Ewê rojê, şeş gulana sala 1985-a, ez bi temamî aza bûm.

Piştî wê yekê, wextê jîyana nava azayê da, min jê pirsî: “Xwedê, ez fem nakim. Bo çi ez aza nebûm, wextê ku qulixçî bona min dua kir? Min derheqa wî hemû tiştî da wî ra gilî kir. Bona çi awqas wede hate xwestinê, ku ez azabim?”

Xwedê carekê ra guhdarîya min bire li ser wê guhartinê, ya ku nava emirê minî duakirinê da qewimî bû. Êpêce wede duayên min, bi tomerî hildayî ev bûn: “Xwedê, min bide xebatê. Ez hîvî dikim, min bide xebatê”. Merkeza emirê duakirina min da ez bûm. Hemû duakirinên min dora başîya min û navê min dizvirîn. Xwestina derheqa azabûna ji wê yekê, ya ku nava min da bû, ne ji Xwedê bû, ne jî ji hizkirina hindava Lîzayê da. Ez ditirsîyam, wekî rojekê problêmên min wê îzinê nedine min, ku ez nava navê xwe da kar bikim. Vê yekê îzin nedida min, ku ez Xwedê ra nêzik bim û wextê ku nêzikayî tune bû, min qewata Wî ya guhartinê nikaribû texmîn bikira.

Hinek wede şûnda dilê min hate guhartinê û hîmê duakirinên min ev bû:

“Xwedê, ez dixwezim Te nas bikim. Îzinê nede, ku di navbera me da çetina yê hebin”. Peyî wê yekê ra ez hatime guhartinê. Wextê ku min berê xwe ji xwe vegeande berbi Xudan, jîyana min bona kerema Wî hate vekirinê. Ewî ez aza kirim û emirê min yê bi bedenî qenc kir. Min ew yek qebûl kir, çî ku Încîl vî cûreyî nav dike-*berxweketina li gora xwestina Xwedê*.

Berxweketina li gora xwestina Xwedê

“Çimkî ew cûrê berxweketinê, yê ku Xwedê dixweze, ku em li ser xwe texmîn bikin, me ji guneh dûr dixê û berbi xilazbûnê dibe. Nava vê berxweketinê da poşmanî tune, lê berxweketina ji vê dinîyayê, tobekirina kîjanê tune, berbi mirina ruhanî dibe” (B Korintî 7:10, NLT).

Bi sala ser hev rûyê wî hukumî da, pirsgerêka xwe da, min berxweketin texmîn dikir. Çawa ku êdî min got, min dixwest ku ez bi xwestinê va girêdayî bim, lê ji xeysetê xwe ez sil dibûm. Gelek meriv rûyê gunehê xwe da berxweketinê texmîn dikin. Çawa jî hebe, berxweketina xwedêtîyê heye, ya ku berbi tobekirinê, guhartinê dibe û berxweketina vê dinîyayê, ya ku gunekarkirinê, bêyî guhartinê, pêşda tîne.

Berxweketina li vê dinîyayê li ser şexsê mêriv hatîye merkezkirinê û ew bi kubarîyê va qewatê distîne. Ew gumanbirîyê û hiznekirina hindava şexsê mêriv da pêşda tîne, çimkî helkirinên tek-tenê, kîjana ew divîne, nava sînoren qewatên mêrivda nin. Berxweketina li vê dinîyayê mînanî merivê kor ewê gumanê nabîne, kîjanê meriv dikare nava qewata Xwedê û zanebûna Wî da bibîne. Bo wê yekê jî ew yek mêriv berbi mirina ruhanî dibe.

Berxweketina xwedêtîyê tiştêkî mayîn e. Nava vê

berxwe'tinê da hiznekirina hindava şexsê xwe da tune ye. Ew ne merkeza xwehizîyê ye, lê ya xwedêtî ye. Neniherî wê yekê, wekî ev berxweketin gelekî bi êş e, feqet gumana wê ya bona pêşerojê heye, çimkî nava wê yekê da karebûna Xwedê ya pîrozkirinê, qewatkirinê û xilazkirinê heye. Berxweketina xwedêtîyê dikare bi kurtayî êşê pêşda bîne, lê zûtirekê peyî ra şabûn û emir pêşda tîn.

Berxweketina li vê dinîyayê û gunekarkirin nava emirê min da dîlketina min dane sertkirinê. Ez difikirîm, wekî xeysetê min yê xwedêparêzîyê ye, wextê ku min dua dikir, lê bi rastî ez bi kubarîyê va tijî bibûm. Min dixwest, ku ez aza bim, bi hesabildana berjewandîyên xwe. Ez gelekî xemgîn nîbûm, ku min êşeke çawa dida dilê Xwedê.

Gelek dicedînin aza bin, çimkî naxwezin, ku gunehên wana nava emirên wana da poşmanîyê pêşda binin, açixîyên pêşerojê biteribînin, yan jî li ber dîwanê bisekinin. Tabîya wî cûreyî ya bi tirsê û ya xweparastinê nikare wê qewatê pêşda bîne, ya ku wê wana biguhêre.

Em nikarin bibine mînanî Xwedê, eger em wê yekê nas nakin, çî ku dilê Wî da ye. Nêzîkaya tevî Wî her dem guhastinê pêşda tîne. Em azaya jî guneh distînin û xweyî dikin, wextê ku tevî Wî nava tevgerêdana da nin. Wextê ku em şikestî nêzîkî Xwedê bin, Ewê Xwe eyan bike û wê qewatê bona pîrozbûnê bide me.

“... Xwedê miqabilî kubar-babaxa ye, lê keremê dide şikestîya. Awa ber Xwedê şikestî bin...Xwe li Xwedê bigrin, Xwedê jî wê Xwe li we bigire (wê Xwe li we eyan bike)... Bira kenê we bibe şîn û eşqa we (berxweketina li gora Xwedê) jî keder. Li ber Xudan xwe bişkênin û Ewê we bilind bike” (Aqûb 4:6-10).

Xwedê me bilind dike, me jî cedandinên berbi tebyeta gunekar azad dike. Ewî em aza kirine, bona ku em aza bin. Feqet em nikarin wê azayê bivînin, eger em nehatine li cem Azadar. Eger em dixwezin aza bibin, Xwedê bigerin. Nêzîkaya tevî Wî wê nava we da her car kedera xwedêtîyê gur bike, wextê ku hûn jî rêyên Wî

dûrkevin. Ev keder wê diha gelekî we nêzikî Xwedê bike û qewatê bide, ku nava azayê da bijîn.

Bîr bînin, ku hûn lawê Xwedê ne û cihê gunekarîyê nava jîyana we da tune ye. Eger hûn li ser rê sist bûne û we azaya xwe unda kirîye, terka fikirdarîya derheqa nekarebûna xwe da bidin. Ji encamên şaşîya xwe netirsîn. Dewsa wê yekê derheqa mezinaya Xwedê û qewata kerema Wî ya xilazkirinê da bifikirin.

“Dêmek, niha dîwan bona wana tune ye, yên ku dighîjine Mesîh Îsa. Eger hûn yên Wî ne, qewata Ruh ya ku jîyanê pêşkêş dike, hûn ji qewata gunehê we aza kirine, ya ku berbi mirinê dibe” (Romayî 8:1, 2, NLT).

Pornografîya û nêzikayî

Nenihêrî wê yekê, wekî girêdana min (Con) ya pornografîyaê va gerekê peyî zewacê ra wunda bûya, li cem min wekî mayîn hate stendinê. Gelek mêr û jin ew yek dîtine, çî ku min da eşkerekirinê. Xebitandina matêrîyalên pornografîk bi cûrê xirab ne tenê hukumî li ser nezewicîya, lê usa jî li ser mêr û jinên zewicî hukum dike. Ew usa jî hukumê ziyandar nava zewacê da dihêle. Pornografîya mêr û jina ji karebûna nêzikaya rast miqûf dihêle.

Em ji wê yekê zendegirtî mabûn, wextê ku em pê hesîyan, wekî şêwirmendên mesîhî hene, yên ku mêr û jinên zewicî ra pêşniyar dikin, ku t’evayî matêrîyalên pornografîk temaşe bikin, ku piştgirîyê bidine jîyana xwe ya bedenî. Eva şaşîke gelekî mezin e. Tö cara wê yekê nekin. Hinek wede şûnda hûnê eşkere bikin, wekî we zîyayê razayî hişyar kirîye, yê ku wê nêzikaya we bi agirê xwestinê bişewitîne.

Feqet “Xwestina çavên mêriv wê tu cara têr nebe” (gotinên Slêman 27:20, AMP). Pornografîya bona zewacê qezîa ye, çawa pêşîya dewatê, usa jî peyî ra. Nenihêrî wê yekê, ku em tevî

merivên li rex xwe ne, yan na, em gerekê tu cara dîna xwe nedine şerma wan meriva.

Nenihêrî wê yekê, wekî pornografiya wedelî piştgirîyê û razîbûnê dide, çimkî ew yek bona bedena me hijmekariyê pêşda tîne, lê ewê karebûna nêzikaya tevî merivê li rex me û usa jî tevî Xwedê xirab dike. Çawa jî hebe, rûyê pornografiyê da emê ji merivê li rex xwe û usa jî xwe razîbûnê nestînin. Pornografiya dikare piştgirîyê bide cêribandina heleqetîyên bi bedenî, lê ewê pirsêd kûr yên nava heleqetîyên zewacê da nede helkirinê. Helkirina vî cûreyî tenê barekî giran li ser hîmê neqewîn zêde dike. Dikare bê texmînkirinê, wekî pornografiya prîska jîyanê vêdixe, lê bi rastî ew têlê bomba mirinê vêdixe, ya ku wê biteqe û wê tevhevbûnê, bêaminayê bêçarîyê pêşda bîne.

Xwedê têra dîtîye, wekî hûn razîbûna bedenî tenê tevî merivê li rex xwe bistînin. Wî çaxî nêzikaya di navbera we da wê ji cî-nivînên zewacê derbasî govekên zewacê yên mayîn bibe û wê wana dewlemend bike. Eger meriv xwe dide pornografiyê, wî çaxî meriv divedîne tenê nava sînoren şexsê xwe da bighîje razîbûnê. Pornografiya nêzikayê naxweze, lê tenê xwestina mezin pêşda tîne. Razîbûna ji pornografiyê standî, himberî ewê razîbûnê, ya ku meriv bi saya nêzikaya ji Xwedê dayî distîne, sî ye, ya ku zû derbaz dibe.

Wextê ku mêr û jin îzinê didin, ku pornografiya bikeve nava yekîtiya wan, ew cî-nivînên zewacê heram dikin, çimkî ew merivên başqe tevî heleqetîyên xwe yên nêzik dikin. Eva progirama Xwedê nîne. Cêribandina heleqetîyên bi bedenî gerekê wê peymanê bîr bîne, ya ku jîyanên herdu dighîne hev, lê nava peymanê zewacê da bona alîyê sisîya cih tune ye. Çi ku di navbera herdu da pîroz e, nava gelek meriva da ew heram dibe. Xwedê dixweze, ku em qedirê cî-nivînên zewacê, usa jî wê peymanê bigrin, ya ku sembola wan cî-nivîna ye. Ew dixweze, wekî li wir bibe cihê şabûnê û razîbûna dirêj.

Roj 4

Bi kontrolkirina dilên xwe

Hetanî van dawîya, saytên întêrnêtê yên pornografîk ew sayt bûn, li kîderê gişka zefîr gelek meriv dîna xwe didane matêriyalên pornografîk (reqema wan meriva ji reqema merivên, ku dikevine saytên sosîalî, zêdetir bû). Ji deh sayta, yek yan ji yekê zêdetir, yêd pornografîk in. Ji 40 mîlionî zêdetir amêrikî her car dikevine van malpera û pornografîyê temaşe dikin. Medê heleqetîyên bi bedenî tu cara pêş neketiye û bi vî cûreyî nehatiye razîkirinê.

Nenihêrî wê yekê, wekî piştgirîya heleqetîyên bi bedenî yên feşkirî bi vê derecê zêde dibe, emirê bedenî bi pir'anî werguhêzî xwestinê dibe. Sêksa bi kompyûtêrê nêzikayê unda dike û zewaca dide xirabkirinê. Niha mêrên usa yên cahil jî hene, yên ku bi wê yekê dizêrin, çimkî xwestina wan ya bedenî rûyê pornografîya întêrnêtê da navhev ketîye. Ew jî jinên bi r'astî r'azîbûnê nastînin û xwestinêd wane vîrtûal jî heleqetîyêd rastî cuda dibin. Pîrsa pornografîyê tenê derheqa mêra da nîne û matêriyalên pornografîk tenê nava întêrnêtê da belabûyî nînin. Ji pênc jina yek, nava hevtê da here kêma carekê întêrnêta pornografîyê temaşe dike. Him jin û him jî mêr xêncî întêrnêtê matêriyalên başqe jî didine xebatê, mesele kovar û kitêbên êrotîk. Evana nava jina da gelekî belabûyî ne.

Pornografîya û gunehên bedenî yên mayîn razîbûna navhevketi pêşniyar dikin, ya ku anegorî progirama Xwedê ya pêşin nîne.

Keysetê wî cûreyî, wextê ku ew tevgirêdana bi bedenî ya nava fikirê da, fantazîyayê da, yan jî li ber êkranê diqewime, encamên diha gelekî xirab pêşda tîne, ne ku tevhevbûna stendina razîbûnê. Îsa got: “Kî bi tamê xirab jinekê binihêre, ewî dilê xwe da îdî tevî wê zinêkarî kir” (Metta 5:28).

Ev cûrê bêamin, yê ku ji temaşekirina pornografîyê pêşda tê, bona zewacê qezîa ye, çimkî her tiştekî ku meremê Xwedê ye

pêşin, yê bona jîyana bi bedenî nav hev dixê, ziyane dide dilê me. “Dilê xwe ji hemû tiştî zêdetir kontrol bikin”, - kitêba Gotinên Slêman dibêje, - çimkî ew prosêsa emirê we qirar dike” (4:23, NLT). Gunhê bi bedenî dilê me heram dike û paşê jî ew dikare emir û zewaca me xirab bike. Ev rastîya vî cûreyî anegorî hesabên sosîolocîk nava 56 selefê ji hevcihêbûnê da alîk her dem saytên pornografîk va girêdayî bûye.

Her gunehêk êrîşê tîne li ser jîyana me. Çawa ku em mesîhî ne, dijmin nava şerkarîya bona stendina ruhên me bin ketiye û usa derdikeve, wekî ew şkarîyê t’evî şexsên me dike. Ew dixweze, ku em nava encamên guneha da bîn çelkirinê û jîyana baş nebînin (binihêre Yûhenna 10:10).

Mesîh em ji guneha aza kirin, lê em nava vê azayê da najîn, wextê ku îzinê didin, ku guneh emirê me kontrol bike. Awa bona çî Pawlos nivîsî:

“Îzinê nedin, ku guneh hukumî li ser wê yekê bike, ku hûn çawa dijîn. Cîh nedine xwestinên bi guneha. Îzinê nedin, ku parçekî bedena we bibe hacetê xirabîyê û qulixî guneh bikin. Dewsa wê yekê xwe bidine Xwedê, çimkî hûn mirî bûn, lê niha jîyana we ya nû heye. *Dêmek, tamamîya bedena xwe bidine xebatê, çawa hacetê heqîtîyê, bona rûmeta Xwedê*” (Romayî 6:12, 13, NLT; xeberên cudakirî, zêdekirî ne).

Nava *temamîya bedena* me da jîyana bi bedenî jî heye. Em Xwedê rûmet dikin, wextê ku em bi tamamî xwe teslîmî Wî dikin û îzinê didine Ruhê Wî, ku Ew rêberîyê li qirarên me yên bi bedenî bike. Xwedê wê me ji hemû tiştî aza bike, çî ku me ji wî emirî miqûf dihêle û pê va dide girêdanê, yê ku Ewî bona me têra dîtîye. Ewê rêberîyê li me bike, ku em xwestina xwe ya bedenî bi cûrên usa bidine kîvê, kîjan azayê, nêzîkayê û razîbûnê pêşkêş dikin.

Em nabêjin, wekî dilketina li cem gunehê bedenî, yê ku îdî bûye keyset, hêsa ye alt bikin. “Bicedînin, - Pawlos dinivîse, - wekî hûn

feydayên xilazbûna xwe bidine kivşê, bi şikestîbûna li ber Xwedê û bi tirs û xofa Wî” (Filîpî 2:12, NLT). Neniherî wê yekê, wekî nava emirê me da pîrozayî karê kerema Xwedê ye, xaçkirina bedenê gelekî bi êş e. Gelek cara bona pîrozayê tê xwestinê, ku miqabilî kubariyê derkevin. Eger îzinê bidine Ruhê Pîroz, ku ew nava me da karê Xwe yê pîrozayê mîyaser bike, emê bikevine nava şabûna ruhanî, ya ku diha mezin e, ne ku ew êşa, ku em wextê şerkarîyê texmîn dikin.

Dîtinoka derheqa paqijayê da

“Ez kumreşiyê li we dikim, bi wê kumreşiya Xwedê, çimkî min hûn yekî ra awa gotî Mesîh ra nîşan kirin, wekî we mîna qîzeke bikir li ber wî bidime sekinandinê. Lê tenê ez ditirsim, ku çawa mar bi fêlbazîya xwe Hêwa xapand û usa jî ew hişê we biçeliqîne û hûn destê xwe ji şîrhelalî û dilsaxîya xwe ya hindava Mesîh da bikin” (B Korintî 11:2, 3, NLT).

Paqijaya zewaca me wê paqijayêva girêdayî ye, kîjanê Mesîh dixweze nava Dergîstîya Xwe da bivîne.

Xwestina bedenî nava civînê da belabûyî ye. Lêkolînên van axirîya derbaskirî didine kivşê, wekî 50-î selefê mêrên mesîhî û 20 selefê jinên mesîhî pornografiyê va girêdayî ne. Meriv mecalên cûre-cûre didine xebatê, ku miqabilî wê yekê şerkarîyê bikin. Ewana meriva digerin, li ber kîjana dikarin hesabdar bin, yan jî berbirî mêtodên guhastina xeyset dibin, ku bona hukumê xwestina bedenî bidine sekinandinê. Ew yek, wekî meriv dixwezîn bêne guhartinê, nîşaneke baş e û ev mecal bi rastî cîhê xwe digrin. Feqet, wextê ku meriv dibe hesabdarê yekî û yan jî dibe qeydeparêz, altkirina tebyeta gunehkar tiştê bûyîne nîne. Eger meriv dixweze bikeve nava heleqetîyên bedenî, tu tiştêkî tebyetêyî usa tune, ku wî bide sekinandinê. Neniherî wê yekê, wekî ji der va xeysetê wedelî bê kontrolkirinê, lê emirê wî yî hundur wê bi xwestinê û gunehkarîyê bê rêberkirinê.

Xeysetê me wê bi rastî bê guhartinê, wextê ku fikira me bê çêkirinê. “Û nekevîne kirasê bendê vê dinîyayê, - Pawlos dibêje, - lê îzinê bidin ku Xwedê we biguhêre, bike merivekî nû, wê yekê biguhêre, çî ku hûn difikirin” (Romayî 12:2). Çawa lawên Xwedê, em ji serwêrtîya guneh azabûyî ne (binihêre Romayî 6:19-23). Çawa jî hebe, bona dîtina vê azayê, em gerekê îzinê bidin, ku Xwedê xeysetê me bide pîrozkirinê, fikira me çê bike.

Fikira me çê dibe, wextê ku em wede nava Gotina Xwedê û hazirîya Wî da derbas dikin. Gotina Xwedê, ya ku dilên me da tê nikandinê û bi Ruhê Wî îzbat dibe, azaya jî guneh dide (binihêre Zebûr 119:11 û Aqûb 1:21). Gelek mesîhî rûyê gunehên bedenî da xwe gazin tîn, lê wê şermê naynine nava hazirîya Wî, Yê ku tenê dikare berbi azayê rêberîyê li me bike.

Gelek îdarên ayîna dîn cêribandine, bi tirsê, yan jî bi kontrolkirina meriva xeysetê wana bidine guhartinê. Ev mêtod kar nekirine, lê dewse ew rastî feşbûnê û guneh hatine. Rûyê şermê da guneh nava sîyê da tê veşartinê, li kîderê ew berfireh dibin.

Qanûnên ayîna dîn û qanûnên meriva nikarin me ji guneha bidine azakirinê. Bi rastî qanûn atmosferê baş bona bêqanûnîyê saz dikin (binihêre R’omayî 7 û B Korintî 3:6). Xwedê naxweze, wekî em havişîya xwe li qanûna bînin, lê ew dixweze, ku em havişîya xwe li Wî bînin. Em dibine îdêalî, wextê ku em hizkirina Bavê Xwe texmîn dikin û wextê ku jî heleqetîyên tevî Wî em qencbûnê distînin. Kitêba Pîroz da nivîsar e:

“Û hûn zanin, ku Mesîh bona wê yekê eyan bû, wekî guneha hilde û nava Wî da guneh tune ne. Her kesê ku nava Wî da dimîne, ew nava guneha da namîne, lê her kesê ku nava guneha da dimîne, ewî ne Ew *fem kirîye, ne jî nas kirîye*” (A Yûhenna 3:5, 6 NLT; xeberêd cudakirî, zêdekirî ne).

Xebera yûnanî ya “gînosko”, ya ku nava vê gotinê da bi xebera “femkirin” hatîye tercimekirinê, dide kivşê “Tu yekî bi

cêribandina şexsî nas bikî, û nava heleqetîya da bî”. Bona azabûna ji tebyeta gunehkar, pêwîst e, ku tevî Xwedê nava heleqetîya da bî, lê ne ku derheqa Wî da ji merivên başqe bizanibî.

Yûhennayê şandî, bi piştgirîya Ruhê Pîroz, elam kir, wekî ew mesîhî yê, ku ser hev guneha dike, merivê nêzikî wî tune, tevî Mesîh nava heleqetîya şexsî da nîne. Dêmek, ew dijarî û gunehên ku nava zewacê da teribandina nêzikayê pêşda tînin, dikarin bi nêzikaya tevî Xudan bêne altkirinê.

Eger guneh emirê we kontrol dike, birevine cem Xwedê. Hûnê ji guneh aza bin, eger hûn derheqa hizkirina Mesîh û kerema Wî da bizanibin. Eger hûn li ber Xwedê şikestî bin, Ewê fikira we çê bike û wê ewê perdê dûr bixe, ya ku îzinê nade we, ku hûn azaya xwe ya nava Mesîh da nas bikin.

“Lê gava yek li Xudan vegere, hingê ew xêlî tê hildanê. Û Ew Xudan Ruh e, û Ruhê Xudan li kîderê be, li wê derê jî azayî heye. Awa em hemû jî rûkî bêxêlikirî mîna neynikê şewqa rûmeta Xudan vedigerînin û em tèn guhartinê, dibine xût ew sûretê Wî û rûmetê da hêdî- hêdî pêşda diçin, ev yek bi alîkarîya Xudan e, ku xwexwe Ruh e” (B Korintî 3:16-18, NLT).

Xwedê naxweze, ku her dem miqabilî gunehên bedenî, yan jî gunehêkî mayîn şerkarîyê bikin. Ew dixweze, ku hûn pîroz bin. Wextê ku hizkirina we ya hindava Xwedê zêde be, ya ku wî çaxî pêşda tê, wextê ku hûn hizkirina Xwedê ya hindava xwe eşkere dikin, hûnê bi cûrekî nû jîyanê binihêrin û hûnê bixwezî qedirê Wî bigrin. Bi mîyaserkirina xwestinên Wî hûnê ewê qewatê bidine eşkerekirinê, bi kîjanê hûn dikarin mînanî Îsa bijîn. Em bona we wê yekê dua dikin, çî ku Pawlos bona civîna filîpîya dua kir:

“...ku hizkirina we hê-hê bi zanebûn û serwaxtîya gihîştî va zêde bibe, wekî kîjan herî qenc e, hûn wê bibijêrin. Hingê hûnê roja hatina Mesîh da şîrhelal û bêleke bin û bi saya Îsa Mesîh, bi

berên heqîyê va tijîbûyî bin, bona rûmet û pesinê Xwedê” (Filipî 1:9-11, NLT).

Wextê ku em bi cedandina razîkirina Mesîh nêzikî heleqetîya bedenî dibin, em dikarin her cûrekî jîyana tevî merivê li rex xwe, nêzikaya tevî wê, yan jî wî, hîn bin.

Roj 5

“Wedê salê”, yê jîyana bedenî

“Bona her tiştî wedê salê û wede heye, bona her kirineke bin ezmîn da...” (Zanêbûn 3:1, KJV).

Nava gelek govekên jîyanê da wede girîng nîne, lê hemû tişt e. Eger nava jîyanê da hemû tişt wedê sale va girêdayîye û bona her kirinekê wede heye, usa ye jîyana me ya bedenî jî wî cûreyî ye. Çar wedê salê (sêzon) hene û em bawerin, wekî ew yek derheqa zewacê da ne jî. Wekî usa ye, werin em derheqa jîyana bedenî da bin vê ronahê da xebêrdin.

Bahar: dehsalîya ewlin

Bona ku em vê meselê diha baş raber bikin, emê her wedekî salêyî jîyana bedenî himberî dehsalîke zewacê bikin. Werin em derheqa mêr û jinekê da xebêrdin, yên ku 28 salîyê da zewicîne û niha yaşê wanî navîn e. Emê van deh salên ewlin, yê nava zewacê da hesab bikin çawa wedê teşkildariyên nû û yê bêşûc, dêmek- baharê, eva ew wede ye, wextê ku çawa ku şayîr Alêksandr Poûp dinivîse, “...guman heta-hetayê pêşda tê”. Baharê emirê we bi mecalava tijî ye.

Dehsalîya ewlin, wedê hêvîya û lêkolîna ye, wextê ku hûn dikevî nava jîyana bedenî ya nû. Ew çî ku pêşda razayî bû,

niha wextê bahara zewaca we, hişyar bûye. Hûn her du jî didine eşkerekirinê, ku hûn çawa şexs kî ne û emirê weyî tevayî çi cûreyî ye. Nava jîyana we ya bedenî da hemû tişt nû ye.

Eger hûn dixwezin, ku zarokên we hebin, wî çaxî hûnê wedê girêdayî hemlebûnê va û pê ra jî çetinaya li ser xwe texmîn bikin. Jîyana we ya bedenî wê rastî guhastina bê, wextê ku nava emirê we da zarok pêşda bîn. Hûnê tenê hizkirîyên hev nîbin, lê hûnê usa jî bav û dê bin. Diqewime zarok rihetîya we biteribînin û gelek cara jî oda we da razên.

Ev wede dikare bi rastî wedekî baş be. Wedê bûyîna dayîka cahil li min (Lîza) gelekî xweş dihat. Min her çar kurên xwe jî ji salekê hetanî duda bi şîrê dê xweyî kirine. Paşê min texmîn kir, wekî bi xweykirina wana û danîna guhdarîya li ser wana diha gelekî hêsa bû, ku min Con hesab hilneda. Tu cara gerekê dayîkên cahil mecbûr nekin, ku di navbera zaroka û mêra da bijartinê bikin, lê fesal bin, wekî ew zaroka biçûk, ya ku hembêza we da ye, wê dewsa mêrê we negire. Gelekî li min xweş dihat, ku ez zarokên xwe têr bikim û hiz bikim û ew yek usa dibû, wekî wede tune bû, ku ez wede bona mêrê xwe başqe bikim. Mîna bîr fikir, wekî nenihêrî wê yekê, ku ewî zarokên me hiz dikirin, lê tevgirêdana wan ya nêzikayêye tevî wî usa nîbû, çawa ya tevî min. Ew hewcê min bû, lê hewcetîyên wan zaroka, yên ku ji hizkirina me hatibûne dinîyayê, bona min diha kiviş bûn. Malbetên usa jî hene, li kîderê bav diha gelekî wede bona keçên xwe başqe dikin, lê nêzîkbûna wî cûreyî hindava jinên xwe nadine kivişê.

Derheqa zarokên xwe da bifikirin, lê bi wê yekê va tevayî nêzikaya xwe jî çê bikin. Emekê xwe bikine nava hev. Zaroka zû razînin, ku bikaribin wede bona xwe jî derbas bikin. Barê xweyîkirina zaroka nivî bikin, bona ku bikaribin diha zêde nivî bikin, ne ku razanê, wextê ku hûn nava cî-nivînananin. Tevî

jina xwe yan jî mêrê xwe derheqa xemgînîyên xwe da gilî bikin û wan tiştê veneşêrin. Carana dikarin bêjin: “Min bîra heleqetîya nêzik kirîye. Em çi dikarin bikin?”, bi wî cûreyî hûnê her tiştêkî nerazîbûnê xirab bikin. Nava dehsalîya ewlin da bicedînin hewcetîyên hev yên bedenî bidine zelalkirinê. Îzinê nedin, wekî xeysetên bedenî yên usa pêşkevin, yên ku paşê dikarin nerazîbûnê pêşda bînin. Bi hev ra qise bikin. Nava deh salên ewlin da ew yek girîng e, ku hûn jîyana xwe ya bedenî nava baxçê baharê da bînine ber çavê xwe, li kîderê dara dinikînin, bona ku rezên wana havînê û payîzê berev bikin.

Havîn: dehsalîya duem

Havîn bona her tiştî wedê herî baş e.

— Çarlz Baûdên

Eger bahar bi gumanê tijî ye, wî çaxî havînê dîtinoka we ya diha sax û pêşketî heye. Nava wî wedeyî da emir bi hemû tiştî va tijî ye. Hetanî havînê we îdî rîya xwe ya pêşekzanîyê bijartîye û we îdî qîrar kirîye, ku gelo hûn hazir dibin, ku zarokên we hebin. Ew zarokên ku îdî hatine dinyayê, mezin dibin û çawa şexs çê dibin. Hetanî ku zarok mezin dibin, dê û bav jî destpê dîkin diha baş hev nas bikin.

Çetin em bikaribin hema dîmenekî havînê ji ber çavê xwe berdin, yê ku nayê qîmetkirinê. Hûnê mecbûr bin bona nêzikayê wedê mektebê, wextê ro derketîye, wextê ku zarok ne li mal in, yan jî hûn li xebatê ne, başqe bikin. Eger dehsalîya we ya baharê açix bû, hûnê vê dehsalîyê diha baş derbas bikin, ne ku ya derbazbûyî. Eger baxçê we wextê wedê ewlin baş bêcerkirî nibû, hela hê dereng nîne wê yekê bikin.

Havîn wedekî usa ye, wextê ku hemû tişt zû dikare bighîje, nava wan da usa jî şînaya nelazim. Hûn gerekê bixebitin, cêrgên

baxçê xwe paqij xweyî bikin, ku şînaya nelazim li wêderê mezin nebe. Wî hemû tiştî avdin, çî ku bona nêzikaya we saxlem e û hemû tiştê zû bighîje, çîmkî axa baxçê we nava dehsalîkê da bi aminaya çêbûyî qewat stendîye.

Havîn rojên dirêj, ken, eşqê dide kivşê. Nava havîna me da em hatine ser wê fikirê, wekî diha baş e, ku em roj bikevine nava heleqetîyên bedenî. Êvara em westîyayî bûn û diha baş bû roj wedê xwe bidine xebatê, wextê ku kurên me, yan derva bûn, yan li mektebê bûn. Êvarê diqewime ew tişt nebûya.

Payîz: dehsalîya sêem

Dehsalîya bi sirê em çawa payîz nav dîkin. Hetanî niha jî bona me eva wedê salêyî herî hizkirî ye. Vî çaxî wekehevtîya rojên bi tevê û şevên sar li me xweş tê. Em bi bedenên xwe yê r'ih'et va diha gelekî hêsa dibîn.

Payîz bahara duem e, wextê ku her belçek bûye kulîlk.

— Albêrt Kamyû

Ev fikira gelekî li me xweş tê. Dewsa wê yekê bicêribînînin cahiltîya xwe paşda vegeerînin û payîza xwe derbaz bikin. Me eyan kirîye, wekî nava evî wedê sale da nêzikayî careke mayîn nava piranîya wedê emirê me da cîhê xwe digre. Niha, wextê ku em yaşê xwe da jî 50 salî derbaztir in, rîtîma jîyana me hatiye guhartinê. Niha tevî zarokên xwe dersên wana hazir nakin û em naçîne civînên li mektebê, yan jî teşkîldarîyên sportê. Em diha gelekî wede tevayî derbas dîkin.

Niha em wî hemû tiştî dinivîsin, çî ku em dixwezînin nava evê dehsalîya payîzê da bikin, bona ku zivistan nişkê va neyê ser me da. Ji van bernama yek ew e, ku em derheqa saxlemîya bedenî da bifikirin. Em derheqa xurekê saxlem, gerê û fizkûltûrayê da difikirin.

Em wedê xwe usa program dikin, wekî gelekî tevayî bigerin. Me ev yek wî çaxî jî dikir, wextê ku em teze rastî hevdu dihatin.

Gelek mêr û jin payîzê jî hev cuda dibin. Wextê ku zarokên wana cîguhastî dibin, ew fem dikin, wekî tevî merivekî başçe dijîn. Nava vê dehsalîyê da mecala bijartina me heye. Em dikarin bi yazixîyê va tijî bibin, rûyê wê yekê da, ku çi derbas bûye, yan jî bi şabûn berbi wê yekê bilivin, çi ku pêşîya me ye. Em we ra dibêjin, ku vî wedeyî çawa wedê çêkirina zewaca xwe binihêrin. Hûn careke mayîn dikarin bibine mînanî jin û mêrên tezewewicî, tenê vê carê hûnê diha zane bin û yaşê xwe da jî mezin bin.

Zivistan: salên mayî

*Bi gihîştina zivstana kûr ez bi kutasî pê hesiyam,
wekî nava min da havîna usa heye, ya ku bin nakeve.*

— Albêrt Kamyû

Emê derewa nekin: kalbûn û pîrbûn çawa wedekî gelekî dijwar û neheq tê texmînkirinê. Dê û bavê Con karibûn evî wedeyî baş teşkîl bikin. Rast e, li cem wan hinek pîrsgirêkên saxlemîyê pêşda hatin, lê gerên rêgûlyar, fizkûltûra û rasthatinên tevî hevala alî wan kirin, ku ew aktîv bimînin û ew jî mînanî du hizkirîyên cahil tevayî nava cî-nivînên du meriva da radizên. Diha baş e tevayî kal û pîr bin, nêzîkaya bi bedenî nava her wedekî da jî bedew e.

Xudanê kitêba Zanebûn, bi nivîsara derheqa wede û wedê sale da dibêje: “Ewî hemû tişt anegorî wede kirîye” (Zanebûn 3:11). Tiştê rast wedê rast da bedew e. Em dixwezin tevayî nava kalbûn-pîrbûna milahîm ra derbas bin û bi rîtima her wedekî da bireqisin.

Dişa meselekê raber bikim, dora kîjanê hêja ye bifikirin. Kincên xweavêxistinê yên şidîyayî li tevbûyên lîstikên olîmpîyê tîn, feqet ez (Lîza) berê xwe vedigerînim, wextê ku merivên yaşên

mezin bi wan kinca divînim. Ew çî ku wede da bona xweavêxistina lez qulix dikir, bona xweavêxistina nerm û paldana li ser avê pêwîst nîne. Hûn gerekê tu cara xweavêxistinê nedine sekinandinê. Hûn gerekê hizkirina avê nedine sekinandinê rûyê wê yekê da, wekî hûn îdî bi wan kinca bedew nînin. Xweavêxistin û emirê bedenî nava hemû wedê jîyanê da baş in. Awqasî nava wede da ew bi cûrê cuda-cuda tên kirinê.

Wextê wedê zewaca me yê baharê, ez bi kincê xweavêxistinêyî vekirî va diketime avê. Wextê ku em wedê zewaca xweyî havînê ra derbas bûn û ez bûme dayîk, min destpê kir, kincê xweavêxistinêyî tam va bikevime avê. Niha, wextê wedê meyî payîzê, ez kincê sportê va xwe avê dixim. Kê zane, diqewime wedê mayîn da ez tiştêkî mayîn xwekim. Feqet ezê xweavêxistinê nedime sekinandinê. Diqewime em awqasî xwe avê nexin, çawa ku wedê xweyî baharê da, ne jî xwe avêxin û bifikirin, wekî zarokên me li male ne, çawa havînê. Feqet emê wextê wedê xweyî payîzê û zivistanê xwe avêxin. Bi gelek alîya va heleqetîya bedenî havîna me ya heta-hetayê ye.

Pêşniyarên praktîk

Nenihêrî wê yekê, ku hûn niha nava kîjan wedeyî da nin, bi hev ra xeberdin. Eger hûn nezewicîne, tevî Xwedê bi xwestin û cedandinên xwe va nivîbin. Tevî hevalekî xwe xeberdin, yê ku cedandinên we tevî we nivî dîke û piştgirîya hevdu bikin. Eger hûn zewicî ne, bi hev ra qîse bikin. Bi xemgînîyên xwe va nivîbin.

Bi rastî, her yek jî dikare bibe hizkirîyê baş, feqet eger tenê hîn be. Li cem mêra fikirdarîya mêtodîkî dikare hebe. Ew difikirin: *“Eger evê nêzîkbûnê nava van deh carên dawî da kar kirîye, hêja ye, ku tiştêkî biguhêrin?”*. Jinno, eger hûn dixwezî, ku mêrên we tiştêkî biguhêrin, derheqa wê yekê da bêjine wana. Mesele, hûn

dikarin bêjine mêrê xwe: “Ew yek li min xweş tê, wextê ku tu stûyê min radimûsî”. Mêrê xwe mecbûr nekin, ku ew bifikire ku hûn çî dixwezin. Derheqa xwestinên xwe da gilî bikin.

Nava rojê da hev hembêz bikin, wextê ku hûn nikarin bikevine nava nêzîkaya bedenî. Hev hiz bikin. Herin gerê, wextê ku hûn dixwezin derheqa heleqetîyên xwe ya bedenî da xeberdin, bona ku ji we tu yek nefikire, ku tiştêkî şaş dike. Çî ku nava kovara da nivîsar e, bawerîya xwe wana neynin, çimkî îzina we heye, ku emirê xwe ya bedenî hûn anegorî xwestinên xwe bikin, mînanî govekên jîyana xwe ya mayîn.

Eger hûn hewcê alîkarîyê ne, wê yekê bigerin. Îzinê nedin, ku ev goveka jîyana we ji guhdarîyê der bimîne. Dawîya kitêbê me navnîşa litêratûrayê daye dîyarkirinê. Lê civîna we jî dikare alîkarîya zêde bona we pêşniyar bike.

Çawa ku nava vê pirsê da kvalîfîkasiya me ya pêşekzanîyê tune, lê cêribandina şexsî heye, fikirên me bi piranî derheqa wan mêr û jina da nin, yên ku dixwezin bi hev ra nêzîk bin, lê ne ku tenê razîbûnê ji hev bistînin. Em fem dikin, wekî wedê usa hene, wextê ku jin û mêr hewaskarîyê hindava hev da nadine kivilşê. Em zanin, wekî înkarkirina bedenî ya vî cûreyî êşeke mezin pêşda tîne. Wî çaxî berbirî tu kesî nebin, berbirî Xwedê bin. Li ber Wî dilê xwe vekin û bawer bin, wekî Ewê yekîtiya we qenc bike. Dewkirina bona heleqetîyên bedenî tu cara wê feydayê baş nede.

Em jî zanin, wekî we’de dijwar hene, wextê kö merivê li r’ex nexwepe û ew yek îzinê nade, kö heleqetîyêd bedenî hebin. T’evî doxtirêd xwe xeberdin, kö hûn bizanibin, çî dikarin bikin.

Em dua dikin, wekî hûn nava temamiya jîyana xwe da berbi hevdu bicedînin û mîrata xwe ya bedenî çê bikin, ya anegorî bernama “Progirama” Xwedê ya îzbatbûyî û ya ji birîn û terbandinên pêşda azabûyî. Bi hizkirina hev va “Her dem serxweş bin”.

Ders: Roj 1

JI NÊZİKAYÊ LEZETÊ BIVÎNIN

“... Lezetê ji jina xwe bivîne, tevî kê tu zewicîyî, wextê ku tu cahil bûyî. Mînanî milyaketeke bedew, mînanî gulekê: tu cara ji hijmekarîya hindava bedena wê paşda nesekine. Tu cara hizkirina wê çawa ya sade qebûl neke.”

— Gotinên Slêman 5:19, 20, MSG

Xwedê heleqetîyên bedena *hetanî* ketina mêriv çê kirin. Nêzikaya bi bedenî nava doranên zewacê da baş e. Bi rastî ew cuda ye. Di navbera mêr û jinê da heleqetîya hizkirinê û nêzikayê ya diha six tune.

Nêzîkbûna we ya hindava sêksê nava zewaca we da çi cûreyî bûye? Gelo hûn wê yekê çawa tiştê paqij û baş hesab dikin, çawa ku Xwedê têra dîtîye? Bo çi, yan jî bo çi na?

Nenihêrî wî hemû tiştî, ku wedê weyî derbazbûyî çi derheqa sêksê da hûn hîn kirine, Bavê weyî ezmîn dixweze, ku hûn bizanibin, wekî Ew bi temamî begemîyê dide nêzikaya bi bedenî ya tevî merivên li rex we û wê yekê dua dike. Wede başqe bikin, ku dora van Gotinên Xwedê bifikirin, yên ku derheqa heleqetîyên bedenî da nin.

Bila jina te bona te bibe kanîya d uakirinê. Tevî jina xwe ya cahiltîyê şa be. Ew xezala bedew e. Bila memkên wê her dem te têr bikin. Bila tu her dem bi hizkirina wê va hijmekar bî”.

— Gotinên Slêman 5:18, 19, NLT

“Mêr û jin gerekê hewcetîyên hev yên bedenî bidine razîkirinê”

— A Korintî 7:3, GW

“Bila zewac çawa tişteki bi qedir nava hemû tiştî da bê hesabê (çawa qîmetlû bê qîmetkirinê, giranbiha, û xwezima hizkirî). Bi vê yekê va tevahî, bila cîh û nivînên zewacê paqij bin (ji bêqdirbûnê dûr bèn xweyîkirinê)....”.

— Îbranî 13:4, AMP

Bila zewac çawa tişteki bi qedir nava hemû tiştî da bê hesabê (çawa qîmetlû bê qîmetkirinê, giranbiha, û xwezima hizkirî). Hûn wan tiştta qebûl dikin, lezetê lê divînin? Gelo ev gotin alî we dikin, ku hûn heleqetiyên bedenî bin ronahiya diha baş da binihêrin?

Nava kitêba Stiranên Slêman yên Evîntiyê da Xwedê nêzikaya saxleme bi bedenî bi hûrgilî raber dike. Vê yekê lêkolîn bikin, xwezima nava (bi taybetî) serên kitêbê yên çara û hevta da û hîvî ji Xudan bikin, ku Ew ditinok û hêvîyên we yên derheqa heleqetiyên bedenî da bike anegorî ditinok û hêvîyên Xwe.

Nava nêzikaya bedenî da prînsîba here girîng *qedir e*. Gelo nava xeysetê weyî niha da tişteki usa heye, yê ku cî-nivîne we yê zewacê bêhurmet dike?

Îbranî 13:4-da tercima Încîlê ya “Êmplîfayd”-ê dide kivşê, weki *qedir* ne tenê dide kivşê, ku gerekê cî-nivîne zewacê bikir bihêlî, lê zewacê gerekê hesab bikin, çawa tişteki qîmetlû, giranbiha û xwezima hizkirî.

Ders: Roj 2

QENCKIRINA BONA DILÊN ŞIKESTÎ

*“(Xwedê) dilên şikestî qenc dike û birinên wana dipêçe
(bi qenckirina êş û derdên wana)”*

— Zebûr 147:3, AMP

Ji me gelek meriva rûyê qirarên şaş da bêhurmetkirin û êş stendine, kîjan wana pêşda qirar kirine. Çawa ku Bavê meyî Ezmîn bi xwestina Xwe ya mezin dixwest me va bê girêdanê, Ewî, bi serwaxtiya Xwe ya bêqisûr, bernama qenckirina jîyanê û dasekinandina wê bi destî Kurê Xwe Îsa hazir kir. Pawlos serpêhatiya Xwedê ya hizkirinê nava nama ser navê Tîto bi kurtayî raber dike:

*“Çimkî em jî wextekê bêfem bûn, xwe serî xwe, xalifi û xulamên cûre- cûre, tamên xirab û kêfa dilê xwe bûn, me nava xirabiyê û hevsûdiyê da dijît, em mînanî marê reş li ber çavê hev reş bûn. Lê gava şîrinayî û hizkirina Xwedê, Xilazkirê me xuya bû, Wî em xilaz kirin. Ne ku bona wan kirinên rast e, ku me kirin, lê gora rehma Xwe em xilaz kirin, bi şûştinê em nû dinyayê ketin û bi Ruhê Pîroz nûyejîyîn bûn. Wî Xwedêyî, ew Ruh bi merdanî ser me da barand, bi destê Îsa Mesîhê Xilazkirê me, wekî bi kerema Wî em rast bîn hesabê û bi wê gumanê jîyîna heta- hetayê war bin. *Pêşkêşa Xwedê heleqetîya me ya tevî Wî da dasekinandinê û jîyanên me paşda vegerandin*”.*

— Tîto 3:3-7, MSG; xeberên cudakirî zêdekirî ne

Gelo nava emirê we, yan jî emirê merivê li rex we pêşda tiştên usa qewimîne, rûyê çî da ji we yek texmîn dike, ku hêja nîne, ku ji heleqetiyên bedenî razîbûnê bistînin? Çend deqa bêdeng bin, dua

bikin û derheqa wê yekê da bifikirin. Eger Ruhê Pîroz tişteki bîne bîra we, binivîsin û bi duakirinê teslîmî Wî bikin.

Bi hevra qise bikin û bi hemû fikira va bi hev ra nivî bin, çi ku derheqa vê pirsê da dilê we da heyê. Du bikin û hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku ew dilên we qenc bike, wê yekê bide dasekinandinê, çi ku hatîye wundakirinê.

Xwedê nikare wê yekê pîroz bike, çi ku em nadine Wî. Bêqelp bin. Gelo hûn govekeke jîyana xwe ya bedenî ji Wî vedişêrin? Gelo ew yek ew para jîyana we ya bedenî ye, li kîderê hûn *ji sînorên îzîndayî derbaztir bûne?* Eger usa ye, ew yek çî ye? Dua bikin û hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku Ew bide kîvşê, ku hûn bona çi wê yekê vedişêrin. Ew çi elam dike, binivîsin.

“..her merivek, yê ku ghiştîye Mesîh, destpêka nû distîne û ji nû va çê dibe. Emirê kevin îdî derbazbûyî ye, emirê nû gul vedide. Ev ew e”.

— B Korintî 5:17, MSG

Dilên me qenc dibin û careke mayîn saxlem dibin, wextê ku em wana *bi temamî* didine Xudan. Awa we çi kir, wextê ku we dua kir û paşeroja xwe teslîmî Xwedê kir. Lê niha bi guhdarî dora van gotina bifikirin. Qanûna Ducarî 6:5, Zebûr 119:2, Gotinên Silêman 3:8, Yêrêmîya 29: 11-14, Marqos 12:29, 30. Ruhê Pîroz derheqa zewacê û jîyana bedenî da bi rîya van gotina çi dibêje we?

Ders: Roj 3

AZAYA NAVA HELEQETÎYA NÊZÎK DA

“...Her kes, yê ku gihîştîye Mesîh gunha nake...”

— A Yûhenna 3:6, GNT

Nêzîkaya tevî Mesîh, kîjanê meriv dikare nava heleqetîyên tevî Ruhê Pîroz bibîne, hîmê azabûna ji hemû gunha ye. Nêzîkayî *heleqetîya six e*. Dawidê padişa, Pawlosê şandî û Meyremê berbi vê yekê divedandin. Heleqetîya nêzîk bûyîna *nava Mesîh da* dide kîvşê. Nava kitêba Peymana Nû da ev gotin ji sed carî zêdetir tê xebitandinê. Îsa nêzîkayî vî cûreyî şirove kir: “Çawa yê ku nava Wî da *dijî*. Em çawa heleqetîyên nêzîk yên tevî Mesîh distînin û xweyî dikin? Em her dem wede û guhdariya xwe didine Wî.

“Nava salname û rojevên me da cîhê xewile gerekê cîyê ewlin da be, çimkî hema li vî cîhî nêzîkayî pêşda diçe...Ew merivên, ku bi rastî dişuxulin û bi qewatê va tijî dibin- bi saya *heleqetîyên hizkirinê yên sexsî yên* tevî Îsa Xudan, wê bighîjine rasta padişatiya mezin”.

— Bob Sorc

Bêyî şikberî, azaya ji guneh nava heleqetîya nêzîk ya tevî Îsa ye. Dêmek, hûnê heleqetîyên tevî Wî çi cûreyî şirove bikin? Hûn çiqwas wede û guhdariyê tenê edidine Wî? Bona çi hûn hazirîya Wî digerin? Têma duakirinên we ya piranî, ya hindava xwestinên we ye, yan xwestina naskirina Xwedê ye?

Eger nêzîkaya tevî Îsa pirsra we ya sereke nîne, gunehkarîyê li ser xwe texmîn nekin. Awqasî tevî Wî bêqelp bin û kerema Wî nivî bikin. Dua bikin: “Xudan ez Te hiz dikim û dixwezim Te nas bikim, lê ez

zanim, wekî niha heleqetîyên min tevî Te usa nînin, çawa ku Tu dixwezî. Ez hewcê alîkarîya Te me Çavên min veke, ku ez qîmetê naskirina Te bibînim. Dilê xwe nişanî min bike. Gelo çi dijarî hene, ku Tu cîhê ewlinda bî? Ez çi dikarim bikim, ku alî bikim, ku agirê hizkirina hindava Te gur be? Ez serwaxtîya Te û kerema Te hîvî dikim, bi navê Îsa”.

Bêdeng bin û guhdar bikin, ku Ruhê Wî çi elamî we dike. Wê yekê binivîsin û kerema Wî hîvî bikin. Bona ku wê yekê bikin, çi ku Ew dibêje.

Ew tiştên, ku dijarîyê pêşda tînin, ku Xwedê cîhê ewlin da be:

Ez gerekê çi bikim, bona ku heleqetîyên nêzîk tevî Wî çê bikim?

TEVÎ XWEDÊ BAŞQE BIN

Mecaleke here baş, ya bona naskirina dilê Wî û texmînkirina derecên azayê yên nû ew e, ku bi hinek wede başqe bin bona duakirinê û tevgirêdana tevî Wî. Hûn dikarin tevî civîna xwe ji bajêr derkevin, yan jî rêwîtiyê tevî merivê li rex xwe teşkil bikin. Bi çend roja başqebûna tevî Xwedê, dîrxistina guhdarîya xwe ya ji tiştên herroje, dikare heta-hetayê jîyan û zewaca we bide guhartinê.

Wede bivînin û tevî Xwedê başqe bin. Wê yekê nava rojnîşa xwe da binivîsin û hesab bikin çawa pîrsa xwe ya pêşin. Wê yekê qîrar nekin, ku hûnê wede çawa derbaz bikin û tevî xwe tiştên usa hilnedin, kîjan wê bikaribin guhdarîya we bidine dîrxistinê. Tenê Încîlê, kaxwez û qelemekî tevî xwe hildin. Hazir bin, ku bi merdanî ji wê rehmê bistînin, ya ku dilê Wî da ye.

Tiştê cîhê xewileyî baş bidine eşkerekirinê: zêde nava van gotina da bixwînin: A Dîrok 16:27, Zebûr 16:11, 27:4-6, 31:19, 20, 91:1-16, Îşaya 40:31, Yûhenna 15:4-8, Îbrani 4:16.

Ders: Roj 4

XWESTINÊN RAST BIDINE PÊŞXISTINÊ

“Lê ez dibêjim: (anegorî tradîsîyayê) bimeşim û nava Ruh da (Pîroz) bijîm (bi dayîna caba Ruh, kontrolkirî û rêberkirî ji aliyê Ruh da): wî çaxî hûnê bêyî şikberî, xwestinên bedenê (bêyî Xwedê) nedine razîkirinê.”

— Galatî 5:16, AMP

Paqijaya zewaca we wê paqijayê va girêdayî ye, kîjanê Mesîh dixweze nava Dergîstiya Xwe da bibîne. Xwestinên bedenî xirab nînin. Xwedê ew xwestin çê kirine û ew li Wî xweş tî. Dêmek, kirin û hukumên şaş dikarin yekîtiya me bidine bêhurmetkirinê. Wextê ku em cîh didine wana, ew miqabilî nêzikayê şerkarîyê dikin û wana tevlihev dikin, çî ku Xwedê çawa tiptên *qenc* nav kirine. Kilîta pêşxistina xwestinên rast ev e: *tebyeta xwe ya merivatîyê birçî bihêlin û ruhê xwe têr bikin.*

“Nenihêrî wê yekê, wekî Încîl bi cûrê qenc heleqetiyên bedenî dinihêre, - bixwînin Stiranên Silêman yên Evîntîyê, - lê xudanên Încîlê derheqa tela guneh yê bi bedenî jî baş zanin, wekî em dikarin pêşkêşa Xwedê xirab kin, ya ku Ewî daye me... Ev e menî, wekî bona çî îzbatîya zewacê bo me girîng e, bona wan meriva, yên ku divedînin nava behra xwestina bedenî da rîya rast ra herin. Hema eva ew cîh e, li kîderê xwestina bedenî bi ruhanî bi fikir e û kardar e”.

— Gêrî Tomas

Ew, çî ku hûn bi destî çav û guhên xwe dihêlin, ku bikevine hundur, paşê dikevî nava fikir û dilê we. Çav û guhên we rêyên berbi şexs û ruhên we ne. Ew çî ku hûn dibînin û dibihên, yan tebyeta we ya merivatîyê dide têrkirinê, yan jî ruhê we.

Bisekinin û bifikirin. Hûn çawa *tebyeta* xwe ya *merivatîyê* têr dikin? Gelo hûn film û progiramên têlêvîzîonê, yan jî sazbandîyê guhdar dikin, yên ku agirê xwestinên nepaqij gur dikin? Gelo hûn bi kitêb, kovar, yan jî saytên usa va “têr dibin”, yên ku fikir û dilê we didine qirêjkirinê? Hûnê derheqa hevalên xwe û hukumên başqe da çi bêjin? Gelo pareke wana piştgirîya qirar û kirinên tebyeta merivatîyê yên şaş dikin, yan na?

Hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku Ew derheqa hukumên nesaxlem da elam bike. Ew dibêje, ji çi, yan jî ji kê xwe dûr bigrin?

Guhastina xeyset wî çaxî diqewime, wextê ku em fikira xwe bi Gotina Xwedê çê dikin. Dora van gotina bifikirin:

“...çimkî ew Xebera ku Xwedê dibêje, sax û zor e û ji her şûrê dudevî biratir e, ku derbazî heta navbera ruh û can hestû û mejû dibe, li kîderê şexs û ruh rastî hevdu tên, berbi cîhên veşartî. Ew fikirên dilê mêriv û menîyên wan eşkere dike...”.

— Îbranî 4:12, Phillips

“Dêmek, ji wan hemû mirdariya û her xirabîkê xwe aza bikin, bi milûktîyê, bi ruhê xwe va qebûl bikin û wê Gotinê slav bikin, ya ku (dilê we da) çandî ye û nava wê da ew qewat heye, ya ku dikare şexsên we xilas bike”.

— Aqûb 1:21, AMP

“Gelo Gotina Mîn ne mînanî agir e (ya ku bona wî hemû tiştî qezîa ye, çi ku dikare li ber wê cêribandinê teyax bike), - Xudan

222 SERPÊHATÎYA DERHEQA ZEWACÊ DA

dibêje, - û mînanî çakûç e, yê ku zinar (miqabilderketina hişk)
hûr dike?”.

— Yêrêmîya 23:29, AMP

USA JÎ BIXWÎNIN: Hêşû 1:8, Zebûr 1:1-3, 119:103, Yêrêmîya 15:16, Romayî 12:1, 2, Kolosî 3:1-5, A Petrus 2:2.

Hûn çi cûreyî *ruhê* xwe bi wê rastîyê va têr dikin, kîjan nava Gotina Xwedê ya derheqa heleqetîyên bedenî, nêzîkayê û pîrozayê da heye? Hûn çi cûreyî dikarin diha gelekî bi rastîyê va “bên têrkinê”? Dua bikin û hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku ew mecalên praktîk û çêkirinê nîşanî we bide bona têrkirina ruhê we û bo wê yekê, ku nava we da xwestinên rast pêşda bên.

Eger hûn hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, Ewê nîşanî we bide, ku hûn çi cûreyî nava xwe da cedandina pîrozayê pêşda bînin, û nava zewacê da çi cûreyî nêzîkayê bidine kûrkinê.

Ders: Roj 5

HELEQETÎ Û NÊZÎKAYÎ

“..Wextê ku em bi hizkirin rastîyê xeber bidin, emê nava heleqetîyên xwe yên tevî Mesîh bigihîjin, Yê ku serî ye”

— Efesî 4:15, GW

Kilîta heleqetîyên bedenî, ya her wedekî zewacê, heleqetî ye. Gelek malbeta da nêzikaya bedenî “rûyê tunebûna zanebûnê da wunda dibe” (Ovsê 4:6, NKJV). Eger mêr û jin her dem bi hêvî û xwestinên xwe va nivî nabin, di navbera wan da pirsgirêk ştên. Wextê ku hûn û merivên li rex we bi hizkirin derheqa xwestinên xwe yên bedenî da xeber didin, hûnê bighîjine mezinaya zewacê, ya ku Xwedê têra dîtiye. Xudan û terîfîkir **Bob û Odrî Mêysnêra** derheqa peymanaya zewacê da fikirên xwe raber kirine:

“Hevaltîya nêzik û zelalîya heleqetîya bona dîtina lezeta ji heleqetîyên bedenî tiştên bêqîmet in... Feqet xeberdana derheqa wê yekê da, ku hêvîyên we yên çî cûreyî ji hevdu hene, şerkarî û dijwariyên çawa hene, wê germayê û qebûlbûnê bidine heleqetîyên xwe yên bedenî. Wê yekê girîng hesab kin, ku hûn gerekê merivê li rex xwe fem bikin, çimkî ew bi xwestina bedenî ji we cuda dibe. Bi sebir bin: jîyaneke tam wê bê xwestinê, hetanî ku hûn bi hûrgilî derheqa hemû xwestinên hev da bizanibin”.

Van cumila ser hevda bînin:

“Ez fem dikim, wekî wedê rojê yê herî fesal, yê bona nêzikaya bedenî, nava evî wedê zewaca me da...”.

“Merivê li rex min xwe parastî texmîn dike û bona nêzikaya bedenî diha vekirî ye, wextê ku...”.

“Ez difikirim, wekî nava evî wedê zewaca me da çetinaya here mezin ya nava heleqetiyên me yên bedenî da...”.

“Tiştê herî grîng, çi ku ez dixwezim hema niha derheqa nêzikaya me ya bedenî de bêjime merivê li rex xwe, eve...”.

Nava jîyana me yu bedenî da tiştê herî zêdetir, ku li min xweş tê çîye?

Nava jîyana me ya bedenî da tiştê herî zêdetir, ku li min xweş nayê çîye?

Gelo hûn wextekê bi bêqelpî tevî merivê li rex xwe derheqa wan tiştê da, kîjan li we xweş tîn, yan jî xweş nayên, nivî bûne? Çawa ku merivê li rex we nikare bizanibe, ku fikira we da çi heye, em dibêjine we, ku hûn wede û cihekî mexsûs qîrar bikin, li kîderê hûn her du dikarin nava atmosîfêra çareserkerî da nivî bin Bîr bînîn- bi hizkirin rastîyê bêjin û kerema Xwedê hîvî bikin, bona ku hûn hewcetî û xwestinên xwe û merivê li rex xwe fem bikin û qîmet bikin.

Mêr, gelo hûn diha gelekî wede û guhdarîyê bona xebat û zarokên xwe başqe dikin, lê ne ku bo jina xwe? Hûn çi dikarin bikin, bona ku diha baş bo hewcetîyên wê yên bedenî qulix bikin. Li ber jina xwe ta bin û fikira wê bipirsin, lê paşê teyayî dua bikin.

Jin, gelo malbeta we, yan jî xebata we bona we diha gelekî girîng e, ne ku pêşxistina nêzîkaya bedenî ya tevî mêrê xwe? Hûn çawa dikarin bona hewcetîyên wî yên bedenî diha baş qulix bikin? Li ber mêrê xwe ta bin û fikira wî bipirsin, lê paşê teyayî dua bikin.

PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

Eger hûn vê kitêbê nava sînorên dersên tomerî, yê “Berevoka Mêsîncêrê”-ye “Serhatîya derheqa zewacê da” lêkolîn dîkin, matêriyala vidêoê ya 5-a temaşe bikin.

- 1| Anegorî kitêba Destpêbûnê, Xwedê mêr ji toza axê çê kir, lê paşê jî jin çêkir û anî li cem mêr. Bi guhdarî Destpêbûn 2:21-25 bixwînin. Ji vê serpêhatîyê nava we da çi tê femkirinê, li kîderê hatîye nivîsarê, ku wextê mêr cara ewlin jin dît, çi kir, çi cûreyî hemû tişt hate guhartinê, piştî wê yekê, wextê ku ew jî gurêdabûnê derketin? (bixwînin Destpêbûn 3:6-8).
- 2| Gelo hûn bawer dîkin, wekî baxşandin û kerema Xwedê bona her gunehekî hene û ew dikarin her gunehekî alt bikin? Eger usa ye, bo çi, bi fikira we, bona geleka gelekî dijwar e, ku ji gunehên xwe yê bedenî azayê bistînin? Eger we tevî yekî xeberda, yê ku nava şerkariya vî cûreyî da ye, weyê çi bigota wî- gunehên pêşda kirî berdîn û baxşandin û kerema Xwedê qebûl bikin?
- 3| Bi xeberên xwe bêjin, ku *qedirgirtina* cî-nivînên zewaca we çî ye? Ew yek bi praktîkî çi cûreyî tê kivşê? *Qedirnegirtina* cî-nivînên zewacê çi cûreyî tê kirinê?
- 4| Nava Gotina Xwedê da derheqa du berxweketina da nivîsar e, kîjana em bi cûrê berxweketina vê dinîyayê û berxweketina li gora xwestina Xwedê texmîn dîkin. Firqîya nava van herdua da guvtugo bikin. Cudatîyên çawa di navbera wan da hene û encamê her yekî çi curie ye?

BERXWEKETINA LI VÊ DINÎYAYÊ

BERXWEKETINA LI GORA XWESTINA XWEDÊ

- 51 Nêzîkaya tevî Xwedê peymanî bona azabûna ji her gunekî ye, nava wê da usa jî gunehê bedenî. Bisekinin û bifikirin. Gelo wê çi biqewimîya, eger me bikaribûya bi karebûna xwe ji guneh bi wedê dirêj azayî bistenda? Gelo ewê heleqetiyên me yên tevî Xwedê û yên tevî meriva bida guhartinê?

Derheqa wê yekê da bifikirin: gelo qîmetê karebûna me yê bedenî heye? Bixwînin gotinên Romayî 7:18, Yûhenna 15:5, Filîpî 3:3 û A Korintî 10:12.

- 61 Bi nêzîkaya tevî Xwedê, hûn gavên çi cûreyî yên praktîk dikarin biavêjin, ku hûn çav û guhên xwe, usa jî fikir û dilê xwe ji tiştên xirab, şikilên heram, xeysêtê xirab biparêzin, kîjana ra civaka me qayîl dibe:

Dora van gotina bifikirin:

“Ez naxwezim dîna xwe bidime her tiştêkî heram û xirab” (Zebûr 101:3, NLT).

“Min tevî çavên xwe peyman mor kirîye, ku bi tamedî başqe tu jineke cahil nenihêrim” (Hob 31:1, NLT).

- 71 Kilîteke paqijmayîna nava emirê bedenî da ew e, ku nava atmosfêra zewacê da *razîbûna bedenî* bistînin. Nava kaxeza Korintîaye ewlin da, ya 7:2-5-da, bi guhdarî derheqa wê gotinê da bixwînin, kîjan Xwedê bi qelesa Pawlosê şandî dide me. Ruhê Pîroz nava her gotinekê da çi elam dike? Ev beşa nivîsarê çi cûreyî fikirên we yên derheqa heleqetiyên bedenî û bi taybetî bona qulixa bo merivê li rex xwe diguhêre?

Serwêr: teslîmî endamên komê bikin, ku ew wê beşa Încîlê ya ji tercîma “Mêsîc”-ê (The Message) bixwînin.

TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Xwedê dixweze, wekî hûn û merivê li rex we emirê bedenîyî nebînayî çê bikin. Temîya Wî ya derheqa qedirgirtin û paqijaya li oda we ya razanê da destpêka vê jîyanê ye.
- Îzinê nedin, ku şerma guneh, yan jî zordariyê dijwariyê pêşda bîne, ku hûn nikaribin lezetê ji nêzikaya zewacê û xweziliya heleqetiyên bedenî bivînin. Xwedê dixweze wî hemû tiştî qenc bike û saxlem bike, çî ku zîyanê ketîye.
- Heleqetîya bedenî ya here baş wî çaxî dibe, wextê ku mêr û jin divedînin hev bidine razîkirinê. Nêzikaya bedenî tevgerêdana fizîkî, texmînkirinê, fîkirdarî û ruhanî tevî merivê li rex we çê dike û razîkirinê pêşkêş dike.
- Xwehizî îzinê nade me, ku em nêzikî Xwedê bin û qewata Wî ya ku diguhêre, bibin. Xwedêhizî û nêzikaya tevî Wî qewata Wî nava emirê me da didine xebitandinê.
- Fikirên me tên çêkirinê û dilên me paqij dibin, wextê ku em wede nava hazirîya Gotina Xwedê û Wî da derbas dikin. Dilê xwe da û bi îzbatbûna Ruhê Wî, Gotina Xwedê ji gunehên bedenî aza dike.
- Her wedekî zewacê cuda ye, çî ku dide kivşê, wekî nava emirê weyî bedenî da jî wedê cuda-cuda wê hebin. Her wedekî salê nava xwe da wedê şabûnê û dijwariyê dide kivşê. Her dem û bi bêqelî derheqa heleqetiyên xwe yên bedenî da xeberdin û nêzikaya bedenî diha bidine pêşxistinê.



— ŞEŞ —

Em careke mayîn destpê bikin

*Jiyana dirêj û bextewar dikare bibe, eger wî
cûreyî Her roj bijîn.*

— Margarêt Bonano

Roj I

Wextê ku kurên me biçûk bûn, min (Lîza) bona wana hikyateke cimetiye dixwend. Hik'yat derheqa merivekî kesîb da bû, yê ku xewin dîtibû. Xewinê da ewî bin dara sêvê da xizne dîtibû. Neniherî wê yekê, ku cîhê dara sêvê eyan nîbû, lê ewê xewinê dilê wî bi gumanê va tijî kir.

Baxçekî vî merivî yê mezin û kevin hebû, lê ew feqîr bibû, çimkî daren baxçe êdî rez nedidan. Pêşda ewî qîrar kiribû, ku baxçê xwe bifroşe, lê peyî wê xewinê ra, ewî destpê kir bi kel û ced bixebite. Ewî fem kir, wekî bona dîtina darê wê xebata giran û dirêj pêwîst be. Bêyî duşurmîşbûn ewî destpêkir dora her dareke xwe bikole. Eger bin darekî da tu tişt nedidît, difikirî, wekî xizne

bin dareke mayîn da ye. Dawîyê ewî dora dara xilazîyê kola, lê xizne bin wê da jî nîbû. Ew westîyayî û bi gumanbirî kete erdê. Ewî merivî xizna xwe bahara mayîn dît. Ew nava baxçeda digerîya û bêhna kulîlkên darên sêva texmîn dikir. Darên wî yên kevin hemû kulîlk dabûn. Her kulîlkek gerekê payîzê bibûya sêv.

Wî merivê feqîr eşkere kir, ku hema ew bû xizna wî. Bi kolana dora dara, ewî pêşda fem nekir, wekî ewî bi xwe kokên dara bi hewê va dane razîkirinê û xwelî (ax) nerm kir, bi wê yekê qewat da dara. Wê salê û nava salên mayîn da jî, ewî tevî malbeta xwe ekinekî gelekî baş berev kir.

Destpêka vê kitêbê da me zewac himberî darê kir. Wextê ku axa darê hişk dibe, koka wê nikare belav be, ku ew avê û qînyatên başqe bistîne, yên ku bona gihîntina darê pêwîst in. Meremê pênc serîyên vê kitêbê yên ewlin ew bû, ku hûn xwelîya (axa) zewaca xwe bidine nermkirinê. Bi dûrxistina ji xwe tiştên bêhurmetkirinê, tîrsê û xwehizîyê, we kok bi hewê va dane razîkirinê. We qirar kir, ku bikevine nava xiyala û qîmetîya, rol û meremên rast îzbat bikin. Hûnê sozê gumanê li ser çiqilên xwe û xizna, ku hûn dixwezîn, pêşeroja xwe da bibînin.

Her zewacek sozê berevkirina ekin dide, yê ku hela hê mîyaser nebûye. Em beşeke wê mîyaser dikin, bi kontrolkirina dil û malbetên xwe, lê Xwedê jî beşa Xwe nava yekîtiya me da bi duakirina Xwe mîyaser dike. Dara tezenikandî bi çiqilên xwe yên teze, dara bi koka xwe qalim, çiqilên kîjanê nava wedê cûre- cure da teyax kirine û pêra jî toximên biçûk, yê ku hela hê gerekê şîn be, ev hemû jî emekê mezin dikin. Xwedê vî hemû tiştî hildide, çî ku qewîn e û usa dike, ku dar rez bide. Ew tiştê kevin werguhêzî yê nû dike û jîyanê dide tiştê mirî.

Hemû tişt nû

Hizkirin paşerojê paqij nake: ew pêşerojê diguhêre.

— Gêrî Çêpmên

Werin em cara dawî vegerine wî baxçeyî li kîderê hemû tişt destpê bû.

Xwedê meriv çê kirin. Ewî ew mînanî Xwedê çê kirin, yên ku tebyeta Xwedê didine kivşê. Ewî nêr û mê çê kirin. Xwedê ew dua kirin: “Gulvedin. Zêde bin. Dinîyayê tijî bikin. Serwêrîyê bikin. Bona mesîyên behra û teyredên ezmin, bona her tiştêkî, ku dijî, yê ku li ser rûbarê dinîyayê dilive, cabdar bin” (Destpêbûn 1:27, 28, MSG).

Programa Xwedê bona me her dem jî wî cûreyî bûye. Paşeroja me, tirsên me û hukumên vê dinîyayê, ku dora me digrin, usa jî navhevxistin tên bona ku meremê Efrandare destpêkê bidine teribandinê, yan jî hukumê Wî bidine hildanê. Diqewime we texmîn kirîye, ku hûn ji teslîmkirina Yêdêm dûr ketine, bona ku bawer bikin, ku ew bi rastî ya we ye. Qewîn bin. Her jîyanek û zewacek dikare jî nûva destpê bibe û destpêka nû bistîne.

“Û Ewê ku li ser kursî rûniştî ye got: “Awa ez hemû tiştî jî nû va dikim...”” (Eyantî 21:5).

Xwedê tiştê derbasbûyî nade nûkirinê. Lê Ew hemû tiştî dike nû. Ewî darên Yêdêm hildan, yên ku derheqa ketene da bîr dianîn û fikir da wana. Ewî Kurê Xwe dare va zeliqand, bona ku Ew bikaribûya we li bajarê Xwe yê heta-hetayê qebûl bike, çimkî dara jîyanê li wir e, belçên kîjanê bona qenckirina mileta ne. Tiştê usa wundabûyî tune ye, ku Ew nikaribe xilas bike. Ev yek usa jî derheqa zewacên me da ye. Ew hemû tiştî çê dike, ku destpêka nû bide me.

Paşeroja we îdî tune ye. Ew îdî nava nivîsarên pêşda hatine tomerîkirinê û nêzîkî cedandinên merivatîyê nîne. Çi jî hebe, Yek heye, Yê ku ji wede der diji û Ew ji sînorên wî cûreyî der kar dike. “Ew bilinde û Yê herî bilind e”. Û “Yê ku nava heta- hetayê da diji” (Îşaya 57:15). Xwedê wê we ji teribandinên berê aza bike û dîroka pêşeroja we binivîse. Nava padişatîya Xwedê da êşa duh dijwariyê bona qewata sibê pêşda nayne. Her roj sozên Wî hîvîya we ne. Ew dixweze tiştê nebinayî bona we werguhêzî tiştê bûyînê bike.

“Ew dikare her tiştî hê zêde bike, ne ku çawa em dixwezîn, yan difikirin, bi wê qewata, ku nava me da dixebite...” (Efesî: 3:20).

Ew kardariya, ku Xwedê dikare bine nava emirê we û zewaca we, diha zêde ye, ne ku hûn dikarin wê yekê binin ber çavên xwe. Wan xiyal, merem û xwestinên xwe yên derheqa zewaca xwe da bîr binin, kîjan we nava roj, yan jî hevtîyên derbazbûyî da nivîsîne. Xwedê naxweze dîtînoka we bide we. Ew hê zêdetir dixweze bike. Ew dixweze nêzîkaya diha kûr pêşkêşî we bike û sînorên hukumê we bide berfirehkirinê, bona ku yekîtiya we, padişatîya Wî ya ezmîn li ser vê dinîyayê îzbat be. Ew dixweze hema nava hîm da, nava we da û bi destî we kar bike. Diqewime, wextê ku we serên 'itêbê yên pêşda dixwendin, hûn nediketîne nava xiyala. Wê yekê niha bicêribînin.

Prînsîbeke jiyana tevî Xwedê ew e, wekî nenihêrî wê yekê, ku Ew ne hewcê alîkariya me ye, ku tişteki bide mîyaserkirinê, lê Ew bi hizkirin hevkarîya me qebûl dike. Hewcetîya Wî ye bona alîkariya me tune, lê dixweze, ku em tev bin. Em hevkarîyê dikin û tevayî tiştên usa mîyaser dikin, kîjan çawa yên nebûyî tèn texmînkirinê. Em hema vê yekê ji we hîvî dikin, bona destpêka we ya nû. Meremên we yên usa gerekê hebin, yên ku niha dikarin bèn texmînkirinê çawa yên nebûyînê.

Serpêhatîk heye, ya ku dide kivşê, ku meriv çawa dikare bighîje tiştên usa, kîjan çawa yên nebûyîne dikarin bên texmînkirinê. Gilî derheqa beşeke dîroka merivatîyê da ye, wextê ku meriv rabûne dijî temîya Xwedê, gotin, ku ew naxwezin dinîyayê tijî bikin. Dewsa belabûna nava dinîyayê da, kal û bavê me gihîştine hev û destpê kirin bilindcîhekê çê bikin, ku bicedînin li Ezmîn tabîya usa bigrin, çawa ku Adem û Hêwa li Yêdêmê bûn. Diqewime hûn îdî zanin, ku Xwedê çawa tevî çêkirina bilindcîya li Babêlonê bû.

“...Xudan peya bû, ku dîna xwe bide wî bajarî û bilindcîhê, kîjan zarên merivayê çê kiribûn. Hingê Xudan got: “*Awa evana miletekin û zimanê wan hemûya yek e û eva tenê destpêka wê yekê ye, çi ku ewê bikin. Û ew ku çi dixwezin çê bikin, bona wana wê çetin nibe.* Werin em peya bin û zimanê wan li wir tevî-hev xin, ku yek zimanê yekî fem neke”. Û Xudan ew ji wir li ser temamîya topa dinîyayê bela kirin, û wana terka çêkirina wî bajarî da” (Destpêbûn 11:5-8, ESV; xeberên cudakirî, zêdekirî ne).

Ev teşkîldarî ji Xwedê nîbû, lê eger Ewî karê wana neda sekinandinê, ewê rûyê du faktora da li hev bihatana- bi saya *zimanê tomerî* û *yeiktîya meriva*. Eger ev her du faktor dikaribûn teşkîldarîya wan meriva pêşda bibirana, wî çaxî em bêjin gelo ew merivên ku nava Mesîh da nin, wê bi çiqasî va qewat bûna?

Heyîna zimanekî û meremekî wê bona we girîng be, wextê ku hûn hemû tiştî careke mayîn destpê bikin, bi qebûlkirina “tiştê ji her tiştê zêdetir”, yê ku Xwedê bona yekîtîya we hazir kirîye. Van her du faktora lê binihêrin, bi destpêkirina ji ziman.

Roj 2**Zimanê ezmîn**

“...çi dilê însên da heye, zar jî wê yekê dibêje” (Lûqa 6:45).

Nava vê kitêbê da me her dem daye dîyarkirinê, ku bi çiqwasi va girîng e îzinê bidin, ku berê ewlin Xwedê nava emirê me da kar bike. Guhartin wî çaxî diqewime, wextê ku em xwe teslîmî Ruhê Wî dikin û gura Gotina Wî dikin. Çawa ku me da kîvşê, guhartina xeyset meriv nikare bike weke guhartina hundur. Wextê ku hûn destpê bikin ji hundur va bên guhartinê, xeysetê we wê cûrekî mayîn be. Şedetîya wê yekê, ya derheqa wê xebatêdane da, kîjanê Xwedê dilê we da mîaser dike-gotinên devê we ne.

Nava her halekî da, rastî kîjanî em tên, gerekê em bibijêrin, ku bi zimanê ezmîn, yan bi zimanê dinîyayê xeber bidin? Her du jî rastîyê tînine ber çava. Ezman anegorî Kanîya rastîyê ya jorin xeber dide:

“Çimkî şewirên Min, ne şewirên we ne û rêyên Min, ne rê ên we ne, - Xudan dibêje:- çawa ku ezman ji dinîyayê bilindtir e, usa jî rêyên Min, ji rêyên we bilindtir in û şewirên Min, ji şewirên we bilindtir in.

Çimkî çawa ku baran û berf ji ezmîn peya dibin û paşda venagerine li wir, lê dinîyayê av didin û bêcer dikin, û toxim didine yê ku direşîne û nan didine yê ku dixwe, usa jî gerekê gotina ji devê Min derketî paşda venegere li cem Min, lê ewê xwestina Min bike, bona çi Min ew şandiye” (Îşaya 55:8-11).

Bona xeberdana bi zimanê Xwedê em gerekê Gotina Wî bizanibin. Gotina Xwedê wê dîtinoka me usa biguhêre, wekî emê tiştê ku nayê dîtinê bibînin û emê wê yekê bêjin, çi ku gerekê bibe. Ewê gotina me werguhêzî zimanê bawermendîyê bike, yê ku diha zêde ye, ne ku imbara xeberên min ya baş, yan jî optîmîstîya min. Ewê ese hindava hemû sozên Xwedê bawerîyê pêşda bîne.

Awa çend mînakên derheqa wê yekê da, ku bi çiqwasî va zimanên ezmîn û dinîyayê ji hev cuda dibin.

Dinîya me dibêje: “Jihevcihêbûn”. Ezman dibêje: “Yekîti”.

Dinîya me dibêje: “Hal bêguman e”. Ezman dibêje: “Hemû tişt dikare biqewime”.

Dinîya me dibêje: “Înkarkirin”. Ezman dibêje: “Qebûlkirin”.

Dinîya me dibêje: “Tu deyîndarê min î”. Ezman dibêje: “Ez bi merdanî didim”.

Dinîya me dibêje: “Heyfhildan”. Ezman dibêje: “Baxşandin”.

Dinîya me dibêje: “Ezê nebime xulamê te”. Ezman dibêje: “Ezê bibime xulamê te”.

Dinîya me dibêje: “Ez sistaya te qebûl nakim, hiz nakim”.

Ezman dibêje: “Ez qewata te dibînim û hizkirina min sistaya te vedişêre”.

Dinîya me dibêje:” Tu derheqa hewcetîyên min da nafikirî”,

Ezman dibêje: “Ez dixwezim derheqa hewcetîyên te da bifikirim”.

Ev gotin meriva ruhdar dikin, lê ewê wededirêj û hukumdar bin, eger ew nava kûraya rastîya Gotina Xwedê da koka xwe girtibin. Em we ra dibêjin, ku hûn zimanê ezmîn qebûl bikin, bi hînbûna hîmdanîna hemû qirar û gotinên xwe yên zewacê li ser hîmê Gotina Xwedê. Çawa merivên Xwedê, em zanin, wekî tengasîyên me yên niha biçûk in û wê dirêj nekişînin. Çi jî hebe, ew tengasî bona me rûmeteke usa hazir dikin, ya ku ji wan tišta zêdetir e û wê hetahetayê bikişîne. Dêmek em wan tengasîya nanihêrin, kîjana em niha dikarin binihêrin, lê dewsa wê yekê em berê xwe didine berbi wan tišta, kîjana em nikarin bibînin. Çimkî ew tiştên, ku em niha dibînin, wê zûtirekê derbas bin (binihêre B Korintî 4:17, 18, NLT).

Qewata zimên ya jîyanê û mirinê heye û bi bawerîyê em dikarin gazî tiştên usa jî bikin, yên ku hela hê nayêne kivşê, lê tê bêjî ew hene (binihêre Gotinên Silêman 18:21 û Romayî 4:17). Îzinê bidin, ku Gotina Xwedê jîyana we çê bike.

Rastîyê xeber bidin

“...bi hizkirin rastîyê xeber bidin û bi her cûreyî diha zêde bibine mînanî Mesîh” (Efesî 4:15, NLT).

Her dem xeberdana bi zimanê ezmîn dide kivşê, ku rastîyê xeber didin. Feqet xeberdana rastîyê ya bi hemû cûreyî her dem nîne, ku rast e. Xeberdana bi zimanê Xwedê dide kivşê, ku *bi hizkirin* rastîyê xeber bidin.

Gelek jin û mêr şaş dibin, wextê ku li cem wan fikirên cûre-cûre hene. Hinek meriv Gotina Xwedê bona êrîşa li ser merivê li rex xwe û nuxsankirina wî yan jî wê didine xebatê. Ew rastîyê dibêjin, lê wê yekê bi nerazîbûnê, bi hêrsê, bi bêhurmetkirinê, yan jî heyfhildanê dikin. Yên mayîn naxwezin ku konflikt pêşda bê, bo wê yekê jî ew rastîyê vedişêrin, derheqa kîjanê da gerekê wana bigota û ser ra hizkirina feş hindava merivê li rex xwe da didine kivşê. Nava wede da ev nêzîkbûn nerazîbûnê û xeyîdê pêşda tîne û carekê nişkêva derdikeve holê. Ji van nêzîkbûna tu yek jî meremê Xwedê mîyaser nake, bona ku em diha gelekî mînanî Mesîh bin.

Hûn sistayên jina xwe, yan jî mêrê xwe diha baş zanin, ne ku merivekî başqe û hûn dikarin wê yekê bidine xebatê, ku êşê bighînine wî, yan jî wê, bidine şermê, yan jî gunehkar bikin. Feqet me navekî diha bilind qebûl kirîye, ne usaye? Me xwe pêşkêşî merivê li xwe kirîye, ku em bibine xulamê wî/wê yê herî bilind û bona berjewandîyên wî/wê bicedînin. Bi xeberdana rastîyê em dikarin alî bikin, ku merivê li rex me diha gelekî bibe mînanî Mesîh, feqet emê tu cara xeberên bi qîmetê heta-hetayê nebêjin, eger zimanên me mînanî sîliha bin, kîjan birîna pêşda tînin.

Eger em dixwezin, ku zewaca me saxlem be, gerekê miqabilî xeysetê nebaş û nerast mecal bêne xebitandinê, lê bona wê yekê wede û cîhê rast heye. We texmîn kirîye, wekî wextê hevraqayîlnebûnên tevî jina xwe, yan jî mêrê xwe bîranîna şaşîya

tu cara guhartina baş pêşda nayne. Dewsa wê yekê ew yek dikare encamê diha xirab û zyandar pêşda bine. Eger hûn texmîn dikin, wekî gerekê derheqa pirsgirêkekê da xeber bidin, hîvîyê bisekinin, hetanî ku jina we, yan jî mêrê we rihet be, hêrsa wî/wê dayne. Eger pirsgirêk mezin e, wî çaxî meriv dikare bona wê yekê rojekê, yan jî sehetekê başqe bike, ku tevayî xeber bidin û wê pirsê nava atmosferê diha nêzik da bidine helkirinê. Wî çaxî diha nêzikî aqila ye, ku merivê li rex we wê we guhdar bike.

Ez (Lîza) zelal bîr tînim, ku çawa carekê Xwedê gote min: “Lîza, eger tu dixwezî, ku bêyî guhdarkirinê usa xeberdî, çawa ku teyê bixwesta guhdarîya gotina xwe bikira”. Meriv dikare vê yekê jî ser da zêde bike: “Wî çaxî xeber bide, wextê ku teyê bixwesta gotina xwe guhdar bikira”. Dema wedê hevraqayîlnebûna yê here sert, wedê rexnekirina çêkirinê nîne. Diha baş e, rastkirina bikin, wextê ku merivê li rex we ne hers e û guhdar dike. Wextê ku hûn westîayî ne, diha baş e, hêsa bin. Bibaxşînine hev, hev hembêz bikin û qirar bikin, wekî hûnê derheqa wê yekê da sibê xeberdin.

Ew yek gelekî girîng e, wekî hûnê rastîyê bi hizkirin xeberdin. Tu kes naxweze derheqa teribandin, yan jî şaşîyên xwe da guhdar bike. Lê merivên zane ji wê yekê karê hildidin, wextê ku derheqa wan goveka da dibêjine wan, nava kîjanada cihê wanî pêşdaçûyîne heye.

Hetanî dayîna şewirekê pirsê bidine xwe. Ji xwe bipirsin: “*Gelo ez vê yekê ji hizkirinê dibêjim, yan ez bona berjewandîyên xwe wî cûreyî divedînim? Gelo ez bi rastî bona pêşdaçûyîna merivê li rex xwe xemgîn im, yan divedînim bona wê bêhurmetkirinê heyfê hildim, ya ku ewî gîhandîye min?*”. Eger wextê wê xeberdanê hûn pêşniyarî merivê li rex xwe dikin, ku xeysetê xwe biguhêre, diqewime koka wê pêşniyarê hema xwehizî ye, çimkî wî çaxî hûn hukumî li ser wan texmînkirina dikin, kîjan ew *nava we da pêşda tîne*.

Xeberdana rastîyê yu bi hizkirinê gelekî dijwar e, wextê ku hûn nava halê neqewîn da nin. Eger hûn zimanê xwe zefî bikin, wî çaxî du cûre tişt dikarin biqewimin: yan hûnê fem bikin, ku hûn şaş bûne û hûnê razî bin, ku we tu tişt negot, yan jî hinek wede şûnda hûnê bikaribin zelal wê yekê bêjin, çî ku gerekê merivê li rex we guhdar bikira.

Em hîn bûne, ku her dem diha baş e xeyîdên biçûk hesab hilnedin û wana teslîmî Xwedê bikin, feqet em fem dikin, ku hinek xeyîda dijwar e bîr bikin. Bi rastî, xwekerkirina wî çaxî, eger hûn ser hev tên bêhurmetkirinê, tabîya ne saxlem e. Feqet pêwîstîya derketina dijî şaşîyê îzinê nade merivê li rex me, ku ew bêhurmet bike. Hûn dikarin rastîyê bi hizkirin bêjin, wextê ku:

- Menîyên xwe bi ronahîya Gotina Xwedê lê binhêrin.
- Pirsê bi êrîşkirina li ser pîrsgîrêkê, lê ne ku li ser merivê li rex xwe bidine helkirinê.
- Zimanê xwe control bikin, ku tiştên xirab xeber nedin.
- Bibaxşînin.
- Rastgo bin.
- Bi cûrê nerm cabê bidin.
- Her dem gumanê bidin.
- Usa xeberdin, çawa ku weyê bixwesta, ku we ra xeberdana.
- Bi serwaxtîyê xebera, wede û cîhê bona xeberdana tevî merivê li rex xwe bibijêrin.

Silêman got: “Çawa ku hesin hesin tûj dike, usa jî heval hevalê xwe tûj dike” (Gotinên Silêman 27:17, NLT).

Nava heleqetîyên me da pevçûyînen vî cûreyî û usa jî hevraqayîlnebûnên vî cûreyî wê hebin, eger wextê van pevçûyîna em bi cûrê rast xwe bidine kîvşê û ew yek dikare xeysetê me bide rastkirinê ku li Xwedê xweş bê.

Ew yek girîng e, ku pirsên usa va mijûl bin, yên ku dikarin yekîtîya me ya zewacê bidine teribandînê. Bêhurmetkirinên biçûk dikarin bibine birînên kûr, eger bi cûrê rast wana qenc nekin, çimkî gelek cara merivên li rex me texmîn nakin ku êşeke çawa dighînine me. Eger em xemgînîyên xwe guvtugo dikin, bi hesabhildana hizkirina Xwedê û ya hindava hevda, em alî hevdu dikin ku diha baş bin û bibine mêr û jinên yekbûyî.

Roj 3

Zimanên hizkirinê

Hetanî niha me ziman bi fikira raste-rast hindik yan jî zêde guvtugo kirîye, bi xeberdana derheqa gotin û cûrê xeberdana xwe da. Niha em dixwezin derheqa tişteki usa da xeberdin, kîjanî meriv dikare çawa *zimanê tomerî* nav bike. Serê kitêbêyî çarada me da kivşê, wekî zewacên me wê diha qewîn bin, eger em fem bikin, wekî diqewime merivê li rex me wî cûreyî qulixî me neke, çawa ku em qulixî wî/wê dikin. Em dikarin weke hev bêjin, wekî meriv bi cûrên cuda-cuda hizkirinê didine kivşê û distînin. Kitêbeke gelekî baş heye, ya ku wê alî we bike, ku zimanên hizkirinê yên cuda-cuda fem bikin: ew tê navkirinê “*Pênc zimanên hizkirinê: meriv çi cûreyî dikare xwepêşkêşkirinê hindava merivê hizkirî da bide kivşê*”, xudanê kîjanê Gêrî Çêpmên e. Vê kitêbê gelekî alî me kirîye.

Bi mînaka zewaca me emê alî we bikin, ku hûn fem bikin, ku ev yek bona çî girîng e. Mîn (Lîza) hîmlî hizkirin bi rîya başqekirina wedê baş û qulixkirinê dida kivşê. Salên zewaca me yên ewlin, ez her dem bi karên cûre-cûre va (kincşûstinê, xwerinçekirinê, paqijayê, xweykirina zaroka, rengkirina dîwara û xweykirina şînya ber male va) mijûl dibûm, bona ku hizkirina

xwe ya hindava Con da bida kivşê. Min jî dicêriband tevî wî xeberdanên bi fikirên kûr derbas bikira, çawa mecala derbazkirina wedekî baş, hetanî ku min ev kar dikirin, kîjan bi fikira min derheqa *hizkirinê* da digotin.

Ez (Con) mînanî Lîzayê nedifikirîm. Min cûrekî mayîn hizkirin dida kivşê- bi nêzîkayê û gotinên piştgirîyê va. Lîzayê xwerinên baş çê dikirin, li ser erdê malê xwelîçe radixistin, lê min xeberên “Ez te hiz dikim” nedibihîstin. Wextê ku min xeberên piştgirîyê digotin û min germayî hindava wê da dida kivşê, ewê jî xeberên “Ez te hiz dikim” nedibihîstin. Fikireke usa pêşda dihat, ku em her du jî bi zimanên başqe xeber didin.

Bona zewaca saxlem her du jî gerekê xwe bextewar û hizkirî texmîn bikin û her yek usa layîqî hizkirinê be, çawa ku ew dikare fem bike. Dêmek ew yek şaş nîne, ku hûn hevdu ra bêjin, ku hûn hizkirinê çawa “guhdar dikin”. Em we ra dibêjin, ku bi xwendina kitêba doktor Çêpmên fêr bin, ku çawa gerekê hizkirinê bidine kivşê, yan jî têsta belaş ya nava sayta “5lovelanguages.com”-ê da tişî bikin. Feydayên xwe guvtugo bikin. Gelo heleqetîyên we wê bibine yên çî cûreyî, wextê ku hûn bi zimanên hevdu xeber bidin. Derheqa vê yekê da bi hizkirin xeberdin, lê ne ku bi gunehkarkirin. Xeberdanê destpê bikin, bêjin: “Ez xwehizkirî texmîn dikim, wextê ku tu...”, û berdewam bikin.

Wextê ku hûn bi zanebûn xeberdin û anegorî zimanê merivê li rex xwe hizkirina xwe bidine kivşê, hûnê imbara xeberên hizkirina zewaca xwe diha bidine berfirehkirinê. Hûnê hîmên yekîtîya xwe qewîn bikin, wextê ku hûn bi zimanê ezmîn xeber bidin û bi hizkirin rastîyê bêjin. Ev her du tevayî nava yekîtîya we da zimanê tomerî çê dikin.

Niha em derheqa wê yekê da xeberdin, ku em çawa dikarin faktora duda çê bikin, ya ku tiştê nebûyîne dikare bike yê bûyîne, yekîtîyê çê bike.

Mîsîya me

Ji wan tiştê yek, derheqa kîjanêda Îsa gelek cara wextê qulixa Xwe dida dîyarkirinê, girîngîya yekîtîyê bû. Wê serpêhatîyê bîr bînin, ya ku nava Kitêba Yûhenna da hatîye nivîsarê. Wê êvarê, wextê ku xayîntî hindava Îsa da hate kirinê, Ewî dua kir, ku em yek bin:

“Ez ne tenê bona wan (şagirtên Xwe) dua dikim,
Lê bona wan jî, yên ku wê bawerîya xwe li Min bînin
Rûyê wan da û ewê şedetîya wan da, kîjanê ewê derheqa Min
da bidin.

Meremê dawî ew e, ku hemû kes bi dil û fikira xwe bibine yek,
Çawa ku Tu, Bavo, nava Min da yî û Ez jî nava Te da, bona ku
ew bi dil û bi fikirê tevî Me bibine yek.

Wî çaxî dinîyayê bawer bike, ku Te bi rastî Ez şandim.

Ew rûmeta, ku Te da Min, Min da wan,

Bona ku ew wî cûreyî yek bin û tevayî bin, çawa ku Em in:

Ez nava wan da, Tu jî nava Min da.

Wî çaxî ewê nava yekîtîyê da gihîştî bin, û wê şedetîyê bidine
diniya bêxwedê,

Wekî Te Ez şandim û Te ez hiz kirim

Hema wî cûreyî, çawa ku Te Ez hiz kirim” (Yûhenna 17:20-23,
MSG; xeberên cudakirî zêdekirî ne).

Yekîtî rûmeta Xwedê eyan dike û şedetîya derheqa xebata aşîtiya Kurê Wî dide. Geleka cêribandîye, bi fikirên cûre- cûre, yan jî hukumdar Încîlê bidine eyankirinê, feqet şedetîya derheqa wê yekê da, ya here mezin, wekî Xwedê dinîyayê hiz dike ew e, ku hizkirina Wî nava cimeta Wî da çî cûreyî tê kivşê.

Yekîtî ne tenê şedetîya wana dide, yên ku hela hê ne nava padişatiya Xwedê da nin, lê usa jî karê dide me, çimkî Xwedê duakirina Xwe nava yekîtîyê da dide (binihêre Zebûr 133). Bi vî cûreyî yekîtî bona padişatiya tarîstanê qezîya dubare ye: ew

lezetê dide cimeta Xwedê û bi wê ykê va teyayî dibêje merivên undabûyî, ku ew bifikirin, wekî Xwedê wana hiz dike.

Bo wê yekê jî tiştê ecêbmayînê nîne, wekî dijmin hemû tiştî dike, ku bêtifaqîyê bike nava zewaca we û her tiştêkî xwehizîyê, yan jî tirsek, kîjanê hûn nava xwe da xweyî dikan, tenê alî karê dijmin dike. Xweyîkirina yekîtiyê barekî giran e, çimkî bona wê yekê pêwîst e, ku him dijî dijmin şerkarîyê bikin, him jî miqabilî tebyeta merivatîyê. Bona yekîtiyê kerema Ruhê Xwedê lazim e û lazim e ku zelal wî meremî bibînin, yê ku ji dijarîyên niha bilindtir e. Careke mayîn Efesî 5:21-ê bixwînin û van gotina bîra xwe da xweyî bikin:

“Bi xofa Mesîh u nava xwe da li ber hevdu xwe bişkênin” (Efesî 5:21, NLT).

Nava serîkî kitêbêyî pêşda me ew yek guvtugo kir, ku mêr û jin çî cûreyî gerekê li ber hev xwe bişkênin û qulixî hevdu bikin. Niha em dixwezî fikirdarîya we ya derheqa şikestîbûnê da bidine berfirehkirinê û bêjin, ku ew yek çawa dike, ku yekîti hebe.

We îdî wedekî dirêj derbas kirîye, bernamên zewaca xwe nivîsîne û ew gav qîrar kirine, yên ku bona mîyaserkirina wana pêwîst in. Bira ewana alî we bikin, ku hûn li ber hev şikestî bin û derheqa wê yekê da bîr bînin, wekî her meremek, yên ku we nava zewaca xwe da qîrar kirine, bona mîsîya jîyanê ya here girîng qulix dike û ew jî hizkirina Xwedê û rûmeta Wî eyan dike. Mêr û jin gerekê li ber vê mîsîyê şikestî bin û hema ev yek usa dike, ku bibine yek.

Bi femkirina vê yekê her du jî dikarin nava zewaca xwe da qewat bin. Bona şikestîbûnê eseyî nîne, wekî ji jin û mêra yek qewat be, lê yê mayîn sist. Çawa ku mîsîya zewacê bona merivekî gelekî mezin e, bo wê yekê jî du merivê qewat bona çêkirina yekîtiya qewîn lazim in. Em hîvî dikan, ku hûn fem bikin, wekî bi xebitandina xebera *qewat* em nabêjin, wekî ew meriv gerekê

hukumdar be, yan jî bi fizîkî qewat be. Lê em dixwezin bêjin, ku ew emekê çawa dike nava karê tomerî. Me çawa daye diyarkirinê, nava zewacê da gerekê serwêrî bê kirinê, lê ne ku diktatorî. Nava zewacê da gerekê cîh bê hildanê, ne ku fikirdariya têrîtoriyal hebe.

Nava zewacê da, li malbetê û ji malbetê der govekên usa hene, nava kîjanada ez (Con) diha zane me, ne ku Lîza. Ew bi hizkirin wan goveka teslîmî min dike. Govekên balşqe jî hene, nava kîjanada Lîza diha zane ye, ne ku ez. Wan goveka jî ez bi şabûn teslîmî zanistî û cêribandina Lîzayê dikim. Bin vê mîsîyê da em yek in û mîsîya me tiştê herî baş dixweze, kîjanê em dikarin pêşniyar bikin.

Con her dem serwêriya finansên me baş mîyaser kirîye. Bona wî çetin nîbûye bawer bike, ku Xwedê wê derheqa hewcetiyên me da bifikire û wê bona me dua bike. Ewî ew hemû mal dîtine, kîjan me dest anîne. Wextê ku ewî bi xwe destpê kir, hesabên me va mijûl be, fikireke usa pêşda hat, tê bêji barekî mezin ji ser milên min (Lîzayê) ket. Ez mecbûr bûm wan tiştê bi xwe bikim, çimkî Con gelek cara nava rêwîtiyê da bû û grafîka xebata wî jî gelekî six bû. Paşê, wextê ku ewî dît, ku ez çi cûreyî ber xwe dikevim, ewî pêşniyar kir, ku ewê wê yekê bi xwe bike. Çi ku hukumî li ser min dikir, ew bi hêsanî teslîmî wî dibû. Ewî dikaribû bi qewilên anegor mala, avtomaşîna û tiştên mayîn dest bîne. Xêncî wê yekê ew bi riya sportê, listîka û tiştên mayîn tevî kurên me dikete nava heleqetiya.

Siriya min da min her dem serwêriya malê kirîye. Min her dem xwestîye, ku mala me bibe cîhekî usa, li kîderê malbet dora sivira xwerinê berev dibe. Ez hiz dikim xwerinê bidime endamên malbetê û min her dem pêşniyar dikir, ku kurên min hevalên xwe jî teglîfî nanxwerinê bikin. Xêncî wê yekê min dixwest, ku mala me da atmosfêra usa hebûya, ku Con bikaribûya hêsa bûya, wextê

ku ew ji rêwîtiya paşda vedigerîya. Wê yekê bidine zelalkirinê, ku hûn yan jî merivê li rex we, dikarin bi saya karebûnên xwe, serwêriya kîjan goveka bikin. Fêr bin, ku wan goveka teslîmî hevdu bikin, yên ku alîyên we yên qewat va girêdayî ne. Westê ku hûn bi hizkirin wê yekê bikin, hûnê bikaribin mîsîya xwe ya tevayî mîyaser bikin.

Roj 4

Pirsên pêşin yên girîng

“Dudu niha baş e, ne ku yek, çimkî dikarin alî hev bikin, ku bighîjine açixîyê” (Zanebûn 4:9, NLT).

Mîsîya û pirsên girîng tiştên mînanî hev nînin, lê ew ji hevdu cuda nabin. Bona xweyîkirina yekîtiyê gelekî girîng e, ku pirsên pêşin hebin.

Pirsên me yên pêşin bi meremê meyî herî mezin tên pêşdakişandinê, yên ku ev in: naskirin û eyankirina hizkirina Xwedê. Çawa ku em zanin, wekî eva mîsîya her bawermendekî ye, em hemû jî dikarin bêjin, wekî pirsên me yên pêşin yek in, nenihêrî wê yekê, ku bona mîyaserkirina mîsîyayê bona mêr û jinên cuda-cuda wê cûrên cuda û cûrên zewacê yên cuda lazim bîn. Em bona wê yekê van pirsên pêşda dikişînin:

1. *Xwedê*: bi rastî, Xwedê “Yê ewlin” nîn e: Ew ji her tiştî jortir e û heleqetiyên tevî Wî nava hemû goveka da girîng in. Ew gerekê piştgiriyê bide hemû pirsên me yên pêşin û nava wan da bijî. Feqet bona zelalkirinê, emê nava vê navnîşê da cîhê ewlin bidine Wî. Meriv dikare bêje, wekî Xwedê Yê herî ewlin e.

Dêmek, nava heleqetîyên tevî Xwedê û ew xebat, kîjanê em bona Wî mîyaser dikin, yek nîn in. Xwezima ew in qulixçî û ew meriv, yên ku li civînê qulix dikin, hesab dikin, ku karê qulixê diha girîng e, ne ku malbetên wana. Em hîvî dikin, ku hûn îzinê nedin, ku malbeta we bibe qurbanîya vê şaşîyê.

2. *Jin yan jî mêr*: li vir jî meriv dikare bibe qurbanîya şaşîya ya ku nayê kivşê, ya ku dikare gelekî biha li ser we rûnê. Zarokên we diha girîng in, lê hûn gerekê awqasî derheqa wan da nefikirin, ku merivê li rex xwe bîr bikin. Rojekê ewê bighîjin û wê ji mala we herin, lê peymana we ya tevî merivê li rex we bona temamiya jîyanê ye. Jiyana xwe usa çê bikin, wekî wextê ku zarokên we ji malê diçin, hûn hela hê çawa hevalên here baş bimînin.
3. *Zarok*: tevbûna jin û mêra û usa jî rolên wan yên nava terbyetkirina zaroka da wextê wedê zewacê yê cuda-cuda wê mînanî hev nîbin. Ev yek gelekî pirsên pêşin va girêdayî ye-navê we va. Eger ji we yek, yan jî hûn her du ji malê der dixebitin, usa ye cabdariya we ya zêde nava xebatê da heye. Eger mîyaserkirina navê we niha dide kivşê, ku hûn gerekê li malê tevî zaroka bimînin, wî çaxî ev yek mînanî gotina pêşin nîne. Feqet çawa ku K. S. Lyûîs got, “Mijûliya bi karê male va karîyêra here mezin e”.
4. *Nav*: bi rastî hemû xalên vê navnîşê nakevine nava navê we û emirê we. Feqet bona zelalbûnê emê vê femdariyê bidine sînorkirinê. Bi xebitandina xebera “nav” em dixwezin wî karî bidine kivşê, bona kîjanî Xwedê gazî we û merivê li rex we kirîye: serkarîkirinê, bîznêsmênîyê, xwendinê, qulixê, zanistîyê, yan jî govekêd mayîn.

Nava zewaca me da jî navê me heye. Feqet gelek mêr û jin nava govekekê da naxebitin, yan jî qulix nakin. Eger

zewaca we wî cûreyî ye, hûn dikarin derheqa mijûlîya hevdu da qise bikin û piştgirîyê bidine hevdu. Çawa ku Silêman got, wextê ku her du hevkarîyê dikin, ew dikarin alî hevdu bikin û bighîjine açixîyê.

5. *Hêsabûn*: hevtê ji alîyê Xwedê da hatîye pêşdakişandinê, lê ne ku ji alîyê meriva da. Wextê ku em hêsa dibin, pirsên mayîn yên pêşin pêşda diçin. Xwedê dixweze, ku nava emirê me da cîhê hêsabûnê û dasekinandina qewata hebe (ew yek bêkarîyê nade kivşê). Em hêsa dibin, wede bona wan tişta başqe dikin, yên ku bi ruhanî, fîzîkî tên dasekinandinê. Nava zewacê da ew yek girîng e, ku em mecalên hêsabûnê dibînin, lê ne ku tenê hêsa bin. Bona me ev yek dide kivşê, ku em têmayên tomerî û hewaskarîyên tomerî bibînin, kîjana em dikarin tevayî bibînin, mesele, tevayî herin nava tebyetê û derheqa xiyalên xwe da xeberdin, girêdayî malbetê û qulixê va. Fêr bin, ku tevayî hêsa bin û qewatên xwe bidine dasekinandinê. Eva beşeke yekbûnê ye.
6. *Emirê civakî*: nava gelek malbeta da mêr û jin emirê civakî yê cuda derbas dikin. Neniherî wê yekê, wekî ew yek jî girîng e, ku mêr dixwezî tevî mêra wede derbas bikin, lê jin jî tevî jîna, û wekî em gerekê heleqetîyên hevaltîyê tevî merivên başqe çê bikin, xêncî merivên li rex xwe, lê nava zewaca saxlem da jîyanên civakî gerekê bighîjine hev. Hevalên me nava piştgirîyê û qewatdayîna da roleke mezin dilîzin. Çawa ku em bedenek in, gerekê gelek hevalên me hebin, yên ku me nas dikin û hiz dikin.

Em nikarin ji çapê zêdetir bidine kivşê, ku bi çiqasî va girîng e, ku hevalên me yên wî cûreyî hebin, yên ku dîcedînin bona yekîtiya me dua bikin. Hevalên me hene, rolên kîjana yên cuda-cuda nava jîyanên me da hene. Hevalên min (Con) yên golfê hene, tevî kîjana ez dikarim tenê hêsabûna xwe nivî bikim. Hevalên

min yên başqe jî hene, tevî kîjana ez golf dilîzim, lê ber wana ez dikarim dilê xwe vekim. Ew meriv bi hizkirin çetinayên min tevî min nîvî dikin.

Çawa ku jîyana min (Lîza) gelekî six bûye û ez golfê nalîzim, tenê hevalên min yên din hene, yên ku min berbi naskirina hizkirinê dibin. Ev jin wan çetinaya fem dikin, yên ku nava jîyana min û zewaca me da hene. Ji wana hinek hevalên min yên wextê çetinayên qulixê ne, lê yên mayîn jî şewirdarên halên konfliktê ne. Ew meriv bona min ji zêr jî bihatir in.

Hebûne meriv, yên ku berê hevalên min bûne, lê em mecbûr bûn ji hev dûrkevin. Wana em usa qîmet dikirin, wekî derdiket, ku qîmet didane yekî, lê yê mayîn nedidanê. Wê yekê jî kar nedida yekîtiya zewaca me. Eger hevalê weyî usa heye, yê ku hevalê we herdu nîne, tevî wî hevaltîyê nekin. Ewê paşê cihêbûnê bike nava yekîtiya we.

Hizkirinê bibijêrin

Awa çawa cimeta Xwedê ya bijartîye pîroz û hizkirî, dilşewatîyê, qencîyê, milûktîyê, berbihêrîyê û sebirê li xwe wergirin. Li hev sebir kin û li hev bibaxşinin, eger gazine yekî li hindava yekî da hebe. Çawa Xudan baxşande we, hûn jî usa bibaxşinine hev. Û ser van hemûya da hizkirinê li xwe bikin, *ya ku van hemûya bi yekîtiya tam hev va girê dide*” (Kolosî 3:12-14, xeberên cudakirî zêdekirî ne).

Hizkirin bi tevgirêdana tamva me hev va dide girêdanê. Ew hîmê yekîtiyê ye û kilîta rast e, ya ku dikare tiştê nebûyîne bike yê bûyîne.

Efesî 5:25-da Pawlos dinivîse, wekî “Mêr gerekê jinên xwe hiz bikin” (NLT). Xebera “gerekê” dide kivşê, wekî eva borcedarîya gelekî berk e. Ev xeber prînsîbeke gelekî bilind dide kivşê, ya ku

him derheqa mêra, him jî derheqa jina da ye. Bêyî texmînkirinên xwe em gerekê hev hiz bikin.

Kûltûra me hizkirinê çawa texmînkirin nîşan dide, kîjanê nikarî kontrol bikî û meriv dikare tenê miqabilî wê yekê derkeve, lê hizkirin her dem qirar dike. Xwedê *qirar kir*, ku me hiz bike. Eger em qirar bikin, ku hiz bikin, texmînkirinên me jî wê peyî karên me herin. Karên bawerîyê (mesele nîşandayîna hizkirinê ye wî çaxî, wextê ku texmînkirinên eşkere tune ne) dikarin çîya ji cî bileqîn. Xwedê dixweze karên me dua bike. Dîtrîx Bonhoffêr gotîye:

Hizkirina we nîne, ku piştgirîyê dide zewacê: zewac e, ku piştgirîyê dide hizkirina we.

Zewaca we dikare piştgirîyê bide hizkirina we tenê wî çaxî, eger kanîya texmînkirin û razîbûna we ya ruhanî heleqetîya tevî Ruhê Xwedê ye. Em dikarin gumana xwe bidine ser kanîya şaş, dêmek, kanîya qewata xwe, lê wî çaxî hizkirina me wê teyax neke, dema ku wextê tunebûna texmînkirina ew bê cêribandinê. Eger em nava hizkirina Xwedê da îzbatbûyî ne, karên hizkirina me wê yekîtiya me wî çaxî xweyî bikin, wextê ku texmînkirinên me sist bin.

Bêfitîya zewac tu cara gerekê bêyî nêzîkbûn nîbe, lê çawa ku K. S. Lyûîs got:

Bona me hemûya, qanûneke zelal heye: wedê xwe ser wê yekê xerc nekin, bifikirin, ku gelo hûn merivê li rex xwe hiz dikin, yan na. Usa bikin, ku tu bêjî, ku ew yek rast e. Hema em wê yekê dikin, em sureke mezin eşkere dikin. Wextê ku hûn usa dikin, ku tê bêjî hûn yekî hiz dikin, hûn bi rastî destpê dikin wî hiz bikin.

Hûn dikarin hizkirinê nîşanî merivê li rex xwe bikin, hema wî çaxî jî, wextê ku li cem we texmînkirina hizkirinê tune ye. Hûn dikarin qirarê qebûl bikin, wekî hûnê qulix bikin, piştgirîyê

merivê li rex xwe bikin. Wextê ku hûn bi hizkirin wê yekê bikin, texmînkirinên we jî wê peyî karên we herin.

Roj 5

Tiştê herî baş bînine der

“Hizkirina Mesîh civînê tomerî dike. Gotinên Wî bedewetîya wê hişyar dikin. Ew hemû tiştê, ku Ew dike û dibêje, bi meremekî ye: tiştê herî baş bînine der, yê ku nava Wî da ye...” (Efesî 5:26, 27, MSG).

“Jina zane, - Silêman dinivîsî, - mala xwe çê dike” (Gotinên Silêman 14:1, NLT). Çawa ku jinên zane malên xwe çê dikin, usa jî mêrên zane çêbûnê didine jinên xwe. Yek hindava yekî da çêbûnê dide û bi vî cûreyî em xeysetê mesîhîtiyê hindava merivêd li rex xwe da didine kivişê. Eger em dixwezî tiştê herî baş bidine êşkerekirinê, çi ku Xwedê bona me çê kirîye, usa ye em gerekê tiştê herî baş jî hev bidine derxistinê.

Bi hizkirina hev, em tevî Ezmîn hevkarîyê dikin û hizkirina Xwedê ra qayîl dibin. Xwedê anegorî sistayên merivên li rex we wî nanihêre, lê anegorî kerem û hizkirina Xwe dinihêre. Xwedê guhdariyê dide ser qewata merivê li rex xwe û pêşniyarî we dike, ku hûn jî wê yekê bikin.

Çawa ku me îdî daye dîyarkirinê, Lîzayê çavekî xwe unda kiribû, çimkî zarotîyê da li cem wê nexweşîya penceşêrê hebûye. Rûyê wê yekêda ew gelekî ditirsîya, ku li ber meriva xeberde. Ez (Con) derheqa tîrsa Lîzayê da haj pê hebûm, lê min jî zanibû, wekî Xwedê zanebûna cuda dabû wê.

Wextê ku ez serwêrê qulixa cahila bûm, min carana pêşniyarî Lîzayê dikir, ku li ber keçikên koma cahila terîf bike. “Ezê tî cara

wê yekê nekim”, - ewê digot. – Ew ne karê min e. Civînê xebat daye te, tu jî gerekê qulix bikî, lê ne ku ez gerekê wê yekê bikim”.

Min gotinên wê guhdar dikirin û min fem dikir ku hîmê wê yekê tirs bû, lê ne ku miqabilderketina hindava pêşkêşa Xwedê da. Lîza ji terîfkirinê gelekî ditirsîya, lê wextê ku ewê terîf dikir, piştî qulixê meriv nêzîkî min dibûn, ku bêjine min, ku xeberdana wê çî cûreyî hukumî li ser wana kirîye. Wextê ku ew dijî wê yekê derdiket, min digotê: “Tu tenê êvarê hazir be, ezê tera têlêfon bikim”.

Ez (Lîza) difikirîm, wekî Con dicêribîne min werguhêzî meriveke usa bike, ya ku ez nîbûm. Ewî zanibû, ku keçên koma cahila hewce bûn, ku ji jinekê gotinê bibhê, lê min xwe anegorî wê yekê texmîn nedikir. Min fem nedikir, wekî bi wê yekê va tevayî ewî dicêriband atmosferêke usa saz bike, li kîderê pêşkêşên min dikaribûn pêşketana. Ewî nava min da tiştêkî usa dît, çî ku min bi xwe nikaribû bidîta. Rast e, carana ez temamîya şevê hişyar dimam, min reca ji Con dikir, ku ew min ra nebêje, ku ez terîf bikim. Feqet ewî tu cara kirina xwe nedida sekinandinê, ku usa bike, wekî Xwedê bikaribûya tiştê Xwe yê herî baş ji min bida derxistinê. Wî çaxî ez gelekî bi tirs pêşda dihatim, lê wextê ku min piş xwe dinihêrî, min didît, ku Con bi hizkirin ez ji nava tirsê didame derxistinê.

Çawa ku Con alî min dikir, min jî wî cûreyî qewatên xwe didane xebatê. Salên zewaca me yên pêşin da min rêdaktorîya kitêbên wî bi hizkirin dikir, guhdarî dida ser wê yekê, ku ew rast bihatana wergerandinê, çî ku dilê wî da bû. Bi piranî çî ku me nava qulixê da mîyaser kirîye, qewimîye, çimkî me bi hizkirin piştgirî dida hev, ku bighîjin û pêşda herin.

Diqewime hûn û merivê li rex we hîn nebûne, ku çawa tiştê herî baş ji hev bidine derxistinê. Diqewime hûn wekî mayîn dikin,

tabîya xwe ya nêzîk didine xebatê, ku êşê bighînine hev. Îro hûn dikarin careke mayîn destpê bikin. Hûn dikarin norma teze pêşda bikişînin.

Destpêkirina careke mayîn tu cara dereng nîne. Eger hûn dixwezin fêr bin, ku çawa tiştê herî baş ji merivê li rex xwe derxin, cîhekî başqe û wede başqe bikin, bona ku tevî jin, yan jî mêrê xwe dua bikin. Bi vî cûreyî duayî Xwedê bikin:

Bavê Ezmîn, em tobe dikin, ku me şaşî hindava wê yekîtîyê da kirîye, ya ku Te di navbera me da îzbat kirîye û me ew karên Te yê herî baş layîqî wê rûmetê nekirîye. Em bona baxşandinên Te yê nû ji Te razî ne, yên ku alî me dikin, ku em careke mayîn destpê bikin. Ruhê Pîroz, em hîvî dikin, ku wê keremê bidî me, hewcê kîjanê ne em, ku em bi hizkirina Te hev bibînin. Serwaxtîya diha mezin bide me, ya derheqa wê yekê da, ku çawa dikarin hev bilind kin û bona hevdu qulix kin. Çawa bide me, ku em wan pêşkêşa û aliyên qewat bibînin, kîjana Tu dixwezî nava me da bidî berfirehkirinê û nîşan bide, ku Tu çawa dikarî nava karê Xwe da, Yê herî bilind bî. Em bawer in, wekî tevayî em diha baş in, ne ku ji hev cuda. Em dixwezin nava wê tijîbûnê da bighîjin, ya ku Te bona jîyanên me û yekîtîya me têra dîtîye, bona ku em rûmetê bo Te binin, bi navê Îsa, amîn.

Me usa jî nivîsarên başqe kirine nava kitêbê, kîjana hûn dikarin bona merivê li rex xwe bixwînin. Çavên wî/wê binihêrin û van xebera bêjin:

Mêr:

Bibaxşîne min, wekî min aliyên xwe yên qewat bona hukumkirina li ser te dane xebatê. Bibaxşîne, wekî min şexsê te, bedewetîya te, zanistîya te û rehmbûna te ne daye dîyarkirinê. Min bibaxşîne, wekî min atmosferê usa çê nekirîye, kîjanê da tu dikarî pêşda herî. Bibaxşîne xwehizîya min ya nava xeberdanên me da bi tomerî hildayî. Ez bawer im, wekî

Xwedê dikare yekîfîya me qenc bike, bide dasekinandinê û rûmetkirinê. Ez bawer im, wekî tu û ez dikarin bi destî Wî hemû tiştî bikin, Yê ku qewatê dide me. Emê tevayî serwêriyê bikin, zêde bin, bi navê Îsa.

Jin:

Bibaxîne min, wekî min aliyên xwe yên qewat dane xebatê, ku sistayên te bidime kivşê. Bibaxşîne min, wekî ez nava tevgîrêdana da xwehiz bûme, vir hada ezê xeberên xwe bidime xebatê, ku jîyana te çê bikim. Bona wan qewimandina bibaxşîne min, wextê ku ez nebûme parêzera dilê te. Ez te bawer dikim û me bawer dikim. Ez bawer im, wekî Xwedê dikare hemû tiştî werguhêzî tiştê nû bike. Ez qirar dikim hiz bikim û me bibaxşînim. Îro roja nû ye bi baxşandinê û rastîyê. Were em hev hiz bikin û bikevine nava xiyala.

Hevalên giranbiha, em bawer in, wekî tiştê herî baş hela hê li pêşîya me ye. Mîrasa we, nêzikaya we û hukumê we bi kerema Xwedê dikarin ji hemû guman û hêvîyên we derbartzir bin. Tevayî, yekbûyî û bi qewata Ruhê Xwedê, usa jî bi ruhdarî hûnê serpêhatîke derheqa zewacê da binivîsin, ya ku hizkirina Mesîh, ya li ser vê dinîyayê eyan dike, û bi Wî va şa dibe, Yê ku li ser text rûniştî ye.

Qirara derheqa destpêkirina careke mayîn da aminaya hindava hev da dide kivşê. Eva mecala tek- tenê nîne. Her dem jî ev mecal heye. *Destpêkirina careke mayîn* dide kivşê, ku em niha dijîn, paşerojê berdidin û dilên xwe vedigerînine berbi wê yekê, çi ku li pêşîya me ye.

Derheqa wî hemû tiştî da, çi ku me nava vê kitêbê da gilî kir, wê tenê bibine fikirên baş, eger em yekîfîya xwe teslîmî Wî nekin, Yê ku xweyê vî hemû tiştî ye. Gotinên Cihûda yên 24 û 25-a derheqa vê yekê da eyantîyê didin, ku hemû tişt dikare çawa bibe.

“Wî ra, Yê ku dikare we ji ketinê xweyî bike û li ber rûmeta xwe ya bêqisûr eşq bide sekinandinê, Xwedê Yê bêşirîkî-bêheval, Xilazkirê me ra, bi destê Îsa Mesîhê Xudanê me, şikir û mezinayî, qudret û hukumet be, berî her- heyê û niha jî û ji heta-hetayê! Amîn (ESV).

Xwedê parêzerê me ye. Tenê ew dikare zewaca me ji her tarîstanekê derxe. Ewî şabûn û rûmeta zewacê teslîmî me kirîye, ku em Wî bidine rûmetkirinê. Jiyanên me berbirîbûnên sax in berbi wan meriva, yên ku dîna xwe didinê, ku em çawa hev hiz dikin û digihîjin, tevayî pêş dikevin.

Her baharek destpêka nû ye.

“Çimkî awa zivistan derbas bûye,
Baran derbas bûye, çûye.

Kulîlk li ber çava tîn kivşê,
Wedê stiranê pêra gihîştîye...”

(Stiranên Silêman yên Evîntîyê 2:11, 12).

Ders: Roj 1

HÎVÎYA TIŞTÊN MEZIN BIN

“(Wê çi tevî min biqewimîya), eger min bawer nekira, wekî ezê rehma Xudan li dinîya saxa bivînim. Hîvîyê be û guman be û gumana xwe bide ser Xudan: li ser xwe be û bila dilê te qewîn be. Belê, hîvîyê be û guman be û gumana xwe bide ser Xudan.”

— Zebûr 27:13, 14, AMP

“Bavê we yê Ezmîn gelekî we hiz dike. Ew dixweze, ku zewaca we açix be. Bi rastî, Ew (hîvîyê ye, digere û dicedîne), ku hindava we da rehm be” (Îşaya 30:18, AMP).

Pirs ew e, ku hêvîyên we yê çî cûreyî ji zewacê hene? Bona mecalên xwedêtîyê yê çî cûreyî hûn dua dikin û bawer dikin.

Wede başqe bikin, ku hûn bifikirin, ku Gotina Xwedê derheqa hêvîyada çî dibêje.

“...Çimkî Te tiştên usa kirin, yê *ku ji hemû hêvîya bilindtir bûn*, û çîya çawa dilerizî. Çimkî ji destpêka dinîyayê virda tu kesî derheqa Xwedê Yê vî cûreyî da nedîtîbû, ne jî bihîstîbû, çawa ku Xwedê Yê me ye, Yê ku bona wana kar dike, yê *ku hîvîya Wî ne*”.

— Îşaya 64:3, 4, TLB

“Hînbûna xebera Te ronahîyê dide, ku h'emû kes bikaribin fem bikin. Ez *ji hîvîyê sekinandinê bîncîkîyayî dibim*, bi qebûlkirina

temîyên Te, were û rehma Xwe nîşan bide, çawa ku Tu bona wana dikî, yên ku navê Te hiz dikin”.

— Zebûr 119:130-132, NLT

“Şikir ji Xwedê ra, Bavê Xudanê me Îsa Mesîh ra, ku ji rehma xwe ya pir careke din em dinîyayê xistin, bi rabûna Îsa Mesîhe ji mirîya, wekî *bibine xweyê gumana sax* û wan soz- qirarên ne betale ne rizî û çilmisî war bin. Evana li ezmana we ra xweykirîne”.

— A Petrûs 1:3, 4, NLT

“...Çimkî Xudan Xwedêyê heqîtîyê ye. Hemû kes bextewar e, yên ku (gelekî hîvîya) Wî ne, yên ku *hîvîyê ne, digerin û berbi Wî divedînin* (serkevtina Wî, hizkirina Wî, aşîtiya Wî, şabûna Wî û hevaltîya Wî ya bêqisûr)”.

— Îşaya 30:18, AMP
(xeberên cudakirî zêdekirî ne)

Hela hê pêşda nava vê kitêbê da me derheqa qezîayên usa da xeber dida, yên ku ji hêvîyên nebûyîne tîn.

Hêvîyên mezin wî çaxî çê dibin, wextê ku em derheqa sozên Xwedê û programên Wî da pê dihesin û xeysetê Wî nas dikin.

Bona Xwedê tu tişt dijwar nîne. Bixwînin Destpêbûn 18:13, 14, Metta 19:26, Marqos 98:23, 24, Lûqa 1:36, 37, Efesî 3:20. Xudan derheqa qewat û karebûna Xwe ya bêsînor da çi dide kivşê?

“Binihêrin, Ez tiştê nû dikim. Niha ew eyan dibe: gelo hûn fem nakin?”

— Îşaya 43:19, NLT

Em bona Xwedê Yê usa qulix dikin, Yê ku hemû tiştê nû dike. Hûn dixwezin ku nava zewaca we da tiştêk bê çêkirinê? Gelo hewcetîya we ya bona hizkirina nû, xiyalên nû, yekîtiya nû, yan jî nêzikaya nû heye, yan na? Hûn dikarin *hîvîyê bisekinin*, wekî Bavê we wê tiştêkî nû bike, wextê ku hûn ji Wî hîvî bikin. Binivîsin, ku hûn çî dixwezin, ku bê çêkirinê û paşê dua bikin û wê yekê teslîmî Xwedê bikin.

Ders: Roj 2

JÎYANÊ XEBER BIDIN

“Xeber fikirên usa têr dikin, çawa ku xurek madê têr dike:qisa baş bi wî cûreyî jî lezetê dide, çawa dirûna baş. Xeber dikuşin, xeber jîyanê didin: ew yan jehr in, yan jî fêkiyên xweş in: hûn dibijêrin.”

— Gotinên Silêman 18:20, 21, MSG

Hûn bi kîjan zimanî gelekî xeber didin: zimanê vê dinîyayê, yan Ezmîn? Yê ewlin mirinê tîne, lê yê duda- jîyanê. Nava hemû hala da, rastî kîjana hûn tèn, hûn qîrar dikin, ku bi kîjan zimanî xeberdin. Serwêr Cîmî Êvans dinivîse:

“Tevgirêdan mînanî pirayê ye ya ku du meriva hev va dide girêdanê û mecalê dide, ku merivek here nava dil û fikira yê pêşberî xwe. Tevgirêdan ne tenê girîng e, lê usa jî bona zewacê pêwîst e... Qewata xebera zore... qewat, ya ku dikare biêşîne, yan jî qenc bike, xirab bike, yan jî şên bike. Em gerekê xwe bi xwe kontrol bikin, bona ku xeberên çêkirinê, qewatkirinê, piştgirîyê û qenckirinê bidine xebatê”.

Çawa ku em pê hesîyan, wedekî bona hemû tiştî heye:wedê bona xeberdanê û wedê bona xwekerkirinê. Bisekinin û bifikirin:wedê herî ne anegorî xeberdana bona pirsên merivê li rex we kîjane? Wedê herî anegor kîjan e? Bo çi?

Bi kurtayî derheqa çetinaya here mezin da bêjin, ya ku niha nava zewaca we da heye. Xeber û gotinên nebaş yên çi cûreyî

gelek cara ji devê we derdikevin, wextê ku hûn derheqa wê pirsê da xeber didin?

Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, ez îdî naxwezim xeberên nebaş bidime xebatê. Hivî dikim, alî min bike, ku tirsê dûr bixim û hêrs ji nava xeberên min derkeve. Gotinên jîyanê bide min, gotinên baş yên bi zimanê ezmîn, bi kîjana ezê bi bawerîyê derheqa zewaca me da xeberdim, bi navê Îsa”.

Hûn dikarin imbara xeberên zimanê ezmîn bidine berfirehkirinê, wextê ku hûn Gotina Xwedê zêde nas bikin. Bi guhdarî van parrça bixwînin, paşê çend tiştên baş li ser hîmê wê yekê binivîsin, kîjana dikarin her dem bona zewaca xwe bidine xebatê. Me çawa mînak meselek tijî kirîye.

Beşa Încîlê

ZIMANÊ EZMÎN ÇI DIBÊJE?

Gotinên Silêman 5:18, 19

“Merivê li rex min û ez, emê heleqetîya bedenî tevayî derbas bikin û emê ji hev razî bin, ji hev têr bin, nava hemû rojên jîyana me da”.

Efesî 4:15, 29

Efesî 4:26, 27

Efesî 5:21-33

Fîlîpî 2:3-5

Zebûr 133

A Korintî 13:4-8



Ders: Roj 3

BI ZIMANÊ MERIVÊ LI XWE XEBER BIDIN

“Peyî jîyana bi hizkirinêva tijî herin, ku tê bêjî jîyana we hema wê va girêdayî ye, çimkî jîyana we bi rastî wê va girêdayî ye...”

— A Korintî 14:1, MSG

Gelek zimanên hizkirinê hene. Jina we, yan jî mêrê we ji wan zimana yekî dide xebatê, lê diqewime hûn jî zimanekî başqe zanin. Xudanê kitêba “Pênc zimanên hizkirinê” **doktor Gêrî Çêpmên** şirove dike.

“Zimanê we yê hizkirinê dikare ji zimanê merivê li rex we yê hizkirinê cuda be, çawa ku inglîzî ji zimanê çînî. Hûn çawa jî bicedînin, ku hizkirina xwe bi zimanê inglîzî bidine kivşê, eger merivê li rex we tenê çînî zane, hûnê tu cara nikaribin fem bikin, ku çawa hev hiz bikin... Em gerekê hazir bin, ku zimanê hizkirinêyî sereke, yê merivên li rex me fêr bin, eger em dixwezî bi kardarî hizkirina xwe bidine kivşê. Fikira min ew e... wekî pênc zimanên hizkirinê yên hîmlî hene, pênc mecal, bi kîjana meriv hizkirinê didine kivşê û fem dikin”.

Gêrî Çêpmên dinivîse, wekî pênc zimanên hizkirinê ev in: gotinên begemî yê, wedê baş, pêşkêş, alîkarîya praktîk û nêzikayî. Gelek meriv, nava kîjana da nin em jî, texmîn kirine, wekî zimanên hizkirinê yê sereke û yê ne sereke hene. Çawa ku me da kivşê, derheqa zimanên hizkirinê da hûn dikarin diha gelekî ji kitêba doktor Çêpmên pê bihesin, yan jî herine sayta wî û matêriyalên başqe yên derheqa wê yekê da bixwînin.

Hûn dikarin rola zimanên hizkirina xwe fem bikin, bi dayîna bersivên van pirsên: *gelo tiştên usa hene, ku merivê li rex min wana*

dike, rûyê çi da ez xwe gelekî hizkirî texmîn dikim? Gelo tiştên usa hene, wekî merivê li rex min nake û ew yek êşeke mezin dighîne min? Min gelek cara çi jî merivê li rex xwe hîvî kirîye: xeberên piştgirîyê yan begemîyê, wede ku tevayî derbas bikin. Pêşkêş, hizkirin, yan alîkarîya nava karên male da? Ez hizkirina xwe çi cûreyî hindava merivê li rex xwe da didime kivişê? Fikirên xwe binivîsin.

Merivê li rex we çawa cabên wan pirsra dide, guhdar bikin. Firqîya diha kivişê kîderê da ye?

Gelo we zanibû, wekî hûn û merivê li rex we hizkirina xwe ne mînanî hev didine kivişê? Eger usa ye, wê yekê çi cûreyî alî zewaca we kirîye? Eger na, hûn dikarin bêjin, wekî ew yek bûye menîya pirsgirêka yan jî hevfevnekirinê?

Tevî merivê li rex xwe wê yekê guvtugo bikin, ku hûn tevayî çi cûreyî hizkirinê didine kivişê û qebûl dikin. Pirsê bidin: “*Sê gavên praktik yên çawa ez dikarim biavêjim, bona ku ez hizkirina xwe ya hindava te da bidime kivişê, bi zimanê te*”. Bersiva wê li vir binivîsin.

Îro wede başqe bikin, ku hûn ji Ruhê Pîroz bipirsîn, ku bi kîjan cûrê baş hizkirina hindava merivê li rex xwe bidine kivişê. Tu kes merivê li rex we diha baş nas nake, ne ku Ew.

Ders: Roj 4

NAVA JÎYANA XWE DA PIRSÊN SEREKE QIRAR BIKIN

“De ez idî hîvî ji we dikim, xwişk û birano, bi navê Xudanê me Îsa Mesîh, bila gotina we hemûya yek be û dutîretî nava w eda tune bin, lê hemû jî bi hev ra bin û ser nêt-meremekî bin”.

— A Korintî 1:10, NLT

Nava yekîtîyê da qewat heye. Xwedê yekîtîya me dide xebatê bona ku hizkirina Xwe bona wan meriva eyan bike, yên ku hela hê Wî nas nakin. Nava tu heleqetîya da meriv nikare bighîje ewê dereca yekîtîyê, kîjanê meriv dikare nava zewacê da bibîne. Bi xwendina serê kitêbêyî duda, we dîtînoka zewacê û merem qirar kirin. Niha, bi nêzîkbûna berbi dawîya kitêbê, em dibêjine we, ku hûn derheqa pirsên sereke yên herroje da bifikirin, kîjanê alî we bikin, ku hûn mîsîyayê mîyaser bikin.

Nava jîyana we da pirsê sereke ya “Ewlin” û here mezin heleqetîyên we yên tevî Xwedê ne. Bo çi girîng e, wekî nava jîyana we da Ew bibe yê ewlin û qedirgirtina Wî, ya nava hemû tiştî da, çi dide kivşê? Heleqetîyên saxlem yên tevî Xwedê çi cûreyî hukumî li ser zewaca we, malbetê, xebatê û govekên mayînin dikin?

Bona ku hûn wê mîsîyayê û wan merema mîyaser bikin, Xwedê kîjan bona we qirar kirine, hûn gerekê berê ewlin guhdarîyê bidine ser merivê li rex xwe, zaroka, nav, hêsbûnê û merivê dor û berên

xwe, hema bi vê sirê. Bisekinin û dua bikin: “Xudan, gelo pirsên min yê sereke nava sirîya navnîşê da rast in, yan şaş in? Eger usa ye, şaşî li kîderê ye? Ez guhdarîyê diha zêde datînim li ser çi? Ez çi, yan jî kê hesab hilnadim? Gavên praktîk yê çi cûreyî ez dikarim biavêjim, ku sirîya navnîşê ya rast dest bînim û wê xweyî bikim? Wan fikira û gava binivîsin, kîjana Ew bo we eyan dike.

We qîrar qebûl kirîye, ku hûnê nava temamiya emirê xwe da merivê li rex xwe hiz bikin û piştgirîyê bidine wî, yan jî wê. Zarok ji malê dûr dikevin, xebat tên guhartinê, lê hevaltî destpê dibin û ser hevda tên, lê peymanana we ya zewacê hemû wedê emirê we ye salê dike nava xwe.

Bi hesabildana heleqetîyên we yê niha, gelo hûn û merivê li rex we hazir in çawa hevalên baş bimînin hetanî dawîya jîyana xwe? Gelo we emek kirîye nava xebat û navê hevdu?

Nava zewaca we da çi piştgirîyê dide yekîtiya we? Çi wê yekê xirab dike?

Bixwînin gotinên Zanebûn 4:9 û Kolosî 3:12-14, lê paşê bi vê nivîsarê dua bikin:

Xwedê, Te merivê li rex min û ez bijartim, çawa hizkiri û bikir. Keremê bi Rhê Xwe va bide min, ku ez bi rehmê, milahîmîyê, şkestîbûnê û sebirê nêzîkî merivê li rex xwe bikim. Alî min bike, ku ez bi gotin û kirên xwe merivê li rex xwe dua bikim. Ez bawer dikim, wekî tevayî bona me diha baş e, ne ku cuda, çimkî em dikarin alî hev bikin û bighîjine açixîyê. Serwaxtîyê bide me, ku em bi cûrê rast pirsên xwe yên sereke qîrar bikin, ku diha baş Te nas bikin û diha baş qulixî hev bikin, bi navê Îsa, amîn.

TIŞTÊ HERÎ BAŞ BIDINE DERANÎNÊ

“...Her mecalekê bidine xebatê. Bila xeberdana we merîfetî be. Merem ew e, ku nava xeberdanê da **ji meriva tiştê herî baş bidine deranînê**, lê ne ku hukumî li ser wana bikin, ne ku wana biqetînin û dûr bixin.”

— Kolosî 4:5, 6, MSG

Çawa mêr û jin hûn yek in. Ev yek dide kivşê, wekî hûn hemû tiştî nivî dikin. Wextê ku merivê li rex we dighîje açixiyê, hûn jî dighijine açixiyê. Wextê ku merivê li rex we ji jîyanê razî ye, hûn dikarin razîbûna diha mezin û kardar bistînin. Bi deranîna tiştê herî başî nava merivê li rex we da hûn tiştê herî baş ji xwe didine deranînê. Awa ku Îsa çi cûreyî nêzikî Dergîstîya xwe dibe. Încîlê da nivîsar e: hizkirina Mesîh civînê dide tomerîkirinê. Xeberên Wî bedewetîya Wê didine hişyarkirinê. Ew hemû tiştê ku Ew dike û dibêje, bi meremekî ye, ku **tiştê herî baş bide deranînê, yê ku hundurda ne...**” (Efesî 5:26, 27, MSG).

Bi vî cûreyî merivê li rex we xweyê pêşkêş, talant û aliyên qewat yên mayîn çi cûreyî ne? Bifikirin, ku li cem wî/wê çi baş tê kirinê, ji çi ew razîbûnê distîne? Bona çi meriv pesinê wî/wê didin û bona çi meriv ji wî/wê razîn e?

Pêşkêşên merivê li rex min, talant û aliyên qewîn ev in:

Eger alîyên merivê li rex we, alîyên qewat, nava xebatê, yan jî qulixê da alî meriva dikin, hûn çi cûreyî dikarin alî bikin, ku pêşkêşên wî/wê diha pêşda herin? Eger hûn dibînin, wekî merîfeteke merivê li rex we heye, kîjanê ew hela hê nade xebatê, hûn dikarin cîhekî usa bîr bînin, yan jî çê bikin, li kîderê ew merîfet wê pêşda here.

“Werin em bifikirin û bi guhdarî derheqa wê yekê da fikirên xwe pêşda bibin, ku hevdu kontrol bikin bi *lêkolînkirinê*, ku çawa dikarin bikin, ku wê yekê bona hizkirinê alîkarîyê û karên baş piştgirîyê bidin..”.

— Îbranî 10:24, AMP;
(xebera cudakirî zêdekirî ne)

“Dêmek, çawa ku mecala me heye, werin em bi qencî kar bikin bona hemû meriva (ne tenê bona kardayînê, lê usa jî bona kara wan ya ruhanî kar bikin). *Bicedînin*, *ku duakirî bin*, xwezima bona wana, yê ku ji malbeta bawerîyê ne (bona wana, yên ku dighîjine malbeta Xwedê- bawermenda)”.

— Galatî 6:10, AMP;
(xeberên cudakirî zêdekirî ne)

Bi guhdarî dora gotinên Îbranî 10:24, Galatî 6:10 û Kolosî 4:5, 6 (çi ku destpêka dersa îroyîn da nivîsar e) bifikirin. Hûn çi cûreyî dikarin bi praktîkî piştgirîyê bidin û tiştê herî baş ji merivê li rex xwe bidine deranînê? Dêmek, hûn çi dikarin *bêjin*, yan *bikin*, bona ku piştgirîyê bidinê, ku ew pêşkêş û alîyên xwe yên qewat bide xebatê? Hûn çi cûreyî dikarin bo merivê li rex xwe dua bikin û alî bikin, ku ew pêşda here?

Wede başqe bikin, bona ku hemû bersivên xwe raberî merivê li rex xwe bikin. Fikira wî/wê bipirsin û îzinê bidin, ku ew dilê xwe li ber we veke. Nava kîjan pîrsa da hûn qayîl in? Derheqa merivê li rex xwe da, yan jî derheqa xwe da hûn tiştê nû fêr bûn? Bisekinin û bona merivê li rex xwe dua bikin.

“Merivê li rex xwe lêkolîn bikin. Xwe jî lêkolîn bikin... Hûn dikarin ji wê yekê zendegirtî bimînin, çî ku hûnê bidine eşkerekirinê... Jiyana zewacê dibe tişteki başqe, wextê ku hûn eşkere dîkin, ku bi rastî merivê li rex we kî ye. Jiyana zewacê wî çaxî ruhdar dibe, wextê ku hûn didine zelalkirinê, ku ewê bibe kî”

— H. Norman Rayt

PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

Eger hûn vê kitêbê nava sinorên dersên tomerî, yê “Berevoka Mêsincêrê” ya “Serpêhatîya derheqa zewacê da” lêkolîn dikin, matêriyala vidêoyê ya 6-a temaşe bikin.

- 1| Xwedê gotibû Adem û Hêwayê, ku zêdebin û temamiya dinîyayê tijî bikin. Piştî çend nisileta, cimetek bilind bû, ya ku gura vê gotinê nekir. Bi guhdarî Destpêbûn 11:1-6 bixwînin, nava kîjan pirsê da ev meriv yek bûn. Eger merivên neşikestî bi saya yekîtîyê gihîştine açixîyê, ev yek bona me çi dide kîvşê, yê ku yek in him nava zewacê da, him nava Mesîh da û dixwezin gura Xwedê da bin.
- 2| Yekîtî qewata mezin e û kemala wê ya mezin heye. Van gotina lêkolîn bikin û nava zewaca xwe da bidine xebatê: Zebûr 133, Metta 18:19, 20, Yûhenna 17:21, 23, B Korintî 13:11. Duakirinên çawa dikarin nava emirê we da pêşda bîn, eger hûn tevî jina xwe, yan jî mêrê xwe yekbûyî bin?
- 3| Gotinên mêrîve dawî girîng in, lê gotinên Îsa yê dawî bi qewata pêxembertîyê bûn. Bixwînin gotinên Yûhenna 17:9-11, 20-23. Nava vê beşê da Ew pêşîya bilindbûna li ser xaç carekê ra bona me dua dike. Guhdarîyê bidine ser *yekîtîya* Wî û Bavê. Bi rîya vê gotinê Ruhê Pîroz çi eyan dike? Ew çi dike, ku hûn tevî merivê li rex xwe berbi yekîtîyê bicedînin.
- 4| Xwedê Xwedê Yê destpêka nû ye. Ew elam dike, ku hemû tiştî nû dike (binihêre Eyantî 21:5). Ew dixweze, ku heleqetî, guman, bawerî, nêzîkaya bedenî û xiyalên me wextê zewaca me yê çêbûyî bin. Çawa jin û mêr em bi cûrên praktîke çi cûreyî dikarin heleqetîyên xwe çê bikin?

- 5| Nava gotinên Silêman 14:1-da nivîsar e, wekî jina zane mala xwe çê dike. Ev yek dide kivşê, wekî mêrê zane çêbûnê dide jina xwe. Jinno, bi gavên praktîk yên çî cûreyî hûn dikarin mala xwe çê bikin. Mêrno, bi gavên praktîk yên çî cûreyî hûn dikarin alî pêşdaçûyîna jina xwe bikin.
- 6| Neniherî wê yekê, wekî hinek mêr û jin tevayî dixebitin, yan jî qulix dikin, jîyana geleka usa nîne. Wî çaxî diha girîng e, ku heleqetîên di navbera hev da xweyî bikin û piştgirîyê bidine nav û hewaskarîên hev. Mecalên praktîk yên çî cûreyî mêr û jin dikarin bidine xebatê, bona ku piştgirîyê bidine hev û heleqetîyên xwe xweyî bikin.

TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Nava Mesîh da her zewacek dikare bê çêkirinê. Ruhê Wî her dem mecala destpêka nû nava hemû goveka da dide.
- Nava hemû dereca da em dibijêrin, ku bi zimanê vê dinîyayê, yan zimanê Ezmîn xeberdin. Em dikarin bi bawerîyê Ezmîn ra qayîl bin. Wextê ku em anegorî sozên Gotina Xwedê xeberdin.
- Meremê zewacê yekîtî ye. Em gerekê cedandina bidine xebatê, bona ku nava hemû govekên jîyanê da yekbûyî bin.
- Wextê ku em bicedînin, ku tevî merivê li rex xwe yekbûyî bin, wextê ku em bi zimanekî xeber bidin û mîsîya xwe mîyaser bikin, duakirinên Xwedê wê bêne nava jîyana me û tiştên nebûyî wê bibine yên bûyî.
- Hizkirina bêqelp ya di navbera mêr û jinê da rûmet û hizkirina Xwedê li vê dinîyayê dide eyankirinê. Yekîtîya me meriva nêzîkî Îsa dike.
- Jina zane mala xwe çê dike, lê mêrê zane çêbûnê dide jina xwe. Wextê ku ji mêr û jinê her yek derheqa alîyên qewate nava yê mayîn da dibêje, ew sînorên hevdu berfireh dikin û xwestina Xwedê, ya li ser vê dinîyayê, mîyaser dikin.

XEBERA ZÊDEKIRÎ

Çawa xilazbûnê bistînin?

“Eger tu bi devê xwe îqrar bikî, ku Îsa Xudan e û dilê xwe da bawer bikî, ku Xwedê ew ji nava mirîya rabûye, tê xilazbî, çimkî bi dil yek bawer dike, rast tê hesabê û bi dev îqrar dike, xilaz dibe.”

— Romayî 10:9, 10, NLT

Bona pêşkêşkirina hizkirina Xwedê, ya bona merivê li rex xwe, hûn gerekê berê ewlin hizkirin û xilazbûna Wî bi destî Kurê Wî- Îsa Mesîh qebûl bikin. Bi saya mirin û rabûna Îsa, Xwedê rê vekir, ku hûn çawa kur yan keça hizkirî bikevine nava padişatîya Wî. Qurbanîya Îsa, ya li ser xaç bi belaş emirê heta-hetayê û tijî da. Xilazbûn pêşkêşa Xwedê ya bo we ye. Hûn nikarin tu tiştî bikin, ku xilazbûnê qazanc bikin, yan jî beyî tu tiştî layîqî wê yekê bibin.

Bona stendina vê pêşkêşa giranbiha hûn berê ewlin gerekê xwe mikur bèn, ku hûn gunekar in, ku ji efrandar cuda dijîn (çimkî eva hema menîya guneha ye, kîjan me kirine). Tobekirin peymanîya stendina xilazbûnê ye here girîng e. Petrûs zelal kitêba “Karên şandîya”-da got, wê rojê, wextê ku 5000 meriv xilaz bûn: “Dêmek, tobe bikin û paşda vegezin, ku gunehên we bèn paqijkirinê” (Karên Şandîya 3:19, NKJV). Kitêba Pîroz elam dike, wekî ji me her yek çawa xulamê guneh hatîye dinîyayê. Koka wê xulamîyê hema gunehê Adem e, yê ku gura Xwedê nekir. Tobekirin qirar dike, ku ji şexsê xwe û ji gurêkirina mîrêcin paşda bisekinin, yê ku bavê derewê ye û teslîmî Xudanê we yê nû, Îsa Mesîh bûye, Yê ku jîyana Xwe bona we da.

Hûn gerekê serwêrtîya emirê xwe teslîmî Îsa bikin. Ew yek dide kivşê, ku hemû tiştên xwe hûn dikine hebûna Wî. Serwêrtîya Wî, ya nava emirê we da cuda dibe. Wî çaxî, wextê ku hûn vê yekê dibêjin, Xwedê we ji tarîstanê aza dike û cîguhastî bin padişatîya Xwe ya bi ronahîyê û rûmetê dike. Zelal gotî, hûn ji mirinê derbasî jîyanê dibin, dibine lawê Wî.


Eger hûn dixwezin xilazbûnê bi destê Îsa qebûl bikin, vê duakirinê biwekilînin:

Xwedê, ku Tu li ezmana yî, ez fem dikim, ku ez gunekar im û ji norma heqîtiya Te ez ketime. Ez, rûyê gunehên xwe da, layîqî dîwana heta-hetayê me. Spas, ku Tu min nava wî halî da nahêlî, çimkî ez bawer im, Te Kurê Xwe Yê tek- tenê şand, Yê ku ji Meyremê hate dinîyayê, ky bona min bimira û dîwana min li ser Xaç li ser xwe bidîta. Ez bawer dikim, ku Ew roja sisîya ji nava mirîya rabû û niha li alîyê milê Te yê rastê çawa Xudan û Xilazkirê min rûniştî ye. Îro ez tobe dikim, ku ji Te dût bûme û jîyana xwe teslîmî serwêrtîya Îsa dikim.

Îsa, ez Te çawa Xudan û Xilazkirê xwe dihebinim. Bi Ruhê Xwe va were nava jîyana min. Min biguhêre, bike lawê Xwedê. Ez ji wî hemû tiştî paşda disekinim, çî ku tarîstanê va girêdayî ye û wede da ez nêzikî wê bûm. Ji roja îroyîn da ezê bona xwe nejm, lê ezê bi kerema Te bona Te bijim, çimkî Tu mirî, ku ez bikaribim heta-hetayê bijim.

Spas, Xudan. Niha jîyana min bi temamî destên Te da ye û angorî Gotina Te ezê bi şermê nemînim.

Hûn bi xêr hatine li malbeta Xwedê. Ez dibêjime we, ku hûn vê mizgînîyê bawermendekî ra bêjin. Girîng e, ku hûn bighîjine civîna nêzikî xwe, li kîderê bawerîya xwe Încîlê tînin û tevî wan meriva bikevine nava heleqetîya, yên ku dikarin nava bawerîyê da piştgirîyê bidine we. Hûn dikarin aza qulixdarîya me va bèn girêdanê, bona ku hûn bikaribin li nêzikî xwe civînê bibînin (werine sayta MessengerInternational.org). Em dua dikin, ku hûn nava zanistîya Xwedê û hizkirina Wî da her roj pêşda herin.




Ruhê Pîroz

Telebextra, gelek cara meriv Ruh şaş fem dikin: gelek nizanin, ku Ew Kî ye û Ew çawa li Me eyan dibe. Gelek cara Ruhê Pîroz çawa şikilê “nefemdarî” tê kivşê, lê Încil zelal nîşanî me dide, wekî Ruh *şexsê mêriv* nîne. Ew *Şexs* e, Yê ku soz daye, ku wê tu cara ji we dûr nekeve. Nava vê kitêba întêraktîv da Con Bîvêr we dewat dike, ku hûn bi xwe şexsê ku li Civînê şaş hatîye femkirinê û nehatîye hesabhildanê-Ruhê Pîroz bibînin.

Evê naveroka ku mêriv zendegirtî dihêle tê bernedin.

- Ev kitêba întêraktîv van matêrîala raber dike:
- Matêrîalên dersên herroje
- Pirsên bona guvtugokirina bi komê



Tirsê Bişkênin

Her merivek nava emirê xwe da nava demekî da tirsîayî bûye. Tu bi rastî zanî, ku ew yek qewimî, yan jî çî bikî ku ew careke mayîn neqewime? Con Bîvêr wê yekê eşkere dike, xeleqa tirsê dişkêne û te hîn dike çawa pêşkêşên Xwedê aza berdî û serwêrtîya Wî ye bilind nava emirê te da îzbatbe.

Bona mecalên zêde herine li vê malperê www.CloudLibrary.org

www.CloudLibrary.org



Ji vê zêdetir dixwezin?
Vî şikilê pêl kin

DEMÊ DA...

Zewac bona heta-hetayê dihate morkirinê. Bi wî awayî jinek û mêrek dighîştine hev û dibûne yek. Bi saya vê yekîfîyê her du jî diha qewat dibûn, diha helal dibûn û dikaribûn bi cûrê diha kivş wê şexsîfîyê bidine kivşê, bi kîjanê ew hatibûne çêkirinê. Ew tevayî diha bextewar bûn, lê ne ku cuda-cuda.

Derbaskirina wê heytehola zewacê tenê destpêk bû. Ew yek bona çêkirina jîyana dirêj û bextewar derge bû. Meremê her hilbijartinekê û kirinekê ew bû, ku wî emirî çê bikin, kîjanî yekîfîya wana raber fikir. Mêr û jin berbi emirê ne eyanî mezin diçûn, bi dilên yekbûyîva, bi dengekî û destê wan destê hevda ew hazir bûn hizkirina Efrandarê xwe bidine kivşê.

Gelo me çawa tevgirêdana tevî evê serpêhatîya evîndariyê ya bi fikira kûr winda kir? Nava kitêba “Serpêhatîya derheqa zewacêda” Con û Lîza Bîvêr we dewat dikin, ku hûn progirama Xwedê ye destpêkê careke mayîn bivînin. Nenihêrî wê yekê, ku hûn zewicîne, yan na, serhatîya we beşeke serpêhatîya Wî ye.

Nava vê kitêba întêraktîv da usa jî ev tişt hene:

- Matêriyalên derheqa xwendina herroje
- Pirsên bona guvtukirina tevayî, bi komê
- Mecalên bona çêkirina zewaca nava xiyala we da
- Gavên bona ku hûn bi cûrê açix serhatîya xwe binivîsin



Con û Lîza Bîvêr xudanên kitêbaya eyanin û hîmdarên qulixdarîya “Mêsîncêr Întêrnêyşînil”-ê ne. Ew ji 30-î salî zêdetir e, ku zewicîne û dixwezî, ku şerkarî û serkevtinên xwe dewlemend bikin û serhatîyên zewaca merivên başçe biparêzin. Con û Lîza li Kolorado Sprîngzê - li ştata Koloradoyê dijîn. Çar kurên wan û sê nebîyên wan hene.

Bona mecalên zêde herin li vê malperê www.CloudLibrary.org

Ji vê zêdetir dixwezî?
Vi şikîti pêlîm



Messenger
International
MessengerInternational.org

Ev kitêb pêşkêşa ji aliyê xudanê wê da ne û nayê frotanê.

